

**Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî 17**

# **Li ser rêya azadîya Kurdistanê de**

**Dr. M.S. Cuma**



Naunîşan : Li ser rêya azadîya Kurdistanê de

Nivîskar : Dr. M.S. Cuma

Çapa yekem : Kurdî - Kurdmancî - 1999

Çapxana : Rewşenbirî - Hewlêr - Kurdistan

Dane : 1000

**Leyawt: Govend M.H. - Berig: Serdem**

Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999

Jimara spardinê (111) li sala 1999

# Li ser rêya azadiya Kurdistanê de

-Çend bîr û bawerî li ser hin rûdanên siyasî de  
ji sala 1956 - 1975 de-

Dr. M.S. Cuma



## Navrok

Pêşgotin.....3

### Derîyê Yekem

Pêkhatina Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de .....	14
Rûdanên li Misrê de .....	26
Pêkhatîna Partîya Demokratî Kurd li Suryê de .....	30
Raperîna Ciwanrû li Kurdistana Iranê de.....	87

### Derîyê Duwem

Rudanên siyasî ji vêkevtina Şûreşa Ilulê sala 1961 - 1970 de...	93
Siyaseta Qasim beramberî Kurd û Destpêkirina Şer.....	93
Wergêkirina Basîyan di 8. 2. 1963 .....	102
Hatina Abdul- Selam Arif ji bona ser Sedarîyê .....	124
Hatina Arifê Duwem û girêdana peymanê 29 axlêva sala 1966 de..	131
Hatina Basîyan careke din ji bona ser Serdarîyê.....	152

### Derîyê Sêyem

Rudanên siyasî ji Peymana 11 avdara sala 1970 tanî sala 1975 de..	164
Peymana 6 Avdarê.....	288
Bi dawî hatina Şûreşê ve.....	295

Hêjakirineke rexneyî li ser helwesta Barzanî de ji bona bi dawîanîna  
vê şureşa hanê ve

-Ev ji bona Nivîsta Duwem hatiye bihitin-

Kanîyên bi karanînê ve.....297

„Mîletekî azad mîletekî din nade bijêrdestkirin“



„Miletêkî azad miletekî din nade bijêrdestkîrin“

*Karl Marx*

## Pêşgotin

Min ji mêj de didate bixwestin, ku ez li ser rûdanên siyasî de di nava welatê me de ji sala 1956 de tanî vê roja meyî neha de bidim binivîsandin; belam min di pêşî de date bixwestin, ku ez demeke nîşankirî ji deh salan de li ser sê berên cudan de bi zimanê me ve di warê wergerandinê de bidim binivîsandin; jiber ku hemû pêşkevîna miletan di warê zanistî û zanebûnê de di pêşî de di rêya wergerandinê de dayite bidestpêkîrin.

Jiber ku ez tevaya karê xwe di şiyarkirinê de didim bidîtin; jîbervêjî ve min di pêşî de ji bona pêşvexistina zimanê me û bi taybetî ve ji bona pêşvexistina zaravayê kurmancî date bikarkîrin, jiber ku ev zaravaya hanê mîna tevaya zaravayên din her û her ji bal dagîrgerên Kurdistanê de di her gavê de dihate bişerkîrin û rê li ber de dihate bigirtin. Herwehaji Dujminên me bi her navekî jî ve her û her wan didatin bikarkîrin, ku ew mêjûwa me him ji nava serên me û himjî ji nava bextên me bi carekê ve bidin biderxistin û wê li ber çavên me him bidin bitarîkîrin û himjî bidin bireşkirin û bes û bi tenha xwe ve mêjûwa xwe li ber dil û çavên me bidin bişêrînkîrin û bi vî rengê hanê ve û bi hisanî ve bi saya jîbirkîrîna ziman û mêjûwa me ve bi xişkayî û xweşkayî ve me di nava xwe de bidin bijavkîrin. Weha min di warê duwem de di wergerandinên xwe de giraniya xwe ji bona ser wergerandina nivistên li ser mêjûwa me de ji bona zimanê dê, zaravayê kurmancî date bixistin. Di qonaxa sêyem de di wergerandina xwe de min hin ji giraniya xwe ji bona ser rêmanên dema vejandinê li

Ewropa de date biavêtin, ku miletê me bi zimanê xweyî dê ve li ser bîr û bawerîyên dema vejandinê de bête biagehdarîkirin; jiber ku ew bi bingehê tevaya vejandina Ewropa ve hatine biderkevtin û li ser bingehên wan remanên hanê de tevaya pêşkevtina Ewropa û Cihana Nuh -Emerîka- tête biavakirin. Min hemû nivîstên di bernameya wergerandina xwe de ji bil nivîsta Komara Eflaton, nivîsat Syasetê ji bal Aristo û Girava Nîgaşî ji bal Tomas Mor de dane biwergerandin. Min nikarîbûn ev nivîstên hanê di dema nîşankirî de bidana biwergerandin; jiber ku min di wê navê de çar nivîstên Mesud Barzanî datin biwergerandin. Min di vê pêla wergerandinê de ev nivîstên hanê dane biwergerandin, ji yên ku ew li ser CD. Rom de hatine biçapkirin; jiber hinêndin jî têtin bidîtin, ji yên ku hêjî ew hatine bi çapkirin û bibelavkirin; lêbelê ew li CD. Rom de jiber kêmbûna demê ew hêjî nehatine binivîsadin. Ew jî evin: 1. Manefêsta Partîya Komonist, 1. Mêjûwa Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de û 3. Li ser Tirba Şero de. Dê ez wan jî ji nû ve li CD. Rom de bidim binivîsandin:

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd  
1931-1958  
Mesud Barzanî

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd  
1958 - 1961  
Mesud Barzanî

Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê  
Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê  
Mohemed Emîn Zekî Beg

Mêjûwa Dewlet Ê Mîrneşîniyên Kurd Di Pêla Musulmantîyê De  
- Bergê Duwem Ji Kurtîya Mêjûwa Kurd Ê Kurdistan -  
Mohemed Emîn Zeki Beg

Pirsiyarîya Kurd  
Mêjûwa Kurdan û Neha Wan

(Civata Xweyîbûnî Kurdîyî Welatperwer)

-Belavoka Pêncem -

Dr. Bilêc Şêrkoh

Kurd

Rûnkirin û Dîtin

Kurd Nevîyên Mîdîyan

V. F. Mînoriskî

Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Profisor A. Hesretyan

Der Barê Sitraticîya Siyasî û Sipahî ya

Tevgera Welatîyî Kurd

-Temaşekirinek ji bona Mêj û Neha, herwehaji yekeke din ji bona Ayinde ji de-

Doktor Ismet Şerîf Wanlî

Zanistîya Mêjûwê li Ewropa de, Felsefa wê, Şeweyê wê, Pêşkevîna wêna, Rûnkirinên li ser Mêjûwa Kurdistanê û Dîroknivîsandina Rojhilatê de

Doktor Ismet Şerîf Wanlî

Tevgera Kurd di serdema nuh û neha de

Akadîmiya Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û Akadîmiya Zanistîya

Ermeniya Sovyêtê; Mosko, di sala 1987 de

Mîr

Nikolo Mikavili

Peymana Civakî

Jean-Jacques Rousseau

Pêşkevîna Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê

Friedrich Engels

Rola Kar di Veguhertina Meymûnan de ji bona Merovan



Friedrich Engels

Derbarê Mafeyê Netewan di Nişankirina Çarenûsa xwe de  
Lenin

Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê  
Lenin

Zînetî Zîmanî di nava Heremên Kurdî de  
R. I. Tissabolov

Li ser rêya azadiya Kurdistanê de  
-Çend bîr û bawerî li ser hin rudanên siyasîyî de ji sala 1956 - 1975  
de-  
Dr. M. S. Cuma

Herrwehî min di sala 1966 de namilkeyek di bin nav û nîana:  
Li ser tirba Pêro de date bibelavkirin

Herwehî min Manêsta Partîya komunist ji bal Karl Marx -  
friedrich Engels de di sala 1975 de ji bona zîmanê Kurdî zaravayê  
kurmançî date biwergerandin û ew di weanên Ronahî de di sala 1976  
de hate biçapkirin.

Herwehî min di gelaveja sala 1986 de: Sî sal mêjûwa Komela  
Xwendevên Kurd li Ewropa date binivîsandin. Ew ji bal Komela  
Xwendevanên Kurd li Ewropa de di gelavêja sala 1986 de li bajarê  
Berlîna Rojava de hate biçapkirin.

Weha bi vî corê hanê ve bernameya minî wergerandinê bi dawîya xwe ve hate bihatin û ji neha û pêve bigir bes û bi tenha ve dê ez li ser hin ji wan rûdanê siyasî de ji pêla sala 1956 tanî neha de pêl bi pêl ve bidim binivîsandin.

Ez dixwazim van pêlên hanê di nava sê nivîstan de bidim binivîsandin. Herwehaji ez dixwazim nivîsteke bi taybetî ve li ser Kurdistana Turkî de û cihê wê yî giring û giran de di çarekirina pîrsa Kurd de ji bona careke din bi yekkirina Kurdistanê ve ji nû ve di rêya neft û ava wê de û pêkanain dewleteke milîyî bi serxwe ve û pêwndî û gihandina wêna ligel Yekîtiya Dewletên Ewropî de di ser Turkî re û ligel wê de di nava çarçopê dewleteke Fêderalî de di ayinde de bi dûr û dirêjî ve bidim binivîsandin; jiber ku ayinda Kurd û Kurdistanê di encamê dawî de di nava Kurdistana Turkîyê de tete biderkevtin û bidîtin.

Heger ku Dewleta iraqê û Surî bi taybetî ve û Erebi bi giştî ve pîrsa Kurdistanê bi şeweyekî dûrbîn û zanistî ve û li ser berjewendîya miletê xwe de li ser bingehê pêrûniştina bi mafeyê Netewê Kurd ve di Çarenûsa wî de pê neyêtin birûniştin, bi neçarî ve û di dawîya dawî de dê serpehatîya Ismailê Sefewî û peymanê sala 1515 di navbera Kurd û Turkan de ji nû ve careke din bi şeweyekî bilindtir û baştir ve li ser bingehê Fêderalîyê de di yekkirina Kurdistanê de bi mîna berî cengê cîhanî yekem ve jiber av û nefta wê ve bête bicîanîn.

Di vî warê hanê de Dr. Ismet Şerif Wanlî pir bi zanistîyeke bilind ve û li ser serpehatîya mêjûwê de ev rastîya pîrsa Musilê di nameya xweyî vekirî de ji Lozan, di 1. 5. 1992 de ji bona Serokê dewleta Turkî Turgut Özal û Serek wezîrê wêna Sulêman Demirêl de date binivîsandin.

Divê Kurd û Erebi bi hev re wan bîr û bawerîyên wê nameya hanê ji xwe re bidin bixwedekarîkirin, da ku ew bêtir di pêwistîya çarekirina vê pîrsê de li ser bingehê zanistî de û li gora berjewendîyên xweyî milî de bi

baştirîn şêwe ve di çarekirina wêyî demokrasî û aşîfî de li ser bingehê Fêderalîyê de bêtin biliberkevtin. Ev nameya hanê bi zimanê Elmanî ve di Kovara “Kurdistan Heute”, Nr: 2/ 92, Oktober/ November hatîye bibelavkirin.

Ev rastîya tirş û tal divê rep û rast ji milletê Ereb re bête bigotin, ku talankirina dewlemendîya Kurdistanê, erebkirina wêna, kole û bendekirina milletê Kurd û qirkirina wîna dê pir bi buha ve li ser wan de bête birawestandin û dê ew di encamê dawî de pir bi zîyana wan ve bête biderkevtin. Çe l dostanîya milletê Ereb ji bona milletê Kurd bi pêwîst ve tete biderkevtin, weha deha bêtir dostanîya milletê Kurd ji milletê Ereb re bi pêwîstir ve tete biderkevtin.

Ez hêvîdarim, ku Dilsoz, Zanevan û Zanistvanên Ereb li ber tevaya vê rastîya hanê ji xwe re bêtin biliberkevtin, da ku ew milletê xwe û milletê me ji wan destanên hanêyî hatî de bidin biparastin û hêmi dostanîyê û biratîyê di nava herdu miletan de di nava milletê Ereb û Kurd de bidin biwarkirin.

Herwehaji ez dixwazin nivîsteke bi taybetî ve li ser hoyên cudabûna di nava Barzanî û Taqîmê Ibrahîm Ehmed de bi dûr û dirêjî ve û di derbasbûna demê re bidin binivîsandin.

Herwehaji ez dixwazim li ser wan amarên tomarkirî de li ser serjimara milletê Kurd de di kanîyên cudan de û li ser pêşkevtina wîyî Demografi de bidim binivîsandin; jiber ku amara serjimara Kurd jiber hoyên cudan ve ew jî bi girêkeke dijwar ve tete biderkevtin, ku ew di dijwarbûna girêka xwe de ne bi kêmê dijwarbûna girêka pirsê Kurd ne tete biderkevtin. Min di salên şestî û herwehaji di nava salên heftêyî de di kanîyên Komela Xwendevanên Kurd de li ser vê pirsê girêka amara serjimara Kurd de û cihê wêyî demografi de di xebata milletê Kurd de him ji aliyê kêra pîrbûn wê de ji bona rizgarîkirina Kurdistanê û himjî ji aliyê kêra wê de ji bona pêşvexistina Kurdistanê date binivîsandin.

Ez dixwazim li vêderê de bes û bi tenha ve berê vê bêtirbûn û pîrbûna serjimara milletê Kurd ji xwendevanên xweyî giramî re bidim bitomarkirin, da ku ew piçekî bêtir him li ber tevay pêşkevtina xebata Milletê Kurd de di azadî û serxwebûna Kurdistanê de û himjî bêtir di destana milletên Rom, Ereb û Ecem de di vî warê hanê de bêtin biliberkevtin.



Ev Amarên darêjtî li ser amara serjimara Kurd de ji nivîsta Ismet Şerîf Wanlî de bi zimanê Ingilîzî ve: „The Revolution of Iraki Kurdistan“, rûpelê 5, Pulished by the Committee for Defense of the Kurdish People's right (Kurdish Representation) April 1965 hatîye biwergirtin; jiber ku di bîr û bawerîya min de kêman weha mîna Ismet Şerîf Wanlî bi zanebûn û zanistî ve di vî warê hanê de dane binivîsandin.

Min ev amara Ismet Şerîf Wanlî bi bingehe ve di sala 1965 de dayite bidin. Herwehaji min bêtirbûna serjimra miletê Kurd carekê bi endaziya 3 % dersd tanî sala 2030 dayite bidanîn, mîna ku evaya bi endaziya navarasta bêtirbûna serjimra hemû miletên li Cihana Sêyem de li gora kanîya Yekitiya Netewan de hatîye bidanîn. Cara duwem min endaziya bêtirbûna serjimara miletê Kurd bi 3,5 % der sed bi texmînkirî ve dayite bidanîn. Li gora bêtirbûna endaziya kanîya Yekitiya Netewan de bêtirbûna Cuhên Rojhilatî di Israîl de û bêtirbûna Hundên Sor li Emerîka de bi bêtir 4 % der sed ve tete biderkevtin. Hiç gûman tede nayê biderkevtin, ku endaziya bêtirbûna serjimara Kurd di Kurdistanê jî de bêtir ji 3,5 % der sed de tete biderkevtin, lêbelê ez dixwazim herdu endazên bêtirbûnê him 3 û himjî 3,5 % der sed bidin bidanîn, da ku Xwendevan bes û bi tenha ve berê pêşkevtina bêtirbûna serjimara miletê Kurd tanî sala 2030 bi texmîn ve ji xwe re bidin bidîtin; jiber ku amara serjimara miletê Kurd bes û bi tenha di amareke serjimareke milî de bi rast û durust ve dikare bête biderkevtin. Ev karê min bes û bi tenha ve ne kêman û neji bêtir berê amara bêtirbûna serjimara miletê Kurd dide biderxistin û ez didim bihêvîkirin, ku wetovjî bête biliberkevtin<sup>1</sup>.

<sup>1</sup> Tevî, ku ez bi zimanê Fîrensî ve nizanîm, Merov dikare ji xwe re ji listên vê legerrandina hanê bide bikarkirin. Ji xwe re li vêderê bi dîr û dirêjî ve li lêgerandina Ismet erîf Walî de bi zimanê Fîrensî ve: LA POPILTION KURDE, "BOMBE A RETRDEMENT ET LES EFFETS SOCIAUX ET CULTURRELS DE LA REPRESSION

Lausanne, mars 1999 de bidin bitemaekirin. Ev lêgerandina hanê di meha gulanê de ji min re ji bal Ismet de hatin birêkirin, tevî ku wî dixwest, ku ew wî ji min di avdaarê de bide birêkirin. Wî ew di avdarê de ji min re dabû birêkirin; belam li ser navnîana min ji berî deh salan de hêjî ji berî yekbûna Elmanya de dabû binardin; jibervêjî ve ev karê hanê wetov bi derengî ve bidestên min hate bikevtin û min nema

Hêjbêtir guhertineke pir giran û mezîn û pir bi kêrtir ve ji bona azadî, serxwebûn û pêşkevîna miletê me di nava kurdistanê de tete biderkevtin, ew jî di barkirina Kurdan ji gundan ji bona nava bajarên de tete biderkevtin. Ez li ser mêjûwa vî şeweyê barkirinê de û hoyên wêna de ne li nik miletên din de û ne jî li nik miletê Kurd de li vir de naxwazim bidin biaxivtin, lêbelê ez dixwazim bes û bi tenha ve bidim bigotin, ku berê bêtir ji 90% der sed ji milête me di nava gundan de û nêzîka 10 % der sed jê di nava bajarên de dihate bijîyandin, lêbelê neha nêzîka 10 % der sed ji miletê me di nava gundandê û 90 % der sed jê di nava bajarên de têtin biderkevtin, mîna ku ev bigir di nava hemû miletên Cîhana Sêyem de dihate biderkevtin.

Bêtirbûna serjimara Kurd bi endazîya 3% der sed ve -bi milyonan ve-

Kurdistan	1965	1970	1975	1980	1985	1990	1995	2000	2005	2030
Turkî	6,00	7,00	8,00	9,34	10,84	12,56	14,56	16,88	19,57	40,98
Iran	4,50	5,21	6,00	7,01	8,13	9,42	10,92	12,66	14,68	30,70
Irak	2,00	2,31	2,70	3,12	3,61	4,19	4,85	5,63	6,52	13,66
Surî	0,4	0,46	0,54	0,62	0,72	0,84	0,97	1,26	1,30	2,73
Tevde	12,90	14,98	17,34	20,09	23,29	27,01	31,34	36,44	42,07	88,07

Bêtirbûna serjimara Kurd bi endazîya 3,5% der sed ve - bi milyonan ve-

Kurdistan	1965	1970	1975	1980	1985	1990	1995	2000	2005	2030
Turkî	6,0	7,13	8,46	10,05	11,94	14,18	16,84	20,00	23,75	56,14
Iran	4,5	5,34	6,35	7,54	8,95	10,63	12,63	15,00	17,81	42,10
Irak	2,0	2,37	2,82	3,35	3,98	4,73	5,61	6,67	7,92	18,71
Surî	0,4	0,48	0,56	0,67	0,79	0,94	1,12	1,33	1,58	3,74
Tevde	12,9	15,32	18,19	21,61	25,66	30,48	36,20	43,00	51,06	120,69

dikarîbû wî ji bal Fewzî Esede ji xwe re bidim biwergerandin. Ez li Kurdistanê Iraqê de bûm û ev karê hanê ji min re ji bona wêderê de hate binardin û min ew li wêderê de ji bona wergerandinê dayite bidan. Di 4. 6. 1999 de ji bona ewropa hatim bivegerandin û wergerandina karê hêjî nehatibû bidawîkirin. Ez dê di 28. 6. 1999 de careke din bêtîm bevegerandin û ez hêvîdarim, ku dê ew karê hanê hatibe biwergerandin.

	toprax km2	top.	%serjim.	Serjimara 2000	Serjimara 2030
Welat		Kurdistan	Kurd		
Turkî	760,000	220,000	23%	20,000,000	56,000,000
Iran	1,600,000	180,000	21%	15,000,000	42,000,000
Iraq	440,000	80,000	30%	6,700,000	18,800,000
Surî	170,000	20,000	10%	1,300,000	3,700,000
Hemû		500,000		43,000,000	120,500,000

Bi vî awayê hanê ve bernameyeke minî pir bi dûr û dirêj ve di warê nivîsandîne de li ser Kurd û Kurdistanê de tête biderkevtin. Ez hêvdarim, ku dê ezê wan karên hanê bikaribim bi başî ve bidim bicîanîn.

Di vê nivîsta beşê pêşî de pir danav ez li ser wan de nehatime biaxivtin, yanjî min bi şiyarbûn ve xwe ji wan dayite bivegirtin; jiber ku dibe ez di pişt re dê bi ser wan danavan ve bêtîm bivegerandin, yanjî jiber ku ez dixwazim bi rastî ve xwe ji wan bidim bidûrkirin û nivîsandina li ser wan de ji hinên din re bidim bihiştin.

Ez dixwazim vê nivîsta xweyî hanê û herduwê dinî li ser vê pêla hanê de ji bona Kak Idrîs Barzanîyê Nemir bidim bidiyarîkirin.

Min Idrîs Barzanî di havîna sala 1970 de di nav Pirdan de li Kongirê Heştî Partîya Demokratî Kurdistan de date binaskirin. Di wan dîtînen hanêyî de di wê demê de min pir guhê xwe bi peyvên wî ve dadatin bidan û min dixwest ku ez wî ji xwe re bidim binaskirin, belam dem pir bi kurt ve ji bona nasîna vî Rêberê Xortê Nuhhatîyî bela û livandî di tatîk û sitratîcya siyasî de û zal û peyvdar li ser têgihiştina siyasî de dihate biderkevtin.

Di 13. 3. 1979 de ez û Roj Şawîş ji Berlin di ser Pirag û Bagdadê re ji bona Tehran ji bona şûna Barzanî hatin biçûyîn. Ez naxwazim li vir de li ser çîroka xwe û Roj Şawîs de bidim biaxivtin û binivîsandin, ya ku ew pir bi tirse ve dihate biderkevtin; jiber ku balafira me li balafîrxana Begdadê de hate bixerabûn; lê ez dixwazim li vir de gotînen Idrîş li ser nigerîya wan de li ser biderngkevtina gihandina balafira me de ji bona balafîrxana Tehranê de bidim bivegerandin; jiber ku wan dizanîbû, ku dê balafira me di ser Bagdadê re ji bona Tehranê bête bigihandin. Piştî ku wî ez û Roj dane



bihembêzkin, wî date bigotin: pir em li ser biderengkevtina we de nigar û xemdarbûn. Wî tevaya xweşbûna dildarîya xwe bi hatin û dîtina me ve bi saxî ve date biderxistin.

Ji vê roja hanê û tanî mirina wîna de di 31. 1. 1987 de roj bi roj ve hevaltî û dostanî di nava min û wî de dihate bixurt û bikûrkin. Em pir ligel hevdû de li ser kûrbûna dûrbûna mîlî de û li ser siyaseta rizgarîkirina Kurdistanê de û li ser armanaca xebata Miletê Kurd de di pêkanîna dewleteke milîyî de bi serê xw ve dihatin bipeyivadin.

Çend di ser van pêwendîyên min de ligel Idrîs de dem dihate biderbaskirin, bêtir û bêtir tevaya Kesîtiya wîyî mezin û welatperwerîya wîyî bêqam di her warekî jînê de di xwendekarîya min de jê re dihate biderkevtin. Belê ew ji Derketvanê dibustana siyasîya Barzanîyî bilind ve di welatperwerîyê de û di têgihiştina jînê de dihate biderkevtin. Ew ne mîna bi Siyasetvanekî Rojholatî ve di nava welatên paşvekevtî de dihate biderkevtin, ji yên ku pir ji wan li ber siyasetê de bi gotinên ser tûran ve hêjî têtin biliberkevtin; lêbelê têgihiştina wîna di siyasetê de di taktîkê de, di sitratîcîyê de û di armanca wêna de bi têgihiştina wêna ve di dema vejandîna de li Ewropa de dihate biderkevtin. Kêm kes mîna wîna min di nava Kurdan de didate bidîtin, ji yên ku ew weha deha bi jêhatîbûn û livandî ve bi vîn û evîn ve, weha deha bi berz û bala ve di taktîk û sitratîcîya siyasîyî Kurd de di armanca wîyî bilind de ji bona serxwebûna Kurdistanê de dihatin biliberkevtin. Kêm Kes mîna wîna li ser siyasetê û serperestîya wêna de weha bi zal û diyar ve dihatin biderkevtin. Ew zû li ber bîr û bawerîyên siyasetê de dihate bikevtin û hêjîbêtir wî bi zûtir ve û li ser bingehê hiş de ew bîr û bawerîyên siyasîyî hanê didatin bicîanîn. Wî zû Rêberên Qelp û Nezan ji Kurdan de didatin binaskirin û hêjîbêtir bi zûtir ve wî ew didatin birutûtazîkirin û di encamê dawî de wî ew didatin birûreş û birûsarîkirin. Hiç kesekî nikarîbû ew bida bixapandin, yanî derewên wetov ligel wî de bidana bikin, da ku ew wî bi wan ve pê bidin bixapandin. Ew bi xwedîyê peyva xwe ve beramber bi Dost û Dujminên xwe ve dihate biderkevtin. Ew bi rast û durust ve bi dostê dostên xwe ve û bi dujminê dujminên xwe ve dihate biderkevtin. Ew bi belayekê mezin ve li ser Dujmin de dihate biderkevtin. Ew ne bi qilçixekî ve, lêbelê ew bi gîsnekî ve her û her di çavên dujmin de dihate biderkevtin; jibervêjî ve hemû Rêberên Qelp

û Nezanên Kurd û Dujminên Kurdistanê bi carekê ve bi devavêtina xwe ve li ser Idrîs de didatin bigirêdan, mîna ku wan berê ew bi devavêtinên xwe ve li ser Barzanî de didatin bigirêdan.

Li ser van nav û nîşanê bilindî hanê de ez dixwazim ji bona vî Pêşmerge Qehreman û Rêberê Kurdistanêyî mezin di nava cerg û hinavên milletê me de vê rêza hanê ji van nivîstan bidim bidiyarîkirin, da ku nîfşên tîn ji xwe re di navbera Rêberên Welatperwerên Mezin de û Rêberên Qelp û Nezan de bidin bicudakirin.

Ez ji tevaya Xwendevanan û Rexnevanan hêvîya libuhrandinê li ser her kêmanîyekê de di vê nivîsta hanê de didim bikirin. Ezê dê li ser pêşneyarekê yanî rexneyekî ji bal Xwendevanan û rexnevanan de bêtin bidilşadkirin û dê ez bixwazim ji wan pêşneyaran û rexneyan sûd ji xwe re bidim biwergirtin.

Di dawîya dawî de ez dixwazim sipasî wan hemû Kesan bidim bikirin, ji yê ku wan hergav yarmetîya min ji bona biserkevtina vî karê hanê dane bikirin û bi taybetî ve mîna hercar ez dixwazim sipasên xweyî bi taybetî ve ji bona Fewzî Esed bidim bipêşkleşkirin, jiber ku bi saya serê wî ve ev nivîsta hanê jî hatîya birastkirin.

Dr. M. S. Cuma  
Berlin, di 25. 2. 1999 de

## Derfîyê Yekem

### Pêkhatina Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de

Ji 10 - 16 gelawêja sala 1956 de li bajarê Wiesbaden -Vîsbadin- de li Elemanya Federalî de Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de hate bipêkhatin. Eve demeke li ser pêkhatina vê komela hanê de hatîye biderbasbûn; lêbelê ev bi demeke kurt ve di mêjûwa merovanîyê de, di mêjûwa xebata miletan de û di mêjûwa sazmendî û rêxistanan de têtê biderkevtin. Lêbelê ev dema hanê di mêjûwa xebata gelê Kurd de û bi taybetî ve di xebata Xwendevanên Kurd de li Ewropa de bi rûpelekî pir geş û xweş ve ji bona xebata gelê me, belê ji bona pêşvexistina vê xebata hanê di hemû warî de têtê biderkevtin. Xebata Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi beşekî ve ji xebata hemû miletên jêrdest li seranserî cîhanê de bi dijî kevneperestîyê, serdarîya bêganê ve û herwehaji bi dijî sustêma kolonyalîyê û impiryalîyê ve têtê biderkevtin.

Di vê sala hanê de, di sala 1956 de xebat li seransî cîhanê de li Asya, Afrîqa û Emerîka Latînî de bi dijî sustêma kolonyalîyê ve hate bigeş û bigûrkin. Herwehaji di nava welat û miletê me jî de xebat hate bigeşkirin; jiber ku xebata me bi beşekî ve ji xebata wan hemû miletan dihate biderkevtin, ji yên ku wan di wê çaxê de ji bona azadîyê, serbestîyê û serxwebûna xwe ji nava lep û pencên Beganan didatin bixebatkin.

## Destûra komela xwendevanên kurd li ewrûpa

Yek - Nav : Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa.

Dudo - Nayrokê Komelê: Sazmendiyeke şagirtiyî pêşverû ye.

Sisê - Armancên wêyî bingehî:

- 1- Bi hêzkirina pêwendiyê di nava Xwendevanên kurd li Ewropa de û karkirin ji bona ji hev- vekirina pirsiyariyên wanî xwendinê yan jî yên civakî û xurtkirina canê hevkariyê, yarmetiyê û yekîtiyê di nava wan de.
- 2- Xurtkirin û hinerkirina pêwendiyê û yarmetiya wekhevî di nava komela me û sazmandiyên Xwendevanên Kurdistanî û Kurdên din de ji bona xebatkirinê ji bona armancên tevgera meyî şagirtiyî hevgirtî.
- 3- Bi hinerkirina pêwendiyên biratiyê û yarmetiya li gelhev de di navbera endamên komela me û karker û rewşenbîrên Kurdên li Ewropa de.
- 4- Vejandina zanyariya milî û welatîyê Kurd û karkirineke bi xurtî ve ji bona pirsiyariya Kurd û beşdarbûn di xebata gelê Kurd de ji bona wergirtina mafeyê çarenûsî xwe di Kurdistan de.
- 5- Nasdana netewê Kurd û çandîya wî, welatê wî Kurdistan û pirsiyariya wîyî welatî bi gelên cîhanê ve.
- 6- Bi hêzkirina canê alîkariyê û dostaniyê di navbera Xwendevanên Kurd de li Ewropa û Xwendevanên welatên din de û pêwendîkirin li gel rêxistinên Xwendevan û ne Xwendevanan de ji yên welatî û cîhanî û hevkarî li gel wan de bi pê kara herdu aliyen ve

7- Beşdarbûn di xebata gelê Kurd û piştgirtina xebata hemû gelên dunyayê de bi dijî Imperyalîzmê, kevneperestiyê û recîmê dîktatorî ve, li pê azadîyê, demoqrasîyê û aşîtiyê de li cîhanê de.

Çar - Pêwendiyên nameyî di navbera Liqan û Komîta Birêvebirina Giştî de bi kurdî ye.

Pênc - Komele Kovarekê li dûhev de bi navê Kurdistan ve derdixe, ew organa Komelê ye.

Şeş - Endametî:

1- Her Xwendevanekî Kurd yanî Rûniştvanê Kurdistan be, ku ew li Ewropa de dixwîne, dikare bi Endamê Komelê ve bête bikirin, bi mercekî ve:

- a) Bi destûra Komelê razî be û ji bona bi cîh anîna armancên wê ve kar bike.
- b) Abûna salan bide, li gora ku Liq wê li ser berzbûna jîndariya welêt datîne û sînor dike.

2- Mafeyê wergirtina Endaman bes û bi tenha ve di destê Komîteya birêvebirina Giştî de ye, piştî wergirtina bawerîya Liq.

3- Eger ku Endam bi pê destûrê ve ne çû, yanî karekî weha kir, ku ziyar bi Komelê ve yanî bi gelê Kurd ve dide bigihandin, ew xwe tûşî van sizeyên xwarê dike:

- a) Serenc rakişandin (inzar), sersikîn kirin (tewbîxkirin) bi biryariya Liq ve tete biderkevtin.
- b) Sarkirin bi biryariya Komîteya Birêvebirina Giştî ve tete biderkevtin

c) Derkirin bi biryarîya Kongirê Giştî ve têtê biderkevtin

Hevt - Rêxistina Komelê. Komele li ser van bendên jêrîn de dire:

1 - Kongirê Giştî :

- a) Pêktê ji wan Endamên têde têtin biamadekirin.
- b) Berztirîn desthilata destê Komelê ye. Dikare destkarîyê di destûra Komelê de bi kêmtirîn piranya dangan ve bide bikin û di dema yekbûna wan de ew alî bi ser ve têtê biserkevtin, yê ku Serekê kombûnê pişt lê dide bigirtin.
- c) Salê carekê ew têtê bigirtin û di dema pêwistî de dikare kongireyekê nedidema xwe de bête bigirtin, evjî li ser daxwaza du ji sisyan ji Endamên Komelê têtê bikin, yan jî du ji sisyan ji Endamên K.B.G. û di herdû caran jî de divê Endamên Komelê bi kêmanî ve mehekê berî wî bi cîh û dema Kongirê ve bêtin bizanîn.
- d) Bi tenê ve K.B.G. mafeyê danîna dem û cîhê kongirê heye.
- e) Pêş xwendina rapora K.B.G. ji Endamên kongirê re komîteyek ji bal kongirê de ji bona birêvebirina kombûnên kongirê têtê bihelbijartin

2- Komitîya Birêvebirina Giştî:

- a) Berztirîn desthilate di nava du kongiran de.
- b) Pêktê ji hevt-neh Endaman û du cîhgir, ku ew xweser li kongirê de têtin bihelbijartin.

- c) Ew Piştî kongire kom dibe û li wê de ji nava xwe Sekretêrê Giştî, Nêwerê wî, Hejmêrê Giştî û Sekertêrê govara Kurdistan dide bihildibjêrin.
- d) Biroya Sekretariyat ji Sekretêrê Giştî, Nêwerê wî û Hejmêrê Giştî tête bipêhatin. Ew biryarên K.B.G. di nava du kombûnan de dide bicihanîn û bi kêmanî ve ji du mehan carekê ew tête bikomkirin.
- e) K.B.G. bernameya kongirê dide biamadekirin û di kombûna pêşî de wê li ber Endaman de dide bidanîn.
- f) K.B.G. her ji sê mehan de carekê kom dibe.
- g) K.B.G. xweser bi berpîrsîyar ve beramberî kongirê Giştî tête biderkevtin.

### 3- Desthilatiyên Sekretêrê Giştî û yên Nêwerê wî:

- a) Sekretêrê Giştî nameyên Komelê mîr dike.
- b) Sekretêrê Giştî yanjî piraniya Endamên K.B.G. ji bona kombûnê bandikin.
- c) Sekretêrê Giştî û Nêwerê wî kar û barên Komelê bi lihevkirina nav xwe ve bi rê dibin. Li kombûna yekemî sekretaryat de Sekreterê Giştî û Nêwerê wî erkê pêwendîkirinê li gel sazmenîyan û rexistinan de û herwehaji ya Liqan jî li ser xwe de didin biparvekin.
- d) Di dema diyarnebûna Sekretêrê Giştî de, Nêwerê wî û hejmêrê Giştî bi erkê birêbirina kar û barên Komelê ve radibin.

### 4- Liq:

- a) Pêktê ji Endamên Komelê li welatên Ewropî de bi biryarîya K.B.G.

- b) Berztirîn desthilatîya navçe ye û bi kêmanî ve salê carekê kom dibe.
- c) Liq di civîna xweyî salane de komitîya xwe dide biheldibijartin.
- d) Civînên kombûnan têtin binivîsandin, hejmêrtîya Liq bi rêk û pêk têtê bidanîn.

#### 5- Komitîya Liq:

- a) Ji sê-pênc Endaman têtê bipêkhatin û ji nava xwe Sekretêr didin bihelbijartin.
- b) Kar û bar Liq dide birêvebirin û roleke mezin ji bona bi cîhanîna armançên komelê û biryariyên K.B.G. ve di welatê tê de dide bilîztin, bi mercekî ve ku ew ji siyaseta K.B.G. neyête biderkevtin.

#### Heşt- Diravîya Komelê:

- 1) Diravîya Komelê li vanê jêrî de têtê bipêkhatin:
  - a) Abûnên salan
  - c) Yarmetîya Endam û Dostên komelê
  - d) Desteketinên çalakî û jêhatîbûnên Komelê.
- 2) Diravîya Komelê li nava kasa Liq û ya Giştî de bi vî corî ve têtê biparvekirin:

Kasa Liq bi kêmanî ve 50 % ji hatinên xwe ji bona kasa Giştî dide bidan, beramberî vê kasa Liqan jî dikarin li gora pêwîstiyên xwe ji kasa Giştî yarmetiyê ji xwe re bidin biwergirtin.



**Destûra Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi zimanê Ingilîzî ve:**

The Constitution of the KURDISH STUDENTS SOCIETY IN EUROPE (KSSE)  
Approved by the 18th congress held in W .Berlin 6-9/8/1976

First: name: Kurdish Students' Society in Europe.

Second: Nature of the Society: A progressive, democratic student organization,

Third. Main Aims:

1-Strengthening relations among Kurdish students in Europe, endeavoring to solve their academic and social problems, and consolidating the spirit of cooperation, mutual assistance and unity among them.

2-Strengthening and consolidating relations and cooperation on equal footing between our Society and other kurdistan and Kurdish student organizations in the service of the aims of our united -student . ;'

movement.

3- consolidating the fraternal relations and mutual cooperation between members of our society and Kurdish workers and intellectuals in Europe,

4- Developing the Kurdish national and patriotic culture, exerting serious efforts in the service of the Kurdish people's cause and their national and patriotic case, and participating in the struggle of the Kurdish people for their right to self-determination in their home-land

kurdistan.

5- Acquainting the peoples of the world with the kurdish nation, its civilization, home-land kurdistan and its national case.

6- Strengthening cooperation and friendship between Kurdish students in Europe and students of other countries and cooperating with the national and international student and non-student organizations for our mutual interests.

7- Participating in the Kurdish people's struggle and supporting the struggle of all the peoples of the world against imperialism, reaction and dictatorial regimes and for freedom, democracy and peace.

Forth- All correspondence between the branches and the executive Committee is to be in Kurdish.

Fifth- The Society publishes a periodical called "Kurdistan" which is the organ of the Society.

Sixth- membership:

1- Every Kurdish student or from Kurdistan studying in Europe has the right to become a member of the Society provided that he or she:

a- Accepts the constitution and endeavors to realize the aims of the Society.

b- pays a manual fee (decided by the branch according to the level of living in its respective country).

2- The acceptance of applications for membership is decided by the Executive Committee after taking the view points of the branch concerned into consideration.

3- Should a member violate the constitution or commit an act harmful to the Society or the Kurdish people and their liberation movement he or she became subject to the following punishment:

a) warning reprimand by a decision of the branch committee .

b) freezing by a decision of the executive committee.

c) Expulsion by a decision of the congress.

Seventh: the constitution of the society:

The society is constituted according to the following bases:

1- the congress which is

a) made up of the members attending it.

b) The highest authority in the society, it has the jurisdiction to introduce amendments to the constitution, it takes decision on the bases of simple majority and in case of a draw, the side with which the vote of the chairman of the session is cast became the winning side.

c) The congress is held once a year and in emergencies, an extra ordinary congress can be held by a request of at least two-thirds of the members of the society or by the two-thirds of the members of the executive committee in both cases, all members must be informed of the date and the place of the congress at least a month in advance.

d) The executive committee only has jurisdiction to fix the place and date of congress.

e) Before reading the report of executive committee, the congress elects from among the participation of committee to chair the sessions.

2- the executive committee which is:

- a) the highest authority between two congresses.
- b) Is composed of 7-9 members and 2 stand by members elected directly by the congress.
- c) Meets after the conclusion of the congress, during it's first meeting it elect from among it's members and the secretary-general, deputy secretary, treasure , and the editor of (kurdistan).
- d) The secretary is composed of secretary general his deputy and the treasure, it implement the decision of the executive committee between two of it's meetings, and it meets at least once every two months.
- e) The executive committee prepare the agenda of the congress and present it to the participants in it's first session.
- f) The executive committee meets regularly once every three months.
- g) The executive committee is directly answerable before the congress.

3- the jurisdiction of the general secretary and his deputy:

- a) he signs the correspondence of the society.
- b) The general secretary or the majority of the executive committee summons the executive committee to meetings.

The general secretary and his deputy agree upon performing the functions of the society in the first meeting of the secretariat, the secretary general and his deputy share between themselves.

## Kongirên Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de tanî sala 1990 de<sup>2</sup>:

Kongirê Yekem	10 - 16. 8. 1956	li bajarê VîzbadinElmanya
Kongirê Duwem	2 - 4. 1. 1958	li bajarê London Ingilistan
Kongirê Sêyem	4 - 8. 8. 1958	li bajarê Monîx Elmanya
Kongirê Çarem	23 - 28. 8. 1959	li bajarê Viyena Nemsa
Kongirê Pêncem	22 - 26. 8. 1960	li Berlina Rojava
Kongirê Şeşem	22 - 26. 8. 1961	li bajarê Munster Elmanya
Kongirê Hefetem	9 - 15. 8. 1962	libajarê Birawînşivayg Elmanya
Kongirê Heştam	9 - 15. 8. 1963	li bajarê Monîx Elmanya
Kongirê Nehem	3 - 9. 8. 1964	li bajarê Hanover Elmanya
Kongirê Dehem	17 - 22. 8. 1965	li Berlina Rojava
Kongirê Yanzdehemîn	23 - 30. 8. 1966	li Berlina Rojava
Kongirê Duwanzdehemîn	27 - 31. 12. 1967	li bajarê Belgrad Yogsilavya
Kongirê Sêzdehemîn	11 - 16. 8. 1969	li Berlina Rojava
Kongirê Çardehemîn	1 - 5. 8. 1970	li bajarê Stokholm Siwêd
Kongirê Panzdehemîn	15 - 19. 2. 1972	li bajarê Buxarêst Romanya
Kongirê Şazdehemîn	16 - 20. 8. 1973	li Berlina Rojava
Kongirê Heftdehemîn	27 - 31. 8. 1975	li Berlina Rojava
Kongirê Heştdehemîn	5 - 9. 8. 1976	li Berlina Rojava
Kongirê Nozdehemîn	27 - 30. 8. 1978	li Berlina Rojava
Kongirê Bîstehemîn	15 - 18. 8. 1982	li Berlina Rojava
Kongirê Bîstûyekem	14 - 16. 9. 1986	li Berlina Rojava
Kongirê Yekgirtinê	19 - 21. 8. 1988	li Berlina Rojava <sup>3</sup>
Kongirê Yekgirtinêyî duwem	17 - 20. 8. 1990	li bajarê Giratzs Nemsa

<sup>2</sup> Ji xwe re di vî warê hanê bi dûr û dirêjî ve li namilka sî sal li ser KSSE de -Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de, di 10. 8 . 1986 ji bal Sikretariya Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa de, Berlina Rojava de, bidin bitemaşekiring, ya ku ew ji bal min de bi zimanê Kurdî Zaravayê kurmancî hatibû binivîsandin.

<sup>3</sup> Careke din ji nû ve yekitî di Komela Xwendevanên Kurd de li Ewropa de di navbera Partî û Hevalên Celal Talebanî de hate bikirin, piştî ku ewe di sala 1975 de ji Komelê ligel Hevalên Selah Bedredîn de hatin biderkevtin û wan Komelek nuh di Baxê Cenweran de li Bajarê Berlina Rojava de bi amadebûna Celal Talebanî de bi dijî Komela ve dane bidurustkirin.

Kongirê Yekgirtinêyî duwem bi kongirê dawîyê Komela me ve tête biderkevtin.

Ez ji Kongirê Pênc li bajarê Berlin de di sala 1960 tanî Kongirêyî dawîyî vê komele hanê de li bajarê Giratz li Nemsal de der sala 1990 di tevan de hatim bibeşdarîkirin û yekek ji Endamên Komelêyî jêhatî tede dihatim biderkevtin. Jîna minî siyasî di nava kar û barên Komelê û Rêxistina Partî Demokratî Kurdistan de di Ewropa de bi jêhatîbûn ve dihatim biderkevtin. Ez hêvîdarim, ku ez dê rojekê li ser wan rojên : geş û geş de di jîna xwe de bidim binivîsandin û pêerjî piçekî bi dûr û dirêjî jî ve him li ser Komela Xwendevanên Kurd de li Ewropa de û himjî ligel jî de li ser Rêxistina Partîya Demokratî Kurdistan de li Ewropa de bidim binivîsandin; belkî piçekî Keç û Xortên Kurd ji mêjûwa herd u rêxistinan ji xwe re sûd bidin biwergirtin û hêjîbêtir piçekî li ser mêjûwa xebata Xwendevanên Kurd de li Ewropa de bêtin biagehdarîkirin, bê kanî wan çilo û çawan û di bin çî merc û zînetan de ji bona welat û milletê xwe didatin bixebatîkirin. Ez ji nehan de belgeyan ji bona nivîsandina vî karê hanê didim bikomîkirin.

Ez ji sersala 1968 de di Kongirê Duwanzdehemîn de li Belgirad de li Yogsilavya de tanî Kongirê Panzdehemîn li Buxarêst de li Romanya de der sala 1972 de û ji Kongirê Heftdehemîn de li bajarê Berlîna rojava de di sala 1975 de tanî Gogirê Nozdehîn li bajarê Berlin de der sala 1987 de bi Endamê Sikretarîya Komela Xwendevanên Kurd ve dihatim biderkevtin û di hemû biryar û derkirinên Komelê de bi jêhatîbûn ve dihatim bibeşdarîkirin; jiber ku Sikretarîya Komela Xwendevanên Kurd bi pîrbûn ve ji sê Kesan ve dihatim bipêkahtin û ew di navbera du civînên Komîtiya Birêvebirina Giştî ve ya Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi hemû kar û barên Komelê ve dihatim birabûn û wê siyaseta Komelê di hemû warekî de di wê pêlê de didate biacînanin. Hergav ez di wir de bi Wênerê partîya Demokratî Kurdisan ve dihatim biderkevtin.

Divê li vêderê de bête bigotin, ku pîr Biraderên din jî di birêvebirina siyaseta komelê de di Komîtiya Birêvebirina Giştî ve û herwehaji di Sikretarîya wê de pîr bijêhatîbûn dihatim bibeşdarîkirin û

ew bi wênerên sazmandî û partîyên xwe ve dihatin biderkevtin, yanjî ku ew bi bêlayan ve dihatin biderkevtin.

Me tevan bi carekê ve pir bi canekî bilindî siyasîyî welatperwer û demokratî ve li ser bingehê karnasîya siyasî de ji bona kara welat û milletê xwe de ligelhevdû de didate bikarkirin, hegerjî cudabûnên bîr û berwerîyan jî di nava me jî de bihata biderkevtin, ew hergav bi şêweyekî demokrasî û bajaratî ve li ser bingehên armancên Komela Xwendevanên Kurd de li Ewropa de dihatin biçarekirin; jiber ku tevaya Komela me li Ewropa de li se wî canê demokrasîyî hanê de hatibû biavakirin û wê hergav jî wisa di hemû karên xwe de didate bireftarîkirin. Bi rastî ve Komela Xwendevanên Kurd ji roja pêkhatina xwe de li ser wê remana demokrasîyî bilind de hatibû biavakirin û hergav jî ew li ser wê de dihate biçûyîn. Ev başîya hanê jî bi rastî ve ji bona wan Merovan re tête bivegerandin, ji yên ku wan di roja pêşî de Komela Xwendevanên kurd li Ewropa de dabûn bidamezirandin. Ew reftra wan ji bona me tevan bi nimûne ve dihate biderkevtin. Rojekê ji rojan tevî hemû cudabûnên renamî û siyasî jî di nava Komela me de ew rêbazê demokrasî her û her ji bal hemû Endamên Komelê de dihate biparastin. Ev jî bi hoyê bingehîyî pêşkevtina Komela me ve her û her dihate biderkevtin û cihê wê bi hêjabûn ve him di nava milletê me de, di nava rêzên Xwendevanên Navnetewî de û himjî di nava bîr û bawerîya cîhanê jî de dihate biderkevtin.

## Rûdanên li Misrê de

Di sala 1956 de bûyîn û veguhertinên giran û mezin li seranserî cihanê de dihatin bikirin. Di vê sala hanê de bi kurtî ve di piştî pêkhatina Komela Xwendevanên Kurd de li Ewropa de xebata miletê Misrî hate bigeş û bigûrkirin. Impiryalizmê û bi taybetî ve impiryalizma Ingilîzî û Firensî bi alîkarîya leşkerîyî Israîlî ve hêrîşeke sê qolîyî mezin ji bona ser Misrê datin bidadan, da ku ew careke din ji nû ve Misrê ji bona jêrdestîya xwe bidin bivegerandin û agirê xebata rizgarîkirinê li Afrîqaya û Rojhilata Navînê de bidin bişemirandin.

Lêbelê bi saya xebata miletê Misrî ve û herwehaji bi saya alîkarîya dewleta Sovyet ve impiryalizma Ingilîzî û Firensî û pêrejî leşkerîya Israîlî jî ketineke mezin ji xwe re datin bixwarin. Belê ev kevtina hanê di cara pêşî de di mêjûwa impiryalizma Ingilîzî de hate biderkevtin, ku bi neçarî ve ligel Hevalbendên xwe divabûn xwe ji Misrê bidin bikişandin. Wehaji li seranserî cihanê de Impiryalizma Ingilîzî û Firensî piştî bi dirêjbûna sedsalan ve dest bi herifandina xwe ve datin bikirin, piştî ku roj di nava wan de nedihta biavakirin.

Vê guhertina hanê di dunyayê de di cara pêşî de di sala 1917 de date bidestpêkirin, gava ku şûreşa Oktobera mezina li Rusya de hate biserkevtin, ya ku têde yek ji şeşem ji ser ûwê zemînê de hate biazadîkirin û herwehaji pêrejî wê şûreşa mezin ji bona bi yekkirina miletên Jêrdest û çînîya Karger ve date bibangkirin, da ku ew bi hev re bi dijî kolonyalizmê, impiryalizmê û kevnepereştîyê ve bidin bitêkoşînkirin. Vê şûreşa Oktoberî mezin, ya ku ew li rusya de hate bivêkevtin, dergehekî pirî mezinî hêvîyê li ber miletên Jêrdest de li seranserî cihanê de date bivekirin û herifandina sustêma kolonyalîyê û impiryalîyê date bidestpêkirin. Zengilê azadîyê, serxwebûnê û

pêşkevîninê di nava hemû wan welt û miletên tamarkirî de di nava sedsalên navînî de hêdî hêdî lêbelê bi xurtî ve ji bona şiyarbûn û vejandina miletan ji nava evsanan de didate bilêdan.

Şûreşa Firensî tevaya miletên Ewropa ji tamara sedsalên navînî de date bişiyarîkirin û birizgarîkirin û serên Padîşahên wanî gen û genî bi gogê ve li ber kaşoyê Napolyon de date bidanîn û bimalandin. Şûreşa Oktoberî mezin tevay sustêma derebegîyê, kolonyalîyê û impiryalîyê di nava welat û miletên Jêrdest de date bitarûmarkirin.

Piştî cenga cîhanî yekem û bi xurtbûna dewleta Sovyêtî ve pêrejî herwehaji tevaya xebata miletên Rojhilat û miletên din di seranserî dunyayê de hate bigeşkirin<sup>4</sup>. Hewehaji pêrejî xebata miletê Kurdistanêyî belengaz jî hate bigeşkirin.

Lêbelê Impiryalîyê careke din ji nû ve ji bona parverkirina dunyayê ji miletên Jêdest ve di navbera xwe de tevaya merovanîyê di sala 1939 de ji bona nava tenûra cenga man û nemanê, ji bona nava cenga cîhanî duwem date biavêtin û impiryalî li ser kelexên hevdû de bi pîxîla hevdû ve hatin bikevtin.

Di 22. 6. Sala 1941 de dewleta Elmanîyî Nazî hêrîşeke giranîyî mezin ji bona ser Sovyêtê date bibirin, da ku ew wê ji ser rûwê zemînê de bide bihilanîn û miletên Sovyêtî ji xwe re bide bibendekirin. Lêbelê dewleta Sovyêtê bi mîrxasî ve, bi qehremanî û lehengî ve rû li rû de bi beramberî Nazîyên Elmanî ve hate birawestandin. Bi alîkarîya Hevalbendan ve û bi saya leşkerê sor ve û piştî girtina paytextê Hêtler Nazîya Elmanî hate birûxandin û di 8. 5. 1945 de Nazîya Elmanî bi bê bend û merc ve hate biberdestkirin û bi pêrejî cenga cîhanîyî duwem hate bidawîkirin, piştî ku têde 50 milyon kes hatin bikuştin û 58 milyon kes têde hatin bitawî û bibawîkirin; ji van jî bes û bi tenha ve ji bona nimûne 20 milyon kuştî ji Sovyête, 6 milyôn bi gazên kêmyawîyî xeniqadî ve û di nava firnên Hitlerî de şewitandî ji Cuhan û herwehaji 6 milyon kuştî ji Elman jî dihatin biderkevtin. Herwehaji

---

<sup>4</sup> Ji xwe re di vî babetê hanê de li nivîsta B. N. Ponomarjov de: „Der Sieg im Namen des Frieden“, Verlag Progress, Moskau 1985 de, bi zimanê Elmanî ve bidin bitemaşekirin; jiber ku ew pir bi nerx ve û himjî pir bi givaştî ve di vî warî de dide binivîsandin. Cuma



bi dawî hatina vê cenga cîhanîyê duwem ve sustêma kolonyalîyê û bi taybetî ve kolonyaliya Ingilîzî, Firensî, holendî û yê din hatin bilawazîkirin û ew ber bi rûxandina ve dihatin biserberjêrkirin.

Di vê salê de sînore împiryalizmê û kolonyalizmê bi eşkere ve hate bixuyanîkirin, ku ew nema bi tenha xwe ve dikarin serdarîyê li seransê cîhanê de bidin bikirin û ew li ser wê de bêtin bizalkirin. Dewleta Sovyêtîyê mezin pir bi xurtî ve piştta Misrê date bigirtin û jê bi darê zorê ve leşkerî Ingilîzî, Firensî û Israîlî hatin bikişandin. Ev hêrîşa hanê bi serêş û derdekî mezin ve li ser serên wan de hate biderkevtin û pêrejî wehajî xebata azadîxwaz li seranserê cîhanê de hate bigeş û bigûrkirin.

Di wê çaxê de Komela Xwendevanên Kurd di cara pêşî de amadebûn xwe date bixuyanîkirin, ku Endamên wê xwe bi serbazê şûreşê ve ji bona Misrê bi dijî sustêma kolonyalizmê û kevnepereştîyê ve û ji bona azadiya miletan û herwehajî ji bona azadiya Kurd didatin biderxistin. Di cara pêşî de di mêjûwa komela me di hate biderkevtin, ku hêjî çend meh di ser pêkhatina wê re nehatibûn biderbaskirin, ku wê di nameya xwe de ji bona Abdul-Nasir ew daxwaza mêjûyê date bixuyanîkirin û pêrejî wê ji bona hemû miletê Kurd û herwehajî ji bona cîhanê date binaskirin, ku xebata miletê Kurd bi beşekî ve ji xebata azadîxwazî tevaya dunyayê tête biderkevtin û pêrejî armancên wê di nava xebata miletan de bi dijî împiryalistîyê û kevnepereştîyê ve têtin biderkevtin.

Di sala 1960 de bi biryara Yekitîya Netewan ve sustêma kolonyalîyê hate bihilanîn. Neha bêtir ji 153 dewletan hatine biazadkirin. Piraniya van dewletan li Afriqya, Asya û Emerîka Latîne de têtin biderkevtin û ew bi mafeyên xweyî siyasî ve hatine bigihandin; jiber ku di sala 1919 ji 1200 melyon kes ji Xelkên dunyayê de ji 1800 melyon kes ango 70% ji Xelkên dunyayê de li jêr sîbera rêştika Kolonyalîyê de dihatin bijîyadin. Di dawîya salên şêstî de bes û bi tenha ve 30 melyon kes ango bes 1% ji Xelkên vê dunyayê

de li jêr Kolonyalîya Purtugalî de li Mozambîq, Engola û hin Giravên biçûk de têtin bijîyandin<sup>5</sup>.

Lêbelê milletê Kurd nebes tenê ew hêjî bi mafeyên xweyî milî ve û bi mafeyê çarenûsa xwe ve nehatîye bigihandin, lêbelêjî herwehaji hêjîbêtir ew ji biçûktirîn mafeyên xweyî merovanîyê jî têtê bibêpişk û bibêbehrkirin. Welatê wî Kurdistan têtê bitalankirin û ew bi serdejî ve têtê bibendekirin; mîna li Afriqa Jêrî de rehperestî, koletî û benditî ji bal Serdarên Borcuwazîyên Turk, Ereb û Farisan de têtê bicihanîn.

---

<sup>5</sup> Ji xwe re di vî warê hanê de li kovara Kader de bi zimanê Erebî ve, r. 47, jimara 11, sala 4de, di gulana sala -1972 de, çapxana Taymis, Begdadê de bide bitemaşekirin, ya ku ew ji bal Partîya Demokratî Kurdistan de têtê biderkevîtin.

## Pêkhatina Partîya Demokratî Kurd li Kurdistana Surî de<sup>6</sup>

Ji rûdanên mezin di jîna siyasîyî miletê Kurd de di Kurdistana Surî de pêhatîna Partîya Demokratî Kurdistan dihate biderkevtin. Bi kurtî ve li gora bîr û bawerîyekê de bi lez ve ev bi hoyên pêkhatina vê Partîya Piroz ve di jîyana siyasîyê miletê Kurd de li Kurdistana Surî de ev dihatin biderkevtin:

Şiyabûna miletê Kurd di vê pêla mêtûyê de ji her kat û zemanekî bi bêtir ve dihate biderkevtin; jiber ku Welatperwerên Xweyîbûn li vir de ji sala 1927 - 1946 de bi roleke pir giran û mezin ve him ji bona şiyarbûna milî û himjî ji bona şeweyê rêxistinê hatibûn bipêrabûn<sup>7</sup>.

Geşbûna rewşên siyasîyî demokrasî û berzbûna kêra dewleta Sovyêtê û Partîya Leninî mezin di seranserî Rojhilata Navînî de bi giştî ve û li Surî de bi taybetî ve dihatin biderkevtin.

Hatina jimareke pir ji Penahindên Siyasîyî Iraqî de bi giştî ve û Kurdistana Iraqê bi taybetî ve ji bona Surî dihate biderkevtin, jiber ku Surî di vê pêla hanê de bi cihê hemû Penahindên Siyasî ve dihate biderkevtin. Di nava van Penaghindan jî de pir ji Endamên Partîya

---

<sup>6</sup> Ji xwe re di vî warê hanê de bi dût û dirêjî ve li herdu nivîstên Mohamed Mele Ehmed de bi zimanê Erebî ve „Rûpelên ji mêtûwa tevgera azadîxwazîyî welatîyî Kurd li Surî de“, Beşê Yekem û Beşê Duwem, Bêrut, Libnan bidin bitemaşekirin. Ev herdu nivîstên hanê pir bi hêja û nerx ve li ser xebata milete de Kurd li Kurdistana Surî de têtin biderkevtin. Ez hêvîdarim, ku Xwendevan di vî warê hanê de ji xwe re ji wan herdu nivîstan hanê de pir sût bidin biwergirtin. Jîbervêjî ve dê ezê di vî warê hanê de pir bi kêm ve bidim binivîsandin.

<sup>7</sup> Ji xwe re li ser Xweyîbûn de li ser vê sazmenîya welatperwerî Kurdî de bi pir hêja û giring ve bi dût û dirêjî ve li nivîsta Mihemedê Mele Ehmed: „Xoybûn“ de, wergerandina ji bal Keça Kurd de ji bona Kurmancî, çapa yekem, Şam, di 15. 1. 1993 de bidin bitemaşekirin.

Demokratî Kurdistanê Iraqê jî dihatin biderkevtin. Celal Talebanî bi xwe ve roleke pir mezin ji bona navtêdana pêkanîna Partîya Demokratî Kurdistan li Surî de date bilistin.

Dewleta Misrî û herwehaji Surî tanî radeyekî ligel pêkhatîna Rexistineke Kurd de li Surî de jiber xurtkirina xebata Kurd li Kudrdistana Turî de bi kêmanî ve ne bi dij ve dihatin biderkevtin.

Ji her tiştêkî jî ve girîngtir rewşên navxweyî Kurd ji bona vê Pêkhatîna Partî pir li kare de dihatin biderkevtin. Bes û bi tenha ve ji bona nimûne di vî warê hanê de pir ji Welatperwerên Kurd dihatin bidîtin, ku wan ji bona pêkanîna vê partîyê didatin bikarkirin û ji van, mîna ku bi bîra min ve neha têtê biderkevtin, Osman Sebrî, Dr. Nuredin Zaza, Reşîd Hemû, Hemîd Derwêş û pîrî pîrî din dihatin bidîtin. Wan pir li ser xwe de û bi zanebûn ve li gora rewş û zînetê Kurdistanê Surî de ev Partîya Demokratî Kurdistan datin bidamezirandin. Daxwazên wê ji mafeyên siyasî, civakî û zanyarî dihatin biderkevtin; yê ku ew ji nava cerg û hinavên mîletê Kurd de li Kurdistanê Surî de dihatin biderkevtin û ji bona wan jî roj bi roj ve ji bal gelemperîya Kurd de pişt li wan de dihatin bigirtin.

Divê li vê derê jî de bête bigotin, ku Rêxistneke Kurdî li Kurdistanê Surî de bi navê „Civata Yekîtiya Xortên Demokratîyên Kurd“ bi taybetî ve li Cezîrê de di payîza sala 1952 de berî pêkhatîna Partî bi çar salan ve hate bipeydakirin, ya ku wê xwe bi nala Liqekî ve ji Partîya Demokratî Kurdistanê Iraqê ve xwe didate biderxistin. Ez bi xwe jî ve ji roja pêkhatîna vê Rexistana hanê de têtê biendam ve dihatim biderkevtin. Weke ku têtê biderkevtin, ev Rêxistina hanê ji bal Mohamedê Mele Ehmed, Ebdul Ezîz Ebdî, Samî Mele Ehmed Namî de û di pişt re jî de di sala 1956 de Endamên din mîna Ebdula Mele Elî, Ebdul-Rehman Şernexî, Ehmed Seyid Hemo û Ekrem Mohamed de dihate biserpereştikirin. Piştî Pêkhatîna Partîya Demokratî Kurdistan li Surî de ez xweser bi Endamê vê partîya Pîrozî nuh ve hatim bikirin û di pişt re teva Endamên wê Rêxistina Cezîrê jî tev li Partî de hatin bikirin<sup>8</sup>.

---

<sup>8</sup> Ji xwe re di vî warê hane de li nivîsta “Hin rûpelên mejûwa tevgera azadîxwazîya welatîyî Kurd li Surî“ de, Mohamed Mele Ehmed, r. 20 - 27, Bêrut, Libnan bidin bitemaşekirin.

Di pêla pêkhatina Partî de pir ji aliyên Komonistên Kurd li Cezîrê de dihate bişerkirin û pir navên bed bi dû Rêber û Endamên wê ve dihatin bikevtin; belam werisî derewan mîna her car bi kurt ve dihatin biderkevtin. Wan partî bi kevneperestîyê û tenhabûna milî ve didatin binavkirin. Hêjbêtir wan Rêberên wê ji bona pêkananîna partî bi bê canzarbûnê ve didatin biderxistin. Wan hîc pêwistîyek, piştgirtinek û ayendeyeke mêjûyî ji bona pêkhatina partî di nava civata Kurdistanê Surî de nedatin bidîtin. Wan rizgarîkirina Kurd û gihandina wîna bi mafeyên wîyî milî ve bes û bi tenha ve di pêkhatina Sosyalistîyê de di nava civaka Surî de didatin bidîtin; jîbervêjî ve wan her daxwazek ji bona mafeyên milletê Kurd di wê pêla de bi dijî bîr û bawerîyên sosyalistîyê ve didatin bidanîn û ew bi kevneperest ve didatin biderxistin. Ew bi van remanên xwe ve di giraveke evsanî de dûr ji hemû bîr û bawerîyên Sosyalistî û komonistîyê beramber bi pîrsa Kurd ve li Kurdistanê Surî de dihatin bijîyandin. Hêjbêtir wan bi van remanên xwêyî hîc û pûç ve bi nezanî ve yanjî bi zanebûn ve Rehperestîya Erebi û şovîya Efleqî beramber bi mafeyên milletê kurd ve di Kurdistanê Surî de bi perda pêşverûbûnê ve didatin bipoşandin û wan xwe ji rastîya pêwistîya mêjûyî ve ji bona çarekirina pîrsa milîyî Kurd di Kurdistanê surî de didatin bivegirtin, da ku ew dilê wê şovîniya rehperestîyî Erebi nedin bihiştin û ew wê nedin bitûrekirin. Hêjêjbetir pîranîya pîr him ji Komonistan û himjî Rêberên Kurdên qelp û nezan tevaya mafeyê Miletêkî di mafeyê çarenûsa wî de, di mafeyê serwerîya wî de, di mafeyê Mirovanîyê wî de li ser bingehê Mafeyî Merov de ji bal Yekgirtina Netewan de der sala 1948 de û herwehaji mafeyî Neşînvaniya Dewletê ji bona Kurd ji xwe re didatin bijîbîrakirin yanjî wan ew mafeyên hanê hîc nedidatin binaskirin, yê ku tevaya civaka bajartîya Merovanîyê û pêşkevîna milletan li ser bingehên bi cîanîna wan de dihate û tete bivakirin<sup>9</sup>.

<sup>9</sup> Ji xwe re di vî warê hanê li nivîsta Lenin de di Derbarê Çarenûsa Netewan de bi zimanê Kurd ve ji bal min de bidin bitemaşekirin. Herwehaji ji xwe re li nivîsta Jean-Jacques Rousseau de Peymana Civakî de bi zimanê Kurd ve ji bal min de bidin bitemaşekirin. Ev hedru nivîstên hanê dê ligel vê nivîsta hanê û pîr nivîstên din de ji wergerandinên ji bal min de di yek CD-Rom-Silkê- de bêtin bibelavkirin.

Hêjîbêtir Komonistan di pêkahtina partî de Hember û Berberekî xurt ji xwe re didatin bidîtin. Piştî pêkhatîna partî bi rastî jî ve roj bi roj ve cemawerên Kurd li seranserê Kurdistana Surî de bi hemû deste, bîr û çînyên xwe ve xwe li dora ala partî de didatin bikomkirin û Kurdan xwe roj bi roj ve ji dora Partîya Komonist didatin bidûrkirin û bivegirtin. Herwehaji pirañya pir ji Welatperwerên Kurd bi derbasbûna demê ve xwe ji nava partîya Kominst didatin bidûrkirin û gelek ji wan jî ve ji bona nava Partîya Demokratî Kurd li Surî de dihatin bikevtin.

Ew nobûna carcaran ku di navbera Partîya Demokratî Kurdistana Iraqê û Partîya Komonistî Iraqê de dihate biderkevtin, ew nobûna hanê di nava Partîya Demokratî Kurd li Surî de û Partîya kominstî Surî de nidihate biderkevtin; jiber ku rewş û zinetên mêjûwayî li herdu perçên Kurdistanê de bi cudabûn ve dihatin biderkevtin û herwehaji pêrejî daxwazên wan jî bi cudabûn ve dihatin biderkevtin.

Gava ku em van rastîyên mêjûyî li vir de der barê Partîya Komonistî Surî de didin biderxistin, divê rola wan di şiyarkirina Kurdan de û hêjîbêtir di pêşkeşkirina pir Kadirên jêhatî û zannevan de ji bona Partîya Demokratî Kurd li Surî de nedin bijibîrkin. Roj bi roj ve bi saya kadirên Partîyî nuhatî ve û bi saya van Kadirên Komonistî hatî de Partî deha dihate bixurtkirin û wehaji pêrejî bi vê endazîya hanê ve deha Partîya Komonist di nava kurdan de dihate bilawazîkirin û hîç jê re di nava civaka Kurdan de li ser bingehê wê siyaseta wê de beramber bi çarekirina pirsê milîyî Kurd ve li Kurdistana Surî de ne cih û ne war dihate bidîtin.

Belê Partîya Demokratî Kurdistan li Surî de di sala 1956/1957 bi yarmetîya Partîya Demokratî Kurdistana -Iraqê -ve hate bipêkhatîn. Navê wê di destûr û peyrewa wêyî pêşî de bi Partîya Demokratî Kurdistanê Surî ve dihate biderkevtin. Belam ew destûr û peyrewa hanê bi lez û bez ve ji nava destên Endaman hate bikişandin û navê Partî di pişt re xweser bi Partîya Demokratî Kurd ve li Surî de hate biveguhertin.

Weke ku neha ev bi bîra min ve tete biderkevtin, ev jî li ser pêşneyara Ismet Şerîf Wanlî hate bikirin; jiber ku di wê çaxê de nuh Ismet Şerîf Wanlî ji bona Şamê hatîbû bivegerandin. Ev veguhertina hanê bes û bi tenha ve ji aliyên qanûnî ve hate bikirin, da ku dijwarîyên bêtir ji bona Partî û Endamên wê neyêtin bipeyda kirin.

Destûr û Peyrew di navroka xwe de bi dûr û dirêj ve bigir bi mîna xwe ve hate bimayîn.

Partî bi roleke mezin ji bona şiyarbûna mîlî û civakî ve di nava cemawerên Kurdistana Surî de hate û tete bipêrêbûn; jibervêjî ve bi tundî ve ew ji bal Rehperestên Erebi û faşîyên Efleqî de dihate bişerkirin. Rêberên û Endamên wê di salên şestî de ji bona binê zindanan ditatin biavêtin û ew ji bona ber dadgehên bes bi nav ve didatin biavêtin û ew li gora qanûnên rehperestî de didatin badkirin. Herwehaji ne kembera Erebi û neji amara ji rêkevtiyî faşî ve û ne ji pêşneyarên Mohamed Teleb Hilal di Xwendekarîya xwe de <sup>10</sup>li ser herema Cezîrê de ji bona bi erebkirina Kurdan ve mûyekî xebata mîletê Kurd li Kurdistana Surî de dane birawestandin. Lêbelê tev li van pêrêbûnên rehperestî faşîyîyên Efleqî de xebata Partîya Demokrat Kurd her û her di nava Kurdistana Surî de dihate û tete bixurtkirin û bigêşkirin.

Kurdistana Surî tanî dawîya cenga cihanîyî yekem bi beşekî ve ji Serlteneta Osmanî ve dihate biderkevtin û ew li paş de li ser bingehe peymna Sykes<sup>11</sup>-Picot -Sayks-Piko-<sup>12</sup> de û bi parvekirin nuh ve Surî,

<sup>10</sup> Ji xwe re di vî warê hanê de li ser Xwendekarîya Mohamed Teleb Hilal li ser herema Cezîrê û pêşneyarên wîyî faşîyî Efleqî de di erebkirina mîletê Kurd de di Kurdistana Surû de li: Kurdica, Journal of Kurdish Affairs, Ne. 1, Julay 1968 de, r. 8, bi zimanê Ingilîzî ve bidin bitemaşekirin.

<sup>11</sup> Ji xwe re li ser Sykes û şeweyê nivîsandina vê pimana Sykes - picot de di giringbûna wê de li nivîsta Israel Intern de ji bal Arne Jörgensen, Militärverlag, VEB, r. 60- 71, Berlin 1984 de bidin bitemaşekirin.

<sup>12</sup> Ji xwe re li vêderê de bi dûr û dirêjî ve li nivîsta M. S. Lazerêv de di wergerandina zimanê Erebi de ji bal Dr. Ebdî Hacî de di bin navnîşana: „Pîrsa Kurd ji sala 1917-1923“ de bidin bitemaşekirin. Lazerêv yekek ji gewretirîn Karnasê Mêjovanê Kurd ve tete biderkevtin. Wî pir bi dûr û dirêjî ve li ser mêjûwa kurdistanê û pîrsa mîletê Kurd de dayite binivîsandin. Cihê wî di Karnasiya mêjûwa mîletê Kurdistanê de ne bi kêmi karnasiyê Minoriskî ve tete biderkevtin, ku herdu jî bi Rus ve têtin biderkevtin. Lazerêv der sala 1993 de di Kongirê Partîya Demokratî Kurdistan de li gel Mêjûvanên Nasvan de Hesrestyan û Şakirov di kongirê 11 de li paytextê Kurdistanê de li bajarê Hewlêrê de hatin bibeşdarîkirin. Pir rêz û hêjabûn ji bona Pirofêso Lazerêvê Rusî, Pirofêso Hesretyanê Eremenî û Pirofêso Şakirovê Kurdî

Iraq û Felestîne ve di nava Ingilistan û Firensa de Surî vê carê bi para Jêrdestîya Firensî ve hate bikevtin û sinorê Surî di peymanan Anqera de der sala 1922 di navbera Firensa û Turkî de hate bidanîn. Kurdên Kurdistanê Surî her û her wan bi serxet û binxet ve didatin bigotin. Mebest li vê derê de şiva hesinîyî tirênê bû, ya ku ew bi şiva hesinîyî Berlin - Begdadê ve dihate biderkevtin, ya ku ew ji bal Elman de di berî cenga cîhanîyî yekem de hatibû bivakirin.

Partîya Demokratî Kurd li Suryê de di befirbara sala 1962 de daxuyanîk bi dûr û dirêj ve li ser rewş û zînetê Kurd de ji bona bîr û bawerîya giştîyî Cîhanî, Erebi û Surî ve date biderxistin. Ji ber giringbûna vê daxuyanîyê hanê de ez wê li vêderê de ji zimanê erebî didim biwergerandin û wê li vêderê de ji bona xwendevanan didim bitomarkirin, da ku ew bêtir ji xwe re li ser rewş û zînetê Kurd de di wê dema hanê de bêtin biliberkevtin:

„Daxuyanî ji bona bîr û bawerîya giştîyê Cîhanî, Erebi û Surî de

Di vê qonaxa mêjûyî giring de, ya ku tede welatên Erebi tere têtin biderbaskirin, herwehaji ya ku tere bi taybetî ve Surî tere biderbaskirin, bi qonexekê ve tere biderkevtin, ya ku ew ji Serdarên Ereban re û herwehaji di pêşîya wan jî de ji Serdarên Surî re dide bixwestin, ku ew li gora endazîya berpirsiyarîya xweyî mêjûyî de û milî de bêtin biderkevtin, da ku ew daxwaza cemawerên fireh di azadîyê, demokrasîyê û jîneke xweş de bidin bicîanîn û herwehaji da ku ew aramîya hundurûyî daxwazkirî li pênavê rewstandina beramberî pîlanên Impiryalîyê de bidin bigirawkirin, ji yê ku ew bi dijî Ereban ve bi veşartî û eşkere ve têtin bitevinkirin.

Di gava ku em xwe di nava van zînetên hanê de bi xwe ve didin bidîtin, jimarek ji rojnamên Surî de ji dêlva ku ew xwe ligel çarekirineke nuh de ji bona pirs û derdên Erebiyî pir de bidin

---

ji bal hemû Endamên Kongire û hemû Berpirsiyarên Partî û serdariya heremê û pir bi taybetî ve ji bal kak Mesud Barazani ve hate bigirtin. Herwehaji ligel wan jî de Dr. Beşîr Sebrî, Dr. Letif û Dr. Sededal ji Mosko hatibûn bihatin û ew jî di Kongire de hatibûn bibeşdarîkirin û pir rêz jî li wan de hate bigirtin.



bireftarîkirin, ew millet bi nûçeyên pir bi tirs ve li ser hebûna „metirsîya Kurd“, „Israila Duwem“ û „Kevtineke Kurdî“ de bi nav ve didin biagehdarîkirin, ya ku ew Surî di sê goşeyê neffî de di Parêzgeha Cezîrê de ber bi tirs ve dide bixistin. Van rojnmanên hanê rûpelên xwe ji bona vê hêrîşa „hêstêrîyî“ navînî de li ser Neşîvanên Kurd de di nava rûpelên xweyî pêşî de dane bigirêdan. Herwehajî sergotarên wan jî li jêr navnîşanên gewreyî diyar de li ser wê metirsîya hanê de didin binivîsandin. Pir ji rojnamên cihanî û dam û destgehên ragiyandinan jî ew nûçeyên hanê dane biveguhêstin û bîr û bawerîya cihanî bi carekê ve pir guhên xwe pê datin bidan.

Kar û bar ne bes tenê li ser wê hêrîşa sitembar de hate birawestandin, hêjîbêtir li gel wê jî de peyvên wetov bi mîna wan hêrîşên hanê ve ji bal hin Berpirsîyarên di serdarîkirinê jî de dihatin biderkevtin, ji yên ku ew bi tirsfirandinê û givbûnê ve têtin bitijekirin. Herwehajî pêrejî civînên Civta Wizaretê bi amadebûna Parêzvanê Cezîrê jî ve li dûhevdû de dihatin bigirêdan, ku di nava wan de siyaseteke jirêderkevtî bi teybetî ve hate biderkevtin, ya ku ew divê ji bal serdarîyê de bi beramberî Kurd ve bi giştî ve û bi beramberî herema Cezîrê ve bi taybetî ve li ser de bête biçûyîn, ya ku ew divê bi siyaseteke jirêderkevtî ve bête biderkevtin, mîna ku rojnaman ew didatin bipesindan, da ku ew bi mîna bernameyeke milîyî taybetî ve bête biderkevtin û bendên wê divên bi carekê ve li ser hemû serdarîyên hatî de bêtin bicîhatin, ji yên ku ew li duhevdû de ji bona ser destên serdarîyê de di pişt re têtin bihatin.

Hiç gûnam lê nayête bikirin, ku dê ev hêrîşa rojnemevanîyî çêkirî û ligel jî de pêrabûnên ji rêderkevtiyên Mîrî de, ji yên ku ew ji bal serdarîyê de li ser Neşîvanên Kurd de têtin bigirtin, şopeke pir bed di nava pêwendiyên biratîyî mêjûyî de di navbera Milletên Ereb û Kurd de bidin bihiştin. Jiber ku milletê kurd li Surî de ji hemû destikên derxistina bîr û bawerîya xwe de beramberî vê hêrîşa sitembar de têtê biderkevtin, ya ku ew îro bi bê hoy ve tûşî wê têtê bikirin, Partîya Demokratî Kurd di Surî de danîna vê pîrsa hanê li ber bîr û bawerîya Cihanî û Erebî de di vê daxuyanîya hanêyî kurt de ji bona ser milên xwe dide bihilgirtin, da ku hemû li ser destana jandarî de bêtin biagehdarîkirin, ya ku ew bi ser serên Zarokên vî milletê hanê de têtê bikevtin, ji yên ku ew dê ji bal serdarîyê de bêtin bipêrabûn, da ku ew

xelkê ji Nişînvaniya dewletê de bidin birûtkirin û bi komel ve xelkê bidin bibarkirin. Ev pêrabûnên hanê tev de bi hevdu re dê derd û azarên qirkirinê bidin bipircarkirin û dê ew bisedan ve bi xelkê ve bêtin bikevtin.

Dibe ku her Merovekî bi rûmet ve îro ji xwe bide bipirskirin, ji yê ku ew pêşkevîna vê hêrişa pir bi derew û deng ve û çêkirî ve li ser hebûna vê kevîna hanê de û metirsîya Kurdî bi navkirî ve ji xwe re lê bide bitemaşekirin, ya ku ji bona van derewên hanê de tu bingehekî rastîyê nayetê biditîn: Magelo çi ji mebestîyên veşartî de li piştê vê hêrişa hanê de li ser wan Neşînvanan de têtin biderkevtin? Bersiv li ser vê de em didin bigotin, hîç di nava vê girêka hanê de tu veşartok nayetê biderkevtin, ku ew nayête biçarekirin. Ji her Merovekî re bi eşkere ve tete biderkevtin, gava ku ew ji xwe re li ser çûna kar û baran de di nava heremên Kurdî de û bi taybetî ve di nava herema Cezîrê de dide bimezyekirin, ku ev hêrişa neha bi xelekekê ve ji xelkên siyaseta heyî de li ser zordariya rehperestî de beramber bi Kurd ve di nava Surî de ji pêla serxwebûnê û tanî neha de tete biderkevtin. Herwehaji raperîna Ilula pîroz jî ji van berên siyasî de tu tişt nedate biguhertin; lêbelêjîhêjî biserdeji ve serdariyên hatî ji bona ser serdarîkirinê de ew siyaseta zordariyî rehperest beramber bi Kurd ve didatin bibêtirkirin, tevî ku millet li ser wê raperîna pîroz de pir hêviyên fireh li ser de didatin bidanîn,; belam ew serdariyên hatî hêjîbêtir di zordarîkirina li ser Kurd de bêtir ji xwe re didatin bikirin.

Serdariya îro jî hêjî ji bona lédana ji bona pêwendîyên biratî û bestandinê mêjûyîyî pir dirêj di nava Ereb û Kurd de tete biçûyîn û ew tengavîyekê dide bidurustkirin, ku tede berjewendîya welatîyî bilind bi carekê ve nayete biderkevtin.

Em tevde pir bi başî ve li ser kar û baran de di nava Iraqê de bi agehdar ve têtin biderkevtin, ku ew bes û bi tenha ve ji bona vê nobûna tengavîyî hanê de hatin bigihandin; jiber ku siyaseteke ne bi şehrezayî ve beramber bi milletê Kurd ve di wir de hate bikaranîn, ya ku ew ji bal hin hişên dorhêla Ebdul-Kerim Qasim de dihate bidanîn, jiber ku wan Ebdul-Kerim ji bona nava gewretirîn tengavîyê de datin biavêtin, ya ku divabû ji roja wergirtina wîna de ji serdarîkirinê de di piştî şûra 14 tîrmehê de bida biçarekirin.

Partîya Demokratî Kurd li Surî de di mêjûwa 19. 12. 1962 de bi bîrxistinek ji bona serdarîkirina Beşîr El-Ezme û Wênerên Partîyên siyasî di nava welêt de date bipêşkeşkirin, ku wê têde siyaseta bikarhatî bi beramberî Kurd ve di wêlet de date bixuyanîkirin, ku ew ne ji berjewendîya welatîyî bilind ve têde bigirtin û neji ew ligel canê biratîyê, dostanîyê û pêwendîyên mejûyî heyî de ji pir Nifşan de di navbera milletên Ereb û Kurd de nayête biguncandin; jiber ku ew siyaseta hanê bi serûştîya zordarîyê û cudabûna rehperestîyê ve têde biderkevtin, ya ku ew bes û bi tenha ve di nava van rojên meyî hanê de piştgirtinê û navtêdanê ji dam û destgehên Impiryalyê û Gurûhên vetisandî de di nava kevnepereştîyê de ji xwe re dide biwergirtin û ya ku ew ne ligel canê serdemê de û neji ligel bextê zindîyî merovanyê de û bingehê mafên Merov de têde biguncandin.

Mexabin, ku divê em bidin bigotin, ku ev herîşên hanêyî zordarî di nava heremên Kurd de ji raperîna 28 Ilolê tanî neha de nehatine bibirîn, herwehaji ji wê mêjûyê de ji bona dadgehên asayîşa dewletê û dam û destgehên beşên siyasî de, mîna ku di bîrwerîya çûyî de hatîye bigotin, bêtir ji sêsed bi navbidûxistina xebatkirinê ve ji bona milîbûna Kurd ve hatine biajotin. Li ser piranîya wan de bi dandkirinên salekê û tanî sal û nîvekî ve hatine bidadkirin. Herwehaji pir kes bi ber lêdan û girtinê ve hatine bikevtin û ew ji bona ber dadgehan de hatine biajotin. Ev jî di piştî nardina mêjûwa pêşkeşkirina bi bîrxistinê jî ve ew hemû bi navbidûxistinên hanê hatin bikirin; ji yê ku ew hemû bi navbidûxistinên bi tawanbarîyên çêkirîyî cundan ve dihatin biderkevtin. Jimara Girtîyan tanî neha bigir bêtir ji pêncsed Kesî ve têde biderkevtin û ew jî bes û bi tenha ve ji ber hoyên milî de hatine bigirtin.

Di wê pêla hanê de Partî di wê bîrxistina xweyî pêşkeşkirîyî bi navkirî ve ji bona serdarîyê de metirsîyên xwe datin biderxistin, ku ev pêrabûnên hanêyî zordarî der derbarê Kurd de di pişt re bi siyaseta dewletêyî mîrî ve dê bête biveguhesztin û bipêşvekevtin û ew ji xwe re serûştîyeke ji rêdekevtî ve beramberî vî milletê hanê de dê bide bigirtin, yê ku ew hemîşe bi dilsoz û piştrast ve ji bona vî welatê hanê de hatîye bimayîn û yê ku pê ve û lêvê nayête bikevtin, ku ev siyaseta ji rêderkevtîyî taybetî de di derbarê wî de bête bicîanîn, ya ku ew li ser zordarîyê û cudabûna rehperestîyê de têde biavakirin.

Nîşanên çûna siyaseteke wetov beramber bi Neşînvânên Kurd ve diyarên wê bi eşkere û diyar ve di peyvînên mîrî de têtin biderkevtin, ji yên ku ew ji bal Merovên Dewletê de di pêla vê hêrişaya heyî de têtin biderkevtin. Bi çî berî jî ve nêt ji bona durustkirina Wizareteke taybetî ji bona kar û barên Cezîrê ve, yanî bi dana Parezvanê Cezîrê ve bi desthilatîyên fireh ve ji bona bi rêvebirina kar û barên heremê jî ve û herwehaji ligel peyvînê de bi mayîna li ser zînetaja ji rêderkevtî ve di heremê de, ya ku ew di hemû hêlên welêt de hatîye bihilanîn, herwehaji peyvîna, ku Cotkarên Kurd di Cezîrê de divên ji Çakkirina Çandinîyê de jê nedin bikarkirin; jiber ku ew bi Biyanî ve û bi Kevtî ve têtin biderkevtin, bête biderkevtin, ev pêranûnên hanê tevde bi hev re bi cîanîna metirsîya nala vê siyaseta ji rêdetketîyê çepel ve derbarê Neşînvânên Kurd de didin bizengilkirin.

Serdarî di neha de ji bona bicîanîna siyaseteke zordarî derbarê Neşînvânên Kurd de li jêr perda hebûna kevtineke Bêgane de ji bona heremê de dide bikarkirin, ya ku ew di vê bêhnê hanê de amara serjimara Kevtînavan bi sed hezar Kes ve dide bitexmînkirin û ew sûcê vê kevtina hanê ji bona ser serdarîya Endul-Nasir ve dide biavêtin; jiber ku di peyvîna Berpirsiyaran de hatîye bihatin, ku ev kevtina hanê di nava van çar salên dawî de ango di pêla Yekîtiyê de hatîye bikirin. Tevî ku hemû di wê bîr û bawerîyê de têtin biderkevtin, ku Ebdul-Nasir didate bikarkirin, ku ew Cotkarên Cezîrê jê bide bibarkirin û li şûna wan de û ji dêlva wan de Misrîyan di heremê de bide bineşînînkirin. Heger ku ev bîr û bawerîya giştî bi rast ve bête biderkevtin, magelo ber bi hiş ve têtê biderkevtin, ku Ebdul-Nasir dê rê bi sed hezar Kevtiyên Bêgane ji Turkî ji bona nava Cezîrê bide bidan, yê ku wî bi xwe jî ve derkirina xelkên kokî jê didate bixwestin? Çîroka kevtinê û hêrişaya çêkirîyî taybetîyî îro li ser wê de ji kar û barên ji dûr ve bi nêtkirî ve ji pêleke dirêj ve têtin biderkevtin, ji yên ku neha ji wan re di vê siyaseta neha de têtin biamadekirin. Ji van jî pêrabûna bi amara taybetî ve têtê biderkevtin, ya ku ew di pêncê meha çirya pêşîyî çûyî de di Parêzgeha Heseke de bi tenha xwe ve pê hatîye birabûn, ya ku ew bi perçeyekî giştî ve ji vê pilana hanê ve têtê biderkevtin û ya ku ew bi amadebûnê ve ji bona vê hêrişaya heyî neha de têtê biderkevtin.

Tiştên ku balpêdanê di vê hêrsa çêkirîyî neha de ji bona ser Kurd de dide biderxistin, ku Balyozê Emerîkî jihatbûnênên xwe dide bixurtkirin û ew bi çend rojan ve bi berî despêkirina hêrîşê ve ji bona serdana herema Cezîrê û Serê Kanîyê de pê hate birabûn û herwehajî Balyozên Turkî û Iranê jî herdu Endamên Peymana Sento li Şamê de bi jêhatbûnên diyar ve ji roja destpêkirina hêrsa rojenamevanyî de bêtin birabûn. Herwehajî ev bi xwe jî ve ev hîrîşa hanê di demekê de tête bikirin, ya ku tede pîlanên Impiryalyê û Sehyonistîyê li ser tevaya welatên Erebi giştî ve û li ser Surî de bi taybetî ve têtin binokirin. Ev kar û barên hanê bi banga metirsîya „Israîla Duwem“ ve jê tête bibêhnkirin, ku ew bi karekî ve ji bona dakevtiunê ve ji bona Israîla Yekem ve bête biderkevtin, yanjî dibe ku ew bi destpêkekê ve ji bona bi cîanîna pîlaneke Impiryalyî çepel ve bête biderkevtin.

Ho milletê Surîyî merd bi hemû desteyên wîyî welatî ve ji Zanevan, Baziranan, Çandîvanan û Kargeran!

Miletê Kurd, yê ku ew di nava cerg û hinavên xwe de li ser destên Serdaran de hatîye bibirîndarîkirin, we di vê roja hanê de li ber berpirsiyareke gewreyî mêjûyî de dide bidanîn û ew tevaya bîr û bawerîya cîhanî li ser we de dide bibînvankirin, ku heger hûn li ser van rûdanên kîrî de beramber bi Kurd ve bêtin bibêdengîkirin. Birek ji Serdaran ber bi herifandinê ve xwe didin bijajotin, ji ya ku Nîşan dabûn biaçakirin û ew wê pêwendîya biratîya canî di navbera milletê Erebi û Kurd de didin bibirîn. Herwehajî şêtbûna Eseed Mahasin û nebaşbûna reftara Seid El-Seyid û bi navkirina wan ji bona milletê Kurd ve bi „Israîla Duwem“ ve û herwehajî bê pişkirina hinekan ji wan ji Neşînvaniya Dewletê û ji Erd ve dê ev tevde ji bona welatê meyî şêrin ji bil cudabûnê û serşorîyê pêvê tu tistekî din nede bianîn. Impiryalyê rêya xwe bi vî rengê peroşî ve ji bona me dide bibîrin û dê ew her û her di nava me de bide bicudakirin, heger ku ev pîrsa hanê bi çarekirineke şehrezayî û dilsozî ve dûr ji şêtbûnê û mebestan ve nêyete bidermankirin.

Debera ew kesên hanê bidin bizanîn, ji yên ku ew dixwazin erdên Kurd li ser Hevalbend û Dostên xwe de li jêr perda qanûna çakkirina çadnîyê de bidin biparvekirin, ku ew bi yarîyeke ne biserkevtî ve têtin biderkevtin; jiber ku Kurd dev ji xakê xwe ve ji tu kesî re nadin biberdan; çendjî ew bi buha ve li ser wan jî de bête

birûniştin. Jibervêjî ve weha divê di gava bicîanina qanûna çakkirina çandinîyê de erdên Derebegên Kurd li ser Perîsanên wan de bêtin bibelavkirin, ji yên ku ew bi sedan sal ve Bav li dû kal de bi nala Kargerên çandinyê ve erdan didin bihilanîn û bidanîn. Weha dê dilên Kurd bêtin bicîkirin, ku ew di nava Birayên xwe de û ew ne di nava Dujminên xwe de têtin bijîyandin.

Vegerinadin ji şaşbûnê bi qencîyê ve tête biderkevtin û çûn li ser wê de bi Merovên Berpirsîyar ve ji bona ayinda welat û miletê xwe ve nayête bikevtin. Bangirina bi kevtina bi hezaran û deh hezaran ve bes û bi tenha ve bi derew û sextekarîyê ve tête biderkevtin. Jibervêjî ve em ji bona Serdarên xwe didin bibangkirin, ku ew li ser siyaseteke şehrezayî de bermaber bi miletê kurd ve di Surî de bêtin biçûyîn û ew tevaya wan biryarên ji rêderkevtîyî wergirtî ve ji bal xwe de bidin bihilanîn û herwehaji ew dev ji wê bedyê ve bidin biberdan, ya ku ew ji bil berên tal ve nade bidan. Em ji bona çûna li ser siyaseteke baş û avakirî ve û rêpêdan ji bona Kurd bi karanîna mafeyên xweyî zanyarî û civakî ve, -divê li vêderê de bête bizanîn, ku Israil bi xwe jî ve tu çavtengîyê li gel van mafeyan de beramber bi Ereben Felestîn ve nade bikin-, û herwehaji ji bona wan rêpêdana pêşvekevtinê di nava welatê Surî de, herwehaji dûrkirina herdu Pehlewanên temaşegêhê ji Esed Mahasin û Seid Seyid ji Cezîrê de, herwehaji divê Girtiyên bê guneh jî bêtin biberdan, ji yên ku tu gunehên wan nayetin bidîtin, ji bil ku bes û bi تنها ve bi mîlibûna Kurd ve têtin biderkevtin, didin bibangkirin. Ev tevde dilên miletê Kurd didin bixweşkirin, yên ku ew di nava çerg û hinavên xwe de pir bi wê siyaseta Serdarna ve hatibûn bişermezarîkirin.

Silavên me ji bona wan Merovan têtin biderkevtin, ji yên ku ew li ser rêya rast de têtin biçûyîn.

### **Befirbar sala 1962 de Partîya Demokratî Kurd li Surî de“**

Gava ku Merov ji xwe re bi dûr û dirêjî ve û di nava wê dema hanê de li navroka vê xuyanîya hanê de dide bitemaşekirin, bi carekê ve siyaseta şovîniyî Erebi ji Merov re beramber bi miletê Kurd de di

Kurdistana Surî de tête biderkevtin. Ji alîyekî de partî bi rengekî nerm ve û li ser xwe de wê siyaseta hanêyî şovînî him beramberî bîr û bawerîya milletê Ereb û himjî beramberî bîr û bawerîya giştîyî Cîhanê de dide birutkirin û ew têde tevaya çepelîya wê siyaseta hanê dide biderxistin. Ji alîyê din ji me re têde ne bes tenê tevaya destana milletê Kurd li Surî de û herwehaji tevaya destana milletê Ereb têde dide biderxistin, gava ku ew wê siyaseta dûr ji berjewendiya xwe beramber bi milletê Kurd ve di Kurdistanê Surî de dide biderxistin. Ez naxwazim li ser hemû navroka vê daxuyanîya mêjûyî û rast de bi dûr û dirêjî ve bidim biaxivtin; jiber ku Xwendevanên hêja dikarin li gora bîr û bawerîyên xwe de û hewehajî li gora têgihîştina xwe de di serpêhatîyên mêjî de dikarin li ber remanên hatî de di wê daxuyanîya hanê de bêtin biliberkevtin. Ez dixwazim pir bi kurtî ve li ser Israîla Yekem û Duwem de bidim biaxivtin, da ku Zanîstvan û Dilsozên milletên Ereb ji xwe re li ber wê siyaseta Çepelên Şovîniyên Ereb de bi başî ve û zîyana wê bêtin biliberkevtin û bi taybetî jî ve beramber bi mîletê Kurd ve bêtin biliberkevtin.

Belê Milletê Ereb çi di rêya Şovîniya xwe de û çi jî di rêya siyaseta Ebdul-Nasir de beramber bi Israîla Yekem ve di her pênc cengên xwe de ji bona avêtina wan ji bona nava deriya sipî de û qirkirina wan de ji sala 1948 de u tanî sala 1973 de her û her bêtir Israîla Yekem li ser kêşê xakê Ereb de dihate bigewrekirin, tanî ku bi sê carî ve hate bikirin. Bes û bi tenha ve ji bona pirsê û nimûne ez li vir de didim binivîsandin, heger ku Ereb bi biryara parvekirina Felistînê ve der sala 1947 de bihata bipêrûniştin, dê ji wan re ne bi pir baştir ve bihata biderkevtin? Çûn li ser wê siyaseta şovîniyê hanê de pir ziyaneke mezin û gewre bi milletê Ereb ve bi giştî ve û bi milletê Felestînî ve bi taybetî ve date bixistin. Heger ku Ereban der sala 1965 de bi gotina Ebu Ruqeybe bidana bikirin, gava ku wî date bigotin: „Israîl bi xewin ve dihate biderkevtin, iro bi rastî ve tête biderkevtin û divê bi vê rastîya hanê ve bête birûniştin“. Pîraniya Serdarên Ereb û Milletê Ereb ew bi Bêbext û Xînez ve beramber bi milletê Ereb ve date binîşankirin.

Milletê Misrî di destpêka sedsalên nozdehan de li jêr Rêberîya Mohamed Alî Paşa û kurê wîyî Imrahîm Paşa de date bixwestin, bi kurtî ve û bi dijî berjewendîyên dewletên mezin ve ji Rus, Ingilîz û

Elman de tevaya Selteneta Oasmî ji xwe re bi alîkarîya dewleta Firensî de bide bivegirti; belam der sala 1839 de sipahê Misrî li jêr Rêberîya Ibrahîm Paşa hate bitar û markirin û ji nava siyaseta Navdewletan de hate bipengizandin û di encamê dawî de Misir ji bal Ingilistanê de hate bivekirin û tanî sala 1954 de dût yanjî nêzik hate bimayîn. Careke din Misirîyan der sala 1965 de datin bixwestin, ku ew vê carê bi navê milîbûna Erebe ve tevaya Rojhilata Navînî bi bin destên xwe ve bidin bixistin, mîna ku Mehdawî di sala 1959 de di Dadgeha Gel de di piştî şureşa Şewaf de didate bigotin: „Misrî ji xwe re didin bixwestin, ku ew xurma ji alîkî de û neftê ji aliyê din de ji bona nava bîrikên xwe de bidin bixistin“. Nasir wetov didate bibawerîkirin, ku ew dê Israîla Yekem ji bona derîya Sipî bide biavêtin û tevaya zalbûna xwe li ser herême û nefta wê de bide bizalkirin. Belam sipahî wî û hemû sipahên Erebyî din di şerê 5 axlêva sala 1967 de di nava şeş rojan de hatin bitar û bimarîkirin û Ebdul-Nasir ji gorepana Siyasî pir tanî mirina xwe hate bilawazkirin. Herwehajî di cenga Oktober jî de careke din hemû sipahên Erebe ji bal Israîla Yekem de hatin bitarûmarkirin. Pirsê ku li vê derê de têtê bîkirin, heger ku Miletê Erebe li ser wê siyaseta çepel de nikarîbûn û nikarin jî Israîla Yekem bidin biqirkirin, magelo dê ew çilo bikarîbin Israîla Duwem bidin biqirkirin?

Israîla Yekem nehate biqirkirin; bes û bi tenha ve jiber ku piştê wê jî bal dewletên mezînan de her û her dihate bigirtin. Miletê Israîl piştî Diyspora -Derkevtina- du hezar sal jî nava welatê xwe de û piştî qirkirina şeş milyonan jê jî sala 1939 tanî sala 1945 de jî bal Elmanya Nazî de careke din bi piştgirtina sozê Belfor de der sala 1917 de dets bi xebatê ve jî bona veqerandina xwe jî bona nava Felestînê û avakirina dewleta xwe de date bîkirin, ya ku wê ew der sala 1948 de date bidursustkirin û ew jî xurtirîn dewletên Rojhilata Navînî neha têtê biderkevtin. Heger ku ew dewleta Israîla Yekem jî bona xatirê çavên Miletê Erebe û şovênîyên wîna de piştê Israîla Duwem bes û bi tenha ve jî bona qazanc û berjewendîya xwe bide bigirtin, magelo dê çi zîyan bi Miletê Erebe ve di Surî û Iraqê de bête bikevtin? Vê bersîva hanê jî bona Zanîstvan û Dilsozên Miletê Erebe de didim bihiştin; jiber siyaseteke wetov pir bi zîyan ve beramber bi Miletê Kurd ve jî bal Şovînîya Miletê Erebe de di encamê dawî de bi zîyana Miletê Erebe ve têtê bidawîkirin. Ez hêvîdarim, ku Miletê Erebe dê pir guhên xwe jî



bona vê zîya hanê de beramber bi miletê Kurd ve bide bidan û dê ew şev û rojê bes û bi tenha ve ji bona berjewendîya xwe rê bi şovonîya xwe ve nede bidan, da ku ew wê siyaseta hanê beramber bi Kurd ve bide bikirin, ya ku ew di encamê dawî de bi bedbextîya miletê Erebb ve bi neçarî ve dê bête bidawîkirin; jiber ku dujminatîya di navbera miletê Israîla Duwem û miletê Erebb de dê pir bi zîyantir ve û bi tundtir ve ji dujminatîya di navbera miletê Israîla Yekem û miletê Erebb de di encamê dawî de bête biderkevtin. Ev dujminatîya hanê ne bi qazanca miletê Kurd ve û ne jî bi qazanca miletê Erebb ve tête biderkevtin. Em tevde bi hev re divê bidin bihêvîdarîkirin, ku miletên me ji vê bedbextîya hanê de bêtin bidûrkirin û dosatî û biratî di nava wan de li ser bingehê berjewendîya herdu miletan de dê bêtin biavakirin. Ev jî bes û bi tenha ve dûr yanî nêzik bi têgihîştina miletê Erebb ve di berjewendîya xwe de tête biderkevtin. Dem bi hemû tîrş û talîyên xwe ve dê vê rastîya hanê bi neçarî ve ji me re û herwehajî ji miletê Erebb re bide biderxistin<sup>13</sup>. Kurd divê her û her ji bona dostanîyê li ser bingehê livandina berjewendîya milîyî de ligel miletê Erebb de bide bikarinû wetov jî bes û bi tenha ve divê miletê Erebb li ber wê dostanîya hanê de bête bikevtin.

Partîya Demokratî Kurd di 5. 5. 1964 de bersivê li ser peyva Serokê Civata Welatî de ji bona Rêberîya Şureşê Amîn Al-Hafîz date bidan, gava ku wî di hatina ahenga 8 avdarê de gotinek date bixwendin û ew li ser pêkhatina encumenekê de hate biaxivtin, da ku

<sup>13</sup> Ji xwe re di vî warê hanê de li namilka Ismet Şerîf Wanlî de bi zimanê Erebbî ve di bin nav û nîşana: „Cihana Erebbî û Cenga Ruzgarîkirinê di Kurdîstana Iraqê de“ bidin bitemaşekirin, ya ku Ismaet Şerîf Wanlî ew li Siwêsrâ de di 28 meha çîrya pêşî de di sala 1963 de dayite binivîsandin. Ev namilka hanê bi rastî ve pir bi rengekî zanistîyî bilind ve hatiye binivîsandin, ku xwendekarîya wêna ne bes tenê ji bona Xwendevanên Kurd pir bi kar û sûd ve tête biderkevtin; lêbelê xwendekarîya wêna ji bal Xwendevanên Erebb jî de pir bi nerx û hêja ve tête biderkevtin, da ku bêtir li ber divabûna çarekirina pîrsa Kurd bi şeweyekî demokrasî û aşîfî ve ji bal serdariya Iraqê û Surî ve di nava Kurdîstana Iraqê û Surî de bêtin bilîberkevtin; jiber ku ew çarekirina hanê ji bona pîrsa Kurd pir di berjewendîya miletê Erebb de tête biderkevtin û her şeweyekî zordarî li ser bingehê şer û cengê de pir bi zîyana miletê Erebb ve di Iraqê û Surî de di encamê dawî de tête biderkevtin.

ew destureke demî ji bona welêt bide bidanîn û herwehajî ew di vê peyva xwe de li ser pirsê Kurd de hate biaxivtin. Ev bersiva hanê wetov hatiye binivîsandin.

Jiber ku ev bersiva hanê pir ronahîyê li ser siyaseta serdarîya Basî de beramber bi milletê Kurd ve dide biderxistin, ez wê jî li vê derê de ji bona Xwendevanan didim biwergerandin û bitomarkirin, da ku Xwendevanên giramî bêtir li ber wê siyaseta hanê de di nava wê demê de bêtin biliberkevtin:

„Ji bona Civata Welatîyî Rêbera Şûreşê

Di pevdariya xwe de Serwerîya Serokê Civata Welatîyî Rêberîya Şûreşê de Serleşker Emîn El-Hafîz bi hatina bîrwerîya heştê avdarê ve ji bona ser komekê ji pirsan date biaxivtin, ji yên ku ew bala Neşîvnanan di vê qonaxa mêjûyî de bi ser xwe ve didin bikişandin, ji yên ku welat di nava wan re têtê biderbaskirin. Ji nava danavên li ser wan de hatiye bipeyivandin, pirsê Kematîyan û bi taybetî jî ve pirsê mîliya Kurd têtê biderkevtin, ya ku ew di rastîya rastîyê de bi kêm ve ji pirsên dinî zindî nayête biderkevtin, ji yên ku balên piranîya pir ji cemawerên millet bi ser xwe ve didin birakişandin; jiber ku ew bi çarenûsa beşekî mezin ve ji Lawên milletê Surî de têtê bigirêdan. Hêjîbêtir ji ber ku ew pir bi nebaşî ve ji bal Impiryalîyê û kevneperestîyê de têtê bikaranîn, ya ku ew bi zîyana berjewendîyên welatîyî bilind ve û herwehajî bi ziyana berjewendîya milletên Ereb û Kurd ve têtê biderkevtin.

Em didin bibawerîkirin, ku Serdarên Berpirsiyar bi pêgîrî ve giringbûna vê pirsê hanê didin bitexmînkirin û ew dixwazin wê bidin biçarekirin, da ku aramî û yekbûna rêzên welatî bêtin bigirawkin û herwehajî da ku li rûwên pîlanên Impiryalîyê û Sehyonozmê de bête birawestandin, ji yên ku ew di nava wan rojên hanê de ji hemû layekî de li dorhêla welêt de têtin bihûnandin. Ji alîyekî din jî de li ber çavan de pir bi diyar ve têtê biderkevtin, ku bê kanî vê pirsê hanê çend derd li Iraqê de ji çendcarkirina tengavîyên abûrî, siyasî, diravî û herwehajî pêrejî tengavîya serdarîkirinê bi xwe jî ve dayite bidurustkirin. Herwehajî pêrejî bê kanî çend ji bona ser serê welêt de ji destanan û derdan dayite bianîn, ji yên ku dê şopên wan bi derbasbûna dirêjbûna salan ve bêtin bihiştin. Cenga gemarî, ya ku tede di dirêjbûna du sal û nîvan de bira bira didate bikuştin, bes û bi tenha ve ew bi encamê

siyaseteke serserî ve û dûr ji şarezabûna rastîyê ve tête biderkevtin, ya ku ew ji bal desthilatîyên zaldar de di Iraqê de beramber bi milletê Kurd ve çî di pêla Ebdul-Kerîm Qasim de û çî jî di pêla serdarîkirina partîya Basî dihate biderkevtin. Vê siyaseta hanê bes û bi tenha ve li dûxwe de ji bona milletê Iraqê de ji Ereb û Kurd de ceng, wêranîkirin, xwînrijandin û hêstirbaradnin date bihiştin. Rastîya jînê date biderxistin, ku wan nikaribûn xwe li ber serûştîya pirsra Kurd de bidin biliberxistin; jîbervêjî ve ew li ser rêyeke rast de ji bona çarekirina wê pirsê hanê de bi şeweyekî durust ve nehatin bicûyîn, ya ku ew ligel berjewendîyê dihate bilihevkin. Siyaseta wan xwe bi rengekî bingehtî ve ji dilbijandineke şovînî ve û ji dîtineke borcuwazîyî tesk ve ji bona çarekirina kar û baran de didate bikanîkirin.

Hegerjî ku em vê nimûneya hanê jî li vê derê de didin bianîn, ev nade biderxistin, ku em didin bibawerîkirin, ku dê kar û bar jî li nik me de di Surî jî de bi vî rengê hanê ve yanjî bi vî berê hanê ve bêtin biçûyîn; belam me ev nimûneya hanê date bianîn, da ku bête bidiyarkirin, ku serûştîya pirsê di nava herdu weletan de bi yek ve tête biderkevtin û çarekirina wêna jî bi mîna hev ve tête biderkevtin. Evaya jî ji alîyekî de û ji alîyê din jî de jiber ku Serdarên Surîyî neha rêya çarekirina cengê bi baştirîn rê ve ji bona çarekirina pirsra Kurd ve li Iraqê de didatin bidîtin û herwehaji hêjîbêtir jiber ku wan bi rengekî kirdar ve û bi rast û durust ve di nava vê cenga gemarî de dane bibeşdarîkirin û ew bi destên xwe ve bi wan encaman ve hatin bigihandin, ji yên ku Hevalên wan li Iraqê de pê hatin bigihandin.

Serwerîya Serokê Civata Welatî ji bona Rêberîya Şûreşê di peyva xwe de bi diyar ve li ser hebûna pirsra milîyî Kurd de li Surî de neda bibiryarkirin; lêbelê heger jî ew pê bide yanjî pê nede bibiryarkirin, tevlivêjî de hebûna pirsra milîya Kurd di nava welêt de bi kar û barên diyar ve tête biderkevtin û rastî wê dide bineçarîkirin û herwehaji dîtina çarekirinekê ji bona wêna bi şeweyekî rast û durust ve ji wan kar û baran de tête biderkevtin, ji yên ku Merov nikare çavên xwe li ber wan de bide bigirtin, yanjî Merov wan di ser guhên xwe re bide biavêtin. Gava ku em li ser vî alîyê hanê de didin bidubarekin; jiber ku milletê Kurd li Surî de di nava van çend salên dawî de tûşî siyaseteke azardanê û zordarîya milî bi rengekî kirdar ve tête biberamberkin û heger kar û bar wetov bi vî rengê hanê ve bêtin

biçûyîn, dê bê gotin dijûnên milî ji bona sînorekî bêtin bigihandin, ku di nava wan de hiç tu kara pirsra welatîyî bilind dê neyête biderkevtin.

Serwerîya Serleşker di peyva xwe de bi hebûna pêwendîyên mêjûyî di navbera miletê Ereb û kurd pê tete birûniştin, ku ew di pêlên xebata hevbeşî de di dijî Dujminên hevbeş de ji pêla Selah El-Dîn û tanî vê roja me jî de têtin bixurtkirin. Herwehaji Serwerîya wî dide bidubarekirin, ku divê li ser van pêwendîyên biratîyî baş û xurtkirina wan de bête biparastin. Belam ew pêrejî lê tete bivegerandin û giv û tirasn dide bifirandin û dide bigotin, ku desthilatîyên serdar nikarin bi pêkhatina gewdeyekî milîyî Kurdî ve di welatê Ereb de pê bêtin birûniştin.

Em bi biramberî vê gotina hanê ve didin bigotin, ku biratîya Erebî - Kurdî di vê roja me de bi xurt û kêr ve tete biderkevtin, ku dê pir bi dijwarî ve li her her Merovekî de bête biderkevtin, ku ew vê rastîya mêjûyî bide binayînîkirin yanjî wê bikaribe bide biveşartin. Belam pir bi peroş ve tete biderkevtin, ku ev durujmê hanê bes û bi tenha ve di hatinan de tete bivegerandin yanjî tete bibilindkirin, di yên ku di nava wan de miletê kurd tûşî bela û destanên bi azar ve tete bikirin, da ku ew gotinên hanê jêre bi nala dilxweşkirinê û jibîrakerina der û birînanan ve bêtin biderkevtin.

Belam der barê xala duwem de, ya ku ew bi pirsra pêkanîna gewdeyekî milîyî Kurd ve di nava welatê Ereb de tete biderkevtin, ev pirsra hanê li jêr nav û nîşanên pir cudan ve hatiye bihatin, mîna ku tede „pêkhatina welatekî milîyî Kurd“, yanjî „pêkhatina Israileke Duwem“, yanjî „Cihêbûn û Jêvekirina Perçeyekî ji Erdê Erebî de“ û hin ji nav û nîşanên din de hatine bihatin. Em bi beramberî van nav û nîşanên cudan ve wetov têtin biçûyîn, mîna ku Serwerîya Seleşker tete biçûyîn û em ligel bîr û bawerîya wîna de têtin birûniştin, heger ku bi rastî ve hin ji van pêrabûnên hanê ve bi renekî pêgirî ve bihata biderkevtin. Magelo Serwerîya Serleşker ne bi me re tete biderkevtin, ku ew nav û nîşanên hanê û ew danînen hanê bi carekê ve û bi xwe ve di rastîya rastî de bi perdeyekê ve ji bona siyaseteke pîsî qirkerina bi komel ve beramber bi Kurd ve di Iraqê de tete biderkevtin û ya ku ew li ser miletê Kurd de di Surî de bi siyaseteke pîstirin zordarî milî û cudabûna rehperestî ve di vê dema me de tete bicîanîn? Herwehaji magelojî Serwerîya Serleşker û Endamên Civata Welatî ligel wî de

didin bibawerîkirin, ku ev siyaseta bi beramberî Kurd ve bi karhatî ve di nava van salên dawî de çi li Surî de û çi jî li Iraqê de dê bikaribe pêwendîyên biratîyê di nava Ereb û Kurd de bidin bixurtkirin, yanjî dê ew wan pêwendîyan ji bingeh ve bide birakirin? Magelo ev berpîrsiyarîya hanê bi ser şanê kê ve tête bikirin?

Debera em pîrsê li Iraqê de ji bona rexekî de bidin bihiştin, da ku Xwedîyên wê ji xwe re wê ji serdarîya Iraqê û milletê Kurd bidin biçarekirin. Em ji xwe re li vê derê de pîrsê li Surî de didin biwergirtin û em li dû pêşkevîna wêna de têtin biçûyîn û tanî kîjan radeyekî ligel vê pêşkevîna hanê û pêwistîyên biratîya Ereb - Kurd de li gora berwelatîyî bilind de û herwehaji têde ligel berjewendîya milîbûna Erebî de bi xwe ve tête bilihevkin.

Di pêla serdarîkirina partîya Basî de li Surî de ji avdara sala 1963 de tanî avdara sala 1964 de ev rûdanên tên van rastîyan didin biderxistin:

Endazîya Kurd di karmendîya kar û barên perwerdekirinê, fêrkirinê û (Şungerên Mamostan) de di pêla serdarîkirina partîya basî de bi gelekî ve bi kêmtir ve ji zîmeta berî serdarîkirina wan ve tête biderkevtin. Wetovjî Merovekî pir sade dide bibawerîkirin, ku her Kesekî di van karmendîyan de tête binîşankirin, divê ku ew him bi Basî ve yanjî bi Mebahisî ve -bi Sîxor ve, Cuma- bête biderkevtin.

Jimareke pir ji Karmendên Kurd ji karmendîyên wan hate biderkin, ji yê ku ew nehatin biderkin, ew ji karkirinê de di nava heremên Kurd de hatin bibêpişkkirin û ew ji bona nava heremên dûr hatin binardin.

Xwendevanên Kurd ji bi destkevtinên xwendinê ve li derve de hatin bibêbeherkin û herwehaji wergirtina wan di nava fêrgehên Mamostan de nikare bête bikirin, tanî ku li jêr ezmûmeneke siyasî de neyêtin biderbaskirin, bi bêyî ku li notên wan de yanjî li karina wan de bête bitemaşekirin.

Jimarek ji Kurd ji karê serbazîyê hatin biderkin û jimarek ji wan jî di piştî wergirtina wan de di kolêca fêrkirina serbazîyî hîlanînê de di demekê de bi bê derxistina tu hoyekî ve ji wan re hatin biderkin. Hiç Lawên Kurd di Kolêcên Serbazîkirinê de nayêtin biwergirtin, bes û bi tenha ve jiber ku ew bi Kurd ve têtin biderkevtin.

dam û destgehên tomarîkirina bajarî bi carekê ve zayînên Kurd nadin bitomarkirin, ji yên ku navên wan bi navên Erebi ve nedihatîn biderkevtin.

Li ser Kurd de hate biqedexekirin, ku ew bi rabûn û rûniştên xweyî milî ve yanjî bi reweştên xweyî taybetî ve ji bona nimû ne pêrabûna bi Cejna Newrov ve bêtin birabûn, ya ku ew bi cejna wanî milî ve tete biderkevtin. Bi sedan ve ji law û Kecên Kurd ve ji bona girtiyên seradbên Polisê veşartî hatin biajotin, ew hatin biazaradan û bi dehan ji wan ve ji bona ber dadgehên parastina milî û zinadanan de hatin biajotin. Evjî her sal bi vî corê hanê jî ve di Cejna Newroz de dihate bivegerandin û her sal bi sal ve hêzên Polîs ji bona nava gundên Kurd dihatin birêkirin, da ku ew nehêlin, ku Kurd bi wê Cenja xweyî milîyî pîroz ve bidin bişahîkirin.

Desthilatîyan pêrabûnên ji rêderkevtî ve di herema Cezîrê de ji xwe re datin biwergirtin, da ku ew derkirina jimareke mezin ji Neşînvânên Kurd ji welêt bidin biamadekirin; piştî ku ew wan ji Neşînvaniya Surî de bidin birûtkirin û danîna her Yekî tomarkirî di nava tomarên bajarî de ji sala 1924 de bi ne Surî ve bidin bidanîn û wan bi „Kevtî“ ve yanjî bi „Penahinde“ ve bidin bidanîn.

Bi alîkarî û bi navtêda serdarîyê ve hinek ji Şêxên Şemeran nala Deham El-Hadî ji bona talankirina erdên Cotkarên Kurd di sê gundan de di Cezîrê de gundê Şebek, Abire û Kevirê Dena datin bidestpêkirin û herwehaji ji bona kuştina çar Cotkaran û birîndarîkirina çarên din ji wan jî dane bikirin, bêyî ku hîç qanûn wan bide bixwestin yanjî ku ji wan beramberî dadgehê ve bi tawanbarîyên xwe ve bêtin bipirskirin.

Bi sedan ve ji Kurdan ve tûşî girtinê, zindankirinê û li dû gerandînen siyasî de hatin bikirin; ev jî bes û bi tenha ve jiber hesta wanî milî, yanjî jiber rawestandina wan di rûwê zordariyê de hate bikirin, ji yên ku ew ji bal wan de dihatin birûtkirin. Dadgehên Parastina Milî li ser piraniya wan de dadkirinên zordarî di navbera şeş mehan û sê salan de datin biderkerin. Hêjî tanî nehajî pir ji wan jî li ber wan dadgehên hanê de têtin bidadkirin û bi dehan jî ve ji nava malên xwe ve bi derkevtî ve têtin bidîtin û ew ji bal qanûnê de jiber wan hoyên jorî de têtin bixwestin.

Di pir hatinan de mîna destpêkirina Şûreşa Kurd di Iraqê de, herwehî di hatina ahengên Cejna Newroz de ji bal Kurdan de û hatinên din de serdarîyê pêrabûnên ji rêderkevtî û zordarî ve bi dijî Kurd ve date biwergirtin û herwehî wê pêrejî wê çûn û hatin di nava hin ji gundên kurd date biqedexekin. Xelkên van gundan bi rojan ve li jêr tirsê û zordarîyê de dihatin bijîyandin. Di nava van pêrabûn û hêrîşên hanê de tevaya xelkên gundekî yanî pir gundan di yek carê de dihatin bigirtin, ji yên ku ew tevde bi hev re tûşî azardaneke hovberî di serdabên Mebahisan -Polisên Veşartî- û zindanên wan de dihatin bikin.

Peyên Mebahisan -Polisên Veşartî- bi taybetî ve di nava heremên Kurd de tirs û dirbûn beramber bi Neşînvana Kurd ve ji Cotkaran, Zanevan û Xwendevan ve didatin bibelavkirin. Girtina kêfdarî di nava wan de dihate bibelavbûn û herwehî lêdanê, piskirinê û tufkirinê di nava serşeqamnên heremên Kurd de xwe didatin bibelavkirin û ev jî bi taybetî ve di herema Efrîn, çiyayê Kurd û Serê Kanîyê de di vê dawîyê de xwe didate bibelavkirin.

Bes û bi tenha ve dîtina nivîstekê bi zimanê Kurdî ve li nik her Merovekî de, hegerjî çî jî ba rengê wê nivîstê jî bihata biderkevtin, hegerjî Elfêba jî bihata biderkevtin, ew bi tawankariyekê ve beramber bi wî Merovê hanê û çarenûsa wî ve dihate biderkevtin û ew ji bona ber Dadgehên Parastina Milî ve dihatin biajotin; piştî ku ew di nava azardaneke hovberî de di jêr zindanên Mebahisan -Polisên Veşartî- de dihatin biderbaskirin. Wetov bi vî rengê hanê ve siyaseta kuştina çanda kurd der barê milletê Kurd de bi xurtî û hovîti ve dihate bicîhatin.

Heremên Kurdî û nemaze herema Cezîrê tanî neha ji hemû aliyên avedanîyê û çakkirinê ve û herweha ji aliyê pêşkeşkirina kar de ji bona millet di warên civakî û tendurûstîyê de di ser guhan re hatine biavêtin û tu pêt bi wan ve nehatine bikin, vê jî date bikin, ku nexweşî di nava wan de û nemaze nixweşîya janazirav bi rengê mertirsî ve hate bibelavkirin. Bi sedan ji Zarokan ve di her sal de bi nebûna guhpêdana tendurûstî ve ji bona wan ve bi mirîna wan Neşînvana ve tete biderkevtin.

Ev hindikên ji gelekan ve ji rengên zordariyê û sitembariyê têtin biderkevtin, ji yên ku ji bona wan miletê Kurd li Surî de tete biberamberkirin. Di piştî vê re ligel me de ne Serweriya Serleşker û neji Endamên Civata Welatî ji bona Rêberiya Şureşê de didin bilihevkin, ku siyaseteke wetov tete biderkevtin, bes û bi tenha ve Merov dikare wê bi siyaseteke cudabûna rehperestiyê ve bide bipesinandin. Magelo ev siyaseta hanê di nava serê Serweriya Serleşker û Civatê de ligel bîr û bawerîya biratîya Ereb - Kurd de, ligel pêwendiyên mêjûyî baş de di navbera herdu miletên Ereb û Kurd de tete bilihevkin? Magelo Merov dikare vê siyaseta hanê beramber bi miletekî ve bi bê afirandina mehnan û hoyan ve pê bête birabûn? Gava ku merov bide bigotin, ku ew dixwaze ji xwe re di „welatekî milî di nava erdê Ereb de bide bidurustkirin“ yanî ku ew ji xwe re dixwaze „dewleteke Israilîyî duwem bide bidurustkirin“ û herwehaji gelek ji van derewên hanê têtin bigotin.

Heger ku ev siyaseta hanê, ya ku ew ji bal serdariyê de beramber bi miletê Kurd ve di Surî de di vê dema neha de tete biderkevtin, bi nala çarekirinekê ve û bi rêyeke helbijartî ve ji bona pirsê Kurd ve tete biderkevtin, di bîr û bawerîya me de tete biderkevtin, ku serdarî beramber miletê Kurd de di Surî de pir di texmînên xwe de têtin biderkevtin, jiber ku ev siyaseta hanê nikare bide biçarekirin, hêjbêtir ew dê pirsê Kurd bide bidijwarîkirin û di vê siyaseta hanê de bi tu renekî ve ne berjewendîya bilindî welatî û neji berjewendîya milîbûna Ereb tete biderkevtin; mîna ku rûdanên li Iraqê de ev rastîya hanê dane biderxistin û pêrejî dane bixuyanîkirin, ku hîç bi tu renekî ve nikare di vê serdema me de miletek bête biqîrkin, hegerî ku pêrejî dest ji bona qîrîkirina bi komel jî ve bête biavêtin.

Di bîr û bawerîya me de tete biderkevtin, da ku çarekirin bi rast ve û bi dadwer ve bête biderkevtin, divê ew çarekirina hanê bi demokrasî ve bête biderkevtin û divê ew pir dûr ji dilbijandina şovîni ve û ji bîr û bawerîya zordariyê ve bête biderkevtin. Herwehaji divê ew ligel canê biratîya Ereb - Kurd de ji rexekî de bête bilihevkin û ji rexekî din de divê ew ligel peymanê Yekkirtina Netewan û bendên Mafeyên Merov de bête biderkevtin. Bi bingeî ve divê ew çarekirina hanê ligel bingê siyaseta bi carekê ve bi mîna hev ve di nava Ereb û Kurd de di mafeyan û erkan de û di refarîkirinê de bi bê hîç



cudabûnekê û jihevparevekirinekê ve bête biderkevtin. Herwehaji ew çarekirina hanê divê xwe ji her regekî ji regên „daqurtandinê“ yanji „bijavtinê“ bide bidûrkirin. Ji alîyekî din de divê ew çarekirina hanê bi regekî bingehe ve dergehên karînen bi karkirî ve li ber vî miletê hanê de bide bivekirin, da ku ew bikaribe bi çanda xweyî milî ve çî ji ziman, wêje û huner de pê bête birabûn û wê bikaribe bide bipêşvexistin û ne ku ew di nava xwe de bîr û bawerîya „kuştina çanda wî“ bide bihilgirtin; jiber ku di kuştina çanda miletekî de dikare kuştina miletekî bi xwe ve bête biderkevtin.

Miletê Kurd pir pê pê dide bikirin, ku ev bîr û bawerîyên hanê di destûra demê de bêtin bicîkirin, ya ku jê re Civata Welatîyî ji bona Rêberîya Şûreşê ji bona amadekirina wêna dayite bikarkirin û ya ku ew xwe li ber derkevtinê de dide bidîtin, mîna ku hin ji Berpirsiyaran de didin bigotin; jibervêjî ve divê ew wan bîr û bawerîyên siyasiyî karkirî bide bimirêkkirin, yên ku divên ew di karkirinê de beramber bi Kurd ve bêtin biderkevtin.

Di warê abûrî û civakî de Neşîvanên Kurd li Surî de pê didin bipêtkirin, ku desthilatî guhpêdaneke bi taybetî ve ji bona heremên Kurd bidin bidan; jiber ku ew heremên hanê tanî neha di pişt guhan re hatibûn bixistin û herwehaji jiber ku ew bi navîniyên abûrîyî jîndarî ve di nava welêt de têtin biderkevtin.

Çarekirina pirsê bi çarekirineke demokrasî û rast ve dikare cihê dewletê di warên siyasî û abûrî de bide bixurtkirin û ew dikare kuneke mezin bide bidadan, ya ku tere pîlanên Impiryalî dikarin xwe bidin biderbaskirin, herwehaji ew dikare bi kêrdarekî xurt ve ji bona aramiyê di nava hundur de bête bikirin û weha ew dikare bi alîkarîya biyekkirina rêza welatî ve bête biderkevtin, da ku ew bi beramberî metirsîyên Impiryalîyê û Sehyonîyê ve bête birawestandin. Bi vî rengê hanê ve dê dewlet ji alîkî din de dildariya miletê Kurd li Turkî, Iran û Iraqê de ji xwe re bide biwergirtin û herwehaji dê ew ji xwe re dildariya bîr û bawerîya cîhana demokrasî jî bide biwergirtin.

Bi vê hatina hanê ve divê em nedin bijibîrakirin; lêbelê divê em bidin bibîrxistin, ku miletê Kurd di Surî de bi guhpêdana xwe ve bi van pirsên xweyî milî ve dide bixwestin, ku ev pirsên hanê dê ji alîyê desthilatîyan de guh bi wan ve bête bidan, herwehaji guhpêdana wîna ji bona van pirsan û derdên hanê de guhpêdana wîna ji bona pirsan

demokrastîyê bi giştî ve nikare bide bidûrkirin. Jiber ku milletê Kurd dide bibawerîkirin, ku hemû pirs û derdên welêt dikarin çarebûna xwe bes û bi tenha ve di bin sîbera serdarîkineke demokrasîyî rast de bidin bidîtin, gava ku milletê Surî bi giştî ve bi xwedanê azadîyên xweyî demokrasî, sîyasî û civakî ve bête biderkevtin.

Derbarê parastîna serxwebûna welêt û serwerîya wî de dê mîna hercar bi baştirîn Berxwedan ve ji bona vê serxwebûnê û vê serwerîya hanê de bête bimayîn û herwehajiî dê milletê Ereb di wî de ji xwe re her û her bi baştirîn Alîkar ve di tarîntirîn û hesttirîn zênetan de bide bidîtin. Herwehajiî dê li ser tehta biratîya Ereb - Kurd de her û her pîlanên Impiryaliyê, Sehyonîyê û Kevneperestîyê bêtin bitarûmarkirin.

Li bajarê Şamê de di dawîya payîza sala 1956 de ligel Sadel-lah ji bajarê Dirbêsîyê de em ji bona mala Osman Sebrî hatin biçûyîn. Li ber dergehê derî de Osman Sebrî pêşewazîya me pir bi germî ve date bikin. Sadel-lah ew ji berê de didate binaskirin, Belam min navê wî pir dabû bibihîstin û li ser Elfebaya wîna de di salên 1953 de ez fêrî xwendîna Kurdî hatibûm bikin. Di piştî fêrbûna xwendina Kurdî de min rojname û kovarên wê demê li ser destên Mele Mohamed û birayê wî Mele Evdul-Qedusê Cemilê Seyda de ji xwe re didatin bixwendin û di nava gotarên wan de pir caran navê Osman Sebrî jî dihat biderbasbûn. Ji wê roja dîtina me de pir pêwendîyeke xurt û dostaniyeke xurttir di nava me de hate bipêkhatin. Herwehajî min di wê demê de Dr. Nur El-dîn Zaza, Dr. Ismet Şerîf Wanlî, Şakir Fetah, Mam Hejar, Rewşen Bedirxan, Qedrî Can, Qedirî Cemîl Paşa, Dr. Ezedin Resol û pir pir merovên din di warê xebata kurd de ji xwe re dane binaskirin. Cîrok û çivanokên me li bajarê Şamê de ligel Dost û Hevalan de zor zorin. Ez ligel Şefîq Cuma, Endanan Ebdul Mecîd, Dawid Hersan, Feysel Hadî Aga, Biçûko (mê weha jê re didate bigotin) -Mohemd Alî- ji Cezîrê ji sala 1956 de bi hev re ji bona bajarê Şamê ji bona xwendinê hatin bihatin û di pişt re jî Mohamed Mele Mehmûdê Kero bi me ve hate bigihandin û em tanî dawîya xwendina xweyî dibustanê ligel hevdû de hatin bimayîn û em tevde bi hev re jî bi Endamê Partî ve ji roja pêkhatîna wêna de dihatin biderkevtin. Şefîq, Edan û Mohamed li Meciristanê de ji xwe re datin bixwendin. Şefîq Zanînistîya abûrî date bixwendin û Edan û Mohamed ji xwe re zanîstîya Bijîşkî datin bixwendin. Dawid Hersan ji xwe re li polanya de Zanînistîya Bijîşkî date bixwendin. Feysel û Mohemed Alî - Biçûko- ji xwe re li surî de datin bixwendin. Feysel Zanîstîya Dadyarî

ji xwe re date bixwendin û Biçûko -Mohemd Alî- ji xwe re Zanistîya Mêjûyî date bixwendin.

Xwezî min rojekê ji rojan jî li ser wan rojên Şamê jî de bida binivîsandin, da ku bi zimanekî wêjeyî xweş ve ew bihatana binivîsandin û ew rojgarîyên hanê ji bona nava wêjeya zimanê kurdî bi hemû sadebûna xwe ve bihata bikevtin. Bê gotine, dê di nava dêr û rêzên wan rojgarîyên hanê de pir bi hestiyarî û dildarî ve li ser rojên zêrînîyî çûyîni de di nava buhara jîna min de bihata binivîsandin. Herwehaji hêjbêtir di nava wan rojgarîyên hanê de dê pir xewin û nigaşên min jî bihatana biderkevtin, yên ku ew tanî vê roja hanê jî hêj tevaya jîna min didin bitengalkirin.

Debera, em neha van remanên xweş ji bona rojên hatî de bidin bihiştin û em careke din ji bona ser hatina Şamê de di havîna sala 1969 de bêtin bivegerandin, berî ku ez xwe careke din bidim bijibîrakirin û li ser bîrwerîyên Şama şêrin de bidin binivîsandin.

Min pêwendî ligel Dost û Hevalan xwe de date bikirin. Herwehaji min pêwendî ligel Qedrî Cemîl Paşa jî de date bikirin. Me hevdû li Mercê de date bidîtin û em ji wir bi çend gavan ve ji bona çayxana Abu Kemalî Zivistanî ve hatin biçûyîn. Dunya pir germ bû, çilê havînê bû. Me ji xwe re çayê û qehwe date bixwestin. Qedrî Cemîl Paşa pir kêfa xwe bi ditîna min ve date bianîn, jiber ku me hevdû bêtir ji neh salan ve nedabû bidîtin.

Qedrî Cemîl Paşa yekek ji gewretirîn, zanatirîn û bi nav û bangtirîn Welatperwerên Kurd ve di Kurdistanê de dihate biderkevtin<sup>21</sup>. Wî bîrwerîyên xwe di nivîsta Zinarê Silopî de bi zimanê Turkî ve dayite binîvasandin û ew nivîsta hanê ji bona zimanê Kurd jî hatîye biwergerandin<sup>22</sup>. Ew bîrwerîyên wî pir bi nerx ve têtin biderkevtin; jiber ku ew di hemû rûdanên dema xwe de bi jêhatîbûn ve

<sup>21</sup> Ji xwe re li ser Qedrî Cemîl Paşa de li nivîsta „Xoybûn“ de ji bal Mihemedê Mele Ehmed de, ji wergerandin wêyî kurmançî de ji bal Keça Kurd de, di r. 130 - 137 de, çapa yekemî Şamê de di 15. 1. 1993 de bidin bişemasekirin.

<sup>22</sup> Nivîsta Qedrî Cemîl Paşa bi zimanê Tukurî ve li jêr vê navnîşanahê de :Zinar Silopî “Doza Kürdüstan, Kürt milletinin 60 senbenderî esarettin kurtuluş savaşı hatirati, Beyrouth 1969 hatîye biderkevtin.

bi beşdar ve dihate biderkevtinû wî bi tavaya dil û canê xwe ve pişta şureşa Kurdistanê Iraqê didate bigirtin û Barzanî bi dil û cergên wî ve dihate biderkevtin.

• Qedrî Cemîl Paşa ji min re li ser rewşa Kurd de li Ewropa de date bipirskirin: Rewşa we çawan tête biderkevtin; çi Ewropî li ser Kurd de didin bigotin û çilo hûn kardikin?

Min jê re li ser wan pirsên wî de pir bi dûr û dirêjî ve date biaxivtin û weke ku neha bi bîra min ve tête bikevtin, min wetov jêre date biaxivtin:

Li Ewropa Rojava de jimara kurdan tanî salên çilî jî ji vî sedsalê me pir bi kêm ve dihatin biderkevtin. Li vir u dera hanê de çend Xwendevan yanjî çend kes dihatin biderkevtin. Lêbelê di salên pêncî de Xwendevanên Kurd bi çûna xwendîne ve li Ewropa de dane bidestpêkirin û der sala 1956 de Komela Xwendevanên Kurd ji çend Kesan hate bipêkhatin. Ji wê rojê û pêve careke din ji nû ve dengê Kurd û Kurdistanê li seranserê Ewropa de piştî xebata Bedirxaniyan di berî cenga cihanîyî yekem de û xebta Şerif Paşa û Hevalên wî di Kongirê Sêver de der sala 1920 de bi şeweyekî rêxistî ve hate bibilindkirin. Tev li vê rûnada pêkhatîna Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de pêkhatineke din li Ewropa de hate bipêkhatin, ku kêra wêna ne bi kêmtir ve ji kêra Komela Xwendevanên Kurd de dihate biderkevtin. Ew jî bi Rêxistina Partîya Demokratî Kurdisatan ve tête biderkevtin, ya ku ew li Ewropa de di reşmeha sala 1960 li bajarokê Planeg de li nêzîkî Monîx de li Elmana Federalî de hate bipêkhatin. Tevaya Kurdan û bi Xwendevanên xwe jî ve bigir di vê demê de li Elmanya Federalî de bi şêst tanî heftê kesî ve dihatin bigihandin; jiber ku Bêganên di Elmanya Federalî de di vê demê de hemû bi sed hezar kes ve nedihatin biderkevtin<sup>23</sup>.

<sup>23</sup> Di dema cenga cihanîyî duwem de 7, 5 milyon û niv ji Dîlên cengê û Karkerên bi zorani ve li Elmanya de di karxanên Elmanî de bi darê zorê ve didane bikarkirin. Di vê roja meyî neha de careke din di sala 1999 de bigir bêtir ji 7, 5 Bêgane li Elmanya de têtin bijîyandin û piraniya herî pir ji wan didin bikarkirin. Ji van jî li gora amara Elmanî de nêzîka ji 600 000 Kurd li Elmanya de têtin bijîyandin. Ji van jî bêtir 90% Kes ji Kurdistanê Turkî de têtin biderkevtin, ji yê ku ew ji bona Elmanya Federalî di piştî sala 1963 de piştî lêkirina dîwarê Berlin ji bona karirê hatibûn bihatin û ew bi destên gulên ve ji bal Elmanan de dihatin bipêşewazîkirin û ew di piraniya xwe

Hemû Kurdên li Ewropa de ji seranserî Kurdistanî jî de ew di vê rêxistina hanê de bi Endam ve dihatin biwergirtin. Hemû Endamên Hizibî Demokratî Kurdistanî Iranê û hemû Endamên Partiya Demokratî Kurd li Kurdistanî Surî jî de ji ber xwe ve bi Endam ve di vê rêxistina hanê de dihatin biwergirtin. Wetov di nava vê rêxistina hanê de hemû Kurd ji herçar perçên Kurdistanê de dihatin biderkevtin. Vê rexistina hanê pir bi başî ve rêxistina rêberîya Komela xwendevanê Kurd li Ewropa de didate bikirin û tevaya kar û barên Komelê bi ser milên xwe ve li seranserî Ewropa de didate bihildan; jiber ku kar û bar li Ewropa de dûr yanî nêzîk bi navê komelên cemawerî dikarîbûn bêtin bikirin. Ji salên şêstî de û piştî vêkevtina şureşê li Kurdistanî Iraqê de der sala 1961 de tevaya Kurdan bi carekê ve bi dil û can ve ji bona gihandina dengê vê şureşa pîroz bi millet û dewletên Ewropî ve bi hev re didatin bixebatkin. Iro bigir li seranserî Ewropa de liqên

de bi Kurmancî didin biaxivtin û yê nî mayî bi Dumilî didin biaxivtin. Herwehaji nêzîka 70 000 ji wan Kurdên li Elmanya de ji Kurdistanî Iraqê de hatine bihatin û piranîya herî pir ji wan bi Penahinde ve têtin biderkevtin, ji yê nî ku piranîya wan Eleman her roj dixwazin wan ji bona nava welatên wan bidin bivegerandin. Herwehaji ji wan Kurdên li Elmanya de 40 000 Kurdên Yezidî têtin biderkevtin, ji yê nî ku ew jî hemû bi Kurmancî ve didin biaxivtin. Bes û bi tenha ve ji bona nimûne li bajarê Berlinê de di paytextê Elmanya de bêtir ji 48 000 Kurd têtin bijiyandin. Neha li seranserî Ewropa de bigir yek melyon Kurd têtin biderkevtin û ji wan careke din 90% ji Kurdên Kurdistanî Turkî de têtin biderkevtin û piranîya wan jî ji xwe re di nava welatên Ewropî de didin bikarkirin û yê nî mayî di nava Kurdên Kurdistanî Iraqê, Iranê, Surî têtin bibelavkirin û herwehaji di nava wan Kurdên Ewropa jî de hin ji Kurdên Libnanê jî têtin bidîtin. Bigir bêtir 95% ji hemû Kurdên li derveyî Kurdistanê de bi Zaravayê Kurmancî ve didin biaxivtin. Ev parvekirina zimanî di nav Kurdan de li Ewropa de roleke pir mezin ji bona pêşvexistina Zaravayê Kurmancî dide bilistin; jiber ku li Kurdistanê de zaravayê Kurmancî bi xurtî ve ber li ber de li Kurdistanî Turkî, Iranê û Surî de têtin bigirtin û hêjibêtir bi xurtî jî ve şerê wî têtin bikirin, da ku Turkkirin, Iranîkirin û erebkirina Kurdan di rêya qedexekirina zimanê wan de bidin biserxistin; jibervêjî ve zaravayê Kurmancî li Ewropa de pir gavên mezin jî ji bona geşbûna xwe de dide biavêtin û ew bi zaravaya bigir bi tenha xwe ve têtin biderkevtin, yê ku ew di zanistgehên Ewropî û derveyî Ewropa de têtin bixwenekarîkin. Di seranserîya Kurdistanê de 75% ji milletê Kurd bi zaravayê kurmancî ve dide biaxivtin û bes û bi tenha ve 25% ji Kurdan bi zaravayê soranî ve didin biaxivtin.

Komela me û herwehaji partîya me têtin bidîtin. Pêwendî pir bi xurtî ve bigir li hemû zanistgehên Ewropî de ji nasîna pîrsa Kurd û piştgirtina wîna tete bikin. Pir belavok, Rojname, Kovar bi zimanên Ewropî cudan ve li ser Kurd û pîrsa wî de di seranserî Kurdistanê de têtin biderkevin. Pir semînar û civîn li bajarên Ewropî de li ser Kurd û Kurdistanê de têtin bilidarxistin. Pir bi bîrxistin ve ji bona Serok û Padîşahên dewlatên li Ewropa de li ser pîrsa Kurd de di seranserî Kurdistanê de têtin birêkin. Herwehaji ew bibîrxistinên hanê jî ji bona Yekgirtina Netewan û rêxistinên wê de têtin binardin. Hêjbêtir pêwendiyên pir xurt ligel Xwendevanên Cihanê de têtin bikin, jiber ku Komela me ji sala 1964 de bi endamê Yekîtiya Xwendevanên Cihanê ve tete biderkevin. Pêwendiyên meyî xurt ligel Yekîtiya Xortên Demokratîyî Cihanê de têtin biderkevin û herwehaji ligel hemû Komelên cewawerî li seranserî Ewropa de pêwendiyên me bi xurtî ve têtin biderkevin. Em bigir bi navê Komela xwe ve di hemû civînan Xwendevanan de ji welatî de yanî navnetewî de têtin bibeşdarîkin. Herwehaji em li hemû Mehrecanên Yekîtiya Xwendevanên Cihanî û Mehrecanên Yekîtiya Xortên Demokratîyî Cihanî de têtin bibeşdarîkin. Herwehaji sal bi sal ve em li seranserî Ewropa de bi Cenja Newroza xweyî perest ve têtin birabûn. Di nava van jêhatîyan de bi carekê ve her û her li ser pîrsa Kurd de di seranserî Kurdistanê de tete bixivtin û Miletên Ewropa li ser rewş û zinetên Kurdistanê de têtin biagehdarîkin û piştgirtina milletê Kurd di Kurdistanê de ji wan ji bona xebata wîyî milîyî rewa di rizgarîkirina wîna de ji bin sitemkarî û zordariya dewletên Dagirkerên Kurdistanê ji Rom, Ereb û Ecem de didin bixwestin. Sal bi sal ve Kongirê Giştîyî Komela me li Ewropa de tete bigirtin, ku ew bi xwe jî ve bi xwe ve bi pêşedeneke mezin ve ji bona piştgirtina milletê me tete biderkevin; jiber ku hemû biryar û belgeyên siyasîyî wan Kongiran li ser rewş û zinetên hemû perçên Kurdistanê de bigir bi zimanê hemû milletên Ewropî ve têtin biwergerandin û bibelavkin. Wetov ji bona nasîna milletê me û piştgirtina wîna ji bal bîr û baweriya Ewropî de pir dilê Kurdan pê tete bixweşkin û hêjbêtir roj bi roj ve hêvîya wan di rizgarîkirina Kurdistanê de tete bigeşkirin û bixurtkin. Navê Kurd û Barzanî li asûwê esamnê Ewropa de bi hev re têtin biderkevin û biberzkin. Miletên Ewropa Kurd bi Braznî ve û Barzanî bi Kurd ve didin

binaskirin û ew herdu bi cêwî ve têtin biderkevtin û ew ji hev nayêtin bicihêkirin. Şureşa Kurd li Kurdistanê Iraqê de di bin rêberîya Barzanî de pir cihêkî wêyî bi hêja ve li nik bîr û bawerîya miletên Ewropî de tête biderkevtin; jiber ku Barzanî pir li ser xwe de bi şeweyekî pir rewa ve û demokrasî ve ji bona daxwaza mafêyên miletê xweyî dadwer de dide bixebatkirin, Tevaya miletên Ewropî pir daxwaza Barzanî ji bona Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê bi dilê xwe ve didin bidîtin. Ev nermbûna hanê û şeweyê xebata rewayî miletê Kurd di Kurdistanê Iraqê de pir dilên miletên Ewropa bi ser xwe ve dide birakişandin û ew bi çavê Rêberêkî mezin ve li Barzanî û rêberîya wî de didin bitemaşekirin û rêzê û hejabûnê jêre didin bigirtin; çend ew nefrtê ji reftarî Felestîyan de di karên wanî Teroristî de didin bigirtin, weha deha ew reftara Barzanî ji bona xebata rizgarîkirina milî di Kurdistanê de di dadwerîya wê de bi nimûne ve didin bidîtin.

Siyaseta Kurd li Ewropa de pir li ser xwe de, bi nermî ve û hêjîbetr bi carekê ve li ser bingehê demokrasîyî û mafeyê Merov de tête bikirin. Me rojekê ji rojan ne bi dijî miletên Turk, Ereb û Faris ve dayite bikarkirin; lebelê em her û her ji bona Dostanîya wan de li ser bingehê çarekirina pîrsa Kurd de di mafeyê çarenûsa wî de didin bixebatkirin. Her û her me durujmê dostanîyê ligel wan miletan de dayite bibilindkirin û em dibêjin, ku azadîya me Kurdan bi azadîya wan milatan ve tête bigirêdan û herwehaji azadîya wan miletan ji bi azadîya Kurdan ve tête bigiredan. Jibervêjî ve pir kêfa miletên Ewrop him ji bona Barzanî û him ji bona Kurdan di xebata wanî rewayî milî de ji bona rizgarîkirina Kurdistanê tête bidîtin.

Gava ku min ev gotinên xweyî hanê datin bidawîkirin, Mamê minî pîrê serboz pir bi germî ve dest bi bigirî ve date pêkirin. Min dêhna xwe pê date bidan û bi lez û bezek pir bilind ve min tevaya bîr û bawerîyên xweyî gotî bi carekê ve ji nû ve di nava serê xwe de datin bivegerandin, magelo min di nava wan de tu tiştêkî weha bi dilşikestî ve ji vî mamê xweyî Pir re dayite bigotin? Piştî lêvenerandineke bi lez û bez ve ji bona wan bîr û bawerîyên gotî de min tu tiştêkî bed tede ji bona mamê xweyî Pîr nedate bidîtin. Hêjî wî girîyê xwe didate bikirin. Dorhêla me li me de didate bitemaşekirin û wan ev girîyê vî Pîrê hanê ji xwe re didatin bidîtin. Min ji xwe re didate bigotin, magelo dê ev

Çavdêrên me çi li ser vî girêyê Pirê hanê de bidin bigotin? Gelo dê ew nebêjîn, bi ka min çi xeberek nexweş ji vî Pîrê hanê re dayite bigotin? tanî ku ew weha ji xwe re dide bigirîkirin? Pir pirs di nava serên min de dihatin û diçûn; lêbêle hîç bersiveke hişmendî min nikarîbû ji bona wan pirsan li ser vî girêyê hanê de ji xwe re bida bidan. Min jî weha ji xwe re mîna Çavdêrên din li Qedrî Cemîl Paşa de didate bitemaşekirin. Wî têra xwe ji xwe re date bigirîkirin. Di pişt re wî bi destmala xwe ve hêstirên çavên xwe dane bipaqijkirin û çend keserên kûr jî ji xwe re datin bikişandin. Wî li min de date bimeyzekirin û ji min re date bigotin: Birazî tu dizane çima ez giryam? Min bi lez û bi bez ve di nava dilê xwe de didate bigotin, ma dê ezê ji kû bidim bizanîn? Min jêre date bigotin, na ez nizanim, çima te date bigirîkirin? Careke din wî keserên kûr ji xwe re datin bikişandîn û wî ji min re date bigotin: Birazî ez ji kêfa re giryam. Her tişt bi bîra min ve dihate biderkevtin; belam girîyê wîna ji kêfare bi bîra min ve nedihate bikevtin. Min deynekir. Wî date bigotin. Birazî! Ez der sala 1937 de ji xwe re li Ewropa de dihatim bigerandin. Bigir kesekî nizanîbû, bê ka Kurd çi kesekin û heger wan navê wî jî ji xwe re bidana binaskirin, bes û bi tenha bi nala Serbiran, Çetan, Keleşan, Mêrkûjan, Rêbiran, Dizan ...ûhd. didatin binaskirin. Ez li bajarê Lozanê de li Siwêsa de ji xwe re li mêvanxaneyekê de hatibûn bipeyabûn û min ji xwe re li wêderê de didate bixewkirin. Danê sibehê ez ji jora xwe ve ji bona aşxanê hatim bidakevtin, da ku ez taştîyê ji xwe re bidim bixwarin. Hemû mêz xelk li ser wan de dihatin bidîtin. Mêzek vala nidihate bidîtin, Her mêzek yek kes yanî bêtir li ser de dihatin birûniştin. Min çavêbn xwe li mêzeke piçekî vala de date bigerandin û min yek mêz bi yek neferî ve date bidîtin. Ez ji bona wê mêza hanê hatim biçûyîn û min ji Rûnişvanê wê re date bibiprskirin: Ma vê derê bi vala ve tete biderkevtin û ez dikarim ji xwe re li vêderê de bêtir birûniştin? Ciwanmêr ji min re date bigotin: belê ew der bi vala ve tete biderkevtin û tu dikare ji xwe re lê bête birûniştin. Ez rûniştim û min jî ji Navmalîyê mêvanxanê de bi zimanê Firensî ve daxwaza taştîya xwe date bikirin. Hêjî taştîya min nehatibû, Beramberî min ji min re date bigotin, magelo ez dikarim ji te bidim bipirskirin, ku hûn ji kîjan welatî têtin bihatin? Min jê re date bigotin: Ez nadim bibawerîkirin, ku tê bide bizanîn; lêbelê tu dikare navê çend welatan bide bigotin.

Beramberî min pir bi Merovekî li ser xwe ve dihate biderkevtin û wî ji min date bipirskirin: tu ji Italya ye, min jêre got, na, ez neji Italya me. Wî ji min re got: tu ji Romanya ye, min jêre got, na, ez ne ji Romanya me. Wî weha careke din li min de pir bi wirdî ve date bitemaşekirin û date bigotin: ma tu ji Yunanê ye, min jêre careke din got, na, ez ne ji Yonanê me. Wi date bigotin, Ez êtir nema dizanim, bê kanî tu ji kû derê ye? Min jê re date bigotin: ez Kurdîm û ji Kurdistanê me. Gava ku min navê Kurd û Kurdistanê jêre date bigotin, wî xwe bi tirs ve ber bi paş ve date bikişandin û wî date bigotin: Ez nadim bibawerîkirin. Min jêre date bigotin, çima tu nade bibawerîkirin? ku ez Kurdîm û ji Kurdistanê hatime. Wî got: Kurdisatan bi cihê Hovberan ve û Kurd bi Hove ve, bi Merkuj ve, bi Diz ve, bi Kelş ve û bi Rêbir ve têtin biderkevtin. Reng û rûwê te bi Merovekî bajarî ve têtê biderkvetin û ew pesnên hanê bi te ve nayêtin biderkevtin. Min jê re date bigotin: ku ez Kurdîm û ji xelkên Kurdistanê ve têtin biderkevtin. Ew nav û nîşanên te gotî bi carekê ve ji bal Dujminên me de li Ewropa de li ser Kurd û Kurdistanê de hatine bibelavkirin. Min kir û nekir, ku ez vî Ciwanmêrê hanê bidim birazîkirin, ew nehate birazîkirin û ew her û her li ser wê bîr û bawerîya xwe de hate bimayîn.

Birazî! Xelkê wetov li Ewropa de di dema me de li ser Kurd û Kurdistanê de didatin biaxivtin û wetov jî didatin bibawerîkirin. Ev peyvên te ji min re datin bigotin, bi gewretirîn hêvî û mizgînî ve li ser Kurd û Kurdistanê de têtin biderkevtin, ku belê Kurd û Kurdistanê cihekî rêzdar û hêja ji xwe re di nava cîhana bajartîyê de dane biwergirtin. Ev jî bi xwe jî ve di encamê dawî de bi mujdeya serxwebûna Kurdistanê ve têtê biderkevtin. Magelo ji bona Pîrekî mîna min ji vê mujdeyê xweştir û ji vê mizgîyînê bi hêjatir ve di jînê de têtê biderkevtin? Belê ez pîr bûme, belam hêviya bi serkevtina welatê min û serxwebûna wêna ve bi buhatirîn hêjabûn ve ji min re di vê jînê de têtê biderkevtin. Heger ku ez rojekê çavên xwe bidim bigirtin, dê ezê bidim bibawerîkirin; ku dê Kurdistan di Rojhilata Navînî de bi serxwebûna xwe ve bi dewleteke milîyî azad ve bête bitacûxelatkirin.

Birazî! jiber vê hêviya xweştir gewre ve min date bigirîkirin. Ez te pir li ser wan gotinên te de û jêhatîyên Komele we de li Ewropa de ji bona doza Kurd û serxwebûna Kurdistanê bi nasîna Kurd û



Kurdistanê ve bi milletên Ewropî ve didim bisipaskirin. Hûn Xortên li Ewropa de bi Peyamberên welatê me ve têtin biderkevtin. Ez ji dil û can tevaya xebata we ji bona Kurd û Kurdistanê di nava milletên Ewropî de didim bipîrozkirin. Wî careke din ez hembêzkerin û macîkirim. Hûn bi serkevtî bin. Me xatir ji hev bi vî rengê hanê vedate bixwestin.

Min careke din nema ew date bidîtin, ji ber ku ew hate bimirin. Dibe, ku ev Ciwanmêr yanî yê din bide bigotin, te çima weha bi dirêj vê ev dîtina xwe û gotinên Qedrî Cemîl Paşa weha bi dirêjî ve li vê derê de datin bigotin? Ez dixwazim li vir de ji bona Xwendevanên xweyî hêja û pir bi rêz ve rastîyeke pir tîrş û tal bidim biderxistin; jiber gava ku em ji bona xwendinê li zanistgehên Ewropa de hatin bihatin, tevaya wan gotinên tîrş û talî gotî de ji bal Qedrî Cemîl Paşa de her û her ji me jî re dihatin bigotin. Wetov millet û welatê me li Ewropa de tanî destpêka salên Pêncîyî vî sedsale me de dihatin binaskirin. 65 melyon Xwendevanên Elamnî di rêya xwendina nivîsta Karl May de: „Di nava Kurdistana Hov de“ Kurd dane binaskirin û her wehaji ji Kurdan didatin bihezkerin; jiber Nivîsvan bi başî ve li ser Kurd de dabû binivîsandin û wî ev nivîsta xwe di nava zindanê de li ser Kurdan de dabû binivîsandin û wî navnîşana wê ji Mulerê Ingilizî dabû biwergirtin, yê ku wî berî wî nivîsta xwe li jêr wê navnîşana hanê de dabû binivîsandin.

Gelo ji vê bedbextîyê ji bona miletekî û welatekî bêtir mestir û girantir tete biderkevtin? Hiç gûman tede nayete biderkevtin, ku ev bedbextîya hanê ji bona meletekî û welatekî jê mezintir tu tişteki din nayete biderkevtin. Lêbelê bi saya serê xebata Barzanî û şûreşa wî ve û bi saya serê xebata Partîya Demokratî Kurdistana Iraqê ve û bi saya piştigirtina hemû Welatperwerên Krdistanê ji her çar perçên Kurdistanê de em bi vê roja hanê ve bi roja serbilindîya Kurd û Kurdistanê ve ne bes tenê li Ewropa de, lêbelêjî di seranserî dunyayê de pê hatin bigihandin û Milletê Kurd û Kurdistan ji bal tevaya bîr û bawerîya cîhana bajartî de pir bi çavakî rêz û hêja ve lê tete bitemaşekirin û piştî xebate gelê Kurd di seranserî Kurdistanê ji bona rizgarîkirina wîna ji bin hoverîya dagirkirina Rom, Ereb û Ecem tete bigirtin. Li ser van rûpêlên mêjûyî de di xebata me de ji bona serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milî de divê hemû nişên

hatî rêbazê Barzanî de di vî warê hanê de bêtin biagehdarîkirin, da ku ew bêtir û betir deha bi baştir ve ji vî karê hanê û rêbazê hanê ve bi serpêhatîtir ve ji xwe re bidin bisûdgiirtin, da ku ew biserkevtinê bi kêmtirîn gorî û kurtirîn dem ve bidin bigirawkirin. Karên wetov li ser her nîfşekî de di mêjûwê de ji bona çarekirina pirsên dema xwe tête biderkevtin; jiber ku bextiyarî û xweşbûna jîna her miletekî di vê dunyayê de û hêjbêtir di seranserî mêjûwê de li ser havilên kar û barên nîfşên çûyî de ne kêm û neji bêtir têtin biderkevtin. Bes û bi teha ve jibervêjî ve weha li vê derê de bi dirêjî ve li ser vê serpêhatîya hanê de ez hatim biaxivtin û min li ser de date binivîsandin.

Ev siyaseta hanêyî hovîtî bi beramberî Kurdên Kurdistanê Surî ve piçekî nobûna wêna di pêrabûna Hafîz Esed Wezîrê Liberxwdanê de di 13. 11. 1970 de bi wergêrkirina serdarîya Surî ve û bi girtina Gewreyên Basîyên bi ser Efleqî ve hate bidakevtin. Ev pêla hanê di mêjûwa Surî de di bin nav û nîşana Tevgera Rastkirinê de li jêr Hafîz Esed de ji sala 1970 de tête biderkevtin. Bele ji wê rojê de bayê nobûna şovînîtiyê bi gelekî ve beramberî bi Kurdan ve hate bidakevtin; tevlivêjî ve Kurd di Kurdistanê Surî de ji biçuktirîn mafeyên xweyî milî de di warê siyasî, civakî û zanyarî de bi bê pişk û par ve têtin biderkevtin. Daxwazên Kurdan ji serdarîya Surî de bes û bi tenha ve bi şeweyekî demokrasî ve di dana mafeyên wanî siyasî, civakî û zanyarî de tête biderkevtin. Siyaseta hemû partîyan Kurdan di Kurdistanê Surî de pir bi nerm û li serxwe de tête biderkevtin. Ew di nava çarçopê demokratîkirina civaka Surî de didin bixebatkirin û di wir jî de çarekirina pîrsa Kurd di Kurdistanê Surî de didin bidîtin. Hemû pêrabûnên rehperestiyên faşiyên Efleqî beramberî Kurdan di Kurdistanê Surî de çî di bicîhanîna Amara ji rêdervetî ve yanjî di kembera Erebbî de yanî di şeweyê erebkirina Kurdan de nehatin biserkevtin û pîrsa Kurd li gel Pîrsa kurd de di Kurdistanê Iraqê de çarekirina wêna bi şeweyekî demokrasî ve ji bal miletê Erebbî de tête bixwestin, heger ku ew bi rast û durust ve li ser serpêhatîyên xwe de û li ser serpêhatîyên miletên din de ji bona çarekirina pîrsa milî di çarenûsa miletan de bête biliberkevtin û ew xwe û welatê xwe ji destanên giran û mezin bixwaze bide biparastin, jiber ku neçarekirina pîrsa Kurd bi şeweyekî demokrasî ve him li Kurdistanê Iraqê de û himjî li Kurdistanê Surî de bi bomba demê ve li bin lingên wan de û bi

dijî qazanc û berjewendîyên wan ve dê bi neçarî ve û bi hinera qanûnên jînê ve bête biderkevtin.

## Raperîna Ciwanrû li Kurdistana Iranê de

Di sala 1957 de piştî pêkhatina komela me bi salekê ve raperîneke Kurd li Kurdistana Iranê de di bin nav û nîşana raperîna Ciwanrû de li jêr Rêberîya Mohamed Ciwanrû de hate bidestpêkirin<sup>24</sup>. Lêbelê rêjima Şahînsah bi balafiran ve bi gule, top û tankan ve date bi xwestin, ku ew vê raperîna hanê bide bibêdengkirin û wê bide biwêrankirin. Lê tevlivêjî de Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de ev zor û sitema Şahînsahî li seranserî cîhanê de date bitazîkirin, ku belê

---

<sup>24</sup> Weke bi bîra min ve têtê bikevtin, min Rêberê vê şûreşa hanê di sala 1983 de li gundê Rajan de date bidîtin. Wî serdana Mesud Barzanî didate bikirin. Wî bi dil û can ve di tevaya şûreşa Ilûnê de piştî wê didate bigirtin û Birazyê wî Ferîdon Cuwanrû tanî nehajî yekek ji Qehremanên Serdarên Pêşmergên Kurdistanê ve têtê biderkevtin, yê ku ew di piranîya şerên man û neman Kurdistanê de hatîye bibeşdarîkirin. Ew bi nimûneya Pêşmergetîyê ve di her warekî de têtê biderkevtin. Min herwehajî Ferîdon liigel Mamê wî de date binaskirin.

Mesud Barzanî û herwehajî Idrîz Barzanî pir rêz lê didatin bigirtin û mêvandarîyeke bi taybetî ve di dema mêvandarîya wî de lê didatin bigirtin. Ew pîrê hanê pir bi dilxweş ve dihate biderkevtin, gava ku çavên wî bi Pêşmergên Kurdistanê ve dihate bikevtin. Tevî li pîrbûna wîna de û herwehajî nexweşîya wîyî malwêran de hêvîya serxwebûna Kurdistanê her û her mûyekî ji nava wî serê wîyî boz ve nedihate biderkevtin. Ew pir bi dilxweşî ve careke din ji nik Mesud û Idrîş Barzanî de ji bona nava Cuwanrû hate bivegerandin.

Min ji xwe re li vî Qehremanê Cuwanrû de tevaya biserhatîyên tîrş û talîyên mîletê xwe di mêjûwa wî de didate bidîtin, yê ku wî di dirêjîya mêjûwê de her û her heyam bi heyam ve, dewran bi dewran ve, pêl bi pêl ve li ber hebûna xwe de bi beramberî Dagîrkerên Kurdistanê ve dida bidan û yê ku ew bi saya çiya û Pîrekên xwe ve di seranserî mêjûwê xwe de hatîye biparastin; jiber ku çiyane meyî sext û dijwar her û her em ji hêrîşên û jêrdarîyên Bêganan dane birizgarîkirin û bi saya serên Pîrekên me ve Zarokên Kurd her û her li ser fêrbûna zimanê meyî perest de dihatin bişîrvekirin. Bi vî rengê hanê ve zimanê me hate biparastin û pêrejî mîletê me di hebûna xwe jî de hate biparastin.

Mîletê Mîsrîyî xwedan bêtir ji çar hezar salî bajartîyê û şehristanîyê di bilindbûna bajartî û şehristanîya Merovanyê de bi saya ebecd hewz ve bigir hate binemankirin û yên mayî jê neha ew di nava welatê xweyî kevnar de bigir bi nala Bêganan ve û bi kêma mafê ve têtin biderkevtin.

Kevneperestên Xwînwarên Serdarên Bêganên Iranî dixwazin, ku ew vî miletê hanê bidin biwêrankirin û wî bi carekê ve ji mafeyên wîyî milî û merovanîyê de bidin bibêpişkirin.

Cara pêşî bû, ku komela me ev xebata miletê Kurd bi geş ve ji bona tevaya bîr û bawerîya cîhanê ve date bixuyanîkirin, di dema ku hêjî miletê Kurd li Ewropa de nedihate binaskirin. Piranîya pir ji Xelkên Ewropa hêjî nizanîbûn, bê kanî Kurd kîne û ew ji kû ne, ji çi welaî ne û ji çi miletî ne. Her û her li ser destên berdevkên Kevneperestên Xwînrijên û Xwîmijên Turk, Ereb û Farisan de li ser Kurd de hatibû binivîsandin û bibelavkirin, yanjî ew name, nivîst û gotarên tîrş û tal ji bal Cîhangerên Ewropî de li ser Kurd de hatibûn binivîsandin, yê ku wan bi dûr ve yanjî bi nêzîk ve li ser miletê Kurd de bi bed ve dabûn binivîsandin. Wan ew geh bi dirbûn ve, gehjî bi keleşî ve, gehjî bi vî navî ve yanjî bi navekî dinî bedtir ve didatin binavkirin, da ku ew her û her Serdarên xwe li Ewropa de û Hevalbendên xweyî Kevneperest ji Serdarên Bêganên ji Turkan, Ereban û Farisan bidin bidilxweşkirin.

## Şûreşa 14 tîrmeha Sala 1958

### Hatina Ebdul-Kerîm Qasim ji bona ser Desthilatîyê

Di sala 1958 de di 14 tîrmehe de şûreşeke mezinî demokrasî, pêşverû û welatperwer li Îraqê de hate bivêkevtin. Tevaya sustêma kolonyalizmê li Îraqê de ji rehên wê de hate bilerizandin. Kevneperest û Hevalbendên Impiryalizmê hatin birûxandin. Patîsahî hate bikevtin, ya ku ew bi saya impiryalizma Ingilîzî ve hatibû bidurustkirin. Komara Iraqîyî şûreşgêrî hate bipêkhatin. Di vê dema hanê de miletê Kurd, herwehaji miletê Ereb û hêzen pêşverû û demokrasî di Rojhilata Navînî de û pêrejî di seranserî cîhanê de bi vêkevtina vê şûreşa pîroz ve dihatin bidilşad û bibextiyarkirin.

Rêberê şûreşê Abdul-Kerîm Qasim di destûra katîyî komarê de date bidazanîn, ku Ereb û Kurd di welêt de bihevbeş ve têtin biderkevtin.

Belê Barzanî di meha cotana sala 1945 de ji bona Kurdistanê Iranê hatin biderbasbûn, ya ku têde komara Mehabadê di 22. 1. 1946 de li gorepana çarçiran de li bajarê Mehabadê de ji bal Qazî Mohamed hate bidazîn û ya ku Paytextê wê Mehabad di 15. 12. 1946 de ji bal sipahê Iranî de hate bivekirin û Serokê Komarê Qazî Mohamed di 18. 12. 1947 de hate bigirtin û ew di gorepana çarçiran de li bajarê Mehabadê de di 31. 3. 1947 hate bidarvekirin. Serdariya Iranî bi alîkarîya impiryalizma Ingilîzî û Emerîkî ve ev tev de bi ser serên Kurdan ve date bianîn.

Barzanî bi neçarî ve di 17 axlêva sala 1947 de ji bona Sovyêtê hate biçûyîn, ji wêderê de careke din ji bona Iraqê di 6 meha çêrya pêşî de di sala 1958 de hate bivegerandin û miletê Iraqê bi Kurd û Ereb ve bi vegerandina Barzanî û Barzanîyan ve bi mîna Qehremanên Iraqê ve nebes tenê bi Qehremanên Kurdan ve lêbelêjî bi nala Qehremanên Ereban jî ve ji bona wan datin bipêşewazîkirin.

Çend ew roja hanê di mêjûwa Iraqê de xweş bû, çend ew geş bû. Belê herwehaji ew roja hanê di mêjûwa Kurdistanê jî de pir bi geş, xweş û pîroz ve tête biderkevtin. Birwerîya wê roja mêjûyî di mêjûwa

Kurdistanê de jiber giringbûn û kêra wêna nayête bijibîrakin.

Vegerandina 500 Hevalên Barzanîyî din di rêya derya re di gemîya gurozya de di 16 meha cotana sala 1959 ji bona bendera Besra hate bigihandin û li wan jî de û herwehaji li Begdadê û Hewlêre de pêşewazîyeke bê nimûne him ji bal miletê Ereb de û himjî ji bal miletê Kurd de dihate bikin. Ew bi nala Qehremanên miletê Iraqî ve dihatin biderkevtin. Bi hatina Barzanî û Barzanîyan ve şahî, govend, dilan û semawend li seranserî Kurdistanê de dihate bikin; jiber ku Qehremanên wanî azadîyê, hêviya jîn û evînî, Pêşmergeên Komara Mehabadê, Pehlewanên Barzan bi ser bilindî ve careke din ji bona nava cerg û hinavê Kurdistanê de hatin bivegerandin. Çend Kurd bi vê hatina bi kêr û pîroz ve di seranserî Kurdistanê de dihatin bidilşad û bextiyarkirin, weha deha Dagirkerên Kurdistanê ji tirsê şapê şiyarbûna azdî û serxwebûna Kurdistanê dihatin bilerizandin; jiber ku wan baş didate bizanîn, Barzanî hêvî û durujmê xebata Kurd ji bona rizgarîkirina Kurd û serxwebûna Kurdistanê dihate biderkevtin û hêjibêtir pêwendîyên wîyî pir xurt ligel dewleta Sovyêtê de piştgirtineke pir mezin ji bona xebata rizgarîkirina Kurdistanê de di nava Rojhilata Navînê de û di tevaya dunyayê de bide bidurustkirin. Çawan Komara Mehabadêyî nuhatî metirsî li ser Dagirkirin û kolekirina wan de ji bona tevaya Kurdistanê didate bipeydakirin, weha deha bêtir hatina Barzanî û Barzanîyan careke din ji bona nava Iraqê û Kurdistanê û bi piştgirtina xurtî Sovyêtî ve metirsîyeke bêtir li ser kolekirin û bendekirinê de li Kurdistanê de dihate biderkevtin; jiber ku di vê dema hanê de tevgera azadîxwaz li seranserî dunyayê de roj bi roj ve bêtir dihate bigeşkirin û sustêma impiryalizmê, kolonyalizmê û zordariyê roj bi roj ve dihatin bilawazîkirin û ber bi rûxandinê ve dihatin biçûyîn.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de ev bûyîna mezin di mêjûwa Iraqê de, ev bûyîna mezin di mêjûwa Kurd û Ereb de bi pîrozî ve, bi şabaşî ve, bi dildarî û evîndarî ve, bi tevaya hêz û hinerên xweyî biçûk jî ve piştê şureşa Pîroz didate bigirtin. Wê tevaya hêz û hinera xweyî biçûk ji bona liberxwedana vê şureşa hanê bi beramberî kevneperestîyê ve û herwehaji pêrejî bi beramberî hêzên Impiryalîyê jî ve date bitirxankirin. Wê tevaya hêza xwe ji bona parastîna vê şureşa hanêyî pîroz bi serhev de date bikomkirin û wê ew li ber destên

Rêberîya şûreşê de date bidanîn. Vê şûreşa mezin dergehê hêvîyeke gewre û giran li ber milletê Iraqê de û herwehajî pêrejî li ber hemû milletê Kurd de li seranserê Kurdistanê de date bivekirin. Bextiyarî, dilşadî û hêvî li Iraqê de di nava millet de roj bi roj ve dihatin bigeşkirin.

Komela me jî bi nala Pasevanekî biçûk ve ji bona danîna rêyekê ji bona Xwendevanên Kurd li Ewropa de dihate biderkevtin û herwehajî wê ji bona piştgirtina vê şûreşa hanêyî pîroz durujmê dostaniyê di nava milletê Kurd û Ereb de didate biberz û bibalakirin û wê durujmê demokrasîyê li Iraqê de ji bona Kurd û çarekirina pîrsa wîna didate bixuyanîkirin, ku ev durujmê demokratîkirina Iraqê bi qazanc û berjewendîya Kurd û Ereb ve tête biderkevtin û bes û bi tenha ve li ser bingehe demokrasîyê de pîrsa Kurd li Kurdistanê Iraqê de bi aşîti ve dikare bête biçarekirin. Her û her Komelê didate bixuyanîkirin, ku bes û bi tenha xwe ve li Iraqê demokrasî de milletê Kurd dikare bi armancên xweyî mîlîyî rewa ve bête bigihandin.

Komela Xwendevanê Kurd Wênerên xwe ji bona Iraqê dane bişandin û wê tevaya dilsoziya xwe û piştgirtina xwe di demên teng û tar de ji bona Şureşa Tîrmehê date bixuyanîkirin.

Lêbelê ev şûreşa hanê, ya ku wê weha bi hêvî û xweşbûn ve pê date bidestpêkirin û ya ku tevaya milletê Kurd û herwehajî hêzên pêşverû li seranserê Rojhilata Navînî de pê dihatin bixetiyarî û bidilşadîkirin û herwehajî pê dihatin bihêvîkirin, careke din ji bal şovînîzm û kevnepereştiya Ereb û kevnepereştiya Kurd jî de û bi serde jî ve ji bal hêzên paşverû de di Rojhilata Navînî de û nemaze jî ji bal hêzên impiryalîya Ingilîzî û Emerîkî de dihate bişerkirin. Ev hêzên tarîyê, ev hêzên Ahrumen bi beramberî şureşa Tîrmeha pîroz ve tevan bi hev re şerê wê didatin bikirin.

Di encamê dawî de Rêberê şureşê Abdul-Kerîm Qasim siyaseta xwe date biguhertin, herwehajî pêrejî wî Dost û Dujmin jî bi hev re dane biguhertin û wî xwe bi dil û can ve ji bona nava şapê hêzên kevnepereştî û şovîniyên rehperestên dijî demokrasîyê û milletê Kurd date biavêtin û wî di nava ava wanî şelû de ji xwe re bi tew tew ve didate bimelekirin. Herwehajî wî ji xwe re didate bixwestin, ku ew di sedsalê bîstan de, di serdema şiyarbûna milletan de li ser bîr û bawerîyên regezperestîyên Efleqê faşî de Kurdan di lûla Erebî de bide



bijivatin û bide bierebkin. Weha Abdul-Kerîm Qasim ji xwe re ji bona ser rêya çûn û nehatê date bidan, ya ku berî wî Mustefa Kemal Paşa Bavê Turkan ji sala 1924 de bi ser ve hate biçûyîn, yê ku ew jî pê rojekê ji rojan tevî hemû derd û kulan jî nehate biserkevtin. Ew hate gorbegorkirin, belam Kurd hate bimayîn.

Miletekî wehayî nala kurd, yê ku ji berî zayînê de bi sê hezar sal ve navê wî di belgeyên Somerî de hatîye bitomarkirin û yê ku ew bi hezaran sal ve li jêr girantirîn derd û êşan de, li jêr tevaya giranîya evsana bihuşta Erebb de nehatîye bibijavtun û nemankirin, dê çawan ev miletê gernas û mêrxas, Pehlewanên Rojhilat li ser destên şovînîya faşîya çepelên Eflaqî wisa bi bê dengî ve û bi hêsanî ve bête bibijavtin û nemankirin. Vî miletê ku bi hezaran sal ve mayîn, hebûna xwe û welatê xweyî Kurdistanê her û her dabû biparastin û wî her û her welatê xwe bi goristaneye tengî tarî ve ji bona hemû dijminan ve dabû bikin, ji yê ku wan dabûn bixwestin, ku ew bi ceng û şer ve di nava Kurdistana wî de bêtin biderbasbûn û wê ji xwe re bidin bivegirtin û bidin bicî û biwarkirin, yanî da ku ew li ser de bêtin bizalkirin.

Kurdistan bi navê cihê Pehlewanên Rojhiolat ve bi nav û bang bû. Lêbelê şovînîya Erebb ji xwe re di xewin û nigaşan de mîna Omer di hate bijiyandin, da ku ew ji xwe re Kurdistana rengînê bide bitalankirin, bide erebkin û miletê Kurd di sedsalê bîstan de bide bibendekirin û biqirkin.

## Derîyê Duwem

### Rudanên siyasî ji vêkevtina Şûreşa Ilulê sala tanî 1961 - 1970 de

#### Siyaseta Qasim beramberî Kurd û Destpêkirina Şer

Kevneperestî û şovîniya Erebî Abdul-Kerîm Qasim didatin biçavsorkirin, wan ew li ser Kurdan de didatin bigur û biharkirin, tanî ku wî şer di 11. Ilola sala 1961 de li Kurdistanê de bi destên xwe ve date bivêxistin<sup>25</sup>. Şerekî sext û ne rewa di nava welatê me de careke din ji nû ve ji bal serdariya Iraqê de bi hemû hêzên xweyî çekdarî ve bi dir û hovîtî ve hate bivêxistin. Careke din ji nû ve milletê Kurd bi liberxwedana man û nemana xwe ve hate bineçarîkirin. Careke din Kurdistan bi qada ceng û şer ve ji bal şovîniya serdariya Iraqê de hate bikirin. Careke di nava welatê me de ter û hişk li ser destên hovberên faşîyên Ereb de hatin bisûtandin.

Komela Xwendevanên kurd li Ewropa de bi tevaya hêz û hinera xwe ve, bi tevaya vîn û evîna xwe ve beramberî vî şerê hovberî ji bal Dagîrkerên Ereb de hate birawestandin. Tevîjî ku hêz û hinerên wê jî pir bi biçûk ve dihatin biderkevtin, wê hemû hêzên xwe ji bona li berxwedana Kurdistana agirpêkevtî de datin bidagirtin. Wê bi vî rengê hanê ve Kurd bigir li hemû welat û bajarên Ewropî de, di cihên ku

<sup>25</sup> Ji xwe re di vî warê hanê de bi dût û dirêji ve li gotara Ismet Şerîf Wanliyî pir hêja de û bi nêrx ve bi zimanê Ingilîzî ve di bin nav û nişana "The war liberation of Iraki Kurdistan" -Cenga rizgarîkirinê li Kurdistana Iraqê de-, di „Africa, Latin Amerika, Asia Revolution, Vol.1, No. 4-5, r. 117 - 155, Lausanne, Switzerland 1963 de bidin bitemaşekirin.

Kurd dihatin bidîtin, datin birêxistin û ew dihatin bidagirtin û wan ji bona hemû hêzên aşîtxwaz, pêşverû û demokrasî li ser rewş û zînetê Kurdistanê de aghedarî didatin biderxistin, ku miletê Kurd di Kurdistana Iraqê de di bin rewş û zînetên pir dijwarîyî ceng û şerê man û nemanê de têtin bijîyandin û ew li ber hebûna xwe de, li ber man û nema xwe de didin bidan. Herwehaji wê şev û rojê tevaya bîr û bawerîya cihanê jî li ser wan rewş û zînetên dijwarîyî Kurdistanê de didatin biagehdarîkirin. Herwehaji wê ji tevaya dunyayê re didate bixuyanîkirin, bê kanî çima şovîniya Ereb dide bixwestin, da ku ew vî miletê rebenî belengaz ne bes tenê wî ji dewlemendbûna welatê wî bide bibêpişk û bibêparkirin, ne bes tèn ew wî ji biçûktirîn mafeyê merovanîyê jî de bipêpişk û bibêparkirin, lêbelê hêjî bi serde jî ve ew dixwaze vî miletê reben û belengaz bide biqirkirin; da ku ew ji xwe re dewlemendbûna Kurdistanê bes û bi tenha ve ji nefetê ve 90 milyon ton bide bitalankirin û di encamê dawî de Kurdistan bide bierebkirin. Serdarîya Erebiyî bêgane Kurdistan didate bitalankirin û miletê Kurd didate bikole û bibendekirin. Wê tevaya siyaseta Afriqya Jêrin di nava Kurdistanê de didate bicî û biwarkirin.

Komela me, cerg û hinavên Kurdan li derve de di vê dema teskî mējûya welat û miletê me de cihekî gewreyî giring ji xwe re ji bona şiyarkirina bîr û bawerîya cihanê li ser rewş û zînetên dijwarî Kurdistana agirpêkevî de date biwergirtin. Di vê dema hanê de jêhatîbûna xebebeta Komela me ji bona aghedarîkinê û ragiyandina bîr û bawerîya cihanê li ser rewş û zînetên Kurdistanê de dihatin bigûrkirin.

wêha vê Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de dibustana Kurdewarî di Ewropa de yekemîn daxuyanî li ser vêkevîna şureşa 11 Ilola sala 1961 de ji bona bîr û bawerîya cihanê di 18. 9. 1961 de date bibelavkirin û ev daxuyanîya hanê bi rastî jî ve bi yekemîn daxuyanî ve ji bal Kurd de li se vêkevîna vê şureşa milîyî mezin de têtê biderkevîtin; jibervêjî ve ev daxuyanîya hanê ji bal Komela Xwendevanên Kurd de pir bi mējûyî ve têtê biderkevîtin.

Ez li vir de bes û bi tenha ve jê çend pevikan didim bitomarkirin, da ku Xwendevanên hêja dûrbûna rastîya remana vê pevekên hanêyî mējûyî ji xwe re neha lê bidin bitemaşekirin: „Em li ser bingehê hêza miletê xweyî bi yekkirî ve û bi alîkarîya bîr û

bawerîya cîhanî ve bi serkevtinê ve têtin bipîştrastkirin. Serpêhatîyên mîletan di vê serdema me de û rastîyên mêjûyî bi diyar ve didin bidubarekirin, ku hîç hêzek di vê cîhanê de nikare pêgîrîya mîletê me ji bona xabatê li pênavê azadîyê de bide binabûdkirin“.

Weha vê Komela Welatperest bi tavaya karîna xwe ve ji roja vêkevtina şureşa Ilola mezin bi dilsozî ve, bi jîrbûn û jîhatî ve û li ser bîngehekî siyasîyî zanistîyî pir bilind ji bona gihandina dengê wê û mîletê me ji bona bîr û bawerîya cîhanê ve didate bixebatkirin.

Wehajî jîbervêjî ve deha jî şovînî û faşîya Ereba di bin pir nav û nîşanan de hîrêşên mezin ji bona ser komela me didatin bianîn û çî navên bed jî di ferhenga Erebiyî faşî de bi dû komela meyî xweşevîst ve didatin bixistin.

Hinan ji wan xwe bi nav ve bi sosyalistî ve didatin bidanîn, belam di rastî de bi şovînê dihatin biderkevtin. Wan dev ji bona komela me didatin biavêtin; jiber ku bes û bi tenha ve vê komelê bi dilsozî ve li ber xebata gelê Kurd de li jêr man û nemanê de ji bal faşîya Ereba de didate bidan û dengê wî, derdên wî bi bîr û bawerîya cîhana bajarî ve li ser hovîtiya serdarîya Dagîrkerên di nava Kurdistanê de didate bigihandin. Herwehajî wê rep û rast di seranserî Ewropa de şovînzîma regezperesta Ereba bi karên wêyî wêrankirin, kuştin û talnkirina mîlet û welatê me ve didate birût û biqutkirin û ew li ber çavên tevaya hêzên aşîtxwaz, pêşverû û demokrat de didatin bitazîkirin. Belê Dagîrkirina Ereba ji bona nava Kurdistanê bi vegirtina Cengîzخان ve di dunyayê de dihatê biberamberkirin û ew careke din di hovberîya xwe de ne bi kêmî vegirtina Kurdistanê ve di pêla Omer Kurê Xetab de der sala 640 z. de dihatê biderkevtin<sup>26</sup>. Wan careke din

<sup>26</sup> Ji xwe re di vî warê hanê de li nivîsta Ekrem Cemîl Paşa bi zîmanê Kurdî ve: Dîroka Kurdistan, r. 122 - 166 bidin bitemaşekirin. Cihê vê nivîstê û sala derkevtina wêna li ser de nehatîye binivîsandin; lêbelê wertête biderkevtin, ku ew li baja Bêrûdê de hatîye biçapkirin. Ev nivîsta hanê pir bi nerxe ve li ser dagîrin û hovberîya Ereba de di pêla Mosulmantîyê de di nava Kurdistanê de bi belge ve dide binivîsandin, ku Merov jê neha hovîtiya Basîyan him di Kurdistana Iraqê de û himjî di Kurdistana Surî de beramber Kurd de bêtir dikare bête biliberkevtin. Di her kat û zemanekî de Talanker bi Talanker ve û bi Hovber ve têtê biderkevtin. Mûyekî Rehperestên Ereba ne di wê çaxê de û ne jî di neha de di bin her çî navekî jî de dev ji hovberîya xwe nedane biberdan.

ji nû ve kela xwe bi wêrankirina Kurdistanê û kuştina giştî ve didane bisarkirin.

Komela me tevî li van devavêtinên van Berdevkên Rehperestên Erb de her û her ew bi zanebûn û konetî ve li ser karên û erkên xweyî milî û welatî de di tevaya welatên Ewropî de dihate biçûn. Wê her û her pêwendiyên xwe ligel hêzên pêşverû , azadixwaz û demokrat de di seranserî cîhanê de didate bixurtkirin û bi taybetî ve wê pêwendiyên xwe ligel Xwendevanên Yekkirtîya Cîhanî de didate bixurtkirin. Hêzên bi nav sosyalistî û pêşverûyên Erebb ve pir kosp û kelem li ber kevtina Komela me de ji bona nava sazmenîya Xwendevanên Yekkirtîya Cîhanî de pir bi erzanî ve didatin bidanîn, da ku em bi Endamê wê sazmenîya Xwendevanên cîhanê ve neyêtin bikirin û da ku em dengê milletê xwe Kurd li seranserî Kurdistanê de bi genc û xortên, Keç û lawên cîhanê ve nedin bigihandin, da ku bêtir û bêtir Kurdistan li jêr lep û pencên Dagirkerên Rom, Erem û Ecem de di nava xwîna xwe de bête bivegevizandin. Tev li van kevtileftên Faşiyên Dagirkerên Kurdistanê jî de bi dijî komela me ve di sala 1964 de komela me bi Endam ve di sazmenîya Xwendevanên Yekkirtîya Cîhanî de hate biwergirtin. Ev rojke xweş bû, belê ev di mêjûwa komela me de rojke geş bû; jiber ku vê komela hanêyî pêşverû û welatperwer ji sala 1956 de ji bona vê endametîya hanê didate bikeftiletkirin û bixebatkin.

Belê di encamê dawî de ev xebata hanê bi endambûna komela me ve di nava Xwendevanên Yekkirtîya Cîhanê de di piştî demeke dirêj û têkoşîneke li ser xwe de û bi bînfîrehbûn ve bi beramberî Berdevkên Dagirkerên Kurdistanê de hate bitac û bixelatkin.

Xebata Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi ser hêzên şovîniyên Dagirkerên Kurdistanê ve hate biserkevtin; tevî ku ew jî bi hemû xurtbûn û karinên xwe ve her û her bi dijî Endametîya Komela me ve dihatin birawestandin. Belê xebata Komela me di vî warê giringî hanê de ji bona gihandina dengê Milletê Kurd û şûreşê wîyî pîroz ji bona tevaya keç û xortên Dunyayê li ser wan hêzên tarîyê de hate biserkevtin. Çarûşkeke bi hêvîyî bêtir ve û bi baştir ve ji bona gihandina dengê Kurd û zinet û rewşên Kurdistanê ji bona bîr û

---

bawerîya tevaya cîhanê dihate biderkevtin, ya ku wê cerg û hinav li Dagîrkerên Kurdistanê de didate bisûtandin û hîmê serdarîkirin û talkirina wan him ji bona mafeyê Kurd û himjî ji bona dewlemendbûna Kurdistanê didate bihejandin; jiber ku miletê Kurd di tevaya mêjûwa xweyî dirêj de di bin destên hovberên Serdarên Rom, Erebb û Ecem de bi bê xwedî ve, bê kes û kûs ve dihate biderkevtin û ev jî bes û bi tenha ve jiber ku em him nezanbûn û himjî me nikarîbû bi zanebûn û jîrbûn ve dengê xwe bi seranserî meletên çîhanê ve bidin bigihandin. Bedbextîya me her û her di nezanîya me de dihate biderkevtin û nezanîya me jî her û her di bedbextîya me de dihate biderkevtin. Komela me bi vê endambûna xwe ve di nava Yekkirtîya Xwendevanên Cîhanî de dikarîbû piçekî vî bazinê bi tenhakirina hanê ve ji bal Dujminên me de ji bona me bide bişikenandin. Belê şikenandina vê xelesa bi tenhakirina Kurdan ve di cîhanê de ji bal Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi gaveke pir bicûk ve li ser rêya pêşkevtina xebata wî ji bona rizgarîkirina wî û welatî wî ji bin jêrdarîya hovî Serdarên Rom, Erebb û Ecem ve dihate biderkevtin. Hêvîya azadîyê û serxwebûna Kurdistanê di nava cerg û hinavên miletê me de dihate bigeş û bigûrkirin; jiber ku her û her Dagîrkerên Kurdistanê ji Rom, Erebb û Ecem ji bona bi tenhakirina Kurdan di vê dunyayê de pir bi xurtî ve û pir jîrbûn ve didane bixebatkin, da ku ew her û her bi bê dengî ve Kurdan di nava Kurdistanê de û di nava xwîna wan de bide bivegevizandin û dewlemendbûna Kurdistanê ji xwe re bi bê dilovanî ve, belê bi hovberî ve bidin bitalankirin. Bedbextîya bi tenhabûna me di vê dunyayê de hemû bi carekê ve bes û bi tenha ve di nezanîya me de dihate biderkevtin. Herwehaji pêrejî bê xwedî û xwedanîya me, bê kes û kûsiya me û bê bextîya feleka me tevde bi carekê ve rehên wan di nava nezanîya me de dihatin bicî û biwarkirin. Nezanîya me bedbextîya me bû, bedbextîya me nezanîya me bû. Gava ku piçekî miletê me jî di seranserî Kurdistanê de hate bizanebûn, hêdî hêdî jêre jî mîna hemû miletên vê dunyayê dergehê jîn û jîyanê, dergehê rizgarîkirinê, azadîyê û serxwebûnê dihate bivekirin û lerza taya mirinê bi Hovberên Serdarên Dagîrkerên Kurdistanê ve ji Rom, Erebb û Ecem dihate bikevtin.

Wetov Kurd vê carê bi baştir ve pêwendîyên xwe ligel derve de bidin bikin, da ku ew bêtir dengên xwe bi seranserî dunyayê, miletan

û dewletan re di rêya rêxistinên xwe re bidin bikin û herwehaji ligel Rojnemevan ji bidin bikin, mîna ku ev hevpeyvîna Barzanî ligel Peyamberê rojnama New York Times de li cihekî de di Kurdistanê rizgarîkirî de ji bal serdarîkirina Diktator Ebdul Kerîm Qasim de hate bikin û ev pirsên hanê ji Barzanî hatin bikin, yê ku ew di rojnama Xebat de di jimara 468 de di çîrya pêşî de di sala 1962 de hatiye bibelavkirin û jiber giringbûna wan ji aliyekî de û ji ber cihê wanî mêjûyî ji aliyê din de ez van pirsên hanê li vê derê de didim biwergerandin û bitomarkirin:

**Pirs:** Armancên we di vê şûreşa hanê de bi çi ve têtin biderkevtin?

**Bersiv:** Ji milletê Kurd re hate biderkevtin, piştî ku ew di jimarekê de ji salan de ligel Qasim û ne Qasim de hate bijîyandin û wî ji xwe re date bidîtin, ku jîyaneke wetov mîna berê û bi şeweyê berê ve nikare ne bête biliserçûyîn û hêjîbêtir ew nikare bi wî corî ve pê bête bijîyandin; jîbervêjî ve ew ji bona daxwaza ewtonomî di nava tara dewleta Iraqî de hate bineçarîkirin, da ku ew ji xwe re hinekî ji azadîyê û aramîyê bide bigirawkin. Herwehaji jiber ku ez bi neferekî ve ji neferên vî milletê hanê ve têtin biderkevtin û herwehaji jiber ku ew daxwaza hanê ji nava nivî vîna milletê Kurd de bi carekê ve tete biderkevtin, ez ji piştî vê daxwaza hanê didim bigirtin û ez ji bona wê didim bibangkin, da ku ew bête bicihanîn. Me tu carî bi carekê ve ji bona pêkanîna serdarîyeke Kurdistanîyî serbixwe ve nedaye bidaxwazîkirin.

**Pirs:** Bi çi ve rola te di vê şûreşa hanê de tete biderkevtin?

**Bersiv:** Ez dixwazim tevde bidin bizanîn, ku ez ne bi Serok ve, ne ji bi Serdar ve û ne ji bi Rêber ve têtin biderkevtin. Ez bes û bi tenha ve bi neferekî ve ji vî milletê hanê ve têtin biderkevtin. Ez xwe bi biçûktirîn nefer tede didim bidîtin. Hiç tu daxwazên min nayêtin bidîtin, jibil ku ez ji bona vî milletê bê pişk û par bidim bixebatkin, yê ku Qasim bi hêz û hinerên xwe ve dide bixwestin, ku ew wî bide biqirkin. Tiştên ku tanî neha hatine bicîhatin, ew ne ji bona saya serê min têtin bivegerandin; lêbelê ew ji bona saya karê vî milletê qehreman û

pehlewan ve têtin bivegerandin, yê ku ew nayête bibezeandin. Milet vî karê hanê ji xwe re dide bikin.

**Pirs:** Magelo tu bi Rojhilat ve yanî bi Rojava ve tête bibestandin?

Bersîv: Pir bi başî ve ji xwe re bidin bizanîn, ez bi Merovekî bê layîn ve têtin biderkevtin. Pêwendîyên me ne ligel Rojhilat de û neji ligel Rojava de têtin biderkevtin. Navbidûxistina me ji bal Qasim de, ku em bi Impiryalya Ingilstanê ve têtin bibestandin, bes û bi tenha ve bi derwekê ve tête biderkevtin, ku Qasim bi xwe jî ve vê dide bizanîn. Lêbelê ew bi vê navdûxistina hanê ve bi dû me ve ji xwe re dide bimebestkirin, da ku ew Ereban û Kurdan bi dijî me ve bide bilivandin û herwehaji da ku ew ji xwe re mehnan bide biafirandin, da ku ew hêrîşên xweyî hovberî ji bona ser me bide birakişandin. Hiç gûman tede nayête biderkevtin, di vê pêla ku hûn di nava me de didin biraburandin û hûn li ser zînetên me de têtin biagehdarîkirin, ji we re bi eşkere ve hate biderkevtin, ku em bi bê layîn ve him ji Rojhilat û himjî ji Rojava ve têtin biderkevtin.

Barzanî hevpevîna xwe bi vê gotina xwe ve date bidawîkirin, ku wî date bigotin:

„Di vir de ez dixwazim vê kêsa hanê ji xwe re bidim biwergirtin, ku ez peyvekê ji bona birayên xweyî Ereb li Iraqê de bidim birûkirin û ez ji wan re didim bigotin, ku em ne bi dujminên wan ve têtin biderkevtin û şûreşa me ne bi dijî wan ve tête biberkirin; lêbelê ew bi dijî dujminê meyî hevbeş Abdul-Kerîm Qasim ve tête biberkirin. Daxwazên xwestiyên me ew bi Iraqîyî giştî ve têtin biderkevtin. Ew bi bêtir ve bi berjewendîya Ereb ve ji berjewendîya Kurd de tête biderkevtin. Em bi şûreşê ve nehatine birabûn; lêbele Abdul-Kerîm Qasim ew li ser me de bi lêzordarîkirina miletê Kurd ve û bi hewildana qirkirina wîna ji hebûnê ve date bineçarîkirin. Em bi hilgirtina çek ve ji bona li berxwedana xwe û hebûna xwe de hatin bineçarîkirin. Di dawî de ez didim bihêvîkirin, ku ew ji bal Abdul-Kerîm Qasim de bi fêlekê ve neyêtin bixapandin, da ku ew bi wan ve pê bidin bikarkirin û ew wan bide biserbazîkirin û wan ji bona dijî me bide biajotin. Em ji wan didin bixwestin, ku ew mil bi mil ve ligel me de bidin bixebatîkirin, da



ku em bi hev re serdarîkirina vî Diktatorê Zordar û Bedkarê yekem ji bona civata Iraqê bidin bihilanîn. Silav ji bona we tevan<sup>27</sup>.

Gava ku Merov ji xwe re li van bersivên hanêyî Barzanî de bi hûr û kûrî ve lê dide bitemaşekirin, Merov tevaya dildarî, dilsozî û hêjbêtir kûrbûn û dûrbûna dîtina vî Hozanê Rêberê gewreyî mezin di mêjûwa xebata Kurdistanê de ji xwe re bi eşkere ve dide bidîtin; jîbervêjî ve tevaya Dujminên Kurd kîna xwe li ser Barzanî de didatin bigirêdan, jiber ku cerg û hinavên wan ji sawa vî Hozanê Pîrî zeman de di xebata kurdistanê de di dilsozî, jîrbûn û zanebûna wî de dihate bilerizandin û taya tamara mirina dagîrkerina wan di nava Kurdistanê perest de bi wan ve hatibû bikevtin û dagîrkerina wan ji bona Kurdistanê bi saya vê dilsozî û zanebûna Barzanî ve bes û bi tenha ve bi pîrsa demê ve dihate biderkevtin; jiber ku Barzanî şiyarbûna milî li ser bingehê rast û xurt de ji bona azadîkirina Kurdistanê, serxwebûna wêna û pêkanîna dewleteke mîliyî serbixwe ve di nava Rojhilata Navînî de date bitac û bixelatkin. Magelo ji bona vê taya tamara mirina dagîrkerina wan de ji bona Kurdistanê de ji rêbazê Barzanî tiştêkî din bi tîstir ve ji wan re tete biderkevtin?

Divê Serdarên dagîrkerên Rom, Erebb û Ecebê ve pîrsa hanê ji xwe re ji Cewahirî Mirê Mîran di Xweşxuwaniyê de bidin bîkirin, gava ku wî di Kongirê Heştêmî Komela Xwendevanên Kurd de ji 9 - 15. 8. 1963 de li bajarê Monîx de li Elmanya Federalî de bi xwexuwaniya xweyî bi nav û deng ve li ser „Kurdistan yanjî Cihê Pehlewanan“ de di demjimara 16 de di êvara roja çarema 16. 8. 1963 de date bixwendin, ku ew wetov di malikekê de pê dide bidestpêkirin: Vejandina miletekî bi Mustefa ve bête bidestpêkirin                      dunya bête bicûn, ew tete bimayîn

<sup>27</sup> Wer tete biderkevtin, ku ev Rojemevanê hanê bi Schmidt Dana Adams tete biderkevtin, yê ku wî di pişt re nivîsteke pir hêja û bi nex ve bi zimanê Ingilîzî ve li jêr navnîşana "Journey among Brave Men, Little Brow & Co. Boston USA 1964 de date binivîsandin. Dana Simis di rêya Surî de û bi alîkarîya Ekremê Cemîl paşa ve û bi hevaltîya wî ve ji bona Kurdistanê Iraqê pir bi dizî ve hate biderbasbûn û ew bi Rojnemevanîyê giringîyî Biyanîyî pêşî ve tete biderkevtin, yê ku wî pêwendî ligel şureşê de date bîkirin û herwehaji raportekî pir giring di rojnama xwe de li ser Kurd de date bibelavîkirin.

Ev xweşxuwana hanêyî pir dirêj wî di rêya hatina xwe de ji Pirag ji bona Monîx di tirênê de date binivîsandin, ya ku ew bi xweşxuwaneke pir bilind û bi nav û deng ve li ser Kurd de hatîyê binivîsandin, ku têde tevaya têgihîştina Şiyarvanên Ereb li ser pîrsa Kurd û pêwistîya piştgirtin û çarekirina wî dide biderxistin. Jibervêjî ve Cewahirî jî bi durujmê Dostaniya miletê Ereb û Kurd ve tête biderkevtin. Cewahirî wetov pir ji miletê Kurd didate bihizkirin; bes û bi tenha ve jiber ku wî weha deha ji miletê xweyî Ereb re didate bihizkirin.

Cewahirê ev xweşxuwana xweyî hanê bi dengê xweşî zelal ve di kongirê de ji me re date bixwendin û kulavekî neqîşkirî bi navê Kurdistanê ve li ser serê wî de dihate biderkevtin û ew kulavê hanê ji bal Celal Talebanî ve jêre hatibû bidiyarîkirin û bigir ew hergav li ser serê wî de dihate biderkevtin û wî pir ji wî kulavê xwe didate bihezkin. Gava ku wî ew xweşxuwana xwe di danê piştîvro de ji me re date bixwendin, tevaya derd û kulên me di nava wan bêhnên xweş de dihatin bijibîrakirin. Hemû Endam û mêvanên Gongirê pir bi wê xweşxuwana wîna ve hatin bidilşadîkirin û hêvîya wan ji bona azadiyê, serbestiyê û serxwebûna Kurdistanê hate biberz û bibalakirin. Herwehajî di vî kongirê hanê jî de Celal Talebanî jî hatibû biamadekirin û wî jî bersîveke pir xweş û bilind li ser vê xweşxuyanîya xweş de date bikirin û bi navê Miletê Kurd ve wî pir sipasî Cewahirî Mîrê Mîrên Xweşxwevanan di cîhana Ereb de date bikirin û ew bi durijmê dostaniya Kurd û Ereb ve date biderxistin. Di piştî gotina Celal Talebanî re bigir piraniya Amdevanan dest bi xwendina Xweşxwevanan û Pexşanan dane bikirin, Tanî ku yekekî ji Amadevanên kongirê date bigotin, ku hola vî Kongirê hanê bi Bazara Ukaz ve êtir tête biderkevtin.

## Hatina Basîyan ji bona ser Deshilatîyê

Wergêkirina Basîyan di 8. 2. 1963

Di 8 reşmeha sala 1963 de şovînzma faşîya Erebi rêjîma Abdul-Kerîm Qasim bi wergerîneke sipahî ve date birûxandin û sustêma faşîyî Erebi li Iraqê de date bidanîn; jiber ku ew pir hatibû bilawazîkirin. Abdul-Kerîm Qasim bi du nexweşîyan ve hatibû bikevtin. Yekek jê nexweşîya meznahîyê bû û ya din bi nexweşîya nezanîya cewhera siyasetê ve dihate biderkevtin. Wî dost û dujminên xwe bi hev re didatin biveguhertin û agir di nava wan de didate bivêxistin, da ku ew xwe ji şerên wan bide bivegirtin û biparastin û wan xwe bi xwe ve bi hevdû ve bide bimijûlkin û bikokirin.

Ev herdu nexweşîyên hanê di her zemanekî de û li nik her Serdarekî de bi bê derman ve têtin biderkevtin û ew di encamê dawî de serê xwedîyê xwe didin bixwarin û wî ji gorepana siyasetê bi darê zorê ve û bi hinera qanûnên jînê ve didin bipengizandin.

Ji alîyê din de Abdul-Kerîm Qasim ji xwe re nedidate bizanîn, ku ew ji bal hêzên siyasîyî kêrdarên pevçûnkirî de ligel hevdû de li Iraqê de bi bûkeke pepûkîyî pir pufdayî ve ji bona yarikirina pê li gora qazanc û berjewendîyên xwe de ji bona ser textê siyasetê bi neçarî ve hatibû binardin û wan pê ji xwe re li gora dilê xwe de û ji bona qazanc û berjewendîyên xwe didatin biyarîkirin. Wî li valî û li walf de çep û rast bi bê agehdarî ve di jîyana xewin û nigaşan de li ser wî textê hanêyî hejandî de li bin pê de bi xwe ve lotik didatin bidan û wî ji xwe re bes û bi tenha ve didate biqîrkin û biqîjkin: Ezim, Serko bi tenha xwe ve, bi tenha xwe ve têtin biderkevtin; belê ew ne bi Serokê bi tenha xwe ve bi rastî ve dihate biderkevtin; lêbelê bi rastî ve ew bi rast û durust ve bi Şetê zeman ve dihate biderkevtin. Wê çaxê, wê gavê tevaya bedbextîya miletan di mêjûwê de hatîye biderkevtin, gava ku Şetên wetov bi Serdarên wî veyanjî bi Rêberên wî ve têtin biderkevtin.

Wetov pir bi hêsanî ve ev kesê bê kes û kûs û Şêtê zeman ji ser textê siyasetê de hate biavêtin û bipengizandin û li ser sergoyê mêjûwê de ew hate bidanîn. Ew bi nala Qehremanekî ve ji bona ser textê mêjûwa siyasî de bi saya vêxistina şûreşa 14 tîrmeha pîroza sala 1958 ve hate biderkevtin, lêbelê ew bi nala pepûkekî ve, bi nala dînekî, hîç û pûçekî ve ji bona ser sergoyê mêjûyê hate bipengizandin û têde û li ser de hate bicî û biwarkirin. Evaya bi dawîya destana nezanîya wî û şêtbûna wî ve bi xwe ve hate biderkevtin.

Vê rêjîma faşiyî hanê di 10. 6. 1963 de <sup>28</sup>ji nuh ve ne bes tenê hêrîşeke pir giran û mezin ji bona ser Kurd date birakişandin, lêbelêjî pêrejî wê didate bixwestin, ku ew hemû hêzên demokrat û welatperwerên Erebi jî ji rehan de bide biqirkirin. Wê bêtir ji 10 000 Komonist datin bikuştin û 120 000 Merov dane bigirtin; jiber ku şovîni û faşîya Erebi bi tirina Emerîkî ve ji bona ser destên desthilatîyê hatibûn bigihandin, mîna ku wan wetov ji xwe re didatin bigotin. Wan hêzên Nasirî û milîyîni dinî Erebi jî ji ber xwe de dane birakirin û ew pir bi hovî ve dane biserkutkirin. Di wê çaxê de wan xwe ji bona nemankirina Kurdan dane bivalakirin û bi amadekirin û wan dest bi hêrîşa xweyî dir û hov ve ji bona nemankirina Israila duwem dane bidestpêkirin.

Ji xwe re li vê derê de bi dûr û dirêjî ve li daxuyanîya Partîya Demokratî Kurdistan de di 11. Axlêva 1963 de li jêr vê navnîşana hanê de: „Çeteyên Basîyên Serdar di Iraqê de li ser melitê Kurd de cengeke gemarî didin bidadan“. Di vê daxuyanîya hanê de bi dûr û dirêj ve partî tevaya pêwendîyên ligel Basî de ji 10. 2. 1963 de tanî vêkevîna şer bi dûr û dirêjî ve dide binivîsandîn û herwehaji têde ew tevaya pêrabûnên Basî bi dijî Kurd ve di wê daxuyanîya xwe de dide bitomarkirin û herwehaji ew têde tevaya siyaseta Basî didin biderxistin. Di vê daxuyanîya hanê de bi êşkere ve tete biderkevtin, ku Basîyan bes û bi tenha ve xwe ji bona şer didatin biamadekirin û wan ji xwe re didatin bixwestin, ku ew ji xwe re piçekî ji demê kar bidin

<sup>28</sup> Cercis Fethulah di nivîsta xweyî pir hêja û binerx de bi zimanê Erebi ve: Serdanek ji bona mêja nêzîkde, r. 120, Sutokholm sala 1998 de dide bigotin, ku er rast û durust di 15. 6. 1963 de dayite bidestpêkirin.

biwergirtin, tanî ku ew xwe bi rêk û pêktir ve ji bona cenga ser Kurdistanê de bidin bikarxistin. Herwehaji tede tete binivisandin, ku Kurd ji dil û can ve didatin bixwestin, ku ew pirsaxwe bi şeweyekî aştî ve bidin biçarekirin; belam Basîyan di pêşîya pêşî de biryara vexistina cengê li ser Kurd de ji xwe re dabûn biwergirtin û wan bi cengê ve didatin bixwestin, ku ew şureşa kurd û pirsaxwî bidin binemankirin û Kurdistanê ji xwe re bidin bierebkin û Israîla Duwem ji xwe re bi nimûna nemankirina Israîla Yekem ve bidin bikin.

Herwehaji Komela Xwendevanên Kurd careke din di cotana sala 1963 de daxuyanîyek bi navê komitîya bi rêvebirina giştî ve date biderxistin. Em van dêrên hanê jê didin biwergirtin û didin bitomarkirin: „Şerê vêkevtî di neha de di nava Kurdistanê de ji bona Partîya Basî bi rastî ve û ne ji bona miletê Erebi merd „bi şerê man û nemanê ve“ tete biderkevtin, mîna ku ev li ser zimanên Rêberên wêyî Serserî de hatîye biderkevtin. Bes û bi tenha ve çarenûsek çavdêrîya partîya Basî dide bikin, ew jî bes û bi tenha ve di mirîna wêyî mayî de ne bes tenê di Iraqê de lêbelêjî di tevaya cîhanê Erebi de tete biderkevtin“.

„Înên tên dê bêtir û bêtir bidin biderxistin, ku Rêberên Bas di pêşbînî û texmînên xwe de hatine bişaşkirin û herwehaji dê çiyayên Kurdistanê pir bi xurtir ve vê û bi deha ve bi sengîntir ve ji hêzên wanî harbûyî û pasevanên wanî faşit ve bêtin biderkevtin“.

Ev rastîya hanê careke din ji me re dide bixuyanîkirin û bidubarekirin, ku miletekî azad miletekî din bi bin jêdestên xwe ve nade bikin. Wê hêrîşeke mezînî giranî hov û dir bi bê nemûne ve di mêjûwa Iraqê de li ser hemû hêzên demokrat, pêşverû û welatperwerên Erebi de date bidadan. Tevaya Iraqê bi zindaneke mezînî tarî ve ji bona hemû hêzên pêşverû, demokrat û welatperwer date bikin. Kîna tîbûna wêna bi xwîna van Welatperwer û Demokratên Erebi ve nehate bişikenandin; jibervêjî ve careke din şovînîzîm û faşîya Erebi date bixwestin, ku ew ji nû ve hêrîşeke gewreyî bi dir û hov ve ji bona ser Kurdistanê bide birin, da ku ew tede ter û hişk bidin bisûtandin û Israîla Duwem ji ser rûwê zemînê bide bihilanîn.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de ji bona hemû hêzên pêşverû û demokrat li seranserî cîhanê de date bixuyanîkirin, ku ev

hêzên faşîyên Basîyên Iraqî, zarok û sêweyên Efleq, ev kotî û keçelên mêjûwê, yên ku ew ji bona ser serdariyê bi tirina Emerîkî ve hatine bihatin, ne bes tenê bi dijî Kurd ve têtin biderkevtin, lêbelê jî ew bi dijî milletê Ereb jî ve têtin biderkevtin. Herwehaji pêrejî ew bi dijî hemû hêzên pêşverû û demokratî ve bi giştî ve di Rojhilata Navînî de têtin biderkevtin û ew di encamên dawî de metirsîyeke mezin û giran li ser aşîtyê û aramiyê de di Rojhilata Navînî de didin biderxistin.

Herwehaji Partiya Demokrat Kurd li Surî de di rojnama organa xweyî Dengê Kurd de di tîrmeha sala 1963 de di ser gotara xwe de di bin nav û nîşana "Li ser rastîya daxwazên Kurd de di Iraqê de" bi dûr û dirêjî ve li ser siyaseta Basîyên Efleqî de li Iraqê de ji bona nemakirina Kurdan li Kurdistanê Iraqê de dide biaxivtin û herwehaji ew li ser siyaseta Basîyên Efleqî Surî de ji bona yarmetîya Basîyên Iraqê de bi xwarin û vexwarinê ve, bi çek û teqemenî ve herwehaji bi rêkirina sipahên xwe ve ji bona qirkirina kurdan di nava Kurdistanê Iraqê de dide binivîsandin. Herwehaji wan li ser pêrabûnên Basîyên Efleqî de bi dijî Kurdên Surî ve ji girtinên bi komel ve û azardana bi hovîti ve ji bona xelkên bê guneh ve dane bidestpêkirin. Li Kurdistanê de Siphayê Basîyî faşî dixwestin Kurdan bidin biqirkirin û li Surî de Basîyên hovberên Efleqî dest bi Erebkirina heremên Kurd ve dane destpêkirin<sup>29</sup>.

<sup>29</sup> Di tûndbûna pêrabûnên Basî de bi girtina bi sedan ve ji Kurdan û gerandina bi hezaran ve di nava mal û xaniyên Kurdan de û azaradan Pîr û Kalan, Pîrek û Zraokan tevaya hovberîya Basîyên faşî dihate biderkevtin. Tirs û saweke pîr mezin bi van rabûnên xweyî dir ve Basîyan di nava Kurdan de dane bibelavkirin, yên ku ew bidijî her mafeyekî qanûnî û merovanî ve dihatin biderkevtin. Girtina her qawinekî bi sitiranên Kurdî ve yanjî her pelekî nivîsandî bi zimanê Kurdî ve Xwediyên wan ji bona bènê zindananê faşîyên Basî dihatin biavêtin. Belê Dadgehên Lêgerandinên sedsalên navanî di nava welat û milletê me de li Kurdistanê Surî de li ser destên Zarokên Omer de careke din di nava Kurdistanê rengîn de hatin bipêkhatin. Wan jî mîna Dadgehên Lêgerandinê di Sedsalên Navînî de û herwehaji nala Nazîyên Elmanî ji sala 1933 de hemû Nivîstên bi bê dilê xwe ve didatin bisûtandin û Xwediyên wan ji bona binê zindanan û azardanê de didatin birêkirin.

Mala me ji tîrsa Dadgehên Lêgerandinên Sedsalên Navînîyê Basîyî faşî de hemû nivîstxana min bi nivîstên Kurdîyî civandî de û pîr bi nex ve ji bona nava binê tenûrê datin biavetin.

Şerekî ne rew a û dir û hov bi bê nimûne ve tanî wê demê li Kurdistanê de hate bidestpêkirin. Basîyên faşî datin bixwestin, ku ew tevaya Kurdistanê Iraqê li dû xwe de bidin bisûtandin; belê wan didatin bixwestin, ku ew gelê Kurd li ser rûwê zemîna Kurdistanê de bi carekê ve bidin bihilanîn. Bi saxî ve bi sedan ve ji Zarokan, ji Manalan, ji Pîrek û Zilaman li bajarê Sulêmanîyî qehreman de didatin bibinaxkirin û bi saxî ve ew didatin biveşartin. Wan Qertelên Merovxwerên Basîyan bajar û gundên me, zom û warên didatin bişewitandin û bitextkirin. Lêbelê nigaşê Basîyên Eflaqîyî faşî bi vala ve dihatin biderkevtin. Xebata milletê kurd, ya ku ew bi hezaran sal ve di dirêjbûna mêjûwê de ji pêle Somerî de ji berî bêtir ji pênc hezar sal ve bi xurtî ve ji bona man û nemanê, ji bona hebûnê û jîyanê, ji bona azdîya Kurdistanê û serxwebûna wêna tête bikin, dê ew ji bal Basîyên sêwên kotîyên mêjûwê de nêyete bidawîkirin; lêbelê xebata milletan di tevaya serpêhatîya dirêjî tirşî talî mêjûwa merovanîyê de di bin nîr û zînetên wisayî dir û hov ve her û her hatîye bigûr û bigeşkirin û ew bi serkevtin û serxwebûna welatê xwe ve hatîya bitac û bixelatkirin û Dujminên wehayî dir û hov ji bona ser sergôyê mêjûwê bi hinera qanûnên jînê ve hatine bipengizandin û ew li wêderê de hatine bicî û biwarkirin.

Vê xebata hanê, ya ku ew her û her bi qehremanî û mêrxasî ve hatîye bikin, ya ku pê milletê me di dirêjbûna mêjûwê de li ber xwe de dayite bidan, di encamê dawî de li ser destên Pêşîyên meyî Mêdîyan de piştî xebateke pir dijwarî bi hezar salî ve bi beramberî Şahînsahîya Aşûrî ve der sala 512 berî zayînê de Babilon û Nineva datin birûxandin. Herwehajî Pêşîyên meyî Kardoxî derdekî pir giran di sala 401 berî zayînê de bi ser serê Serleşkerê Zeyzefonê Yunanî ve di derbasbûna wî de di nava Kurdistanê de dane bianîn, ya ku ew di

---

Gelo milletek di seranserî mêjûwa xwe de rojekê ji rojan bi sazmenîyeke wetov ve bi nala sazmenîya basîyên faşî de dikarîbû bihata biserkevtin? Min di jîna xweyî kurt de û di xwendakarî û lêveneradina dûr û dirêj de di tevaya mêjûwa merovanîyê de carekê ji caran ji ji xwe re nedayite bidîtîn, ku sazmenîyeke hovî mîna sazmenîya Basîyî faşî di encamê dawî de hatîye biserkevtin; lêbelê hêjirbêtir di seranserî mêjûwa merovanîyê de sazmenîyên wetov nala Basîyên faşî di encamê dawî de ji bona ruxandina û herifandina dewleta xwe dane bikarkirin.

mêjûwa yunanî de di nivîsata Zeyzefon de di „Veğerandina Dehhezarn“ de bi dûr û dirêjî ve hatîye biniovîsandin û bitomarkirin.

Basîyên faşîyên sêwî û zîçên Efleqî ji xwe re didatin bixwestin, ku ew Kurdistanana meyî sipêhî û ciwan bûka Rojhilata Navînî û dergûşa şahrestanîya merovanîyê bidin bikavil û biwêrankirin û pêrejî meletê Kurd li ser rûwê zemînê de bidin bihilanîn, ku careke din nav û nîşana Kurd û Kurdistanê bi ser zimanan ve neyête bikevtin.

Miletê Kurd bi qehremanî û pehlewani ve di bin Rêberîya Partîya Demokratî Kurdistan de bi Serokîtiya Barzanî ve li ber man û nema xwe de di sedsalê bîstan de didate bidan. Hêzên pêşverû û demokratên Erebi û herwehaji hêzên pêşverû, demokrat û aşîtxwaz li seranserî cîhanê de û bi taybetî ve hêzên dewletên sosyalistî ve di bin Rêberîya Sovvyête mezin de bi xurtî ve piştta gelê Kurd di vê roja teng û tarî de di mêjûwa Kurdistanana me de datin bigirtin.

Sovyêta mezin di huşyarîya xwe de ji bona Iranê, Turkî, Surî û iraqê de di sala 1963 de bi xurtî ve date bixuyanîkirin, ku ew bûyînên li bakurê Iraqê de têtin bikirin, yê ku ew li nêzîka sînorên Sovyête de bi dijî milletê Kurd ve têtin bikirin, ew metirsîyekê ji bona ser asayîş û berjewendîyên welatê Sovyêtê dide bixistin. Ew divên bêtin birawestandin. Em bi destgirtî ve bi beramberî wan ve nayêtin birawestandin.

Bi piştgirtina dewleta Sovyêtî ve di 2 tîrmeha sala 1963 de Komara Gelêrîyî Mengolî date bibiryarîkirin, ku ew tawankarîya qirkirina milletê Kurd ji bal serdarîya Iarqê de ji bona ser civîna Heştdehî hatîyî ji komkirina giştîyî Yekitîya Netewan de di vê salê de bide bianîn. Herwehaji pêrejî di 9 tîrmeha wê salê jî de Serokê Şanda Sovyêtî pirsra Kurd ji bona ser civîna 36 ji Civata Aburîyî û Civakîyî Yekkirtina Netewan de di dema civîna de bi nala deqekê ve ji bona li ser axivtina wê de date bipêşkeşkirin û li ber destên wê de date bidanin, ku „Serdarîya Komara Iraqê li ser siyaste qirkirinê de beramber bi milletê Kurd ve tete biçûyîn“.

Ev tevde bi hev re ji bona piştgirtin û parastina milletê Kurd ji qirkirinê de dihatin bikirin, di dema ku Surî leşkerê xweyî Yermûk di bin Rêberîya Fehed El-Şair de di hewara Basîyan de ji bona ser qirkirina Kurd dabû binardin û ew di 28. 10. 1963 de di şerê Fişxabûr



û Bêxêr de ligel sipahê Iraqê de bi dijî Kurdan ve hate bibeşdarîkirin<sup>30</sup>. Ev leşkerê Basîyî faşîyî bi paye ve ji bona qirkirina Israîla Duwem bi serbilindî û serkevtî ve weha xwe ji bona nava Kurdistanê de didate birakişandin. Wî weha ji xwe re didate bibawerîkirin, ku dê ew di nava Kurdistanê de ji xwe re bi seyranekê ve bête birabûn. Lêbelê Pêşmergeên Qehremanên hevî , vîn û evîna Kurdistanê Pehlewanên mîna Hurmuzê Aşûrîyî Qehremanê Pêşmergeê Kurdistanêyî bi bê hempa ve bi canê xwe ve fêrkirineke mêrxasîyê bi bê nimûne ve ji bona Pêxwasên, Serwanên Huştirên Tazîyên Basîyên faşî dane bidan, ku leşkerê Yermukê di nava xaka Kurdistanî pakî perest de hate bitar û bimarîkirin. Bi sedan ji wan ve hatin bikuştin û pir çek û teqemenî li dû xwe de di gorepana şer de datin bihiştin û herwehaji bi dehan ve bi Dîl ve bi destên Pêşmerge ve hatin bikevtin û pir ji yên mayî ve ew hatin bibezandin û di Turkî re hin ji wan de dihatin biderkevtin. Ew bi darê zorê ve careke din bi ser şorî ve, belam vê carê bi dizî ve ji bona nav Surî hatin bivegerandin. Navên pehlewanên Kurdistanê Pêşmergeên Baraznî li seransî dunyayê de careke din mîna navê Selah Eldîn dihatin biberz û bibalakirin û navê pêxwasên faşîyên basîyên Ereb dihatin bigemarîkirin; jiber ku ew ji bona nava Kurdistanê de di bin wî durûjmî de hatibûn biçûyîn, da ku ew Israîla Duwem bidin biqirkirin.

Fehed El-Şair û Mohemed Teleb Hilal Fîsfîs Pehlewanên Basîyan ne bes tenê bi rûsarî û rûreşî ve dihatin biderkevtin; lêbelêjî hêjî bi bêtir ve ew nala hemû Basîyên faşî ve ji bona qirkirina Israîla Duwem de bi rast û durust ve bi Dizên şekalên xwe ve dihatin biderkevtin. Di dema ku Hurmuzê qehremanê Pêşmergeê Kurdistanêyî bi bê hempa ve, mîna ku Barzanî ew didate binavkirin, bi tîp û dêrên zêrînî ve nav û nîşanên wî di nava bextê rûpelên mêjûwa Kurdistanê de tete bitomarkirin<sup>31</sup>.

<sup>30</sup> Ji xwe re di vî babetê hanê de bi dûr û dirêjî ve li nivîsta Circis Fethulah: Serdanek ji bona mēja nêzik de, r. 80, Sitokholm sala 1998 de bidin bitemaekirin.

<sup>31</sup> Di dawîya havîna sala 1970 de Dara Tewfîq li ser Hurmuz de ji me re date bigotin: ku Barzanî jê re dayite bigotin, ku heger rojekê Pêkerêk ji bona Pêşmergeên Kurdistanê de bête biçêkirin, divê ew Pêkerê hanê bes û bi tenha ve bi Pêkerê Qehremanê Hurmuz ve bête biderkevtin.

Hemû Serşorên Efser û Serbazên Yermuk di pêşandaneke sipahîyî gewre de li bajarê Şamê de bi mîna Pehlewanan ve ji bal Serokê Dewleta Surî de General Amin El-Hafiz di 10. 1. 1964 de hatin bipêşewazîkirin û ew roja hanê bi mîrî ve bi nala „the most glorious day ever lived by the Arab Syrian people“ - pîroztirîn roj ve di seranserî mêjûwa miletê Erebi Surî de hate bipesinandin-. General Amin El-Hafiz Serokê Surî ligel serdarîya xwe de Fehed El şair, Efser û Serbazên wî bi nala Qehremanên bi serkevtî ve pêşewazî li wan de dane bikin. Di bersîva xwe de General Fehed El-Şair ji bona General Emin El-Hafiz date bigotin û wî date bidubarekirin, ku spahê wî „had clean large areas of this eternal part of the Arab Fatherland which in Northern Iraq, from the separatist Barzani bands“ -topraxeke mezin ji nava xakê welatê Bav û kalên Erebi de di Jorî Iraqê de ji nava destên Çeteyên Cihêvanê Barzanî de date bipakkirin-. Wî hêjbêtir date bigotin: „The Kurds in the Arab Fatherland enjoy all rights of citizenship but could have no special rights“ -Kurd di nava welatê Bav û Kalên Ereban de ji wan re hemû mafeyên Nişinwanîyê têtin bidîtin, lêbele dê tu carî ji wan re mafeyekî bi taybetî ve neyête biderkevtin-<sup>32</sup>.

Di dawî de General Emîn El- Hafiz singên wan Fisfis Qehremanên xwe bi xelatên nişanên mêrxasîyê ve datin bixemilandin; jiber ku li Surî de weha bi reweşt ve dihate biderkevtin, çend Efseran ji ber Dujmin bidana bibazdan, weha deha singên wan bi xelatên nişanên mêrxasîyê ve dihatin bixemilandin û bêtir pileyên payedarîya

<sup>32</sup> Ji xwe re bi dût û dirêjî ve di vî batê hanê de: „Intervetion of the Syrian Army“ - destdirêjîya sipahê Surî- di nivîsta Ismet Şerif Wanlî de bi zimanê Ingilîzî ve: „The Revolution of Irakî Kurdistan, Part I, (From September 1961 to Desember 1963), r. 44- 47, Puplished by the Committee for the Defense of the Kurdish People’s rights, (Kurdish Representation) Apri 1965, bidin bitemeşekirin.

Ev yekek ji nivîstên pir bi nerx ve li ser şûreşê de bi zimanê Ingilîzî ve ji Ilula sala 1961 tanî befirbara sala 1963 de têtê biderkevtin. Ew bi şeweyekî zanistîyî pir bilind ve li ser vê pêla şûreşê de dide biaxivtin. Kêm Kesan tanî neha wetov bi zanistî ve, bi kurtî û givaştî ve mîna Ismet Şerif Wanlî li ser vê pêla hanê de dayite binivîsandin; jiber ku Ismet Şerif Wanlî yekek ji gewretin karnasên pîrsa Kurd û mêjûwa Kurd û Kurdistanê ve têtê biderkevtin. Ew pir bi dût û zanistî ve pêşbînîyê ji bona çarekirina pîrsa Kurd di serxwebûna Kurdistanê de û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve di Rojhilata Navînî de dide bidîtin.

wan dihatin bibilindkirin. Ji bona nimûne di şerê Ereban û Cuhana de der salên 1967 û 1973 de di nava hîç sipahekî de di vê dunyayê de mîna di nava Sipahê Suriyî Efleqî de wetov nişanên mêrxaniyê û pilêyên Payedariyê hatine bilevakirin, ne jiber ku ew bi gernasî û mêrxasî ve beramber bi Dujminên xwe ve hatibûn birewestandin, lêbelê jiber ku wan bi bê nimû ne di mêjûwa sipahiye de ji ber Dujminên xwe dabûn bibazdan. Cudabûn di nava wan herdu şeran de li nik Sipahî Surî û Misrî de dihatê biderkevtin, ku Sipahê Misrî bi pîrbûn ve destên xwe ber bi Xwedê ve didatin bibilindkirin û xwe didatin bidîlkin û Sipahê Surî xwe bi lez û bez ve ji rasta şer de didatin biderxistin û ber bi bajarê Şamê ve didatin bibeşdan. Wan wetov ji dil û can ve bi mîna Kal û Pavpirên xwe ve didatin bibawerîkirin, ku rev bi nivê mêranîyê ve têtê biderkevtin. Dibe, ku ev taktîka şer di nava biyabanîya Ereba de bi sûd ve bihata biderkevtin; lêbelê ew di şerê nava Kurdistanê de beramber bi Pêşmegên Qehreman ve û himjî di şerê Felestînê de bi beramberî Sipahê liberxwedanêyî Israîlî ve nebes tenê bi rûsarî û şermezarî ve dihatê biderkevtin, lêbelê hîjbêtir ew li ser serên wan de bi destanekê ve dihatê biderkevtin û ew ji wan re di encamê dawî de bi rewêşt ve dihatê biderkevtin. Bi Kurtî ve sipahekî wetov pir bi dir û hov ve û bi bêqam mêrxas ve bi beramberî Menal, Zarok, Pîrek û Rîsipîyan ve dihatin biderkevtin, lêbelê ew bi beramber Dujminekî Çekdarî mîna xwe ve bi pîsî ve dihatin biderkevtin û her û her rev û bez ji wan re bi pişk û par ve dihatin biderkevtin. Merov bi rastî jî ve bi beramberî Dujminên wetov ve bi şermezar ve têtê biderkevtin, jiber ku hîç mêrxasiyek têtê ji bona bezandina Dujminên wisa nayête biderkevtin; jiber ku ew bi xwe ve ji bona bezê ji rasta şer hatine bidakevtin. Kurd bi vê rastîya hanê ve di bezên sipahên Ereba de bi beramberî sipahê Israîlî ve hinekî li mêrxasiya xwe de dihatin bigûmankirin.

Cento û Nato di rêya Iran û Turkîyê de didatin bixwestin, ku ew vê şûreşa hanê bidin bitemirandin. Şah û Turkan di sala 1963 de leşkerên xwe ji bona ser tuxûbên Kurdistanê de didatin bicivandin. Wan çavên xwe ji bona hêrîşekê li ser Kurd de didatin bibelkin. Herwehaji wan Encumeneke hevkarîyê ligel Basîyan de li bajarê Musilê de dane bidurustkirin.

Di 20. 8. 1963 de Izgeha Dengê Kurdistan di cara pêşî de date bidestpêkirin. Wê tevaya derd, kul û hêvîyên miletê Kurd bi rast û durustî ve ji bona tevaya bîr û bawerîya cîhanê ve date bigihandin; jiber ku Serdrarên Rehperestên Dagîrkerên Iraqê mîna hemû dagirkren Kurdistanêyî din perdeyeke pir giran û mezin ji agehdarî û ragiyandinên li ser miletê Kurd de dabûn bipoşandin.

Ev Izgeha hanê bi saya dewleta Sovyêtê ve bi şûreşê ve hate bigihandin. Berî vêna der sala 1962 de Izgehekî biçûk li Ewropa de hate bikirin û ew ji bal Rêxistina Partîya Demokratî Kurdistan de li Ewropa de bi destên Fadil Gênc Elî, Şewket Hesên û Ehmed Neqîb ji Elmanya Fêderalî de di bin pir merc û zînetên dijwar de bi Otombêlekê ve ji bona Istenbolê hate bibirin û wan ew ji bona wan Kesên nîşankirî dane bidan û di paş re ew careke din ji bona Elmanya hatin bivegerandin. Belam ew Izgeha hanê ji bona Kurdistanê nehate bigihandin û ew bi rê ve di ketina nava avê de hate bipûçkirin.

Di vekirina vî dengê pîroz de Dengê Kurdistanê de bi gotinekê ve ji bal Barzanî de hate bivekirin, ya ku ew ji bal Serheng Dr. Seyid Ezîz Şemdînî de di piştî wergerandina wê de ji bona zimanê Erebi têde hate bixwendin.

Jiber giringbûna mêjûyî vê gotina hanê de ez wê careke din ji zimanê Erebi ji bona zimanê Kurdî zaravayê kurmançî didim biwergerandin; jiber ku nivîsandina wêyî kurmançî li nik min de nayête bidîtin.

Gotina Barzanîyî mêjûyî di vekirina Dengê Kurdistanê de:

„Miletê Kurdî xweşevist!

Berî her tiştî ez vê Izgeha hanê bi navê Xwedawendê Bilindî Hêja didim bivekirin û ez niyazmendim, ku dê ew ji bona me alîkarîyê bide bidiyarîkirin, da ku em li pênavê mafe, dadwerîyê û rastîyê de bêtin biserkevtin.

Xweşk û birayên hêja!

Di nava van zînetên hanê de Dujmin hêrîşeke bêbext û hovber ji bona ser miletê meyî Kurd dide bikirin, ez ji we tevan ji her car pêtir ve parastîna yekîtiya weyî welatî didim bidaxwazîkirin, jiber ku yekîtiya welatî bi bingehekî xurt ve û bi hîmekî binge hî ve ji bona her bî serkevtineke we ve têde biderkevtin; jibervêjî ve erek li ser tevaya Welatperwerên Kurd de dide bineçarîkirin, ku her yek ji wan di şerê

man û nemanê de bidin bibeşdarîkirin, yê ku têde miletê meyî Kurd xwe di nava agirê wî de dide bidîtin. Dujmin qirkirina miletê Kurd û talankirina welatê wîyî Kurdistanê dide biarmanckirin. Wî hîç rê li ber tu Kesekî de nedate bihiştin, ku ew bi bê alî ve bête birawestandî; jibervejî ve divê li ser her Lawekî pakî vî welatê hanê de bi mal, can û xwîna xwe ve di beşdarîkirina vê şûreşa hanê de tu çavtengayekê nede biderxistin.

Birayên hêja!

Ji vir û derewên Dujmin nedin bibawerîkirin û ji giv û bivên wî nedin bitirskirin. Pir li li ser xapandin û fenên wî de wiryabin; jiber ku ev Keleşên hanê bi Dûndên pêşiyên xwe ve ji çepelê Qasimê gor bi gorkirî ve têtin biderkevtin. Xebata meyê hîmkirîyî xurt, ya ku wê hêmên serdarîkirina Qasim date bihejandin, dê ew bi yarmetîya Xwedawendê Bilind ve rev û şîkenadîna bi neçarî ve bi Destdireêjan jî ve bide bigihandin.

Birayên Hêja!

Divê ez ji we re nedim biveşartin, ku Basîyên Mêrkuj bi hîç awayekû ve miletê Erebî dost nadin biwênerîkirin; lêbelê ew him bi Dujminê miletê Kurd ve û himjî bi Dujminê miletê Ereb ve têtin biderkevtin.

Xebata hevbeşî di navbera herdu milîyên Ereb û Kurd de bi kevirê goşî ve ji bona parastina serxwebûna Iraqê û avanîkirina rêstikeke demokrasîyî sax ve û ji bona bi cîanîna Ewtonomî ve ji bona Kurdistanê tete biderkevtin.

Debera vîna miletê kurd di xebata wîyî rewa de li pênavê mafeyên wîyî milî de û ji bona Ewtonomî bête biserkevtin  
Herbijî Leşkerê Sûreşgêrê Kurdistan.

Di dawî dawî de hêz ji yekîtîyê de tete biderkevtin û biserkevtin li nik Xwedawend de tete bidîtin<sup>33</sup>.

Herwehajî di vê pêla hanê de Partîya Demokratî Kurdistan bangê ji bona Yekîtîya Netewan, Serokên Dewletan û rêxistinên

<sup>33</sup> Ji xwe re li ser vê gotina Barzanî de di rojnama Xebat de bi zimanê Erebî de, r. 1 û 8 jimar 470, Ilona sala 1963 de bidin bitemaşekirin.

Navdewletî de date birêkirin. Jiber giringbûna vê banga hanê de ez dixwazim wê li vê derê de ji zimanê Erebi bidim biwengerandin û bitomarkirin. Divê li vêderê de bête bigotin, ku tu Mêjû li jêr vê banga hanê de nehatiye binivîsandin û ew bes û bi tenha ve di rojnama Xebat de jimar 470, Ilola sala 1993 de hatiye bibelavkirin. Ev bi deqa vê banga hanê ve tête biderkevtin:

„Banga Partîya Demokratî Kurdistan  
ji bona

Sikretariya Yekgirtina Netewan de  
Civata Asayîşa Navdewletê de  
Serokên Dewletan de

Rêxistinên, Sindikatên Dam û Destgehên Navdewletî de, Rêxistina Xacê Sorî Navdewletî de, Dam û Destgehên Ragiyandinên Cihanî de

Ji du salan de miletê meyî Kurdî aşîtxwaz bi tenha xwe ve li Kurdistanê pêvekirî de ligel Iraqê de xwe di nava cengeke gemarî de dide bidîtin, ya ku ew ji bal Dujmînekî de li ser de hatiye bineçarîkirin, yê ku ew bi baştirîn çekên kuştinê û wêrankirinê ve hatiye biçekkirin; jiber ku miletê Kurd bes û bi tenha ve biçûktirîn mafê ji xwe re dide bixwestin, yê ku ew jê re ji bal mafeyê çarnûs de tête bidan û yê ku ew di mafeyê Ewtonomî de di nava dewleta Iraqê de tête biderkevtin.

Tevejî ku welat ji serdarîkirina Qasimê Diktatorê bi tenha xwe jî ve hate birizgarîkirin û tevî ku hemû pêrabûn û hewildan ji bona çarekirineke aşîtî hatin bikirin, da ku ji bona miletê me hin ji mafeyên wî bêtin bigirawkirin û ceng bête bidawîkirin û aşîtî ji bona welêt û aramî ji bona heremê bête bivegerandin.

Lêbelê Çeteyên Basên faşî serdarîkirin bi tenha ve bi destên xwe ve dane bixistin, piştî ku wan di wergêrandina 8 rêşmehê de di rêya siyaseteke sawkiriya zordarî de desthilatî bi destên xwe ve dane bixistin. Wan hîç guh bi dengê hiş ve nedane bidan û herwehaji wan guh bi serpehatiyên mêjûwê ve nedane bidan. Wan tu pêk bi gift û goyan ve nedane bidan, yê ku ew di navbera wan û Wênerên me de dihatin bikirin. Wan ji xwe re di pêla gift û goyan de kês didatin biwergirtin, da ku ew ji nû ve hêzên xweyî westiyayî bidin birêxistin.

Wan ji nişkê ve dest bi şer ve dane bikirin û hwerwehaji wan bi diji hemû yasayên vê dunyayê ve Wênerên me ji bona gift û gokirinê ligel wan de dane bigirtin û Endamên wî bi şeweyekî pir hov û dir ve hatin biazaradan. Herwehaji wan ji nişkê ve dane bidazanin, ku çûn û hatin di hemû bajarên Kurd de dane biqedexekirin, yê ku ew li jêr desthilatiya wê de dihatin bikevtin. Herwehaji wan kuştina her Kesekî Beramber bi bê agehdarîkirin û yanji bi lê pirsikirin dane biderxistin. Di nava vê zîmeta hanê de wan kês ji xwe re ji bona kuştina bi dehan ve ji Neşînvânên bi guneh ve di nava bajarên de û bi sedan ve ji Gundîyên reben ve dane biwergirtin. Bi sedan ve Gundî wan datin bikuştin, gava ku ew di berbanga roja 9. 6. 1963 mîna her car ji bona nava bazarê hatin biçûyîn. Basîyan ew ber bi gulên rêjînkên, top û tankan ve dane bivekirin û ji wan bes û bi tenha ve di bajarê Sulêmanîyê de 267 Kes hatin bikuştin. Herwehaji mal û dukan ji hatin bitalankirin û biwerankirin û ji bona binê zindanan û axuran de bêtir ji 15 000 girtî hatin biavêtin û ew tûşî dir û hovtirîn rengên azardanîkirinêyî vejandî ji bal hişê Basîyî faşî hatin bikirin. Ji wê pêla hanê de û tanî neha de welatê meyî Kurdistanê ciwan tûşî hêrişên asmanîyî pir ji bal balafirên cudan de têtê bikirin, yê ku ew di nava diyarên wê de agir, mirin û werankirinê didin bibelavkirin. Ew bê gunehan ji Pîr û Pîrekan ji Zarok û Menalan didin bikuştin. Ew zevî û benderan didin bisûtandin. Ew mal û keşkan li ser serên Rûniştvanên wanî bê çek û reben de didin biherifandin. Ew terş û cenaweran didin biqirkirin. Belê ev cenga qirkirinê ji bal hêzên Ahrumend de hêzên mirinê û wêrankirinêyî Çetên Basîyî Serdar de li Begdadê de li ser Kurdistanê de bi bê cudanbûn ve têtê bidadan. Tevî li vê hêrişa Hêtlerîyî Basî jî de ji kuştinê û werankirinê jî de serdarî bi hîç regekî ve tu bi serkevtinên xweyî sipahî ve nedane bicîanîn.

Bêdengbûna li ser van serbirinên merovanîyê de û cenga qirkirina bi rêxistî ve bi hîç corekî ve ligel canê serdemê de nayête bilehevkirin, yê ku ew bi remanên merovanîyî pêşkevtî de têtê bidagirtin û herwehaji ew bêdengîniya hanê jî ligel erek û kar û barên avetî ve ji bona ser milên Encumena Yekgirtina Netewan de û ji bona ser peymanê wêna de nayête bilehevkirin û herwehaji ew ligel sozdanên Endamên wê nayête bilehevkirin, yê ku wan rêzêgirtina ji bona rêz û dirên dazanîna mafeyê Merov pê li ser xwe de dane

bisozdan û herwehaji wan dane bisozdan, ku ew xebate ji bona parastina asayise û aramiye bidin bikin.

Miletê meyi Kurd ji bal siyaseta rehperestiya hover de tete biazaradan, ya ku ew ji bal Kelesên Basiyân bi hesin û agir ve li ser wî de tete bicianin. Hegerji ku Basî hêji ji aliye bi rexistinê ve di siyaseta rehperestiyê de li pişt Efriqya Jêrê de tete biderkevtin, lêbelê ew bi şeweyê wêrankirinê ve bi gelekî ve li pêşiya wê de têtin biderkevtin. Wê tax û gerek bi carekê ve li bajarê Kerkukê de datin biwêranikirin û wê xelkên wêyi bi jimara xwe ve bi çil hezar Kurd ve datin biderkirin, bes û bi tenha ve jiber ku ew bi Kurd ve têtin biderkevtin û ew ligel Basiyân de bi tuxum û ziman ve bi cudabûn ve têtin biderkevtin. Di dirêjiya sinore di navbera herema Erebi û Kurdistana Iraqê de serdariye hemû Kurdên aşitixwaz û bêguneh dane biderkirin û ew bi revê ve datin bineçarîkirin, da ku ew jina xwe bidin birizgarîkirin û wan hemû mal û malên xwe ji bona revandinê û talankirinê li dû xwe de dane bihiştin. Serdariye encumenên mirî dane bipêkanin, da ku ew Eşîrên Erebi li şûn û warê wan de bidin bineşinîkirin û da ku ew milk û malên wan Derkevtiyân li ser wan Eşîrên Erebi de bidin bibelavkirin. Herwehaji serdariye bi hezaran ve ji Karmend û kargerên Kurd ji ser karmendi û ji ser karên wan de dane biderkerin û wê bi siyaseta erebkirina faşi ve bi carekê ve beramber bi Kurd û Kurdistanê ve date bidestpêkirin.

Gotina serdariye ku pirsê me bi pirseke navxweyi ve tete biderkevtin, ew bi gotineke vala û hîç û pûç ve tete biderkevtin; jiber ku pir ji Zordaran û Sitemkaran ve xwe bi vê derewa hanê ve dane bigirêdan, da ku ew rê li ber Yekgirtina Netewan de bidin bigirtin û nehêlin ku ew bi erkên xweyi giring ve pê bête birabûn. Tevî li hemû pêrabûnên perîşaniyi ji de bêhêvi ji bal serdariya Efriqya Jêrî û dewletên Impiryali de di Encumena Yekgirtina Netewan ji de bi nehiştina gift û gokirinê ve li ser siyaseta cudabûna di navbera rehperestiyê de bi mehna ku ew bi destdirêjiyekê ve ji bona nava kar û barên hundûrû ve tete biderkevtin, lêbelê Encûmênê ew mehnên hanê date bivegerandin û wê ew siyaseta pêrabûna serdariya Efriqya Jêrî bi dijî beşekî ji Neşînvânên xwe ve bi dijî bendên mafeyên Merov ve date bidanin. Jibervêji ve wê bi erkê xwe ve date biditin, da ku ew sinorekî ji bona wê siyaseta hanê de bide bidanin û Neşînvanan û



Zordarîlêkiran bidin bibaprastin. Weha wê biryarek bi sizadana birîna pêwendîyan bi carekê ve ligel wê serdarîya hanê de date bidan. Weha siyaseta serdarîya Basîyî faşî jî bi dijî milletê Kurd ve li Iraqê de di cewhera xwe de bi siyaseteke rehperestî ve tête biderkevtin, ya ku Kurd li gora wê de ji wergirtina mafeyên xweyî milî de têtin bibêpişkirin û ew ji bona bijavtina di nava milîbûna Ereb de bi darê zorê ve û bi şêweyekî hoberî ve tête bineçarîkirin.

Pêrabûnên serdarîya Begdadê di Kurdistanê de ji siyaseteke kolonyalîyî sitemkar bi hîç rengê ve ne ji aliyên şêwe û armancên xwe ve ji gilîyên derkevî de ji bal hin milletên li jêr kolonyalîyê de bi dijî dewletên kolonyalî ve nayêtin bicudakirin. Magelo jiber ku Serdarên Kurdistanê ne bi Ewropî ve têtin biderkevtin, yanî jiber ku welat bi abûrî ve bi paşkevî ve tête biderkevtin, ku ev bi tenha ve didin bitêrkirin, ku nav bi duxistina kolonyalîyê li ser wan Serdarên Kurdistanê de bête binayînîkirin û bêdengbûn li ser mênkijûyên wan de divê bête bidîtin, di dema ku ew di nava Kurdistanê de bi karî ve siyaseteke kolonyalîyî deha bi bedtir ve û bi hovtir ve ji siyaseta kolonyalîyê de pê têtin birabûn, ya ku ew pir bi dûr ve ji hêjabûnên merovanîyê ve û ji hemû hêjabûnên naskirî ve tête biderkevtin û ew bi gelekî ve bi dirtir ve û hovtir ve ji pêrabûna hovtirîn dewleta kolonyalî ve di berzbûna zordarîya wê de tête biderkevtin? Megelo hîç di nava dunyayê de welatekî kolonyalî destûrê bi sipahê xwe ve dide bidan, ku ew di her bêhnekê de bi xwedanê mafe ve tête biderkevtin, ku ew kuştinê, talankirinê, werankirinê û zindanîkirinê di her bêhnekê de ji xwe re li gora kêfa xwe de bi bêyî hîç sûcekî ve, bi bê hîç navbiduxistinekê ve û bi bê hîç dadgehkirinekê ve bide bikin, mîna ku serdarîya Iraqê ew mafeyê hanê bi sipahê xweyî dagîrkirinê ve di Kurdistanê de li gora fermana komarîyî derkevî de di 9. 6. 1963 de dayite bidan? Hêjibêtir bi serdejî ve li ser şanê Yekgirtina Netewan de tête biderkevtin, jiber ku ew bi şûngera Hevgirêdana Netewan ve tête biderkevtin, li ser milên wê de berpirsiyarîyeke bi taybetî ve beramber bi pîrsa Kurd ve di Iraqê de tête biderkevtin. Jiber ku tête bizanîn, ku Kurdistana jêrînî ango Kurdistana Iraqêyî neha ew bi welatekî ve tête biderkevtin, ku piranîya pir ji xelkên wê ji milletê Kurd ve têtin biderkevtin. Ev Kurdistana hanê ne di nava dewleta Iraqê de dihate biderkevtin, ya ku Ingilistanê ew di nava welatê herdu çeman de der

sala 1922 de date bipêkanîn, lêbelê Kurdistan der sala 1926 de ligel Iraqê de hate bipêvekirin, ya ku ew li ser bingehê biryara Hevgerêda Netewan de li ser bingehê dengdaneke bi nav ve date bikirin, ya ku ew ji bal wê de hatibû bikirin û ew li gora merc û temînîyên Hevgerêdana Netewan de hate bikirin, ji yên ku dewleta Iraqî û Ingilistanê bi hûr ve pê datin bisozdan. Herwehaji careke din ji serdariya Iraqê bi sozên dayîni ve ji nû ve der sala 1932 pê hate birûniştin, gava ku ew bi Endam ve ji bona Hevgerêdana Netewan de hate bigirtin. Lêdana serdariya Iraqê ji bona wan mercên sozdayî û pêrabûna wêna bi şerekî gemarî ve ji bona ser miletê kurd de ji bona erebkirina wîna yanji ji bona derkirina wîna, yanji ji bona qirkirina wîna û kirina Kurdistanê bi beşekî ji welatê Ereb ve û bi bê pêşkirina Kurd ve ji hemû mafeyên wîyî merovanî, demokrasî û milî ve ev hemû bi hev re pir bi tirs ve têtin biderkevtin û hêjbêtir ew bi pêlêbûnekê ve ji bona bîr û bawerîyên Yekîtiya Netewan de, ji bona rewaya mafeyên merov û hêjabûnên sincîyî zalkirî di nava merovan de tete biderkevtin. Hêjbêtir ew bi lêdanekê ve bi carekê ve û bi nayînkirinekê ve ji bona hemû mercên peymanê ve têtin biderkevtin, ya ku li gora wê de Kurdistan bi ser iraqê ve hate bivekirin; jibervêjî ve divê li ser Yekîtiya Netewan de destdirêjîyê ji bona vegeradina mercên wê peymana hanê bide bikirin, yên ku ew li gora canê serdemê û pêşkevtinên demê de dihatin biderkevtin û herwehaji da ku ji bona miletê Kurd mafeyê wîyî bi carekê ve û azadîya wîyî bi carekê ve bête bidan, nebes tenê ji bona bi yekkirina wîna ve ligel Ereb de di nava yek dewletê de bête bijiyandin yanji na, lêbelê ji divê mafe jêre bête bidan, ku magelo ew dixwaze li jêr sîbera serdariya Basîyî neha de Dujmina Ereb û Kurd de bête bijiyandin?

Li ser yên çûyîni de penabûna serdariya Basî ji bona qawîne rizyayî ku cenga qirkirina vêkevtî di Kurdistanê de ji kar û barên wêyî hundurû ve tete biderkevtin û ji mafeyê dewletên aşîtxwaz û pêgirtîyên bi peymana mefeyên merov ve nayête biderkevtin, ku ew wan kar û barên Basîyan di Encumena Yekîtiya Netewan de li ser de bidin bigiftûgokirin. Ev derewên Basîyan di ser miltên dunyayê û dewletên wanî evîndarî ji bona azadîyê û aşîtiyê de weha bi hêsani ve nayête bibuhurandin. Lêbelê çavgirtin ji bal Yekîtiya Netewan de li ser vê birîna merovanîyê de di nava kurdistana Iraqê de û xwe jê

bidûrkerin bi bê guhpêdaneke diyar ve û kêmanîyeke mezin ve beramberî wan erkên hildayî li ser milên wê de ji bona parastina miletan ji zordariyê, ji tirsê û ji sitemkariyê tête biderkevtin. Weha berpirsiyariya mêjûyî û merovanîyê ji her dewletekê Endam de di Yekîtiya Navnetewan de bi xurtî ve tête bixwestin, ku ew sînorekî ji bona vê cenga hanê bidin bidanîn, ya ku ew ji bal serdariya Basîyî faşî de li ser miletê Kurd de tête bidadan û divê ew xweser ji bona yarmetiya vî miletê sitemkêş bi hemû şeweyên alîkariyê ve çî bi çanî ve yanjî bi bojeyî ve bidin bikirin.

Miletê me neha tûşî pîstirîn û firehtirîn hêrîşkirina qirkirinê tête bikirin, ya ku miletek ji miletan di nîvê duwemî vî sedsalê bîstan de pê hatiye bihêrîşkirin. Bi dehan hezar ve ji Pîran, ji Zarokan û Pîrekan têtin bibêcî û bibêwarkirin û li vir û dera hanê de hatine bitar û bimarkirin. Dujmin xanî û keşkên wan dane biherifandin, mal û cihên wan dane bişewitandin û terş, mer û malatên wan dane bikuştin. Ew di nava zînetekê de têtin bidîtin, ya ku ew bes û bi tenha ve bi serên wan kesan ve hatiye bihatin, ji yên ku ew di pêla cenga duwemî cihanî de li jêr bombebarandina asmanî ve ji bala balafirên cengînî ve dihatin biderkevtin. Ew bi pêwistî her rengekî ve ji alîkariyê de têtin biderkevtin, hegerjî çendjî ku ew bi sade jî ve bêtin biderkevtin. Belê ew bi pêwistî dildariya merovanîyê ve têtin biderkevtin, belê hêjbêtir ew bi pêwistî bi gotineke xweş ve ji bal Qencvanan û Merovan ve têtin biderkevtin. Magelo li kû derê de Merovên Xêrxwaz têtin biderkevtin û bidîtin, da ku ew li ber dilên Gorîyên Bombebarandinên asmanîyî tawankarî de bidin bikirin, da ku ew wan ji mirinê ji ber nebûna dermanan bidin birîzgarîkirin, na hêjbêtir ma kanî li kû derê de Encumenên Parastina Cenaweran têtin bidîtin, da ku ew bi dehan hezar ve ji terş û cenaweran ji bal hêrîşên bombebarandina asmanî de li herema Şarezor de ji bona nimûne bidin birîzgarîkirin, jiber ku balafiran bi rêjînkên xwe ve pênc hezar serî ji pez û bêtir ji hezar serî ji bizinan de dane bikuştin?

Em dixwazin ji xwe re bidin bixuyanî kirin, ku hîç li ser rûwê zimînê de hêzek nikare li ser me de bide bizordarîkirin, ku em bi vê rewş û jîyana hanêyî neha ve pê bêtin birûniştin, yanjî dê ew bikaribe rê li ber me de bide bigirtin, ku em li ser xebata xwe ji bona mafeyên xweyî milî û demokrasîyî rewa neyêtin biçûyîn, hegerjî çendjî dema

vê xebata hanê jî bête bidirêjkin û hegerjî çendjî gorîyên wê jî bêtin bigewrekirin. Miletê meyî Kurd dê ji tevaya cîhanê re bide bieşkerekirin, ku ew ne bi kêmtir ve ji milletên din de li ser parastina hebûna xwe de tête biderkevtin û herwehî amadebûna wîna dê ne bi kêmtir ve ji bona liberxwedana mafeyên xwe de bête biderkevtin. Beramberî vê vîna miletî bi carekê ve û beramberî çûna Keleşên Basîyên faşî li ser siyaseta xweyî tawankarî de em ji bona we didin bibangkirin, ku hûn bi lez û bez ve destdirêjîyê bidin bikirin, da ku hûn li ser serdarîya Iraqê de bidin bizordarîkirin, ku ew vê cenga gemarî bîne bidawîkirin û daxwazên miletê meyî rewa di wergirtina ewtonomî de di Kurdistana Iraqê de bide bicîanîn. Herwehî em ji bona we didin bibangkirin, ku hûn biryarekî bi qedexekirina firotina çek, kel û pelên cengêyî din ji bona dewleta Iraqê de tanî bi dawîkirina vê cengê ve bidin biderxistin, herwehî em ji bona we didin bibangkirin, ku hûn temînî û xwestîyên pêwîst ji bona hemû dewletan bidin biderxistin, da ku ew hemû alîkarîyên karînî ji bona miletê meyî Kurdî xebatvan bidin bipêşkeşkin, da ku ew di xebate xwe de ji bona mafeyên xweyî milîyî rewa de û ji bona bi lezbûn û bi dawîanîna azaradariya xwe û zordariya xwe ve bête bialîkarîkirin.

Em ji bona hemû milletên vê cîhanê de didin bibangkirin, ku ew bi erkên xwe ve beramberî miletê meyî Kurd ve çî di warên givaştinê de li ser dewletên xwe de û yanjî çî di warên pêşkeşkirina alîkarîyên bêwîst de bêtin birabûn û herwehî ku ew siyaseteke dostaniyê beramber bi Kurd ve bidin bigirtin û jê re yarmetîya xweser çî bi canî ve yanjî bi bojeî ve bidin bipêşkeşkin.

Herwehî em ji rêxistinên merovanîyê û qencîyê ve di tevaya cîhanê de û herwehî bi taybetî ve em ji bona rêxistna xacê Sorî navdewlî jî de didin bixwestin, ku ew bi erkên xweyî merovanî ve bêtin birabûn, da ku ew barên li ser van Gorîyên cengê de bidin bisivikkirin û ew Wênerên xwe bidin birêkirin, da ku ew li ser zîneta Kurdistanê de bidin bilêkolandin û alîkarîya bi pêwîst ve di jê rewşên wetov de bi leztirîn dem ve jêre bidin bipêşkeşkin.

Di dawîya dawî de Deftera Siyasîyî Partîya Demokratî Kurdistan xwe bi bextiyar ve dide bidîtin, ku vê kêsa hanê ji xwe re bide bidîtin, da ku ew rêz û silavên xwe ji we re bide bipêşkeşirin.

### Deftera Siyasîyî Partîya demokratî Kurdistan<sup>34</sup>.

Heger Merov ji xwe re bi hûr û kûrî ve li vê banga hanê de bide bitemaşekirin, merov dikare van rûnkirinan ji xwe re li ser de bide biderxistin:

Ev banga hanê, heger ku ew ji bona Kurdan bihata binivîsandin, dê dûr yanjî nêzik ne bi xerab ve bihata biderkevtin.

Ev banga hanê ji bona wan Rêxistinên Netewî û Navnetî de bi şeweyekî pir sert ve hatîye binivîsandin û dûr yanjî nezik ew ne bi şeweyekî diplomasi ve hatîye binivîsandin. Ew li gora dilbijandinê û fermankirinê de hatîye binivîsandin. Li hemû dunyayê de Merov dikare yarmetiyê ji milletê xwe bide bixwestin; belam divê ku Merov yarmetiyê ji milletên din de bide bihêvîkirin.

Ev şeweyê remankirina hanê di darêjtina pirsê milî de bi şeweyî Erebî ve ji bona darêjtina pirsê Felestînê ve ji bona bîr û bawerîya cîhanî ve bi bîra Merov ve dide bixistin, ya ku ew her û her bi bêkir û bi bê sûd ve dihate bimayîn; jiber ku ew mîna vê banga hanê ji bona milletê Ereb de dihate binivîsandin û ew ne ji bona milletên din de li jêr ferhengên din de dihate binivîsandin.

Ev banga hanê bi navê Deftera Siyasîyî Partîya Demokratî Kurdistanê ve ji bona wan Rêxistinên Netewî û Navnetewî de hatîye binardin, ku li gora Peyrew û Pirograma Partî de divabû her pêwendîyek ji bona derve bi navê Serokê Partî Barzanî bihata bikirin. Di vir de Deftra Siyasî serê duberiyê di nava xwe de û Barzanî de dide biderxistin. Emê dê di piştî vê de vê duberîya hanê bêtir û bêtir û bi eşkeretir û tujtir ve ji xwe re bidin bidîtin.

---

<sup>34</sup> Ev banga hanê bi bê mêjû ve di rojnama Xebat de, jimara 470, ilola sala 1963 de, r. 1 û 5 de hatîye bibelavkirin.

Hemû bang û bibîrxistinên rêkirî ji bal Baraznî de yanjî ji bal Wênerên wî de ji bona Rêxistinên Netewî û Navnetewî de bi şêweyekî diplomasîyî pir bilind ve têtin biderkevtin û ew xwe bi carekê ve ji vî şêweyê remankirina xav û dilbijandinê ve didin bidûrkin. Bes û bi tenha ve ew bi şêweyekî diplomasîyî zanistî ve têtin binivîsandin û birêkin. Bes û bi tenha ve ji bona nimû ji xwe re li bangên rêkirî de bi navê Barzanî ve ji bal Ismet Şerîf Wanlî û Kameran Bedirxan Beg de bidin bitemaşekirin, ku di nava wan de tevaya diplomasîya bilind li ser zanistî û hişmendîya Ewropê de tête biderkevtin.

Tevlivêjî de ev banga hanê rastîyên hovberîya siyaseta Serdarên Iraqê beramber bi miletê Kurd ve dide binivîsandin û Merov dikare ji xwe re pir agehdarîyan li ser wê pêla hanê de bide bigirtin û jê ji xwe re bide bisûdkirin.

Bi saya xebata gelê Kurd, hêzên Erebiyî pêşverû ve û herwehaji bi saya piştgirtina dewleta Sovyêtî Partîya Leninî mezin ve şûreşa Kurdistanê ji rûxandinê hate biparastin.

Borcuwazîya Kurdî gen û genî ev rastîya hanê date bijîbîrakirin û wê ji xwe re didate bixwestin, ku ew hêjbêtir vê rastîya haneyî bingehî di mêjûwa şûreşa Kurdistanê de bide bijîbîrakirin, ku di encamê dawî de ev jibîrkirina mêjûwa şûreşa meyî hanê ji bal Borcuwazîya me de bi hoyên rûxandina wêna ve der sala 1975 de hatin biderkevtin.

Belê şûreşa Kurd hate biparastin û rêjîma Basîyî faşî li ser destên Abdul-Selam Arif de di 18. 11. 1963 de hate birûxandin û ev bi kurtî ve bi hoyê wê rûxandina Basîyan ve têtin biderkevtin:

Dujminatîya di navbera A. S. El-Sadî û Abdul-Selam Arif de dihate biderkevtin; ji ber ku Sadî didate bixwestin, ku ew bi Rehber ve bête biderkevtin.

Dijminatîya di nava Sipah û Pasevanên Milî de dihate biderkevtin.

Iraq ji bal Mişêl Eflaq û General El -Hafiz Emînê Surî de dihate biserdarîkirin û diktatorîya Partîya Pasî dihate bizalkirin.

Miletê Iraqê bi giştî ve bi dijî rêjîma Basî ve dihate biderkevtin û tawankarîyên ji bal Endamên Pasewanên Milî de pir bi bed ve ji bal gel de lê dihatin bitemaşekirin.

Bi sernekevîna Basîyan beramber bi şûreşa Kurd ve dihate biderkevîn<sup>35</sup>.

Wî ji xwe re şûna wan date bigirtin û lihevhatineke demî ji bona rawestandina şer di navbera Arif û Barzanî de der 10. 2. 1964 de hate bikirin. Şer li Kurdistanê de hate birawestandîna û mîletê Kurd piçekî bêhna xwe ji xwe re date bivedan.

Di vê demê de di sala 1964 de di navbera Barzanî û Hevlaên Ibrahîm Ehmed de di partî de cudabûneke mezin hate birûdan<sup>36</sup>. Tevî ku ji layekî jî de hewildan ji bona lihevhatinê de hatin bikirin, ew cudabûna hanê nehate bihîlanin, ya ku Ibrahîm û Hevalên xwe dixwestin Barzanî bi handan û yarmetîya Iranê ve bidin biavêtin û ew rêberîya Partî û şureşê ji bona nava destên xwe bidin bixistin. Wan Barzanî bi biryarekê ve ji Sorokitîya Partî dane bixistin û şer di nava hêzên wan û hêzên Barzanî de hate bivêkevîn û ew hatin bişikêstin û di rêya Hemedan de di sala 1964 de wan berê xwe ber bi Iranê ve dane bivekirin. Di pişt re Barzanî li wan de hate bibuhurandin û ew ji bona nava şureşê hatin bivegerandin, belam di bin re her pêwendiyên Ibrahîm Ehmed û hin ji Hevalên wî ligel serdarîya Iraqê de dihatin bikirin û ew der sala 1966 de ji bona Begdadê hatin biçûyîn û li nik serdarîyê hatin bimayîn û di destpêkirina şer de wan ligel Sipah û Caşan de bi dijî şureşê û Pêşmerge ve tanî peymanê 11 avdara sala 1970 didatin bişerkirin û ew bi navê Caşên Şêst û Şeş ve ji bal mîletê Kurd de di seranserî Kurdistanê de hatin binavkirin û ew bi wî navî jî pê hatin bixelatkirin. Careke din Barzanî di piştî peymanê avdarê de li wan de hate bibuhurandin û ew ji bona nava dam û destsgehên şureşê de hatin bivegerandin. Ew di nava şureşê de û ligel şureşê de bi jêhatî ve û bi dil û can ve hatin bimayîn û bi dil û can jî ve wan piştî siyaseta

<sup>35</sup> Ji xwe re li nivîsta Ismet Şerîf Wanlî de: „The Revolution of Iraki Kurdistan“ - Şureşa Kurdîsta Iraqê-, Published by the Committee for the Defense of the Kurdish People's rights (Kurdish Representation) April 1965, r. 51 bidin bitemaşekirin.

<sup>36</sup> Ji xwe re di vî warê hanê bi dûr û dirêjî ve li nivîsata Cîrcis Fethulah de: Serdanek ji bona mêja nêzîk de, r. 34-42, 107 û 124-127 de bidin bitemaşekirin. Kêmerovan wetov bi zanistî ve li ser vê cudabûna hanê ve dayite binivisandin.

şûreşê didatin bigirtin. Ew di liberxwdana sala 1974 de bi dijî rêjîma Basîyî faşî ve hatin bibeşdarîkirin û ew jî mîna hemû Pêşmergên Kurdistanê di piştî kevtina şûreşê de ji bona Iranê hatin biçûyîn<sup>37</sup>.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de ew rûdanên gewreyî giran û pir bi derd ve him ji bona tevaya Xwendevanên cihanê û himjî ji bona tevaya bîr û bawerîya cîhanê de didate bigihandin û ji wan daxwaza piştgirtina meletê Kurd û şûreşa wîyî pîroz di bin serokîtiya Barzanî de didate bixwestin.

Abdul-Selam Arif ji dêlva ku ew pirsiyara Kurd bi şeweyekî demokrasî ve li gora qazanc û berjewendîya miletê Iraqê de bi Erebb û Kurd ve bide biçarekirin, wî xwe bi xurtî ve ji bona cengê li ser Kurd de didate biamadekirin. Vî Nivîdinê Milîvanê Erebb hîç bawerî bi canê demokrasîyê ve nedidate bikirin û hêjîbêtir wî nizanîbû, ku ev gotina hanê di ferhenga siyasî de tete bidîtin. Belê wî jî mîna hemû Serdarên Iraqîyî berî xwe ji xwe re didate bixewinkirin, bê kanî çilo dê ew ji xwe re bi başî û hêsanî ve vê veşartoka hêza liberxwedana Kurd bide bişikenandin. Heger ku ew wê ne bi aşîtî ve bide bişikenandin, wetov divabû ku ew wê bi şer û cengê ve ji nû ve careke din bide bişikenadin. Wehajî mîna Serdarên Iraqîyî berî xwe wî jî ev girêga veşartina hanê pê jî nehate biçarekirin û bivekirin.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de her û her mîna her Kurdekî didate bixuyanîkirin, ku bes û bi tenha ve çarekirina pîrsa Kurd li Kurdistana Iraqê de dikare di rêya demokrasîkirina civaka Iraqî de bête biçarekirin. Hêjîbêtir pîrsa Kurd li seranserê Kurdistanê de bi ceng û şer ve, bi wêrankirin û qirkirinê ve ji bala Serdarên Rom, Erebb û Ecem de nikare bête biçarekirin. Ew bidestên xwe ve bi wan ceng û şeran ve di nava Kurdistanê de gora xwe bêtir didin bikûrkirin û ji bona serxwebûna Kurdistnê de û pêkanîna dewleteke mîl tede bi leztir ve ji me Kurdan ve didin bikarkirin.

<sup>37</sup> Ji xwe re bi dûr û dirê jî ve li ser vî babetê hanê de di nivîsta bi zimanê Erebbî ve: Tevgera Azadîxwaziya Milîyî Kurd ji Barzanî tanî Mesud Barzanî, nivîsta duwem, ji bal Ebdul-Qadir Birîvkanî, r. 105 - 113 de, çapa yekem, Qahire, Mîsir sala 1998 de bidin bitemaşekirin.



## Hatina Abdul-Selam Arif ji bona ser deshilatîya Iraqê de di sala 1964 de

Ne Diktatorekî Dînî mîna Abdul-Kerîm Qasim û ne jî Nivdînekî milîyî mîna Abdul-Selam Arif hîç nikarîbûn vê pirsîyarîya milî di nava Kurdistanê de bidin biçarekirin. Herwehaji Serdarên şovîniyî din rojekê ji rojan nikarin vê pirsê Kurd di seranserî Kurdistanê de bidin biçarekirin. Çarekirina pirsê milî di nava welatekî pir milî de bes û bi tenha xwe ve di rêya demokrasîkirina civaka wî welatî de dikare bête biçarekirin û herwehaji pêrejî divê rûniştina bi mafeyê çarûsa Netewan ve bête biderkevtin. Çi gava ku ev merc û bendên haneyî bingehî ji bona çarekirina pirsê milî di nava welatekî pir milî de nehatin bidîtin, dê ew welataya her û her xwe di nav ceng û şeran de bide bidîtin, tanî ku dewleta wîyî sitemkar û bedkar jihev bête bixistin û ew miltên di nava wê de bi mafeyên çarenûsa xwe ve bi neçarî ve di serxwebûn û pêkananîna dewleteke xweyî milî de bêtin bigihandin.

Jibervêjî ve Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de li ser bingehên serpehatîyên miletan de di çarenûsa wan de her û her didate bibîrxistin, ku pirsê milî li Kurdistanê Iraqê de li jêr rewş û zînetên nişankirîyî mêjûyî de bes û bi tenha ve di wê demê de rêya berzîkirina durujmê Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê bi rast û durust ve dihate biderkevtin; jiber ku di rêya vê daxwaza hanê de bêtir me dikarîbû armancên xwe bi hemû sadebûn û qulbûna wan ve ji bona serxwebûna welatê xwe di encamê dawî de bidin bicihanîn û Dujminên xweyî Serdarên Iraqê bi hovber ve bi rast û durust ve beramberî tevaya dunyayê bîr û bawerîya wêna û cewhera wan bidin bitazîkirin; jiber ku ew bi hîç rengêkî ve bi tu mafeyên Kurdî rewa ve nedihatî birûniştin û hêjîbêtir bi wê serûştîya xweyî faşî ve ew tucarî jî pê nikarîbûn bihatate birûniştin, yanjî ew pê bêtin birûniştin.

Jibervêjî Barzanî pir bi jîrbûn û hozanî ve li ser têgihiştina serûştîya Dagîrkerên Kurdistanê de û li ser bingehên serpêhatîyên miletan de di xebata wanî rizgarî de daxwazên xwe timî biçûktir ji karînen xwe didate bixwestin. Herwehaji her û her daxwazên wî ji biçûk ber bi mezintir ve, ji jêr ber bi jor ve dihatin biderkevtin. Vê siyaseta zanistîyî rast û durust di encamê dawî de roj bi roj ve siyaseta Serdarên Iraqê beramberî bi çarekirina pîrsa Kurd ve di rêya şer û ceng de bêtir û bitir bi ber kavihbûnê ve ditate biderxistin û hêjbêtir wê ew beramberî tevaya bîr û bawerîya cîhanê bi nala kolonyalîya Portugalî û sipanî ve di sedsalên panzdehan de di Emerîka Latîni de yanjî bi nala siyaseta rehperestîyî serdarîya Efrîqya Jêrî ve beramber bi milletê wê ve di vî sedsalê me de ditate biderxistin.

Bi ceng û şer ve ji bal Rehperestên Faşîyên Basîyên Erebb de xebata gelê Kurd li Kurdistana Iraqê de nayête birawestandî û bitemirandî; lêbelê ew roj bi roj ve di nava cerg û hinavên milletê me de di hate bixurtkirin û hêjbêtir ew di seranserî Kurdistanê de bi şiyarbûna milî ve di hate bigeskin. Çend siyaseta Şovîni û Faşîyên Erebb bi dir û hovtir ve beramber bi milletê Kurd ve li Kurdistanê de di hate biderkevtin, weha deha xebata ji bona serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milî bêtir cihê wê di nava nivê dilên Kurd de di hate biqulkin û hêvîya bi cîanîne vê armanca perest bi nêzîktir ve di hate biderkevtin.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de, ya ku wê xwe bi beşekî pir biçûk ve ji xebata gelê Kurd didate bidîtin, her û her wê xebat ji bona durujmê Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê didate bikin; jiber ku di vî durujmê hanê de tevaya berjewendîya Kurd û Erebb di hate bidîtin û herwehaji tede pir pirsîyarîyên dijwar li pêşîya gelê Iraqî de dikarîbûn bihatana biçarekirin, da ku li Iraqê de pêşkevîna civakî û geşbûna abûrî bihata biderkevtin, da ku bextiyarî û xweşbûna jîne di tevaya civaka Iraqê de bihata biderkevtin û da ku ew ji bona çarekirina pîrsa Kurd li seranserî Kurdistanê de di nava Kurdistana Tukiyê, Kurdistana Iranê û Kurdistana Suryê de bi nala nimûne ve bihata biderkevtin. Wetov Milletê Kurd di Kurdistan de ligel milletên wan welatên hanê de dikarîbûn hemû bi xweşî û bextiyarî ve di nava civakeke demokrasî de

bihatana bijîyandin. Wetov bi vî rengê hanêyê demokrasî ve pirsra mîlî di nava pir welatên bajartî de hatiye biçarekirin.

Arifê Yekem, piştî ku wî Basîyên faşî li Iraqê de dane biserkutkirin, careke din ji nû ve wî xwe ji bona şer û cengê li ser Kurdistanê de didate bilikarxistin û di encamê dawî de şerekî giran li ser gelê Kurd de careke din di 4. 4. 1965 de date bivêxistitin<sup>38</sup>.

Lêbelê Pêşmegrên qehreman û mêrxasên Kurdistanê, hêvîya jîn û evîna gelê Kurd di bin Rêberîya Barzanî de mîna şêr û pilingan bi vîneke polayî ve li ber şovînzîma Erebi de di durujmê: Kurdistan yanjî neman de hatin birawestandin.

Hemû milletê Kurd di seranserî Kurdistanê de bi dil, bi can û bi mal ve ji bona vê xebata dujwar didatin bipiştgirtin û ew xebata hanê bi şev û roj ve di nava cerg û hinavên wan de dihate biderkevtin û Pêşmêrgên Kurdistanê di bin Rêberîya Barzanî de bi cerg û hinavên wan ve dihatin biderkevtin; jiber ku ew bi hêvîya jîna wî ve di rizgarîkirina Kurdistanê de ji jêr pencên Dagîrkerên Ereben faşî ve dihate biderkevtin.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi tevaya tuwana xwe ve, bi hemû karinên xweyî biçûk ve li seranserî Ewropa de bi dilgermî û xwîngermî ve, bi dil û can ve piştta vê şûreşa Kurd û liberxwedana wîna de didate bigirtin. Wê şovînzîma hoberîyî Erebi li seranserî cihanê de bi jêhatîbûnên xwe ve di hemû waran de didate bi qût, birût û bitazîkirin, bê çawan ev çavsorên şovîniyên Erebi dixwazin, ku ew dewlemendbûna welatê me ji xwe re bidin bitalankirin û hêjî bi serde jî ve milletê Kurd di vî sedsalê bîstan de ji xwe re bidin bikole û bibendekirin, na hêjîbêtir ew dixwazin wî bidin biqirkirin.

Di cara pêşî de di mêtûwa xebata Kurdan de xwe pêşandaneke Kurdan di nava Dewletên Hevgirtiyên Emerîka de di 21. 9. Sala 1965 de li beramberî Yekgirtina Netewan de di roja destpêkirina vekirina

<sup>38</sup> Li gora belavkirinekê de li ser Nûçeyên Kurdistan de ji bala Encumena bi rêvebirina giştîyî Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de di meha cotana sala 1965 de hatiye binivîsandin, ku pêrabûnên vî şerê hanê rast û durust di 10. 4. 1965 de dayit bidestpêkirin.

wêyî giştî de hate bilidarxistin. Di vê xwe pêşandana hanê de jimareke kêm ji Kurdan bi cil û bergên xweyî milî ve û ligel hin Emerîkî jî de çend demjimaran bi hildana çend durujman ve li ser armên xwe de mîna: „United Nations! Stop Genocide Against the Kurd in Iraq“-Yekgirtina Netewan qirkirinê bide birawestandin-, Forgotten, But Not Defeated! Suport the Kurds“-hatine bi jibîrkirin, lêbelê nehatine bişikenandin! Piştî Kurdan bidin bigirtin, „Kurds are Entitled to Human Rights Too“-Kurd jî mafeyên Merovanîyê ji wan re têtin bidîtin, „ Self-Determination for the Kurds“, etc- çarenûs ji bona Kurdan, ûhd- li ber dergehên Yekgirtina Netewan de dihatin û diçûn<sup>39</sup>.

Herwehaji li vêderê de ez vê nameya Barzanîyî hanê jiber girinbûna wêna ji bona bîr û bawerîya cîhanî li ser pirsî Kurd de di Kurdistanê Iraqê de ji zimanê Erebi de didim biwergerandin û wê li vêderê de ji bona Xwendevanan didim bitomarkirin:

**„Bibirxistina Barzanî ji bona Encumena Yekgirtina Netewan de  
 Ji bona Sikretêrê Encumena Yekgirtina Netewan de  
 Ji bona Encumena Mafeyên Merov de  
 Ji bona Encumena Nemankirina Kolonyalîyê de  
 Ji bona Serokên Wênerên Dewletên Endam di Encumena Yekgirtina  
 Netewan de  
 Hêjayan**

Ji nêzîka derbasbûna çar salan de û welatê me Kurdistanî Iraqê bi cengeke rehperestî û şovîni ve tete birûkirin û li ser serdarîkirina desthilatîya Iraqê de sê pêlên doktatorîyî sipahî li dû hevdu de hatine bihatin. Dirêjbûna vê cenga hanê jî bi dirêjbûna cenga cîhanîyî yekem ve û ew bi çend mehan jî ve bi kêmtir ve ji dirêjbûna cenga cîhanîyî duwem ve tete biderkevtin. Çekên mirinê û wêrankirinê ji balafirên, tank û topan ve, ji yê ku ew ji bal serdarîya iraqê de di vê cenga destdirêjîyî hanê de bi dijî milletê Kurdî rebenî bi bêçek ve tete bikaranîn, bi gelekî ve ew ji wan çekan de di wêrankirina xwe de têtin

<sup>39</sup> The Kurdish Journal, Vol. II, September, December 1965, r. 2, . Pulished by the Kurdish Student Organization in the USA. Ev Kovara hanê ji bal Rêxistina Xwendevanên Kurd de di yekgirtinên Dewletên Emerîkî de dihate biderkevtin.

biderkevtin, ji yên ku ew di nava herdu cengên cîhanî de dihatin bikarhatin. Her Merovek, ji yên ku wan azar û destanên cengên cîhanî ji xwe re dane bixwarin, dikarin pir bi başî ve di hilgirtina azar û destanên welatê me de û di kişandina derd û janên milletê me de bêtin biliberkevtin.

Hêjbêtir ku ceng bi serê xwe ve bi malweranîkirinekê ve tête biderkevtin, milletê meyî aşîtxwaz rû bi rû ve tûşî bi siyaseteke rehperestîyî çepel ve, bi pêrabûnên zordariyî tolgirtî ve, bi serbirinên tevayî ve, bi talankirinê, barkirinê, derkirinê, şewitandina Bênderan, zevîyan û gundan ve, bi wêrankirina xaniyan ve bi ser Xwedanên wan ve ji Zarokan, Pîrekan û Piran ve, bi destdirêjkirinê ve li ser namûs û perestyên de têtin bikin. Ez ji nû ve careke din banga xwe ji we, Hêjayan re didim bikin; jiber ku serdariya Iraqê hêjê bi xurtir ve û bi çepelîtir ve di siyaseta xwe de li ser erdê sutandî de tête biçûyîn û bi dehan hezar ve ji Neşîvanên Kurd piştî şewitandina gundên wan û talankirina malên wan di vê dema dawî de dide biderkirin. Herwehaji jiber ku ev cenga hanê ji xwe re serûştîya qirkirinekê ji nû ve dide biwergirin û ji bona qirkirina milletê meyî Kurd tête bihewildan; piştî ku serdarîkirina diktatoriya sipahî di nemankirina şureşa Kurd de nehate biserkevtin.

Ev hemû bi carekê ve derbarê milletê me de têtin bikin; jiber ku ew bes û bi tenha ve dide bixwestin, ku ew li ser zimanê xwe de kel û pora xwe û nasîna milîbûna xwe bide biparastin. Piraniya pirî ku milletê me ji xwe re dide bixwestin, ew ewtonomî ji xwe re di nava sînorên Komra Iraqê de dide bixwestin, ya ku ew di nava biryarên Encumena Yekgirtina Netewan de der barî mafeyên Netewan de di çarenûsa wan de tête biderkevtin.

Hemû zordariyên, yên ku milletê me li ser destên Serdarên Iraqîyî Rehperest de pê têtin birûkirin, bi carekê ve bi dijî peymanî Encumena Yekgirtina Netewan ve têtin biderkevtin û herwehaji pêrejî ew bi dijî bendên mafeyên Merov ve têtin biderkevtin; jiber ku hebûna jîyana her Kurdekî di her cihekî de li Kurdistanê de li jêr desthilatîyên Iraqî de di bin tirsê de tête biderkevtin.

Derd û azarên nehayî kişandî ji bal milletê Kurd de ji derd û azarên her miletekî din de bi bêtir ve li jêr tarîntirîn pêla kolonyalîyê de têtin biderkevtin. Herwehaji jiber ku ruwên Zordarên milletê Kurd

bi esmer ve têtin biderkevtin, ev bi tenê ve nayête bitêrkirin, ku nîşana Kolonyalîyê li ser wan de bide binayînîkirin. Siyaseta Rehperestî ji bal serdarîya Iraqî de bi beramberî miletê me ve ne bi kêmtir ve û bi hovtir ve ji siyaseta herdu serdarîyên di Jêrî Efriqa û Rodîsya de têtê biderkevtin. Siyaseta serdarîya Iraqê bi şeweyê xwe ve bi hovtir ve ji siyasta wan herdu serdarîyan de têtê biderkevtin, hegerjî ku ew di rêxistina siyaseta xwe de bi kêmtir ve ji herduyan din de bête biderkevtin.

Ez pir bi hêvî ve têtîm biderkevtin, ku dê Encumena Yekgirtina Netewan û Rêxistin û Endamên wêna biryaran û pêrabûnan bidin biwergirtin, yên ku dê ew piştta miletê meyî sitembar bidin bigirtin. Ev hêvîyên min li ser wan bîr û barîyên qencî hanê de têtin birawestandin, ji yên ku li ser wan de ev Rêxistina Navdewletî û hêjabûnên Merovanîyê hatine biavakirin û yên ku ew ji bona hemû Endamên xwe ji bi cîanîna wan hêjabûnên Merovanîyê didin bibangkirin, herwehajî hêjbêtir jiber ku Encumena Yekgirtina Netewan bi Şûngirîya Hevgirêdana Netewan ve têtê biderkevtin, ya ku wê bi cîanîna mafeyên miletê Kurd ve di biryara xweyî taybetî de di pêvekirina Kurdistana jêrî de bi Iraqê ve di 16 çirya duwem de di sala 1925 de pê date bimerckirin, ji mafeyên ku em iro wan ji xwe re didin bixwestin.

Jiber wan hoyên jorî û herwehajî jiber ku miletê Kurd di Iraqê de milîbûnekê dide bipêkanîn, ya ku ew bi ziman, kelepor û pêkhatîyên ve têtê bipêkhatin û herwehajî jiber ku ev cenga vêkevtîyî neha di nava kurdistana Iraqê de metirsîyekê li ser aşîtyê de di nava Rojhilata Navînî de dide bipêkanîn, wetov gotina serdarîya Iraqê ji bingehê xwe ve bi derew ve têtê biderkevtin, gava ku ew dide bigotin, ku pirsra Kurd bi pîrseke navxweyî ve têtê biderkevtin. Ev derewa Iraqê ne bi kêmtir ve ji derewa Serdarên Rodîsya û Afirîqya Jêrî ve têtê biderkevtin, ku siyaseta wanî Rehperestî bi pîrseke navxweyî ve têtê biderkevtin.

Bi navê xwe û herwehajî bi navê miletê xweyî sitemkêş ve ez ji bona Encumena Yekgirtina Netewan, Encumenên wê û Endamên wêyî din didim bibangkirin, ku ew encumenekê ji bona lêgerandina rastîyan de li Kurdistanê de bide birêkîrin, bi kêmanî ve mîna ku wê ew ji bona nava jimarekê ji heremên lihevkevtî ve dayite birêkîrin.

Ez ji we didim bihêvîkirin, ku hûn sipasî û hêjabûnên min ji xwe re bidin biwergirtin

Dilsozê we

Mustefa Barzanî

Serokê Civata Rêberîya Şureşê di Kurdistanê iraqê de û Serokê Partîya Demokratî Kurdistan

1. 1. 1966"

Di nava rêz û dirên vê bi bîrxistana hanê ve tevaya nermbûna siyaseta diplomasiyê Barzanî û dûrbûn û kûrbûna wêna tête biderkevtin. Ew li ser bingehêkî pir bi bilind ve di warê diplomasiyê de dûr ji kînê û himjî ji dilbijandîne hatîya binivîsandin. Ew bi şêweyekî hişmendî rastîya rûdanên li Kurdistanê de li ser destên serdarîya Iraqî de li ber destên Encumena Yekgirtina Netewan, Encumenên wê û Endamên wê dide bidanîn û ji wan bi hemû nermbûn ve dide bihêvîkirin, ku ew piştî miletê Kurdî sitemkêş di nava welatê wîyê Kurdistan de li ser bingehên Bîr û bawerîyên xweyê bilind de bidin bigirtin. Wetov bi carekê ve siyaseta Barzanîyê pir bi bilind ve û li ser bingehê zanistîya siyaseta de tête biderkevtin; jibervêjî ve tevaya Kurd û welatperwerên Kurdistanê bi carekê ve piştî wê her û her didatin bigirtin û ew siyaseta hanê ji bal tevaya cîhana bajartî de rêz û piştgirtin jê re dihate bidîtin.

Xewin û nigaşên faşîya Erebi, keçel, kotî û sêwîyên Eflêqî careke din jî bi vala ve hatin biderkevtin. Temenê serdarîkirina Arifê Yekem bi temenê pîvanokê ve hate biderkevtin. Ew di hilokepterekî de di 13. 4. 1966 hate bikevtin û hate bimirin, lê miletê Kurd Nevîyîn Midya, Pehlewanên Rojhilat bi ser bilindî ve li ber çavên tevaya dunyayê de li ser lat, teht û zinarên çiyayên Gotî de, di nava deşt û newalên kaşî, Orarto, Mitanî, Subarto, Hûrî û Kardoxî de hatin bimayîn.

## Hatina Arifê Duwem û girêdana peymanê 29 axlêva sala 1966 de<sup>40</sup>

Arifê Duwem ji bona serdarîkirina Iraqê hate bidanîn. Şer her û her bi xurtî ve, bi gûr û germî ve tanî sala 1966 de li dar bû.

Piştî hêrişê nuhî sipahê Iraqî ji bona ser Kurdistanê de „Barzanî bangêk: ji bona bîr û bawerîya Cihanî û Dewletên Mezin de date biderxistin:

„Ji nêzîka pênc salan de serdarîya Begdadê cengeke dir û hov bi dijî gelê Kurdistanê Iraqê ve dayit biberpakrin. Take hoyê vî şerê hanê bi dijî Kurd ve tete biderkevtin; jiber ku em daxwaza Ewtonomî ji bona Kurdistanê di nava çar çewê Komara Iraqê de didin bixwestin.

Kurd hergîz daxwaza cêhêbûnê nadin bikin û neji dane bixwestin. Divê ev jî ber bi çavên serdarîya Iraqê ve bête bixistin, ku di 22. 12. Sala 1922 bi şeweyekî mirî ve soz ji bona damezirandina ewtonomî date bidan; belam ne wê serdarîya hanê û neji yê tevaya li dû wê hatî jî de rêz li wî sozî wergirtî de nedan bigirtin. Evaya jî zor bi

<sup>40</sup> Ji xwe re di vî warê hanê de li kovara Kurdica, July 1968 de bi zimanê Ingilîzî ve li vê gotara hanê de di bin nav û nişana: “Two years after”; r.3- 7 bidin bitemaşekirin. Di vê gotara hanê de bi dîr û dirêjî ve hêjakirinek li ser pêla derbasbûna du salan de li ser girêdana wê peymanê hanê de tete bikin. Merov ji xwe re ji vê gotara hanê pir sîd dide biwergirtin û bêtir li ser rewş û zînetê siyaseta serdarîya Iraqê de beramber bi Kurd ve li Kurdistanê Iraqê de tete bikin.

Herwehaji di vê kaşîya hanê de di rûpelê 9 - 12 de gotareke pir bi nêrx û hêja ve di bin nav û nişana “The Kurd in 1968” -Kurd di sala 1968 de-, ji bal A. M. Hamilton hatîye binivîsandin. Hemilton der salên çilî de rêya giradana Kurdistanê Iraqê bi Iranê ve date bivekirin, da ku Alîkarîya Hevalbendan di rêya kendava Farîsî de ji Besra ji bona Sovyêtê di Qefqasya de bi dijî Elmanya ve bête bigihandin. Ev rêya hanê bi navê wî jî ve tanîha tete binavkirin , ku jêre rêya Hemelton tete bigotin. Herwehaji wî nivîsteke pir bi nêrx ve li ser Kurdistanê de li jêr navûnişana „Road through Kurdistan“ - Rê di nava Kurdistanê re-, (2<sup>nd</sup>. ed.), London 1958 de date binivîsandin. Wî pir ji Kurdan didate bihizkirin, jibervêjî ve pir bi başî ve tete bidîtin, ku ev gotara vî karnasê Ingilîzî bête bixwendin.



çakî ve niyaza bedî serdariyên Iraqî yek li dû ya din de dide biderkirin, ku hemû ji bona çareserkirina pîrsa rewayî Kurd pena xwe ji bona ber çek û bi karanîna hêzê ve dane bibirin.

Rojnamên cihanî û dam û destgehên cihanî jî çend caran tawankirina kuştina xelkê bi komel ve ji bona pal serdariya Begdadê de dane bixistin, yên ku wê bi dijî gelê Kurd ve dane bikirin. Lêbelê serdariyê tanî êsta hîç guhê xwe bi van tawankaran ve nedaye birapelkirin. Li ser rayê vê jî de ev serdariya hanê di hêrîşa xweyî nuhî sipahî de her li ser bi karanîna napalm û bombên gazê jehrî de têtê biçûyîn. Kurdistan neha têtê biwêrankirin û xelkên wê têtin binabûdkirin.

Jibervêjî ve ez daxwaza yarmetîya sincî û merovanî li hemû gelên cîhanê de ji bona xelkê Kurdistanê de didim bikirin, yên ku ew xwe di nava metirsîyeke gewre de didin bidîtin.

Herwehaji ez daxwazê li hemû serdariyan de didim bikirin û bi şêweyekî tabetî jî ve ez li dewletê mezinî cîhanê jî de didim bikirin, ku ew tev de ji bona serdariya Begdadê de bidin bixwestin, ku heger ew divê li ser şer de bête biçûyîn, divê ew rêzê li peymanî cihanîyî Cinêfê de bide bigirtin û heger ku ew bi servajîvêjî ve aşîtiyê dide bixwestin, ku em zor bi dilsozî jî ve daxwaza wê didin bikirin, bi pêwîst ve têtê biderkevtin, ku ew bi çareserkirina pîrsa Kurd ve bête birûniştin, ya ku ew li gel canê serdemê de û li gel peymanî Yekgirtîyên Netewan de têtê biderkevtin.

Kurdista Iraqê , di gulnana sala 1966 de.  
Mustefa Barzanî“.

erên Zozik û Henderîn de di 3. 5. Sala 1966 de date bidestpêkirin. Di hêrîa Pêmerge de di 12/13 hestîyên textikê piştî leşkerê Iraqê hate bişikenadin. Bi sedan ve leşkerê Iraqî kelexên bê xwedî li dû xwe de li ser rasta ceng û şer de li Kurdistanê de datin bihiştin û ew ji rasta şer datin bipengizandin û bebizandin. Lingo bi qurbanû, durjumê Efleqîyan bû. Ew pîr bi beramberî Zarok, Pîrek û Pîran ve, bi beramberî mîletê bê çek ve pîr bi çavsor û mêrxas ve têtin biderkevtin, lêbelê ew bi barmberî Pêşmegre û Zarokên Musa ve bi Dizên şekalên xwe ve têtin biderkevtin.

Şerên Zozik û Henderîn ji bal Pehlewan û Qehremanên Kurdistanê û Welatperwerên Erebb de bi dijî faşîya Efleqî ve hatin bikirin.

Ev erê hanê deh rojan date birêjkirin. Têde Girda Yekem û Duwem ji batirî Girdên sipahên Iraqî de ji koka pênc girdên wî di vî erê hanê de ligel bi hezaran ve ji Caan hatin bikarhatin. Amara serjimara vê koma ervanên Iraqî bi sîûpênc hezar ervan ve dihate biderkevtin. Beramberî van bes ûbi tenha ve nêzîka sê hezar û nîv Pêmerge dihatin biderkevtin.

Armanca vê hêria hanê girtina serên çiyayên Henderîn û Zozikî beramberî hev dihate biderkevtin.

Pêmerge hêria xwe ji nikê ve û pir bi xurt û no ve di 12/13. 5. 1966 de date bidestpêkirin û sipah ji cih û sengerên wî date biderxistin. Tirs û lertz di nava sipah de hate bivêkevtin û canê bez û revê di nava wê de hate bizalkirin. Sipahê iraqê ji mêrxasî ve hate bikevtin. Kes bi kes ve tanî bajarê Rewanduz nema dihate biragirtin. Bi sedan ve hatin bi dîlkin û bi sedan ve hatin bikutin û yê mayî ji hatin bitar û bimarkirin. Du ji xurtirîn Girdên Bi destkevtinên vî erê hanê tevaya gewrebûna ikestina sipahê Iraqî dide biderxistin. Em bes ji bona nimûne hinekan ji van bidestkevtinên hanê li vêderê de didin bitomarkirin:

6 topên giran endaze 75 mm, 4 topên giranî cihgirtîyî nelivandî, 4 xumpareyên giran endazî 4, 8 xumparnen endaz 3, 4 topên giran endaze 81 mm, 5 rêjinkên giran ji rengên Vîkerz, 2000 ji tiving, tivingên awtomatikî, rêjinkên destî û exwer, 46 destgehên bêtêlî ji bona wergirtin û nardinê, bi tonan ve ji sindoqên teqemenî û bomban, 6000 betanî û herwehaji 100 çadirnên sipahîyên gewre û biçûk ji bal Pêmerge ve hatin bidestkevtin. Hêjbêtir bi destgeh û titên pirî din ji bi dest ve hatin bikevtin, pir bi dijwar ve dikarîbûn bihatana bijimartin û biamarkirin. Herwehaji pir jitonên xwarin û vexwarinê ji bidest ve hatin bikevtin. Herwehaji di vî erê hanê du jixurtirîn û batirîn Girdên sipahê Iraqî hatin bitar û bimarkirin<sup>41</sup>.

<sup>41</sup> Ji xwe re bi dîr û dirêjî ve li nivîsta Circis Fethula: Serdanek ji bona mêja nêzik de, r. 143 de bidin bi temaekirin.

Faxir di Kongirê hetehemîn de di Navpirdan de di tîrmeha sala 1970 de ji min re li ser tevaya bi rêveçûna şerên Zozik û Henderîn ve bi dût û dirêjî ve date biaxivtin.

Mulazim Xidir min pir navê wî dabû bibihistin, jiber ku Barzanî û Pêşmerge jê didatin bihizkirin. Der salên heştêyî de min ew li Rajan de date binaskirin û Dostanîyeke pir xurt di navbera min û wî de hate bidîtin; jiber ew bi dil û can ve bi Dostê milletê Kurd ve dihate biderkevtin; jiber ku ew bi Welatperêkî Erebi mezin ve dihate biderkevtin û mina her Merovekî Welatperwer di vê dunyayê de ji milletê xwe pir didate bihizkirin; jiber vêjî ve û bi şiyarbûn ve wî ji milletê Kurd didate bihizkirin. Mulazim Xidir di vî warê hanê de bi tenha xwe ne bû. Bes û bi tenha ve ji bona nimûne ez dixwazim pir bi lez ve çend navan li vir de bidim bianîn: Ezîz Şerîf, Cewahirî, Hesên El Neqîb, Mulazim Ehmed û gelekî gelekî din jî dihatin biderkevtin, ji yên ku ew bi rast û durust ve bi durujmê Dostanîya Erebi û kurd ve didin bibawerîkirin û heger çarekirina pîrsa Kurd li Iraqê de bi destên wan ve bihata biderkevtin, dê wan bi nimûnefî ve pîrsa Kurd li Kurdistanê Iraqê de him ji bona Qazanca milletê xweyî Erebi û himjî ji bona Qazanca milletê Kurd bidana biçarekirin, da ku herdu milletên Dost li ser bingehê mafeyê çarenûsê de ligel hevdu de bihatana bijîyandin û bi xweşî û bextiyarî ve bihatana bijîyandin û dewlemendîya welêt ji bona avakirina wîna bihata bikaranîn û ne di encamê dawî de mîna ku Basîyan date bikirin, ku ew dewlemendîya hanê ji bona dujminatîya Erebi û Kurd û di wêrankirina Kurdistan û Iraqê de dihate bikaranîn, da ku dewleta Iraqê di encamê dawî de bi darê zorê ve, li ser serpêhatîyên milletan de û hêjbêtir bi hinera qanûnên jînê ve mîna Selteneta Osmanî û dewletên dinî bedkarên mîna wê ji hev bête bixistin û ji nefet û ava Kurdistanê bête bibêpîşkirin û Kurdistan bi serxwebûna xwe ve bête bitacûxelatkirin. Rojêkê ji Rojan de milletê Kurd di seranserî mêjûwa xweyî dirêj de şer ne ligel Birayên Xweyî Erebi, ne jî ligel Birayên xweyî Turk û ne jî ligel Birayên xweyî Faris de dane bikirin. Wan her û her durujmê biratîyê ligel wan milletên hanê de dayite biberz û bibalakirin. Wan her û her li ber man û nemana xwe de bi dijî Serdarên Dagirkerên Rom, Erebi û Ecem dayite bidan û bi mêrxasî û qehremanî ve bi dijî wan ve wî ji

bona rizgarîkirina Kurdistana xwe ji nava lep û pencên wan dayite bitêkoşînkirin û şerkirin.

Her û her li Kurdistana Irqê de durujmê biratîya Kurd û Ereb ji bal Dilsoz û Welatperwerên Kurd de hatiye biberz û bibalakirin. Barzanî Rêberê Miletê Kurd der sala 1943 de di daxuyanîya xwe de ji bona miletê Kurd û Ereb de dide bigotin: „Em şer ligel miletê Ereb de nakin; ji ber ku ew bi birayê me ye, lêbele bes û bi tenha ve em şer bi dijî Serdarên wî ve didin bikin, yên ku ew bi rast û durustî ve bi Nokerên impiryalizma Ingilîzî ve têtin biderkevtin“.

Bi vê rastîya hanê ve Rêberîya Kurd di bin serokîtîya Barzanî de her û her di seranserî xebata gelê me de di bin hemû merc û zînetên tîrş û talî hovberî de ji bal Rehperestên Erb de Kurd pê dane biperwerdekirin û Barzanî rojekê ji rojan jî tucarî cudabûnek ji bona nava xebata miletê Ereb û Kurd nedayite bixistin.

Her û her evîndariya wî ji bona Xebatvanên Ereb û hijakirin û rezlêgirtina wîna ji bona wan dihate bibêtirkirin. Wetov Pêşmergeên Kurdistanê û Welatperwerên Kurd ji bal Rêberê mezinî Barzanî de bi evîndariya miletan ve û ji bona xebata wanî rizgarîkirinê dihatin biperwerdekirin; jibervêjî ve û bi saya serê Barzanîyê Qehremanê miletê Kurd ve tucarî di nava Pêşmergeên Kurdistanê de kîndarî beramberî miletê Ereb nedihate bidîtin; jiber ku wî ew her û her bi rast û durust ve bi birayên wan ve didatin bidanîn.

Wehajî Komela me jî, Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de li ser vî rêbazî Barzanîyê rast û durustî mêjûyî de di tevaya siyaset û ragiyandina xwe de ji bona bîr û bawerîya cîhanî de li ser xebata miletê Kurd de di seranserî Kurdistanê de dihate biçûyîn. Wê her û her durujmê dostanîyê û biratîyê ligel miletên Ereb, Turk û Faris de û herwehajî ligel tevaya miletên din de di seranserî cîhanê de didate bibilindkirin û wê Endamên xwe pê didatin biperwerdekirin. Jibervêyekê jî ve Komela me di tevaya siyaseta xwe de durujmê Dostanîyê, Biratîyê û Aşîtiya di nava hemû miletan de didate bibilindkirin û wê ew bi bendekê ve ji pênc bendên bingehî ve di nava destûra xwe de dabû bidanin; jiber Endamên Komela me, Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de xwe bi Pêşmergeên şûreşê ve li jêr Reberîya Barzanî de li derveyî welêt de didatin bidanîn, ku kar û barên wan di şiyakirin û ragiyandin tevaya bîr û bawerîya cîhanî de him li

ser zînet û rewşên Kurdistanê de û himjî li ser û rewş zînetan de di seranserî Kurdistanê de dihatin bidîtin. Çekên me bi dilsozîya me ve li ser rêbazê Ahmedê Xanî û Barzanî ve ji bona serxwebûna Kurdistanê me dihat biderkevtin, çekên me bi xame û bi pênivîsên me ve dihatin biderkevtin û hêjêjbêtir çekên me di zanebûn û zanistîya me de dihat biderkevtin. Jîrîtî, zanebûn û zanistîya Ewropî bi armanca me ve ji bona rizgarîkirina Kurdistanê me ve, ji bona serxwebûna welatê me ve û ji bona bi pêşveçûn û geşkirina civaka Kurdistanê me ve dihat biderkevtin. Her Endamek ji Endamên Komela me xwe bi peyamberê miletê xwe ve ji bona gihandina dengê wî, derdên wî, awatên wî û hêvîyên ji bona tevaya bîr û bawerîya cîhanê didate biderkevtin û wetov ji wî pê didate bihestyarîkirin.

Arifê Duwem piştî şikestina leşkerê wî di Zozik û Henderîn de bi rewestandîna şer ve û bi pêkhatîna peymanê 29 axlêva sala 1966 ve hate bineçarîkirin. Di vê peymanê hanê de rêjîma Arifê Duwem bi hin daxwazên Kurd ve hate bipêrûniştin, ku di wê çaxê de Bezaz bi Serokê Wezîran ve dihat biderkevtin. Arifê Duwem ligel Bezaz de ne didate bixwestin, ku ew pirsê Kurd bidin biçarekirin, lêbelê wan didatin bixwestin, ku ew belkî bi aşîfî ve şûreşa Kurd ji hevdu bidin bixistin û Kurdan xwe bi xwe ve bi bera hedû ve bidin bikirin û wan di nava xwîna wan de bidin bivegevizandin û agirê cengeke navxweyî di nava Kurdistanê de di rêya Caşên Şêtûşê de bidin bilidarxistin.

Ev siyaseta hanê pir ji kevnarî de, ji roja pêkhatîna dewletên bajaran de ji pêla Somerî de, her û her Serdaran bi dijî meletên jêrdestên xwe ve didatin bikaranîn; jiber ku ew siyaseta hanê him pir bi arzan ve û himjî pir bi kêr ve dihat biderkevtin. Heger kurmê darê ne ji darê ve bête biderkevtin, dar nayête bikurmîkirin. Dujmînan me di tevaya dirêjbûna serdarîkirina xwe de di nava Kurdistanê me de ev siyaseta hanê her gav ji xwe re didane bikaranîn û wan em pê di nava xwîna me de didane bivegevizandin. Wan her û her bi destên hêzên lawza ve didatin bigirtin û hêzên xurt pê didatin bişekinandin û di pişt re wan pêhnêk li wan hêzên lawza de didin bixistin û ew jî ji ber xwe didatin bihilanîn.

Di pêla serdarîya Şahînşahiya Iranî û Selteneta Osmanî de li ser Kurdistanê de û herweh jî di piştî parvekirina Kurdistanê de li ser bingehên peymanê Sayks-Piko de û perçekirina wêna ji nû ve di

navbera Dewletên Turkî, Iran, Iraq û Surî de ew siyaseta hanê hergav hêjî tête bikaranîn. Ev siyaseta hanê ji bal Mikavilî de di nivîsta Mîr de di bin nav û nîsana: „bi parvekirin û bizalkirin ve“ dihate binaskirin.

Ingilîz di tevaya dirêjbûna desthilatîya xwe de di nava Koloniyên xwe de di seranserî dunyayê de beramberî milletên jêrdestên xwe de her û her ew didate bikaranîn û ew têde bigir hergavjî bi serkevtî ve dihate biderkevtin.

Bezaz jî bi nala Nokerekî rasteqîneiyî Ingilîz ve ji xwe re date bixwestin, ku ew vê siyaseta hanê mîna hercar li Kurdistanê de bide bicîanîn. Belê Bezaz bi vê siyata xweyî çewt û xwar ve tanî demekê hate biserkevtin. Kurd pê pir hatin biêşandin. Herwehajî Komela me jî bi vê siyaseta hanê pir pê hate biêşandin. Belê vê siyaseta Bazazî çewt û xwar Çaşên Şêst û Şeş di sala 1966 de date bidurustkirin û biafirandin, yên ku ew der sala 1964 de bi handan û fermana Sevakê Iranî ve bi dijî Barzanî û Şureşê ve ji bona bi ser tapanan ve hatin bikirin. Ew ji nava şûreşê di rêya Hemedanê re ji bona Iranê hatin biderkevtin. Ew bi tevaya gemara xwe ve ji bona Şahê Iranê hatin binardin. Di pişt re Barzanî li wan de hate bibuhurandin û ew ji bona nava şureşê hatin bivegerandin. Gava ku Bezaz ji wan destên xwe datin bidirêjkirin, ji nû ve bi lez û bez ve ew ji bona nik sedarîya Iraqê hatin biçûyîn, da ku ew Çawîtiya xwe û bêbextîya welatî ji bona Serdarîya Iraqê bi dijî şureşê û berjewendiyên Kurd û Kurdistanê bi nokerî ve bidin bikirin. Van Caş û Nexweşên zarotîyê xwe bi Çawîti û bêbextîya welatî ve, bi nokerî û hestîkojîya xwe ve li ser sifra Dujminên me de bi pêşvrû ve didatin biderxistin û wan Barzanî û tevaya Peşmergên şureşê bi xwe jî ve bi kevneperest ve û bi dijî Kurd ve didatin bidanîn; jibervêjî ve wan xwe bi Caşpolîsên serdarîyê dabûn bikirin û rûxandina şureşê bi ser milên xwe ve ji bona serdarîya şovîniyî Erebiyî Iraqî dabûn bihildan

Lêbelê ne wê siyaseta hanê û neji wan Çaşên Şêst û Şeş jî dikarîbûn xwe li ber pêşveçûna şureşê û xebata milletê Kurd de di bin Rêberaya Barzanîyî Qehremanê milletê me de bidana bigirtin. Ev siyaseta hanê û Çaşên Şêst û Şeş her û her di nava seranserî Kurdistanê de dihatin birûreşkirin û bikevtin û Çaşên Şêst û Şeş jî

bibêbextiya welatî ve hatibûn bikevtin û binavkirin. Ji alîyê din jî de şûreş û xebata milletê Kurd her û her dihate bipêşvekevtin û biserkevtin.

Di navbera 15-20. 11. 1966 de Kongirê Heftemî Partîya Demokratî Kurdistan di Gelale de hate bigirêdan. Di vî Kongirê hanê de:

Xurtbûn û yekîtîya Partîya Demokratî Kurdistan û desthilatîya wê di nava Cemawerên kurdistanêyî fireh de hate biderkevtin.

Têgihiştina wêyê kûr ji bona rewşên wê demê de, nîşankirina rêya xebata partî û milletê Kurd çî warê hundurû de û çijî di warê navdewletî de hate biderkevtin û herwehaji tede Çeteyên Ibrahîm Ehmed - Celal Talebanî- bi Xinêzîya -Xiyaneta- mezin ve beramber bi millet û welêt ve hatin bitawankarîkirin.

Têde li ser Peymana 29 axlêva 1966 de hate birûniştin û Kongire ji serdarîyê bi cînanîna wê peymanê hanê ve him bi canê wê ve û himjî bi navroka wê ve date bidaxwazîkirin.

Têde bi tevaya dengdanê ve careke din Mustefa Barzanî ji bona Serokê Partî hate bihekbijartin.

Gotina rêkirî ji bal Serok û Serdarê Şureşê Mustefa Barzanî de ji bona vekirina Kongirê Heftem de:

„Mêvanên hêja!

Birayên Endamên Kongirê Heftemî Partî!

Silav ji bona we, dilovanî û pîrozbaya Xwedê ji bona we

Min pir didate bixwestin, ku ez di vî Kongirê weyî hanê de bihatama biamadekirin, lêbelê ji ber rewşa minî tendurustî de li ser min de date bineçarîkirin, mîna ku hûn didin bizanîn; jibervêjî ve min ji bona birayê Hebîb date bisipartin, ku ew ji dêlava min ve vê gotina hanê ji we re bide bixwendin“.

„Birayên hêja!

Ji we nayête biveşartin, ku pêşkevtin û bextiyarîya netewan li ser xebata Zaroyên wanî dilsoz de têtin birawestandin, ya ku ew bi gorîvanî ve ji bona bicîanîna aramanc û nimûneyên bilindiyî wan

milet û netewan de didin bikirin. Li ser vî bingehê hanê de ez ji we didim bihêvîkirin, ku hûn derd û dijwarîyên miletê meyî Kurd û şûreşa wîyî dadwer bidin bixwendekarîkirin, da ku hûn ji bona wan çarekirinên rast û durust bidin bidanîn û herwehaji da ku hûn wan Merovan ji xwe re bidin bihelbijartin, ji yên ku hûn dilsozîyê û karînê di wan de didin bidîtin, ji yên ku ew dê bikaribin kar û barên Partî bidin biserpereştîkirin.

Herwehaji pêrejî ez ji bona kongirê we tevaya bi serkevtinê ve ji bona kara armancên miletê meyî Iraqî bi giştî ve û miletê Kurd bi taybetî ve didim bihêvîkirin.

Ez ji we ji ber rewşên xweyî tendurustîyê û kar û barên xweyî pirî din hêvîya lêbuhurandinê didim bihêvîkirin, ku hûn xwevekişandina min ji Serokîtîya Partî bidin biwergirtin, heger ku ev bikare bête bikirin; jiber ku min di berê jî de ji bona we ev hêvîya hanê di Kongirên dinî Partî de didate bipêşkeşkirin. Dê ezê her û her ji bona wî Merovê ji bal we de helbijartî bi hemû karînen xwe ve bi alîkar û piştgirt ve bêtîm biderkevtin, da ku em bi hev re erkên li ser şanên me de bidin bikirin.

Di dawîya dawî de em ji Xwedawendê Bilind ve didin bidaxwazîkirin, ku ew me tevan ji bona ser wê rêyê de bide birêberîkirin, ya ku têde qencî û çakîya milet û welat têtin biderkevtin. Silav ji bona tevan.

Birayê weyî dilsoz  
Mustefa Barzanî  
Di 14. 11. 1966 de“

Herwehaji Barzanî di dawîbûna vî Kongirê hanê de ev nameya hanên jêre date biarastkirin û Kongire pê hate bidawîkirin:

„Birayên Endamên Kongirê Heftemî Partî!

Silav ji bona we, dilovanî û pîrozbaya Xwedê ji bona we

Ez dê pir ji pêşîya pêşî de bi kêfxweş ve bihatama biderkevtin, heger ku min bikariba kongirê we bida bivekirin û di nava kar û barên wî de bihatama bibeşdarîkirin; belam jiber rewşa minî tendurustî de, mîna ku min ji we re di berê de dabû bibîrxistin, mexabin ez nikarîbû di nava kongirê we de bêtîn bibeşdarîkirin. Herwehaji di vê rojê jî de



min careke din date bihewildan, ku ez di vê civîna dawîyî kongirê de bêtin biamedebûn, da ku ez kar û barên wê û herwehaji xebata weyî dilsoz bidim bipîrozkirin, ji yê ku ew ji bona kara Partî û miletê didin biarmanckirin. Careke din jî ev xwezîya hanê jiber hoyên berê de nikarîbû bihata bicîhatin.

Di dawîya dawî de ez ji bona we biserkevtinê didim bihêvîkirin û ez ji we didim bihêvîkirin, ku hûn silavên min û hêjabûnên min ji bona birayên xweyî dilsoz di nava heremên xwe de bidin bigihandin. Ez we sipasdikim.

Dilsoz

Birayê we Mustefa Barzanî

18. 11. 1966<sup>42</sup>.

Barzanî bi bîrxistineke pir bi nêrx û hêja ve di bin nav û nîşana: „Bîrxistinek ji Barzanî ji bona Serdariya Iraqê“ de date birêkirin û wetov ev bi bîrxistina hanê ve hatiye binivîsandin. Jiber girgbûna wêna ve û himjî ji bona bêtir xwendevanên hêja li ser wê pêla mêjûyî de di mêjûwa xebata me de bêtir bêtin biliberkevtin, ez dixwazim wê bi bîrxistina hanê ve ji zimanê Erebi bidim biwêgerandin û wê li vê derê de bidim bitomarkirin:

„Serwerê Serokê Komara Iraqê Sergird Abdul-Rehman Mihamed Arifê hêja  
Serwerê Serokê Wizaretê Serleşkerê Cengoş Nacî Talibê Hêja  
Silavek Xweş

Em ji bona serwerîya we vê bi bîrxistina hanê ve didin bibilindkirin, da ku em bêtir ronahîyê ji bona ser zînetê nehayî sarkirî de bidin biavêtin, ya ku ew gift û gokirinê dide bipoşandin û ya ku ew kospan di rêya çarekirinkirina pîrsa Kurd de ji 29 axlêvê û tanî neha de dide bixistin.

---

<sup>42</sup> Ev herdu gotinên Barzanîyî hanê ji rojnama Xebat bi zimanê Erebi ve di jimara 493 de sala 1966 de, r. 1 hatine biwêgirtin.

Ji Serwerîya we nayête biveşartin, ku peyman 29 axlêvê bi bendên xweyî belavkirî û ne belavkîri ve mafeyên milletê Kurdî milî di nava xwe de didin biwergirtin, ji yên ku milletê Kurd her û her ji bona wan didate bidaxwazîkirin û ew nehajî ji bona bicîanîna wan ve bi xurtî ve dide bidaxwazkirin, nemaze derd û janên wî ji bona wan mafeyan bêtir ji dema cenga cihanî duwem de date bidirêjkin. Lêbelê jiber ku me didate bixwestin, ku ji bona parastina berjewendîya bilindî welêt û ji bona nehiştina rijandanina xwîna birayên Erebb û Kurd û herwehaji ji bona parastina yekîtiya welêt em li ser peymanê de hatin bipêrûniştin. Me didate bihêvîkirin, ku dê bendên wê bi nêtek baş ve û bi canekî başîti ve bêtin bicîanîn, ku têde dê bi kêmtirîn mafeyên milletê Kurd ve pê bête birûniştin. Lêbelê em vê didin bigotin û û cerg û hinav li me de têtin bisûtandin, ku peyman hêjî yanjî bigir bi belgeyekî mirî ve tete biderkevtin, tevî ku bêtir ji pênc mehan jî de di ser belavkirina wê re hatine biderbasbûn. Hêjîbêtir zînet hate bitevlihevkevtin, gava ku hinekan ji Berpirsiyarên Serdarîyê bi hin gavan ve hatin birabûn, ku wan bêtir metirsî datin bibelavkirin û aramî ji binî de datin bipeqandin û pevçûn di nava heremê de datin bilidarxistin. Ev rastîya hanê di afirandina rengêkî nuh ji Suwaran - Caşan. Cuma- tete bigewdekirin, herwehaji ew hatin biçekkirin û bipiştlêgirtin û ew ji nava serbazxanên serdarîyê de ji bona destdirêjîya li ser azadî û jîyana Neşînvanan de didin bihêrîşkirin. Ew rûdanên, yên ku ew li Sulêmanîyê, Pencewîn û Qeladizê de têtin bikirin, bi baştirîn Bînvanên zindî ve têtin biderkevtin.

Bi rastî ve û li ser yên çûyî de em dikarin bidin bigotin, ku şer bi carekê ve ji 29 axlêvê de nehatîye birawestandin û bi dehan ve di vê pêla hanê de Kuştî û Birîndar hatine bikevtin. Çûn li ser vê yeka hanê de dê zînetek pir bi tirs ve bête biafirandin; jiber ku şerkirin ligel hevdû de çend jî ew bi sivîkî jî ve bêtin biderkevtin, dibe ku ew ji bona encamên pir nebaş de bêtin bipêşvexistin. Ev bi xwe jî ve bi bê dilê Sozdarên vî welatê hanê ve têtin biderkevtin.

Ji rexekî din de hin ji Berpirsiyaran de pirsra Kurd bes û bi tenha ve di nava danava avakirina Jor de dane bixistin, ku jê jî tu tişt jî nehatîye bicîanîn, tevî ku divabû ew pir guh ji bona pirsra Kurd de ji tevaya alîyên wê de piştî derbasbûna pênc salan ji derd û destanan de di ser wê re bidana bidan.

Ji rexekî sêyem de Berpirsiyarên Gewre dest bi berdana peyvan ve dane bikirin, ku ew têde bi navdûxistinên pir mezin û dûr ve ji rastîyê û rastê de didin bixistin, ji yên ku bes û bi tenha ve Xwedawendê Mezin dide bizanîn.

Em remanên xwe ji xakê welêt û ji canê biratîyê di nava Ereb û Kurd de didin biwergirtin û tu givaştin nikarin li ser me de bidin bikêrkirin, hegerjî kanîya wan ji kû derê jî de bête biderkevtin.

Tête bizanîn, ku Xwefiroşên kevin û nuh û hin ji Berpirsiyaran de, ji yên ku ew li ser kîsê şerê di nava Biran de bi nexweşîya ziktilêrîyê ve hatine bikevtin û ew bi rolek şermezarî ve di afirandina pevçûnan de, di peqendina bîr û bawerîyan ligel hevdû de û di nokirina pevçûnê de di nava pêwendîyan de didin biyarîkirin, da ku ew destanên berê bidin bivegerandin û da ku bêtir ji xwe re malê vî miletê xwegirtî û bêhnfireh bidin mijinadin.

Bi rastî ve me gelek hêvîyên mezin li ser serdana Serokê Komarê ji bona Jor de û ditîna me ligel serwerîya wî de date bidanin. Me ew pir bi nêzik ve li ser girêkan de date biagehdarîkirin.

Neşînvanan wetov ji xwe re didatin bigûmankirin, ku Serwerîya Serok ligel xwe de kilîta vekirina girêka pîrsa Kurd dayite bihilgirtin, gava ku wî berê xwe ji bona Jor de date bivekirin. Tevaya hêvî û awatên wan ber bi wê serdanîya hanê ve dihatin bikişandin û herwehaji bi wê serdanîya hanê ve tevaya dostên Iraqêyî dilsoz pê dihatin bibextiyarîkirin. Tevî li hemû giringbûna wê serdanana hanê û kêra wêyî baş jî de li ser hemû Neşînvanan jî de bi peraş ve wetov tête biderkevtin, ku hin destên wêrankirinê xwe di nava dam û destgehên hestyar û bilind de didin bihêlînkirin, yanjî ew xwe li dor û berên serdarîkirinê de didin bikomkirin, da ku ew nedin bihiştin, ew sozên wergirtî bêtin bicihanîn. Ew wan tiştan didin biherifandin, ji yên ku ew ji bal destên avanîkirinê de têtin biavakirin û hiç bi dilên wan ve nayêtin bikevtin, ku biratîya Ereb û Kurd bête bihîmkirin û yekîtiya welatî bête bixurtkirin. Ew bes û bi tenha ve dixwazin, ku welat careke din ji bona nava destana cenga navyweyî de bête bivegerandin. Ji vê pê ve tu têgihîstinên meyî din li ser hiştina vê zîneta bed de nayêtin biderkevtin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku em li gora karînen xwe de bi hemû karekî ve di nava vê zîneta dagirtî de bi nobûnen xwe ve û pir

dûr ji bawerî, piştgirêdanê de ligel hevdû de û nebûna girawkirinan hatin birabûn û em bi van karên hanê ve hatin birabûn:

Me hemû Dîlvan bi carekê ve û di yek carê de dane biberdan.

Me hemû rêyên giştî dane bivekirin.

Me Istgeha xwe ji dawêşandinê de date birawestandin.

Em bi vegerandina serpereştîyên cih ve li gora peymanana rawestandina şer de pê hatin birûniştin.

Me piraniya çekên giraniyê serdarîyê ji bona Berpirsiyaran de date bizîvirandin.

Bi rastî ve em bi hemû karekî ve hatin birabûn, ji yê ku wî ji bona serûştîkirina zînetê di heremê de didate bikêrkin.

Debera em ji xwe re li kar û barên kirî de ji bal serdarîyê de li gora peymanê wê de bi xwe jî ve bidin bitemaşekirin. Di pêşgotina wê de wetov hatîye binivîsandin: „ku ev serdarîya hanê dide bixwestin, ku ew sînorekî ji bona vê rewşa ne serûştî de di tevaya hêlên Jorî Welêt de bide bidanin.... Ji bona dubarekirina li ser bestîyên rastî heyî de di navbera Ereb û Kurd de, yên ku ew ji bona karekî dilsoz û hestiyar de ji bona qenciya welatê hevbeş de didin bibangkirin, em vî bernameya hanê didin bidazanin û herwehaji em pêgîriya xwe pê bi carekê ve didin biderxistin, ku dê em wê bi navroka wê û canê wê ve bi leztirîn dem ve li gora karîne de bidin bicîanin“.

Em pir bi başî ve didin bidîtin, ku em vê peymanana hanê bend bi bend ve li gora rêza wan de li ser de bidin biaxivtin:

Rewş û zînetên ji rêderketîyî heyî de ji bona piraniya Serdaran de bi dilên wan ve têtin biderkevtin û desteyek ji yên tundrû ji wan de daxwaza vegerandina pêkanîna Civata Rêberîberîya Şûreşeyî avêtî didin bixwestin, ango ew ji bona çesipandina zînetên ji rêderkevtî de didin bikarkirin, ji yên ku jê mîlet di nava salên çuyî de pir tirs û talî ji xwe re dane bixwarin. Herwehaji ev tevde ji bona danîna destûra hergavî û yasayîkirina wê de didin bidûrkin, ya ku têde divabû „li ser mafeyên milîyî Kurd de bihata bidubarekirin û ew bi bêtir ve bihatana bieşkerekirin, ku bi diyar ve bi pêrûniştina milîbûna Kurd ve û bi mafeyên Kurdî milî ve di nava welatê Iraqeyî yek de bihata bikirin, ku welatê Iraqê du milîbûnên serokî ji Ereb û Kurd di nava xwe de dide

biwergirtin, ku têde Ereb û Kurd bi wekhev ve bi xwedanê mafeyan û erkan ve têtin biderkevtin“.

Qanûna Parêzgehan hêjî ji xwe re ronahî nedaye bidîtin, tevîjî ku di peymanê jî de hatîye binivîsandin, „ku ew xwe di rêya qanûnkirina xwe de dide bidîtin“. Tevjî ku ew ji bendên bingehî ve tête biderkevtin, ji yên ku ew di nivîsandina sipartina Nacî Talib ji bona pêkanîna Wezaretê ji bal wî de têtin biderkevtin. Wetov ji bona Nacî Talib pê hate bisipartin, ku ew Rêstika Nenawendî bide bicîanîn û beşdarîkirina Neşînvanan di kar û barên wanî cihî de û şehrebanîyê de bi yasayekî ve bide biderxistin û divê wê qanûnê hanê jî bide bicîanîn. Ango pêrabûna Kurd bi beşekî mezin ve ji mafeyên xwe ve, ji yên ku serdarîyê di peymana xwe de bi wan ve hatîye bipêrûniştin, bi derkirina qanûna Parêzgehan ve tête bigirêdan, ya ku Berpirsiyarên Gewre di nava dewletê de xwe pê didin bidiyarkirin, ku ew dixwazên dev ji derkirina wê qanûna hanê de bidin biberdan.

Pêrûniştina serdarîya bi zimanê kurdî ve bi nala zimanê mîrîyî xwendinê ve di nava heremên, ji yên ku têde pîranîya Neşînvânên wan ji Kurd têtin biderkevtin, hêjî pesindana qanûnî jê re nehatîye bidan. Wetov bi vî corê hanê ve hîç tu pêt jêre ji alîyê bicîanîna wê qanûna hanê de pê nehatîye bidan.

Heger ku bi rastî ve nêta bi pêrabûna helbijartinê ve di nava sinorên demî de bête biderkevtin, ji yên ku destûra demî jêre dayite bidan û ji yê ku millet pîr daxwaza wê helbijartina hanê jî dide bikin; jiber ku dê ew helbijartina hanê mafeyê wîyî rewa di serdarîkirina xwe de jêre bide bivegerandin. „Em didin bigotin, heger ku nêt bi rastî ve ji bona wê yeka hanê de tête biderkevtin, bi başî û qencî ve tête biderkevtin, ku jê re amadebûn bi berdana azadîkirina giştî ve mîna azadîya rojnamevanîyê, azadîya rêxistinê û yên din bête bikin, da ku helbijartin bi rengekî serûştî ve bêtin bikin. Belam heger ku her tişt bi mîna xwe ve hate bimayîn, dê wê çaxê bawerîya Neşînvanan bi pêrabûnên helbijartinê ve di dema wê de bêtin bigizkin“. Dê ev jî bêtir û bêtir dûrbûnê di navbera millet û Serdaran de bide bixistin, ku dê ev jî hêjbêtir û bêtir dujminatîyê bide bidurustkirin û bawerîyê bi ayind ve bide bikêmkirin.

Li pêşîya Kurd de ber ji bona beşdarîkirina wan ligel birayên xweyî Ereb de di karmendîyên giştî de û têde jî di nava wezaretan de û

di nava karmendîyên serpereştîyî giştî de, herwehajî di nava karmendîyên serpereştîyî dadgehan, diplomasî û sipahî de ne li gora endazîya amara serjimara wan de û ne jî hêjî bi endazîyeke pir kêmjî ve bigir hatîye bivekirin. „Herwehajî ji biçûktirîn karmend, ji yên ku ew ji ber hoyên pirsra Kurd de hatin biderkerin, ji bona ser karmendîya xwe nehatin bivegerandin, herwehajî bi hîç corekî ve tu kes ji bona ser karmendîyên xweyî hestiyar nehatin bivegerandin“. Herwehajî tête biderkevtin, ku di listên Wergirtvanan de di kolêca Sipahî, Balafirvan, Polîsan de ji bona vê sala hanê de bes û bi tenha ve endazîyeke pir kêmjî Kurd têde têtin biderkevtin. Hîç Xwendevanek ji bona nava van kolêcan de nehatî biwergirtin, ji yên ku pêwendîyên wan ligel şûrêşê de dihatin bidîtin. Magelo dê çawan di ayinde de wekhevûn ji bona Kurd bête biderkevtin?

5. Although the Great National Assembly may decide whether the Assistant Governor-General shall be a Turk or a Kurd, he shall, nevertheless, be elected directly by the Kurdish National Assembly. The nomination of the Governor-General, the Assistant Governor-General and the inspector must, however, be submitted for the approval of the Angora Government.
6. The Kurdish National Assembly shall be formed in the eastern provinces by elections based upon universal suffrage, and the mandate of each Assembly shall be for three years. The Assembly shall meet on the 1st March each year, and will sit for four months. If, during this period, the Assembly is unable to complete its labours, members and with approval of the Governor-General.
7. The General Assembly shall have the right to examine the budget of revenue and expenses of the administration of the eastern provinces and enquire into injustices to which subordinate civil and administrative officials may be exposed. The Assembly may take definite decisions concerning the advancement and the prosperity of the country, and all these decisions shall be communicated to the Angora Government for the information of the Great National Assembly.
8. The Great National Assembly shall decide in all disputes between the Governor-General and the Kurdish Assembly, and both parties must submit to its decision.
9. Pending the settlement of boundaries by a mixed commission, the administrative area of Kurdistan shall consist of the provinces of Van, Bitlis, Diyarbakir and the sanjeks of Dersim, together with certain cases -Kazas- and the nahies -nahiyes-
10. With regard to the administration of Kurdistan judicial organisation shall be created in harmony with local usages for special areas. For the time being this organisation shall consist of competent officials, half of whom shall be Turkish

---

and other half Kurdish. Upon retirement of the Turkish official the may be replaced by Kurds.

11. From the date of the application of this law no taxes shall be imposed either under the form of war contribution or any other form. All fiscal contribution hitherto in vigour shall be abandoned at the discretion of the local administration, and payments of taxes shall be made once a year only. The proportion of net revenue to be paid to the Angora Government shall be settled by a mixed commission consisting of Deputies of the Great National Assembly of Angora and the Kurdish National Assembly.
12. A corps of gendarmerie shall be formed to maintain order in the eastern provinces. The Kurdish Assembly shall elaborate the law governing this body, but the chief administration of the gendarmerie shall be in the hands of high Turkish officials until the conclusion of peace, when those who desire may return to their own country.
13. Kurdish officers and soldiers in the Turkish army shall remain in their present service until the conclusion of peace, when those who desire may return to their own country.
14. After the conclusion of peace the value of all animals and materials requisitioned both during and after the general war shall be a first charge, and shall be paid within twelve months at the latest.
15. The Turkish language only shall be employed in the Kurdish National Assembly, the service of the Government and in the administration of the Government. The Kurdish language, however, may be taught in the school and the Government may encourage its use provided that this shall not be made the basis of any future demand for the recognition of the Kurdish language as the official language of the government.
16. The primary duty of the Kurdish National Assembly shall be to found a university with law and medical faculty.
17. No tax whatever may be imposed by the Kurdish National Assembly without the approval of the Governor-General and before the Great National Assembly of Angora shall be informed.
18. No concessions of any kind shall be granted without first consulting the Great National Assembly of Angora and securing its consent.



1914 - 1918- bi dû perçan ve dihate biderkevtin û ew di navbera Şahînşahiya Iranî û Selteneta Osmanî de di piştî şerê çildêran de di sala 1514 de hate biparvekirin<sup>50</sup> û Selteneta Osmanî ligel Kurdan de di rêya Hozanê Mewlana Idris de peyama sala 1515 de ji bona hiştina Mêrneşînîyên Kurd û serpereştîkirina wan ji bona Kurdistanê date bigirêdan<sup>51</sup>. Ev peymanan hanê wetov hatibû bimorkirin.

---

It wil be understood from this summary why the draft law was opposed with such energy by the Kurdish Deputies as described above.

I have,şc.

Horace Rumbold

High Commissioner“.

Ev ji nivîsta: „The emergence of Kurdish Nationalism and the Sheikh Said Rebellion. 1880 - 1925, by Robert Olson, University of Texas Press, Austin, 1989“ r. 166 - 168 hatiye biwergirtin.

<sup>50</sup> Ji xwe bi dût û dirêjî ve li ser vî şerê hanê û encamên wî de û herwehaji li ser dema wî de bi zimanê Elmanî ve di „Weletgeschichte“ bergê 4, r. 610 - 613, de beramber bi Selteneta Osmanî de û herwehaji beramberî bi vî bi şerê hanê û encamên wî de û dema dewleta Sefewî de li Iranê de di vê nivîsta hanê de, r. 626 - 635 de, VEB DeutscherbVerlaag der Wissenschaften, Berlin 1964 de bidin bitemaşekirin.

<sup>51</sup> Ji xwe re di vî warê hanê de pir û bi dût û dirêjî ve li nivîsata M. M. van Bruinessen de bi zimanê Elmanî ve di bin nav û nişana: „Agha, Scheich und Staat“ -Axa, Şêx û Dewlet- de, r. 186 - 244, Edition Parabolî, Berlin sala 1989 de bidin bitemaşekirin. Ev nivîsta hanê pir bi nex ve tete biderkevtin. Nivîsvanê wêna di vê dema me de pir caran ji bona nava herçar perçên Kurdistanê de hatiyê biçûyîn û li wê derê de xwendekariyên xweyî civakî li ser civaka Kurdistanê de dane bikin. Pir aghdariyên mêtûyî û kanîyîn li ser miletê Kurd de tede tetin biditin û ew bi kanîyeke pir baş ve li ser mêtûwa Kurdistanê û xebata miletê Kurd ve tete biderkevtin. Ew di sala 1975 de di dema kevîna şûreşa Kurdistanê Iraqê de li nik Pêşmerge de dihate biditin û ew ji ligel Pêşmerge de ji bona nava Iranê hate biderbasbûn. Wî pir bi dût û dirêjî ve li ser şûreşa Kurdistanê Iraqê de dayite binivîsandin û tede pir aghdariyên hêja û bir û baweriyên bi nex ve dane biderkevtin.

Ez li vir de Wergerandina Kurmancî ji Xwendevanan re didim pêşkeşkirin. Di bergê yekemî ji Mêjûwa Kurd û Kurdistan de ji bal Mohemed Emin Zekî Beg de bi zaravayê Soranî ve bes û bi tenha nivîsandina hinekî ji koka wêyî Turkî ji Hammer, bergê 4 hatîye biwergirtin û binivîsandin. Di bergê Erebî de Peyman hemû ji bona zimanê Erebî hatîye biwergerandin. Ji vê wergerandina hanê wergerandina Kurmancî hatîye bikirin:

„Hêjayê Hêjan, Nişana Qencan, Rêwîyê Rêya rast, Rêberê Kanîyên Ayînê, Bidîtinvanê dujwarîyên Oldarîyê, Berê Av û Axê, Hogirê Şah û Sultan, Nişana Xelkên Xwedanê Yektayî û Perestên wî Mewlana Şhrezayê Oldarîyê Idrîs, Xwedê hêjabûnên bêtirbike.

Debera, ew bizanibe, gava ku ev Fermana Bilindî Hayonî pê bête gihastin, ku Nameya we bi destên minî bextiyar hate gihastin. Ew bi vekirina tevaya Wilayeta Diyarbekrê dide mizgînîkirin. Evaya jî tevde başbûna Oldarîya we, pêsipartina we, dilsozîya we û rastîya we dide biderxistin, mîna ku ev tevde ji we tete hêvîkirin. Xwedê Ruwê we bide bisipîkirin.

Ger Xwedayê Bilind xwest, dê tu bi hoyê vekirina tevaya Wilayetana bête kirin. Tevaya Guhpêdanên minî bilindî Patîşahî ber bi we ve têtin vekirin û ew ji bona we likarin.

Ligel Manganeyên weyî taybetî tanî Meha Şewala piroz du hezar Zêrê Filorî, Kurkekî Simore û yekekî Weşeq, du bergên Hirî, du bergên Çox, Kurkekî Hirî bi Kurkekî Simore betankirî, Kurkekî Hirî bi Kurkekî Weşeq betankirî û Şûrekî Zêrkirî bi Kalenekî pêcayî bi Coxekî Firengî ez didim rêkirin. Gava ku ew bi te bêtin gihandin, ger ku Xwedayê Merd xwest, dê tu wan bi Xweşi û bextiyarî bide girtin û tê wan ji bona xwe bide xerckirin. Debera, tu bi Xweşi bijî; jiber tu bi hêjayî bi van rengên pir ji Dilovanîyên minî Patîşahîyî bi nerx tete biderbikevtin. Evanan jî tevde ji bona karên te û Diyarîne ji bona Rastî û Dilsozîya te ji te re têtin pêşkeşkirin.

Jiber Mîrên, yên ku ew ji Diyarbekir hatin û wan bi dû te dan, tu li ser zînetana wan, li ser Nav û Nişanên wan, li ser Sinceqên Wilayetê, yên ku ew ji bona wan divê bêtin binîşankirin, li ser Dostanî, Dilsozîya, Karnasî û kar û barên wan agehdare; jibervêjî min ji te re Fermanên Patîşahîyî Bilind Sipi bi Mora minî Bilind hatîye

bimorkirin û ew ji bona Rûmetvanên Mîrên Mezin, Piştî Serbilindên Gewre, Xwedîyê karin û rêzlêgirtinê, Xwedîyê Nav û Nîşanan, Piştigirtvanê bi rengên pir ji layê Xwedayê mayînê, Mîrê Mîrên Diyarbekir Mohamed Xwedê ber wî xweş bike.

Divê hûn belgeyên Sultanî li ser zînetî Sincenqên, yên ku hûn wan ji bona her Mîrekî didin nîşankirin, bidin binivîsandin. Herwehaji Nav û Nîşanên wan jî, erdên bi wan dayî bi renegekî baş û bitomarkirina wêneyên wan belgeyên Sultanî bi dûr û dirêjî û perên ji bona wan nîşankirî di Deftereke taybetî de bête nivîsandin û ew ji bona nik min bête binardin. Da ku ew li vêderê de bête hilanîn û her tişt diyar û liberketî be. Herwehaji ligelî bîrxistinek dûr û dirêj li ser Sincenqan-melbandan, yên ku te ew ji bona Mîran dane pêşkeşkirin û çawabûna dana wan, şeweyê nivîsandina nav û nîşanên wan û Diyarîyên wan bi mercekî ev biparvekirin û danên hanê bi kokê nedin kêrkirin, da ku ew pêwendîyên di nava wan de neyêtin lawaz û lerizandin.

Herwehaji min ji te re pelên Sipî morkirin bi nîşana Bilindî Sultanî datin rêkirin, da ku tu wan ji bona wan Mîran bide binivîsandin, yên ku tu nivîsandina wan baş dibîne. Tu li gora kêfa xwe dikare wan bide binivîsandin û wan ligel Diyarîyên Patîşahî bide rêkirin. Di pişt re tu dikare wêneyên wan belgeyên Sultanî, çawabûna diyarîyên wan û şeweyê reftarkirina ligel wan de di deftereke taybetî de bide bitomarkirin û wê ji bona nik cihê min bide rêkirin, ya ku ew penebûna dunyayê ye. Da ku her tiştêk bi dûr û dirêjî ve bi diyar ve bête biderkevtin.

Guhpêdana Sultanî di vî warê hanê ew li ser mebesta minî qenc bû. Ger ku Xwedayê Bilind xwest, dê mêldarîya min li ser wî wari de bête bigirêdan. Bawerbik, ku Mêldarîya min li ser wan Mîran pir ji hevîya wan mezintir tete biderbikevtin.

Neha Ismaîl El-Delalî Kurê Şêxê erdebîlî Hesên Beg û Behram Axa ji Peyên xwe bi Peyamberî ji bona nik cihê min dane birêkirin. Wan kaxezê nivîsandî bi xwe re anîne, ku ew tede pir rengên jêrbûnê, berdestîyê, xwebiavêtine, şelafîyê û donkirinê ji bona bigirêdana Lihevhatinê û Aşîtyê didin biderxistin. Ew dibêjin, ku ew bi tevaya daxwaz û xwestîyên me bê qeyd û şert pê têtin birûniştin. Lêbelê divê bawerî bi peyvên wî û neta wîyî pak neyete kirin; jibervêjî min fermana zindankirina Herdu Peyamberan di keleha Dîmotqê de û

Peyên wan di keleha Kilîd El-Behir de date bidan. Divê li ser te, tu ji ji aliyê xwe de bi baştirîn pêrabûn beramber bi yê navkirî bête birabûn, da ku ew pir bi pêgîrî ji bona kar û barên û berjewendîya dewleta minî hermayî di dirêjbûna rojan de bi kêrbin.

Di dawî de ez hêvîya kar û barên bilind û bi şop ve ji te didim bikirin. Vê bizan û piştî xwe bi Nîşana minî pak ve bide bigirtin.

Di Navîna Meha Şewala Pîrozî Sala Nehsed û Bîst û Yekê Koçî de di cihê Xanîyê Xilafetê de hatiye binivîsandin. Ederne.

(Pêşîya çirya duwem sala 1515 z. de)“.

Ev peymanî hanê di sala 1846 de ji bal selteneta Osmanî de hate bihilanîn<sup>52</sup>. Der sala 1847 de dawîya Mîrneşîniya Kurdîyî Berdixanîyan li ser destên Selteneta Osamanî de hate bidawîkirin. Ji vê pêlê û pêve pêla Şêxîtiyê di nava kurdistanê de bi xurtî ve date bidestpêkirîn û di pêşî de ew ji bal dewleta Selteneta Osamanî de pişt li wan de dihate bigirtin û piştî ku wan cih ji xwe re dane bigirtin û xwe dane bixurtkirin, wan serên xwe li ber dewleta Selteneta Osamanî de datin biberzkerin û di pişt re hemû serhildan û Şûreşên Kurdistanê li ser destên Şêx û Merovên Oldarî de jiber cihên wanî dunyayî û oldarî di nava civaka kurdistanê de dihatin bidestpêkirin û wan rêberîya

<sup>52</sup> Ji xwe re li Helmuth V. Moltke de di nivîsta wî de bi zimanê Elmanî ve li jêr navnîşana: “Unter dem halbmod -Erlebnisse in der alten Türkei- „ -Li jêr Nivheyvê de, dîtînen min di Turkiya kevin de ji sala 1835 - 1839 de, r. 220 - 340, Verlag NEUES Leben Berlin 1984 de bidin bitemaşekirin. Moltke (1800 - 1891) yekek ji gewrefîn û bi nav bangtirîn Sipahdarên Elmanî ve tete biderkevtin. Ev nivîsta wî bi namên wî ve tete biderkevtin, yên ku wî ji bona Elmanya li ser rewş û zinetên Selteneta Osmanî de didate binivîsandin. Wehajî wî di çend nameyên xwe de xweser li ser Kurdan, welatê wan Kurdistanê de û şerên Selteneta Osmanî ligel wan de date binivîsandin, di yên ku ew ligel sipahê Osmanî de bi çavên xwe didatin biditin. Ev nivîsta bi baştirîn nivîst li ser Selteneta Osmanî de di herifandina wê de tete biderkevtin û herwehajî li ser Kurd de bi pir belgeyekî mêjûyî bilind ve tete biderkevtin. Bi destên Moltke ve (1800 - 1891) bi nala Sipahsalarê Elmanê ve di 2. 9. 1970 di şerê Sedan -Sîdan- de dîlkirina Patîşahê Firensî hate bikirin û di sala 1871 de bi saya vî şerê hanê ve û bi saya siyaseta Bismarck ve (1815 - 1898) Elmanya li Kaxa Vesailles -Feresay de Yekitiya Elmanya hate bidazanin; jiber ku Elmanya di berê de bu 2 000 herên Gumrikî ve û bi 360 Mîrneşîni ve dihate biderkevtin.

xebata rizgarîkirina Kurdistanê ji nava lepên dewleta Selteneta Osamî de bi ser milên xwe ve dane bihildan. Wan pir bi dilsozî ve ji bona azadîkirina welat û milletê xwe dane bixebatîkirin û pir mal û can bi merdayetî ve di wê rêya rûmetê de dane bigorîkirin. Ji gewretirîn û giringtirîn şûreşên milî de di Kurdistanê de di vê pêla hanê de Şureşa Şêx Ubeydul-Lahê Nehrî der sala 1880 ji bona serxwebûna Kurdistanê tete biderkevtin.

Li ser bingehê vê peymanê Sayks - Piko de ji dêlva du perçebûna Kurdistanê ew di encamê dawî de ew ji bal Impiryaliya Ingilîz û Firensî de ji bona berjewendîya ji bona çar perçan hate biparvekin. Beşek jê bi ser Irqê ve di peymanê sala 1926 de piştî çarekirina pîrsa Musilê di navbera Ingilîz û Turkan de hate bikirin û beşê din jî jê di sala 1922 di navbera Firensa û Turkan de li ser bingehê peymanê Enqera de hate bikirin.

Basîyên faşîyên Surî di bin Reberîya Mişêl Eflaq de ev rastîyên mêtîyî bi carekê ve dane bijîbîrakirin û wan her û her dixwestin Kurdan di lûla Erebi de bidin bihildandin; jîbervêjî ve wan der sala 1962 de Amara jirêdekevtî de li ser Kurdan de datin bicihanîn, ku bêtir ji sedûbîsthezar Kurd ji mafeyî Neşînvaniya dewletê hatin bibêpişk û bibêparvekirin û herwehaji jîbervêjî ve wan Kembera Erebi di Kurdistana Surî de li ser tuxûbên Turkî de bi dirêjbûna 350 Km û bi panbûna 15 tanî 25 Km ve dane bicihanîn.

Rojnama El-Munadil rojnameyeke siyasî ye, ya ku ew ji bona nava hundurê partîya Basî Surî de ji bal Rêberîya milîyî Partîya Basî de tete biderkevtin, jîmar yanzdeh, nivê befirbara sala 1966 de wetov li ser „Pirojeyê Çandîyên Dewletê di Parêzgeha Heseke“ de bi dûr û dirêjî ve dide binivîsandin. Em bes û bi tenha ve ji bona li berkevtinê de hinekî ji vê rojnama hanê de hinekî ji xwe re didin biwergirtin û ji zimanê Erebi didin biwengerandin. Belam pir bi baş ve tete biderkevtin, ku tevaya piroje bête bixwedekarîkirin, da ku bêtir ji li ser vê pirojeyê rehperestîyî Basî de bête biliberkevtin. Ev pirojeyê Çandîyên Dewletê di Parêzgeha Heseke de wetov dide bidestpêkirin: „Metirsîyên ku Impiryaliyê dane bi durustkirin û yên ku ew ji bona milletê me yî Erebi de di Jorî Iraqê de hatinê û têtin birûkirin, wan dane bidestpêkirin, ku ew serên xwe li Parêzgeha Heseke de ji bona me ji berî çend salan de bidin biberzîkirin, ev jî dide bi pêwîstîkirin, jiber ku

piranîya serdarîyên çûyî di serguhên xwe re çarekirineke Erebyî ji rehan de van metirsên hanê dabûn biavêtin. Jibervêjî Munadil ji bona beşdarbûna wêna di vî karê hanêyî giştî de ji bona nava destên Hevalan Pirojeyekî pêşyî ji raportekî dide bixistin, ji yê ku Nivîsgeha Cotkaran li ser hin pêrabûnên bi cihatî de û ji yên pêşneyarkirî de ji bona rû bi rûkirina vê pêrsa hanê ve di ayinde de bête bikin“.

„Li ser Zineta Serûştî de:

Tevaya topraxa giştîyî ji bona vê xêza hanê, ya ku em di derbarê wê de didin biaxivtin, bi 3001911 Donim tête biderkevtin û ew li ser dirêjîya sînorê Iraqê Suriyî Jorîyî Rojhilatî de ji herema Malikîyê di navbera gundên Til Ehmer û Qelet El-Husen li ser sînorê Iraqê de tanî sînorê cudakirî di navbera Parêzgeha Hesekê û Reqa de di navbera Til Qelîe û Rechan de û dorhêlên wan de û ji Bîr Xatun tête biderkevtin, ya ku ew di navbera 454 heremên çandinî de tête bibelavkirin“<sup>53</sup>.

<sup>53</sup> Ev navên hatîyî Erebi bi carekê ve ji navên Kurdî hatine biwergerandin; jiber ku siyaseta Basî wetov didate bixwestin, ku navên Kurdî bi darê zorê ve mîna kirina Turkan di Kurdîstana Turkî de ji xwe re ew di Kurdîstana Suri de bidin bierebkin. Herwehaji navên Kurdî di tomarkirina Zarokan de nedin biwergirtin, da ku ew heremên Kurdî û Merovên Kurd bi navên Erebi ve bidin bierbkin.

Bav û Kalên me di pêla Musulmantîyê de navên Ereban ji dil û can li Zarokên xwe de didatin bikin; jiber ku ew bi Musلمان ve dihatin biderkevtin. Herwehaji Miletên Iranî, Pakistanî, Turkî û pir miletên dinî Musulman jiber oldariya musulmantîyê navên Ereban ji dil û can li Zarokên xwe de didatin bikarin, Magelo ew bi Erebi ve dihatin biderkevtin? Herwehaji piraniya navên miletên Eropî ji bona nimûne jiber oldariya filetîyê ve bi navên Cuhani ve têtin biderkevtin, magelo ew miletên Eropîyî hanê bi miletê Cihû ve têtin biderkevtin?

Belam Basîyan didatin bixwestin, ku ew bi darê zorê ve navên Kurdan bidin bierebkin. Magelo dê Kurd wetov bêtin bierebkin? Herwehaji magelo dê welatek û miletek wetov mîna Kurd bi vê siyaseta hanê ve ji ser ruwê zimînê de bête bihilanîn?

Serpêhatîya mêjûwa meyi tirş û tal ji me re dide bi eşkerekin, ku wetov ji Rom welatê me nala Zarokên Omer di destpêka nivê sedsalê heftehemîn de bi saya buhuşta evsana Erebi ve didatin bikavil û wêrankirin û dewlemendiya wî ji xwe re didatin bitalankirin û miletê me ji xwe re bi sedan sal ve didatin bikole û bendekirin. Belê wan em her û hej di nava xwînê de didatin bivegezandin, her gava ku me didate bigotin, ku em jî merovin û bi serdejî ve em kurdin.

„Tevaya gundên di vê heremênê hanê de bi 385 gund ve têtin biderkevtin; jibervêjî ve remankirin bi hilanîn û danîna wê ve bi vî rengê hanê ve di nava derbasbûna salan re dê pir dijwarîyan bidin bidurustkirin, Jibervêjî ve em didin bipêşneyarkirin:

ku fermaneke yasayî bête biderkevtin, ku ew vê herema hanê ji Xwediyên wan bide bisitendin û bi mafeyê dewletê ve bête biderkevtin, ku ew wê herema hanê li gora xwestina xwe de bide

Belam bi saya zurna sor ve Ebcêd Hewez roj bi roj ve tête bitarûmarkirin û gemara buhuştaya evsana Ereb ji nava nivî mejîyê me tête bimalandin û derdên giranî Yariyan piçekî ji nû ve di vê serdema Newroza Kurdistan me de tête bidermankirin.

Hewara Pîrên Moganên min ji nava Laleşa peresta Bav û kalên min di nava bextê mêjûwa me de ji nû ve bi xurtî ve di dema şiyarkirina milî û rizgarîkirina Kurdistanê de ji bin gemara tapanên Rom, Ereb û Ecem de tête bibilindkirin.

Her Mîletek di vê dunyayê de di ayîn û oldarîya xwe de divê bi zad ve bête biderkevtin û rêz û hêjabûn li tevaya oldarîya wan de bête bigirtin, lê rojekê ji rojan de ne ayînî û neji oldarî ji bona bendekirina mîletekî divê neyêtin bikaranîn, mîna ku tanî neha ew ji bal Ereb û Rom de bi beramberî mîletê Kurd ve di Kurdistanê de hatîyê û tête bikaranîn.

Çi gava ku ev hate bikirin, bi neçarî ve li ser serpêhatîya mêjûwa mîletan de her û her ew ayînî û oldarî ji nava wî welatî û mîletî bi darê zorê ve bi hinera qanûnên jînê ve û bi derbasbûna demê re hatîye biderkirin û bihilanîn yanjî ew ji nû ve hatîye bimilîkirin, mîna ku ev di sedsalên Vejanî de li Elmanîya de di rêya Pîrotîstîyê de, li Ingilîstanê de di rêya Engilîkanî de û herwehaji di pir Welatên dinî Ewropî de bi milîkirina Filetîyê ve hate biderkevtin û tevaya Oldarîyê di bin zalbûna dewletê de mîna hercar di seranserîya mêjû de û ji bona qazanc û berjewendîya wêyî milî dihate bidîtin. Wetov bi carekê ve cudabûn di navbera ayînê û dewletê de hate biderkevtin. Ayînêyê xwe ji destdirêjîya siyaseta di nava dewletê û civakê de bi carekê ve date bikişandin. Belam ji bal dewletê jî de pir rêz û hejabûn ji bona dam û destgehên ayînî de dihatin û têtin biderkevtin.

Herwehaji tanî radeyekî biçûk jî ev di pêla Ebasîyan jî de dihatê biderkevtin û bi Firskirina Musulmanîyê ve di rêya Rêça Şîî de di pêla Sefewî de di sedsalên Panzdehan de ev hate bitac û bixelatkirin, berî ku ev karê hanê li Ewropa Vejanî de bête bikirin.

Tevaya mêjûwa ayînî û oldarîyên kevnar di Rojhilat de û himjî di Rojava de vê rastîya tirş û tal dide biderxistin.

bihilanîn û bidanin; jiber ku zînetê neha nikare bête bihiştin, mîna ku me dabû bi pesinandin.... Herwehaji jiber ku piraniya Xelkên vê herema hanê, ji yên ku mulkên wan têde têtin bidîtin, ji Merovên ne Erebi têtin biderkevtin.

Divê serûştîya Xelkên vê heremana hanê di rêya barkirinê de bête biveguhertin û herwehaji divê Ruwên ne Erebi ji vê herema sinorî bêtin bidûrkin.

Rojnama El-Munadil bi dûr û dirêji ve li ser vê herema hanê de ji aliyê civakî û siyasî de dide biaxivtin û çilo û çawan dê wê bi baştir ve bidin bierebkin.

Herwehaji Partiya Demokrata kurd li Surî de bîrxistinek bi dûr û dirêji veji bona Serokê Dewleta Surî de di babetê Kembera Erebi de di 15. 9. 1966 de date binardin, ku têde careke din tevaya zordariya siyaseta Dewleta Suriyî nerewa beramberî miletê Kurd li Surî de dide biderxistin. Herwehaji ew di wê bîrxistina xwe de dostaniya kurd û Erebi mêjûyî ji pêla cenga Xaçperestan û herwehaji di pêla kolonyaliya Firensî ligel miletê Erebi dide biderxistin. Herwehaji ew di wê bîrxistina xwe de dide biderxistin, ku ev karê hanê ji bal Kevneperestiya Erebi beramber bi Kurd ve tête biderkevtin û ew ne bes bi diji Kurd ve; lêbelêji bi rastî ve bi diji berjewendîya miletê Erebi ve di dawîya dawî de tête biderkevtin.

Partî pir nimûneyên wê siyaseta Kembera Erebiyî sitemkar de li ser Kurdan dide bianîn û ew ji bona ji bona Serokê Dewleta Surî dide bibangkin, ku ew wê Kembera Erebiyî zordar û sitembar beramber bi miletê Kurd ve li Surî de bide bihilanîn; jiber ku siyaseta hovînî di nava tu welat û dewletan de di vê dunyayê de nehatiye biserkevtin û hêjbêtir pê tu pirsî milî ji nehatine biçarekin.

Di dawîya dawî de ev bi bîrxistina hanê wetov tête bidawîkin:

"Herbijî xebata milet li pênavê serdarîyeke demokrasiyî rasteqî.

Herbijî biratiya Erebi û Kurd, ya ku ew bi tehtekê ve tête biderkevtin, ku li ser wê de tevaya siyaseta Kevneperestiya têtin bitarûmarrkin".

Wetov hîç ev Merovên Rehperestên haneyî Erebi nizanîn, ku Kurd ji berî bêtir ji pênc hezar sal ji pêla Somerî de û tanî neha de û bi bê birîn ve li vê herema hanê de li jêr hemû hilat û dihatin jînê de têtin



bijîyandin. Ma dê çilo û çawan ev Basîyên çepel û gurîyên mêjûwê vî milletê hanê di vî sedsalê me de, belê di vê serdema me de bi darê zorê ve û bi vê siyaseta rehperest ve bidin bierebkin? Her Merovekî, yê ku ew ji xwe re mêjûwa merovanîyê piçekî dide bizanîn, bi başî ve têtê biliberkevtin, ku Basî bi vê siyaseta xwe ve di encamê dawî de bi lez ve di nava Kurdistanê de gora xwe ji xwe re didin bikoandin, yanji dê pir bi leztir ve xwe ji nava Kurdistana meyî perest de bidin bipengizandin û ev jî dê pir bi ziyar wan ve di dawîya dawî de bi neçarî ve bête biderkevtin û herwehaji dê ew di encamê dawî de ji neft û ava Kurdistanê bêtin bibêpişkirin û bibêparkirin; jiber ku ew neft û ava hanê di Kurdistanê de bi bomba demê ve li bin lingên wan de têtê biderkevtin; heger ku ew wetov li ser vê siyaseta Basîyî faşî de beramber bi çarekirina pirsê Kurd û Kurdistanê ve bidin bireftarîkirin û heger ku ew wê li ser bingehê mafeyê çarenûs de bi aşîfî û demokrasî ve li ser berjewendîya milletê Kurd û Ereb de nedin biçarekirin. Magelo dê milletê Ereb li ber vê rastîya tirş û tal ve bête bikevtin? Ez bersîva vê pirsê him ji bona Dilsoz û Zanistvanên Ereb de û himjî ji bona demê de didim bihiştin.

Basîyên faşîyên Efleqî bi xurtî ve bi erebkirina Kurd ve di kurdistana Surî de dane bidestpêkirin. Jibervêjî ve di vê dema erebkirina Kurd û Kurdistanê de ji bal Faşîyên Efleqî de di Surî de ew hêrîşa rehperestî ji bal Basîyên Surî bi xurtî ve li ser Peymana Avdarê de dihate bikirin, Jiber ku di wê peymana hanê de bi şeweyekî demokrasî ve bi mafeyên milî ve ji bona gelê Kurd di Kurdistana Iraqê de pê dihate birûniştin û ew bi rast û durust ve bi dîjî siyaseta regezperestîyî faşîyên basîyên Efleqîyî Surî ve dihate biderkevtin. Bes û bi tenha ve gurî, kotî û çepelên mîna sêwîyê Efleqê faşîyê Ereb ji xwe re didatin biremankirin ku dê ew bikaribin Kurd û Kurdistabê di sedsalên bîstan de bidin bierebkin. Van kesên mîna Efelq di nava Ereban de tevî li hemû pêgihîştina derd û ziyarên wan de ji bona milletê Kurd de di xebata wî de ji bona serxwebûnê deha ziyarên gewretir û malwêrantir wan di encamê de bi millet û welatên Ereb ve datin bigihandin. Herwehaji ew bi vê siyaseta hanê ve pir ji bona pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve di nava Kurdistanê de pê didin bilezkin.

Ev rastîya hanê li ser bingehê serpêhatiya miletan de di tevaya dirêjbûna mêjûwa xebata wanî milî de ji bona serxwebûnê û ji bona rizgarîkirina wan ji nava lep û pencên Dagirkerên xwe de rep û rast tête biderkevtin.

Li gora têgihîştîna diyalêktîka felsefa mêjûwê de li ser ramana Aristo, Xanî, Hegel û Marx de bi êşkere û diyar ve tête biderkevtin, ku Merovên mîna rehperestên Mişêl Efleq di nava Ereb, Rom û Ecem de deha bi leztir û bêtir ve ji bona me Kurdan ji bona serxwebûna tevaya Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve didin bikarkirin. Heger rojekê ji rojan jî bihata bidîtin, ku Merov ji Dujminê xwe re li ser diritî û hovîtîya wîna de bida bisipaskirin, wetov dê bihata biderkevtin, ku divabûn Kurd ji bona bi lezkirina serxwebûna tevaya Kurdistanê û pêkhatina dewleta wanî milîyî serbixwe ve ji bona wan Merovên mîna Mişêl Efleq di nava Ereb, Rom û Ecem de bidana bisipasîkirin. Belê ev tirş û talîyên hanê tevde di diyalêktîka jînê de têtin biderkevtin. Di erînê de nayîn tête bipeyda kirin û di nayînê de erîn tête bipeyda kirin. Cîhan ne li gora dibijandinê yan jî kî nê de hate biavakirin û ew ne ji ne ji li gora dibijandinê yan jî kî nê de dê bête biwêrankirin. Di pêşî de ne gotin dihate bidîtin, belam mîna ku Gotê di Fawist de dide bigotin, ku di pêşî de Kar tête bidîtin.

Çi gava ku merov bi rast û durustî ve li ber vê qanûna diyalêktîkî de bête biliberkevtin, Merov dikare bi hêsanî ve pêşbînîya tevaya xebata miletê kurd ji bona serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve bide bidîtin û hêjbetir rê û banên hêsantir bi kêm gorîtir ve û di demê de bi kurtir ve ji bona serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve bide bipeyda kirin û ji bona vê armanca perest ji bide bixebatkin.

Pirsa miletan di tevaya mêjûwa Merovanîyê de bes û bi tenha ve li ser bingehê zanebûn û zanistîyê de hatiye biçarekirin û ew bes û bi tenha jî ve li ser bingehên zanebûn û zanistîyê de dikarin bêtin birizgarîkirin û ew di hemû warên jînê de dikarin bêtin bipêşvekevtin û bigeşkin. Di tevaya mêjûwa Merovanîyê de ji dema nivîsandina wê de ji berî şeş hezar sal û bêtir de hemû qanûn, yasa, ayîn û xwedan bes û bi tenha ve ji bona kara dewletê hatine bipeyda kirin û biafirandin. Çi gava ku miletetekî di seranserî mêjûwa nivîsandîyî Merovanîyê de ev rastîya hanê ji xwe re dayite bijibîrakin. ew bi neçarî ve hatiye

bibindestkirin, yanjî ew hatîye bikole û bibendekirin û hêjbêtir ew di encamê dawî de ji ser rûwê zemînê de hatîye bihilanîn û bes û bi tenha ve nav û nîşanên wî di nava rûpelên mêjûwê de hatine bitomarkirin yanjî şopên wî di nava xanîyên hilanînên şopên kevnar de têtin bidîtin.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de bi vê peymanê 11 avdara sala 1970 ve di navbera Rêberîya Kurd de di bin Serokîtiya Barzanî de û Serdarîya Iraqê de pê hate bidilşad û bibextiyarîkirin. Wê bi hemû hêzê û hinerên xwe ve li seranserê Ewropa de piştê vê peymanê pîroz didate bigirtin û wê di nameyeke taybetî de pîrozbaya xwe ji bona Serokê Komara Iraqê Hesên El-Bekir di 18. 4. 1970 de date binardin. Ez li vê derê de vê nameya hanê bi zimanê Ingilîzî ve ji bona Xwendevanên hêja û berêz didim bitomarkirin:

„The President of the Republic of Iraq

El Bakir

Bagdad, Iraq

We welcome your government's realistic recognition of the fact that the Kurdish national question in Iraqi Kurdistan can only be solved by peaceful methods. We look upon the peace settlement which your government arranged with the revolutionary leadership of our people on March 11 of this year, after a nine years war, as a renewed confirmation of the historical fact that the national question of any nation cannot and will not be solved by force. It is our wish for all the peoples of Iraq that the settlement „Autonomy for Kurdistan and Democracy for Iraq“ be realised and remain enduring. For it is only by means of this settlement that the peoples of Iraq can form a united front against the enemies of Iraq. It is on this basis that we wish the government of Iraq success. Long live brotherly harmony among all the peoples of Iraq.

The Secretariat

Kurdish Students' Society in Europe

18. 4. 1970“

Di vê nameya rêkirî de ji bona Serokê Komara Iraqê Hesên El-Bekir de Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de têde pîrozbaya

xwe ji bona serdarîya Iraqê de dide biderxistin û herwehaji ew di peymanan 11 avdarê de tede tevaya dilxweşi û bextiyariya xwe dide biderxistin, ku ew li ser bingehê hişmendiyî rast de û herwehaji li ser berjewendîya milletê Ereb û Kurd de hatiye bigirêdan. Ew tede dide bixuyanîkirin, ku rojekê ji rojan di tavaya mêjûwê de pirsiyariya milî bi darê zorê ve nehatiye biçarekirin. Herwehaji ew durujmê şureşa Kurd ji nû ve bi bîra Hesên El-Bekir ve dide bixistin, ku ew jî di „Ewtonomî ji bona Kurdistanê û Demokrasî ji bona Iraqê de“ tete biditin û ku bêyî vê jî milletê Iraqê nikare xwe li ber dujminên xwe de bide bigirtin; ji ber ku di vî durujmê hanê de tevaya biserkevtina milletê Iraqê tede tete biditin û wetov serdarîya Iraqê dikare bête biserkevtin. Di dawî jî de ew bi dirêjbûna biratiyê û lihevhatina di navbera hemû milletê Iraqê de dide bibangkirin.

Herwehaji Xwendevan di vê nameya hanê de tu tîn û germbûnekê ji xwe re tede nadin biditin; jiber ku Sikretariya me hîç bawerîya wê bi Basîyan ve nedahete biderkevtin, ku ew dê wê peymanan 11 avdarê bidin bicianîn; jibervêjî ve di vê nameya hanê de girêdan him li ser Demokratîyê de û himjî li ser serpehatîya mêjûwê de dihate bikirin, ku bi bê bicianîna demokrasîyê di Iraqê de û bi darê zorê ve pirsê Kurd nikare bête biçarekirin. Di encamê dawî de ev bîr û bawerîya li ser Basîyan de bi rast û durust ve hate biderkevtin.

Ev peymanan pîroz ne bes tenê li qazanc û berjewendîya gelê Kurd de dihate biderkevtin; lêbelêjî pêrejî ew li qazanc û berjewendîya gelê Ereb jî de li Iraqê de bi xwe jî ve dihate biderkevtin. Cara pêşî bû, ku di mêjûwa Rojhilata Navînî de pirsê Kurd di nava perçeyekî ji Kurdistanê de bi şeweyekî demokrasî ve bi mîrî ve û hêjbêtir bi dilê gelê Kurd ve hatibû biçarekirin. Belê vê peymanan mêjûyî dergehekî mezin li ber xebata gelê Kurd de di seranserî Kurdistanê de ji bona çarekirina pirsê wîyî milî bi şeweyekî demokrasî ve date bivekirin. Ev peymanan pîroz bi kulmeke xurt û mezin ve ji bona şovîniyê, kevneperestîyê û impiryalizmê de di deverê de dihate biderkevtin; jiber ku çarekirina pirsê Kurd di Kurdistanê bi şeweyekî demokrasî ve li qazanc û berjewendiyên milletên Ereb, Turk û Faris de dihate biderkevtin û biservajî vêjî ve ew bi dijî qazanc û berjewendiyên kevneperestîyê, şovîniyê û impiryalizmê ve di devera Rojhilata Navînî de dihate biderkevtin.

Çend jî hêzên pêşverû bi vê peymana mêjûyî ve pê dihatin bixetiyarîkirin, weha deha jî hêzên kevneperestîyê, şovînistîyê û împiryalizê pê dihatin bizikreşkirin û bikîndarîkirin. Weha deha bêtir wan vîlika dek û dolabên xwe li ser vê peymana mûjûyî de didatin bihûnandin û bitevinkirin. Kevneperestî û rehperestîya Erebi di seranserî Rojhilata Navînî de bi alîkarîya împiryalizmê ve û nemaze bi yarmetîya împiryalîya Emerîkî ve bi xurtî ve bi dijî vê peymana 11 avdara pîroz ve dihatin birawestandin û bi dijî wê jî ve didatin bişerkirin.

Çarekirina pîrsa Kurd li Iraqê de bi şêweyekî demokrasî ve li ser kara Kurd û Ereb de bi mîxekî tûj û dirêj ve di nava nivî tabûta hêzên tarîyî Ereb, Rom û Ecem de di Rojhilata Navînî de dihat biderkevtin û dê wî ew di nava demê de di wê tabûta hanê de didana bimûmkirin. Herwehaji hêjbêtir çarekirina vê pîrsa hestiyarîyî milî di nava Kurdistanê Iraqê de û di Rojhilata Navînî de bi yarmetî û kêra Sovyêtê ve bi gîsnêkî pir tûj û giran ve di nava nivê çavên împiryalizmê de di Rojhilata Navî de dihat biderkevtin. Vê yarmetî û kêra Sovyêtê ji bona çarekirina pîrsa Kurd bi şêweyekî demokrasî ve metirsîyeke pir mezin û di dûr de pir bi kêr ve li ser berjewendiyên Împiryalizmê û Hevalbendên wan de di deverê de didatin biderxistin; jiber ku ev cihê Kurdistanêyî hanê di deverê de di warê cihê siyasî û abûrî de roleke pir ging û giran jêre tete biditinn. Vê dostaniya Iraqê û Sovyêtê giringbûneke weyî giranî mezin bi taybetî ve li ser ayinda Kendava Farisî de dihat biderkevtin, ya ku jê bêtir ji 80 tanî 85 % der sed de ji nîyaziya Tîna Çapan û dewletên Ewropa Rojava de dihatin biderkevtin û jê jî dihatin bihatin. Him li ser vê Kendava Farisî de kanîyên neftê dihatin biditîn û himjî tere lûlên neftê, reh û damarên jîna abûrîyî dewletên Împiryalizmê tere dihatin biderbasbûn. Di vî cihê hanê de 60% ji sedî ji tevaya nefta cihanêyî neha de tete biderkevtin, ya ku ew bi dehan sal ve ji bal Kompaniyên Impiyalîyê de tete bitalankirin. Herwehaji di nava Kurdistanê me de ji bal dewletên Dagirkerên Kurdistan de ji bal Dagirkerên Iraqî de di Kurdistanê Iraqê 90 melyon nefet, ji bal Dagirkerên Rom de 8 melyon neft û ji bala Dagirkerên Surî de 12 melyon neft sal bi sal ve tetin bitalankirin, mîna ku Kolonyaliya Sipanî û Portogali talaniya dewlemendiya welatên miletên kokiyî Emerîkî ji sala 1492 de bi hovberî ve didatin

bitalankirin. Bi çend Km ve bi durbûn ve ji van kanîyên gewreyî neftê de hêjî miletê Kurd agirê xwe bi tepikê rêxê ve, bi serkul û buşkulan ve bi pûş û kayî ve, bi qurmikan û darikan ve û bi dar û êzingan ve didin bivêxistin. Bes û bi tenha ve Dagirkerên Kurdistanê ji Rom û Ereb bi perên talankirina nefta me ve gulên top û tankan, bombên balafiran û napalman bi ser miletê ve didin bibarandîn û welatê me pê bidin biwêrankirin û bi serdejî ve miletê me pê didin bikole û bendekirin, na hêjbêtir ew dixwazin wî bidin biqirkirin. Hêjbêtir tevaya hılanîna nefta cihanêyî dozandî de neha bi 1400, 6 bilyon ton nefte ve têtê biderkevtin, ji jê jî 9% der sed de di nava Kurdistanê me de têtê biderkevtin.

Welatê me Kurdistan pir bi paşkevtî ve û miletê me pir bi perîşan ve têtê biderkevtin; jiber ku welatê me pir bi dewlemend ve di Rojhilata Navînî de têtê biderkevtin<sup>54</sup>.

Zanistvanên Siyasîyî vê dunyayê di neha de ji xwe re didin bigotin: Kê Kendava Farisî ji xwe re ji bona nava destên xwe ve date bixistin, wî tevaya Ewropa û Çapanê bi nava destên xwe ve date bixistin û kê Ewropa û Çapan bi nava destên xwe ve date bixistin, wî tevaya dunyayê bi nava destên xwe ve date bixistin. Jibervêjî ve her û her di mêjûwê de ji mêj de ji pêla Qeyserî Rusî de her û her Rusan ji xwe xewin bi vegirtina deşta Furatê ve didatin bidîtin. Wan bêtir ji dused salî ve di pirsra Rojhilat de ligel Ingilizan, Firensîyan û Elman de ji bona parvekirina Selteneta Sultanê nexwêş de li ser Bosboros de didate bikarin. Lêbelê jiber ku wan Talankeran di nava xwe de li ser parvekirina Selteneta Osmanî de nedikarîbûn bidana bilihevkerin, rûxandina Seletneta Osmanî dused salî hate biderengîkevtin. Ev şerên hanê di nava dewletê Ewropî de li ser parvekirina Selteneta Osmanî di nava dused salî de li jêr Pirsra Rohilat de di zimanê Ewropê de dihate binavkerin.

Der sala 1833 de ruxandin û mirina wêna li ser destên Ibrahîm Paşa kurê Mohamed Alî Paşa dihate biderkevtin, gava ku ew bi

<sup>54</sup>Ji xwe re di vî warê hanê de li vê nivîsta hanêyî pir bi nerx ve ji bal S. Losev û Y. Tyssovsky de „The Middel East Oil Polecy“, Progres Publishers Moscov 1984 de bidin bitemaşkirin.

leşkerên xweyî xurt ve li Kütahya de li nêzîka Istenbolê de dihate birawestîtin û rêya vegirtin û girtina Istenbolê bi carekê ve bi bê liberxwedan ve dihate biderkevtin; lêbelê vê carê jî bi saya serên dewletên Ewropa Rojava ve bi giştî ve û bi saya serê dewleta Inglîstanê bi taybetî ve givaştina man û nemanê ji bona ser Ibrahîm Paşa bi vekişandina xwe ve ji bona Misrê dane bineçarîkirin, da ku ew Misrê ji vegirtin û bindestkirina Ingilîz de bide biparastin. Wetov di gulana sala 1833 de li baregehê Ibrahîm Paşa de li Kütahya de peymanek hate bigirêdan û ew bi vekişandinê ve hate bineçarîkirin.

Careke din Selteneta Merovê Nexweş bi saya Ingilîz û dewletên dinî Ewropî ve ji ruxandin û mirina xwe ve hate biparastin<sup>55</sup>. Herwehaji careke din di sala 1939 de şerekî pir giran û mezin, şerê man û nemanê di navbera Ibrahîm Paşa de û Selteneta Osmanî de di 24. 6. 1839 de li pesarê Nesîbînê de li Kurdistanê de hate bivêkevtin. Di vî şerê hanê de sipah Sultan pir bi pîsî ve hate bişikenandin û bitarûmarkirin. Belê careke din pir bi xurtî ve nema Seltena Osmanî ji her car bêtir li ser destên Ibrahîm Paşa de bi diyar ve hate biderkevtin.

Mohamed Alî Paşa bi wergirtina tevaya deshilatîya Selteneta Osmanî ve pir hatibû binêzikkirin. Vê carê jî dewletên Rojava ji bil Firnsa de li Ingilîstanê di 15. 7. 1840 de bi amadebûna Ingilîstanê, Perusya -Elmanya- Nemsî û Rusa hatin bicivandin û peymanek ji bona parstina yekîtiya Selteneta Osmanî û rizgarîkirina wêna de ji Mohamed Alî Paşa datin bigirêdan. Di encamê dawî de Mohamed Alî Paşa bi pêrûniştina vê peymana hanê ve bi darê zorê ve hate bineçarîkirin<sup>56</sup>. Weha careke din li ser destên dewletên zaldarî xurtî Ewropî de Selteneta Osmanîyî genîyî rizyayî ji bona demekê de hate bihiştin<sup>57</sup>.

<sup>55</sup> Ji xwe re bi dîr û dirêjî ve di vî babetê hanê de li „Weltgeschichte“ berge 6, r. 302., VEB Deutscher Verlag der Wissenschaften, Berlin 1969 de bidin bitemaşekirin.

<sup>56</sup> Ji xwe re li kanîya pêşî de , r. 305 de li ser vê xala pir giring de bidin bitemaşekirin; jiber ku bi dîr û dirêjî ve li ser de hatîye binivîsandin.

<sup>57</sup> Ji xwe re li kanîya pêşî de di r. 306 de li ser Fermana Sultan de di Xetî Şerîf de „Tanzimat-i Hairî -Tanzimatê Xeyrî- de di 3. 11. 1839 de bidin bitemaşekirin; jiber

Belê heger ku di wê çaxê de Selteneta Osmanî li ser destên Ibrahîm Paşa de bihata biruxandin; hîç gûman têde nedihate biderkevtin, dê tevaya rewş û zîneta Kurdisanê jî di wê çaxê de bi renekî din ve bihata biderkevtin, jiber ku pêwendîyên pir xurt di navbera Mîrneşînîyên Kurd de bi giştî ve û ligel Mohamed Paşayê Kor<sup>58</sup> de bi taybetî ve ligel Ibrahîm Paşa de di sala 1832 de dihatin biderkevtin û Ibrahîm Paşa bi xurtî ve piştî xebata Mîrneşînîyên Kurdan bi dijî Selteneta Osmanî ve didate bigirtin<sup>59</sup>. Selteneta Osmanî bi nexweşîya nema xwe ve tanî sala 1918 de di dawîya cenga cîhanî yekem de date bidirêjkin û ew bi carekê ve di piştî cengê de hate bijehvevkevtin û li ser peymanê Sêver de di sala 1920 de parvekirina wêna di nava Ingilîz û Firensa de hate bikirin.

Herwehaji di derbarê Kurd de ev bendên giring û giran têde di cara pêşî de di mêjûwa Kurdistanê de li ser çarekirina pîrsa Kurd de ji cihekî wetov berzî balayî Navdewletî de hatin biwergirtin:

---

ku pêrabûnên şerê Selteneta Osmanî der sala 1846 de di bin rêberîya Reşîd Paşa de di Kurdistanê de bi vê fermana hanê ve tanî radeyekî têtin bigirêdan.

<sup>58</sup> Ji xwe re li ser vê Mîrneşîya Mohamed Kor Paşa de bi rêjî ve li nivîsata J. Bailie Fraser: "Travels in Kurdistan & Mesopotamia" -Geşîyek di Kurdistan û Mêsopotamîya de-, (Richard Bentley, New Burlington st, London 1840 bidin bitemaşekirin. Cafer El Xeyat beşê duwem ji vê nivîsta hanê ji bona zimanê Erebi di bin nav û nîşana: „Geşta Fraser ji bona Bagdad di sala 1834 de“ date biwergirandin û ew di çapa Mearif de li Begdadê de di 30. 8. 1964 de hatiye biçapkirin. Xwendina vî nivîsta hanê pir bi nex ve ji bona têgihîştina pêla Mohamed Kor Paşayê Rewanduz tete biderkevtin û Xwendevan ji xwe re dikarin jê pir sûd ji bona têgihîştina mêjûwa Kurd û Kurdistanê û herwehaji ji bona xebata kûrî Bav û Kalên me ji bona serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewleteke milî di wê demê de bidin biwergirtin.

<sup>59</sup> Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve di vî batê hanê de li nivîsta Munzir Elmusilî de bi zimanê Erebi ve: „Ereb û Ekrad“ -Ereb û Kurd-, r. 190, Dar Elxusûn, Bêrûd, sala 1986 de, bidin bitemaşekirin.



## Peymana Sêver<sup>60</sup>

Beşê Sêyem: Kurdistan

Benda 62:

„Dê Encûmenk cihê wê li Istenbolê de bête bilidarxistin, ku ew ji sê Endaman de tête bipêkhatin. Her yekî ji wan ji xwe re hersê Dewlet, ya Ingilistanê, ya Firensî û ya Îtalî didin binîşankirin. Evaya jî di navbera şeş mehan de ji bi cihanîna Peymana serxwebûna xweyî tête bikirin. Evaya derbarê heremên ketîyî rojhilatî Furatê û beramberî sinorê jêrî Ermînya, yê ku ew di pişt re dikare bête binîşankirin, ji yên ku Xelkên Kurd di nava wan de têtin birûniştin. Sînorê Turkî ligel Surîyê û Îraqê de dê ew li gora nîşana diyarkirî de di metnê duwem û sêyem de ji movika duwem ji benda jimara 27 bête bidanîn. Lêbelê heger lihevhatin li ser mebestekê de nehate bidîtin, wê çaxê dê ew bi agehdarîya Endamên Encûmenê ve her yek ji wan ji bona Dewleta xwe wê mebestê bide birêkirin. Ev pirojeya hanê divê girawbûnên têrkirî ji bona parastina Kildanan, Aşûrîyan û Kêmayetîyên din, çi Tuxmî yanî Oldarî bin, di nava van heremên hanê de bêtin bidan. Jiber vê jî dê Encûmenek ji Wênerên Birîtanya, Firensa, Îtalya, Eceman û Kurdên Cih bête bidestnîşankirin, da ku ew lê bide bivenerandin û rastkirinan bide bibiryarîkirin, heger ku wê date bidîtin, ku divê ew li ser sinorên Turkan de bêtin bikirin; jiber ku li gora metnên vê Peymana hanê jî de sînorê bi navkirî ve ligel sînorê Ecem jî de tête bisuwarkirin“.

---

<sup>60</sup> Ji xwe re li ser peymana Sévres -Sêver- de di 10. 8. 1920 de bi dût û dirêjî ve derbarê Seltaneta Osmanî de bi zimanê Elmanî ve di „Weltgeschichte“, berge 8, r. 109-110, VEB, Deutscher Verlag der Wissenschaft, Berlin 1966 de bidin bitemaşekirin.

## Benda 63:

„Dewleta Osmanî ji îro û pêve li ser xwe de dide bisozkirin, ku ew dê bi biyarîyên herdu Encumenên, yên ku ew di benda jimara 62 de hatine binavkirin, di navbera sê mehan de ji mêjûwa agehdarêyê de, ji yên ku ew ji bal wan herdu Encumenan de têtin bidazanîn, bête birûniştin û wan bide bicihanîn“

## Benda 64:

„Heger ku di nava salekê de ji destpêkirina mêjûwa bicihanîna vê Peymana hanê de Miletê Kurd, yê ku ew li heremên nîşankirî de di benda jimara 62 de têtê bineşnîkirin, daxwazek diyar ji bona Koma Netewan de date bipêşkeşkirin, ku piraniya Miletê van heremên hanê didin bixwestin, ku ew ji Turkîyê bêtin biserxwebûnkirin. Wehajî gerjî vê Koma hanêyî bi navkirî ve date bidîtin, ku ev Miletê hanê ji bona serxwebûnê bi karinê ve têtê biderkevtin, wê çaxê ew pê dide bitemînîkirin. Weha Turkî ji neha de li ser xwe de dide bisozkirin, ku dê ew bi wê Temîniya hanê ve bête birûniştin û ew dê ji hemû mafeyên xwe ve û bi destkevtiyên xwe ve di nava van heremên hanê de bête bidakevtin- dê dûr û dirêjiya van dakevtinên hanê bi Mebesta Lihevhatineke Taybetî ve bête bidîtin, ku dê ew di navbera Dewletên Hevalbendên giring û Turkyê de bête bigirêdan. Heger ku dakevtin bêtin biwergirtin û gava ku ew bêtin biwergirtin, wê çaxê hiç beramberîyek ji bal Dewletên Hevalbendên bi navkirî ve beramberî Yekbûna Kurdan nayête bidîtin, ji yên ku ew li perçê xakê Kurdistana nehayî de di nava Wilayeta Musilê de têtin bijiyandin, ku ew bi hemû azadiya vîna xwe ve ligel Dewleta Kurdîyî Serbixwe de bêtin biyekkirin“.

Dostaniya Iraqê ligel Soyvêyête de bi qazanc û kara gelê Iraqê ve û herwehajî pêrejî ew bi qazanc û sûda hemû gelên Rojhilata Navînî ve dihate biderkevtin û ev dostaniya hanê jî ji bona miletên deverê ve pir bi ber ve diahte biderkevtin, belam ew ji bona impiryalizma Emerîkî de pir bi bigiran û sengîn ve û himjî bêtir pir bi tirs ve dihate biderkevtin. Jibervê yeka hanê jî ve impiryalizma Emerîkî hemû hêz û hinerên xwe di Rojhilata Navînî de ji bona nava kar dane biavêtin, da ku ew vê peymana 11 avdara sala 1970 mêjûyî di

jîna gelê Iraqê de û herwehaji di mêjûwa Rojhilata Navînî de bidin birûxandin.

Şovînizma Erebî bi carekê ve bi çarekirineke aşîfî û demokrasî ve ji bona pirsra Kurd li Kurdistanê Iraqê de pê nedidatin bipêrûniştin û hêjbêtir pê nedidatin bibawerîkirin. Wan her û her ji xwe re didatin bikarkirin, ku ew wê bi darê zorê ve di rêya leşkerî de bi ceng û şer ve bide biçarekirin; hêjbêtir wê didate bixwestin, ku ew bi şer û cengê ve xebata gelê Kurd bi carekê ve bide bişikenadin û di encamê dawî de wê bide bitarûmarkirin û Kurdistanê bide bierebkin.

Evaya bi xewin û nigaşa Erebên rehperest ve di sedsalê bîstan de, di sedsalê şiyarbûna miletan de, di sedsalê herifandina kolonyalizmê, impiryalizmê û serdarîkirina bêgane de ji bona çarekirina pirsra Kurd, Israîla Duwem dihate biderkevtin. Belê di nava van remanên hanê de bes û bi tenha ve him ji bona Kurd û himjî hêjbêtir di encamê dawî de ji bona miletê Ereb de wêranîkirin û destanên gewreyî mezin dê bêtin biderkevtin, Ku di nava wan destanên gewreyî mezin de dê miletê Ereb bi deha bêtir ve tûşî şikestinê, wêranîyê û kevtinê ve bête bikin.

Serpêhatîya dewleta Emewî bi baştirîn nimûne ve tete biderkevtin, ku piştî nêzîka ji 132 salan ji serdarîkirina Ereb de di rêya Abasîyan de û bi piştgirma Farisan û Kurdan ve serdarîya Emewî di Rojhilat de hate birûxandin. Di encamê dawî jî de him Farisan di rêya Furskirina Musilmantîyê de di pêla Sefewîyan de di sedsalên panzdehan de û him ji wergirtina Turkan Xilafeta Musulmantîyî Ereb de bi navê Musulmantîyê ve di destpêka sedsalê şanzdehan de miletê Ereb tûşî gewretirin destanê hate bikin û ew ji sala 1515 tanî 1918 ji bona jêrdestîya Turkan de hate bikevtin û gewretirîn destanên demê bi serê wî ve hatin bikevtin û ew di nava perîşanî û paşkevtinê de dihate bijiyandin û bi sedan sal ve ji pêşkevtina Merovanîyê de hate bipaşkevtin.

Merov dikare li vê derê de bi sedan nimûne ve ji mêjûwa tevaya miletan de ji bona rehperestên Ereb de bide bianîn, ku bê kanî çî bi serên wan miltan ve hate bikevtin, ji yên ku wan jî bi beramber miletên jêrdestên xwe ve remanên wetovî regezperestî didatin bikaranîn.

Her miletêk divê ew bi xwe ve xwe ji serpehatiyên mêjûwa xwe û herwehaji ji serpehatiyên mêjûwa miletên din de bide bifêrkin, da ku ew xwe ji destanên giranî mêjûwê de bide biparastin; jiber ku Merov û herwehaji Milet di vê jînê de mêjûwa xwe bi destên xwe ve didin bidurustkirin. Bextxweşi û bextreşiya Merov û Miletan di encamê dawî de bi destên wan ve tete biderkevtin. Çi gava ku Merov û Milet di vê rastîya hanê de hatin biliberkevtin, wê çaxê ew dikarin pir derd û kulên xwe di vê jînê de bidin bikêmkirin û bextyarîyê û pêşkevtinê ji xwe re di vê jîna hanê de bidin bigeşkirin û bigirawkirin.

Di 21 befirbara sala 1922 de bi dazanînekê ve bi hevreyî ve ji bal Şanda Serdariya Ingilizî û Şanda Rêjima Bagdadê de bi şevyekî mîrî ve ji bona Hevgirêdana Netewan de bi pêrûniştina mafeyê Ewtonomî ji bona Kurdistana Jêrî ve dihate biderkevtin. Evaya bi deqa wê dazanîna hanê ve bi zimanê Ingilizî ve tete biderkevtin û ew wetovjî ji bona Hevgiradana Netewan de hatiye bipêşkeşkirin: „The Government of His Birtanic Majesty and the Government of Iraq recoqnize, to establish a Kurdish Government within these Frontiers. They hope that the different Kurdish groupe will arrive as soon as possible at an arrange among them on the form they desire for this government and limits within which they would like it to extend. They will send respomsible delegates to discuss their economic and political relations with the Government of his Majesty and the Government of Iraq“ -Serdariya Padişahiya Biritani û serdariya Iraqê bi mafeyê Kurd ve di nava sînorên Iraqê de têtin birûniştin, ku ew ji xwe re di nava wan sînoran de serdariyeke Kurdî bidin bidurustkirin. Ew didin bihêvîkirin, ku dê gurûhên cudan ji Kurdan bi lez û bez ve di nava xwe de bi lihevhatinekê ve li ser daxwaza xwe de ji bona rengê vê serdariya hanê û danîna sînorên wêna de bêtin bigihandin. Herwehaji divê ku ew Wênerên xweyî Berpirsiyar ji bona gift û gokirinê ve li ser pêwendiyên wanî abûrî û siyasî de ligel serdariya Padişahiye de û ligel serdariya Iraqî de bidin binardin-

Herwehaji di 24. 12. 1924 A Stament by the Biritish High Commssioer „recogneizing the right of the Kurdish living within the frontiers of Iraq to establish a Kurdish Government inside these frontiers“ -ji bal Serpereştvanê Ingiliziyî Bilind ve li Iraqê de ev ragihandina hanê hate bidan: -Pêrûniştin bi mafeyê Kurdên Jîndar ve

di nava sinorên Iraqê de, ku ew serdarîyeke Kurdî ji xwe re di nava wî sînorê hanê de bidin bidurustkirin-.

Ev jî Igilizan jiber çarekirina Musilê û rakişandina Kurdan bi ser xwe ve date bikin. Merov li vêderê de û di vi warê hanê de pir li ser belgeyên Ingilizî de dikare bide biavixtin, jiber ku ew birastî jî ve pir hatine binivîsandin û hêjbêtir ew pir bi nerx ve him ji bona têgihiştina siyaseta dewleta Ingilizî de li ser pirsê Kurd û durustkirina dewleta Iraqê de têtê biderkevtin û heryek ji wan belgeyên Ingilizî jêre taybetîyeke mêjûyî him ji bona Kurd û him jî ji bona Ereb têtê biderkevtin. Xwendekarîya wan bi wirdî ve bi pêwsit ve li ser Rewşenbîrên Kurd têtê biderkevtin. Jibervêjî bi başî ve têtê bidîtin, ku ew belgeyên hanê bi hev re bêtin bixwendin û li ser wan de bête bixwendekarîkin.

Li vê dere jî de em bes û bi tenha ve dixwazin bê ka çi li ser pirsê Musilê de ji bal Mohemed Emîn Zekî Beg de di mêjûwa Kurd û Kurdistan de bergê yekem de di rûplê 153 de ji destnivîsa wergerandina kurmançî de ji xwe re dayite binivîsandin, da ku ji xwe re rehperestên Ereb bêtir him di cewhera pirsê de û himjî di metirsîya neçarkirina wê de di ayinde de bi baştir ve bêtin biliberkevtin, gava ku ew vê ligel peymanê sala 1515 de bi hev re bidin biberamberkirin; jiber ku Turkan hêjî pirsê Musilê ji xwe re di nava serê xwe de nedane bijibîrkirin û av û girêz ji devên wan, mîna ku ev av û girêz ji devên Ingilizan û Firensan di dema xwe de ji pêla peymanê Sayks-Piko de ji sala 1916 de li ser nefta Kurdistanê de dihate biherikandin û jibervêjî ve û li ser vêjî de wan Kurdistan dane bi sê perçekirin û du perçe jê bi darê zorê ve bi ser Iraqê û Surî ve dane bivekirin, him li ser nefta Kurdistanê de û himjî li ser ava Kurdistanê de têtê biherikandin.

Çawan neft bi hoyê parvekirina Kurdistanê ve di piştî cenga cihanî yekem de bi careke din ve piştî parvekirina çildêran de dersala 1514 de hate biderkevtin, weha dê neft û ava Kurdistanê bi hoyên yekkirina wê ve di encamê dawî de bi neçarî ve bêtin biderkevtin.

„Pirsîyarîya Musilê“<sup>61</sup>

<sup>61</sup> Ji xwe re bi dîr û dirêjî ve li ser vê pirsê hanê de û tevaya belge û pîlanên siyaseta dewleta Turkî di vi warê hanê de di nivîsta pir hêja de li ser pirsê Kurd de bi zimanê Elmanî ve di bin navnîşana: „Kurdistan zwischen Aufstand und Völker Mord“ -

Pirsiyarîya Kurd bi tenha ve bi ser welatê Musilê ve hate bigivaştin, Ku ew bi kê ve bête bigirêdan, divabû ew ji bal Hevgirêdana Netewan de bihata binîşankirin.

Di dawî de Hevgirêdana Netewan ji bona lêgerandinê li daxwazên Ingilîzî, Turkî û Pirsyarîkirina Arezoyî Xelkê wê de bi pêkanîn û binardina Encûmenekî lêgerandinê di 30 kewçêrika sala 1924 de date bibiryarîkirin.

Civata Hevgirêdanê di 13 çêrya duwem de di sala 1924 de ev Encumena hanê date bipêkxistin. Ev pêkhatina hanê ji Peyayekî Gewreyî Meceristanê Kont Tîlîki, ji Siwêdê Misyo F. Wîrson û Kolonêl Bolis ji sipahê Belçîkî ve hate bipêkhatin.

Evan li dawîya çavpêketina wan de ligel dewleta Ingilîzî û Turk de di 16 rêbenda sala 1925 de bi Bexdê ve hatin bigihaştin.

Herwehaji Wênerê Turk jî ligel wan de bû. Li Bexdadê Wênerekî dewleta Îraqê jî tev li wan bû. Ew tev de ji bona lêgerandinê ji bona welatê Musilê û hemû cîgehekî geryan. Li dawîya bidawînanîna Karmendîya xwe de ew vegeerîyan û di 16. tîrmeha sala 1925 de Raportekî dûr û dirêj ji bona Civata Hevgirêdana Netewan dane

Kurdistan di navbera sehildanê û Qirkirinê de-, r. 17 - 31, Edittion Komkar, Frankfurt am Main 1991 bidin bitemaşekirin. Di vî beşe hanê de li ser siyaseta Dewleta Turkî de beramber bi Wilayeta musilê ve tete binivisandin û tevaya belgeyên wê siyasetê dide bitomarkirin. Herwehaji di nava van rûpelên hanê de ev navnîşana hanê jî li ser bingehê pîrsa Musilê de tete binivisandin: „Kurdistan vor der Neuauvteilung oder eine gerechte Lösung der Kurden Frage“ Magelo Kurdistan li ber parvekirineke nuh ve tete biderkevtin, yanjî magelo dê çarekirineke dadwerî ji bona Pîrsa Kurd de bête bidîtin.

Ez naxwazim li ser vê pîrsa hanê de di neha de bidim biaxivtin; jiber ku neha pîr li ser vê pîrsa hanê de tete binivisandin û ew bi rastî jî ve di neha de û herwehaji di ayinde de dê roleke pîr germ û giran bide bilîştin. Ez dê li lêgerandina xwe de pîr bi dûr û dirêjî ve di Nivîsta Sêyem de li ser vê pîrsa hanê û cihê wê û hêjbêtir kêra wêna di pîrsa Kurdistanê de bidim binivisandin; jiber ku ev nivîsta neha dê ew tanî sala 1975 de bide biderxistin û dê li ser wê pêlê de bide biaxivin. Nivîsta duwem li gora bernameya min dê ew li ser pêla 1975 tanî 1988 de bête binivisandin û Nivîsata Sêyem dê ew li ser 1988 tanî dema neha bête binivisandin û dê tete li ser pîrsa Musilê jî de bête binivisandin; jiber ku girîngbûneke taybetîyî mêjûyî jê re bi vî şeweyî yanjî yê din ve tete bidîtin.

bipêşkeşkirin û wan di vî Raportê hanê de derbarî Kurd de û welatê Musilê de datin bigotin:

„Divê guhpêdan derbarê nîşakirina Karmendên Kurd ji bona serpereştîya welatê wan û xwendinê di dibustanan de, dadkirin û liberxwedan bi zimanê wan ve bi arezuwa Kurdan ve bête bikirin û zimanê Kurdî bi zimanê mîrî pê bête birûniştin. Encûmen di wê bîr û bawerîyê de ye, heger li dawîya çar salan de li paş wergirtina peymanan Ingilîz û Îraqê de û helsana Çavdêriya Hevgirêdana Netewan ji ser Îraqê de ji bona pêkanîna serpereştîyeke cihî peyman ji bona Kurd pê neyêtin bidan, beşê zor ji Kurdan serpereştîya Turkî di ser serdarîya Ereba de didin bigirtin“ (P. 111, Benda 7. Movika 2 ji wergerandina Raportê Encûmenê).

Civata Hevgirêdanê li ser vî Raportê hanê de li 16 rêbenda sala 1925 de hin mercên hılanê dane bibiryarkirin. Welatê Musilê ji bona dewleta Îraqê date bidan. Wergerandina Benda Sêyemî vê biryaryê jî eve ye:

„Dewleta Ingilîzê ji ber ku ew dewleta dest li ser Îraqê de ye, divê ew bicihanînen pêrabûnên xwe beramber peymanên derbarê Serpereştîya Cihî de ji bona Kurdên Îraqê ji bal Encumena Lêgerandinê û ji encamên dawîyî teminîyên wê de li ser Civata Hevgirêdanê de bide biraxistin“.

Li ser daxwaza Wezîrê Koloniyên li 3 kewçêrînkên 1926 de bi peyveke dirêj ve pêrabûnên başbûna nêta dewleta Îraqê derbarê Mafeyê Kurdê Îraqê de li ber Hevgirêdanê de date biraxistin û giraw wî ji bona wê ji bona bicihanîna wan jê re date bikirin“.

Lêbelê gava bi şer û ceng ve Basî nikaribûn bihatana biserkevtin û pêrejî xebata gelê Kurd ew roj bi roj ve bi pêrûniştina daxwazên Kurd ve didatin bineçarîkirin, bi neçarî ve bi bê dilên xwe ve Basîyan peymanan 11 avdara sala 1970 ligel Rêberê Kurd Barzanî de date bigirêdan, ji bona ku ew piçekî bêhna xwe bidin bivedan û heger bête bikirin, da ku ew xebata gelê Kurd û şureşa wî bi aîtî ve bidin bixistin û hêjbêtir wî ji Dost û Hevalên wî bidin bidûrkirin.

Şovînizma Erebi xwe di nava cawê pêşverûyê de didate bipêçan. Wê ew ruwê xweyî reşî faşî bi pêşverû ve didate bixuyanîkirin û wê her û her bi xwe jî ve ji bona rûxandina peymanan 11 avdarê didate bikarkirin. Wê bi destên xwe ve û bi şiyarbûn ve dek

û dolab li ser wergêkirina wê peymana mêjûyî pîroz de di rêya kuştin û vîlikan de didate bikarkirin û bes û bi tenha ve ji bona nimûne bi derkirina bêtir ji 70 hezar Kurdên Feylî ji Iraqê de ji bona Iranê di sala 1971 de datin biderxistin, ji yên ku wan ji berî sedan sal ve ji Loristanê de ji bona Iraqê hatibûn bibarkirin, berî ku dewleta Iraqê ji bal Ingilizan de bête bidurustkirin.

Herwehajî di sala 1970 tanî sala 1971 de 20 gundên xurû ji 22 gundên Kurdan li dor û berên Kerkuk de bi mehna serbazîkirina wan ve ew ji Kurdan dane bivalakirin. Herwehajî di havîna sala 1971 de serdarîya Iraqê careke din destên xwe ji bona derkirina 400 Kargerên li nik kompanîya neft de ligel malên wan de bi 2000 kes ve ji bona nava cihên Ereb dane biveguhêstin<sup>62</sup>.

Wetov bes û bi tenha ve Serdarîya Iraqê ji sala 1961 de tanî 1971 20 000 Kurd ji bajar û dor û berên Kerkûkê de dane biveguhêstin û li şuna wan de 30 000 Ereb ji nava cihên dinî Erebî ji bona nava bajarê Kerkukê û dor û berên wêna de dane bivugehestin. Tevaya siyaseta serdarîyên Iraqê bi carekê ve ji salên sihî de ji bona erebkirina Kerkukê û dor û berên wê de didate bidestpêkirin<sup>63</sup>.

Li gora encumena lêkolînê de di navrasta salên bîstan de amara serjimara Neşînvânên Kerkukê bi vî şêveyê hanê ve dihate biderkevtin<sup>64</sup>:

Ereb	35 650 Kes
Kurd	47 500 Kes

<sup>62</sup> Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve li nivîsta Circis Fethulah de: Serdanek ji bona mêja nêzik de, deriyê e de li ser bajarê kerkuk de, r. 180 bidin bitemaekirin.

<sup>63</sup> Ji xwe re di vî warî hanê de bi bêtir ve li ser vê danava hanê de li nivîsta "Saladins Söhne" ji bal Günter Deschler, bi zimanê Elmanî ve, r. 259 - 262 de, Droemer Knaur, München 1983 bidin bitemaşekirin.

<sup>64</sup> Ev amarên hanêyî tên ji nivîsata Feysel Debax: "Kurd û Kemenetewayefîyekanîtir li ser jimêrî salê 1977 da „-Kurd û Kêmanîyên tir li ser jimara di sala 1977 de- r. 3, çapxana Perwerde axlêva sala 1993 de hatîye biwergirtin, yên ku wî ji ew ji nivîsta Fadil Husinî bi navê: Muşkilet El Musil -Pirsa Musilê- çapa sêyem sala 1977 de dayite biwergirtin.



Turk 26 100 Kes  
 Diyan-File- 2 400 Kes  
 Hemû 111 400 Kes

Herwehaji li nivîsta Amar de di Iraqê de der sala 1947 de tête biderkevtin, ya ku ew ji bal serdariya Iraqê de li Begdadê de der sala 1954 de hatiye bibelavkirin, tede serjimara Kurd li Kewrkukê de serjimara Kurd bi 151 575 Kes ve têtin biderkevtin, ku serjimara hemû Neşinvanên Parêzgeha Kurkukê bi 286 005 Kes ve dihatin biderkevtin.

Wetov endaziya serjimara Kurd di tevaya Parêzgeha Kurkukê de bi 53 % der sedî de dihat biderkevtin

Di 2. 6. Sala 1999 de li bajarê Dihokê de li ser destê Dostekî minî pir şêrîn de belgeyekî pir giring û mêjûyî li ser amara Parêzgeha Sulêmaniyê û kerkuk de der sala 1957 de bi destên min ve hate bikevtin, yê ku ew bi zimanê Erebi ve di bin vê nav û nîşana hanê de: „Komara Iraqê, Wizareta Navxwe, Serperetiya Tomarkirina Sernivîsandina Gîfî, Koma amara tomarkirina sala 1957 ji bona Parêzgehên Sulêmaniyê û Kerkukê.

Ev di Çapxana El-Anî de li Begdadê hatiye biçapkirin.

Tevaya Xelkê Parêzgeha Kerkukê.

Lîsta azdeh di rûpelê 243 de

Parvekirina Xelkê di Parêzgeha Kerkukê de li gora Nêr, Mê û Tuxum de

Bajarê Kerkukê      Mayîna Parêzgehê      Tevaya Xelkê  
 Parêzgeha Kerkukê

Zimanê Dê	Nêr	Mê	Tevde	Nêr	Mê	Tevde	Nêr	Mê	Tevde	%
Erebî	15008	12119	27127	41716	40777	82493	56724	52896	109620	28,19
Kurdî	21281	18766	40047	74110	73436	147546	95391	92202	187593	42,24
Iranî	60	41	101	17	5	22	77	46	123	21,44
Turkî	22564	22742	45306	18992	19073	38065	41556	41815	83371	
Ingilîzî	391	243	634	42	21	63	433	264	697	
Firensî	22	13	35	6	-	6	28	13	41	
Hindî	53	26	79	5	3	8	58	29	87	
Kildanî û Siryani	774	735	1509	48	48	96	822	783	1605	
Zimanên din	226	192	418	-	-	-	226	192	418	
Nediyar	2684	2462	5146	113	25	138	2797	2487	5284	
Tevde	63063	57339	120402	135049	133388	2684437	198112	190727	388839	

Herwehaji em dixwazin, Lîsta Panzdeh û pêvekirina wêna di rûpelê 240 û 241 de ji amara bi navkirî ve ji bona bêtîrbûna agehdayîyê li ser amara serjimra Parêzgeha Kerkukê de ji bona Xwendevanan û Xwendekaran de bidin bianîn.

Pêvekirina bi Lîsta Panzdehan ve (B), r. 240

Parvekirina Xelkê li gora Tuxum, Ayînê û cihê zayînê de di Parêzgeha Kerkukê de

Cihê zayînê	Tuxum	Jimar	Musulman	Fileh	Cihu	Saibe	Yezîdî	Ayînin din	Nediyar
Nasriyê	Nêr	536	526	1	-	9	-	-	-
	Mê	459	456	-	-	3	-	-	-
Besra	Nêr	187	132	42	-	12	1	-	-
	Mê	163	112	37	-	14	-	-	-
Bê Cih	Mêr	350	331	16	-	-	-	-	3
	Mê	365	336	26	-	-	-	1	2
Surî	Nêr	36	17	18	-	-	-	1	-
	Mê	48	22	26	-	-	-	-	-
Libnan	Nêr	51	14	36	-	-	-	1	-
	Mê	68	17	51	-	-	-	-	-
Ordon	Nêr	21	18	2	-	-	-	1	-
	Mê	8	7	1	-	-	-	-	-
Siûdîye	Nêr	1	-	1	-	-	-	-	-
	Mê	1	-	1	-	-	-	-	-
Welatê Erebiyî din	Nêr	129	102	26	-	-	-	1	-
	Mê	66	34	30	-	-	-	2	-
Iran	Nêr	365	282	83	-	-	-	-	-
	Mê	158	104	79	-	-	-	2	-
Turkî	Nêr	712	64	644	-	-	-	3	1
	Mê	641	90	544	-	-	-	5	2
Ji Asya û Ustiralya	Nêr	88	72	14	-	-	-	-	-
	Mê	48	32	16	-	-	-	-	-
Afriqya	Nêr	4	-	4	-	-	-	-	-
	Mê	5	1	4	-	-	-	-	-

Pêvekirina bi Lîsta Panzdehan ve (B), r. 241

Parvekirina Xelkê li gora Tuxum, Ayînê û cihê zayînê de di Parêzgeha Kerkukê de

Cihê zayînê	Tuxum	Jimar	Musulman	Fileh	Cihu	Saibe	Yezîdî	Ayînin din	Nediyar
Ewrop	Nêr	373	3	369	-	-	-	-	1
	Mê	196	6	187	-	-	-	2	1
Emerîka	Nêr	21	-	20	-	-	-	-	-
	Mê	22	1	21	-	-	-	-	-
Nediyar	Nêr	-	-	-	-	-	-	-	-
	Mê	-	-	-	-	-	-	-	-
Tevaya serjimara Parêzgeha Kerkukê	Mê	198112	190951	6926	3	128	15	28	61
	Nêr	190727	184281	6224	3	114	8	28	69
	Tevde	388839	375232	13150	6	242	23	56	130

Li ser amara serjimara sala 1957 de serjimara Kurd li Parêzgeha Kerkukê de bi 187 593 Kes ve dihate biderkevtin û serjimara hemû Neşînvên Parêzgeha Kerkukê bi 388 839 Kes ve dihatin biderkevtin. Weha endazîya serjimara Kurd di tevaya Parêzgeha Kerkukê de bi 48,24% der sedî ve, Ereb bi 28, 19 % der sedî ve û Turk bi 21,44 % der sedî ve dihate biderkevtin<sup>65</sup>.

<sup>65</sup> Jiber girîngbûna vê amara hanê de ez dixwazim van amarên girêdayî bi Parêzgeha Sulêmanîyê ve li vê derê de ji bona bêtirkirina aqêdariya Xwendevanan bidim bitomarkirin.

Lista Yekem, r. 1

Serjimara Xelkên Parêzgeha Sulêmanyê di tomarên 1947/1957 de û bêtirbûna di navbera herdu tomaran de û endazbûna sedîyê bêtirbûnê

Tuxum	Jimara Xelkê	Sala	Bêtirbûna di nava herdu tomaran de	Bêtirbûna Endazîya sedî
Nêr	101767	158624	56857	55%
Mê	112633	146271	21638	17%
Tevde	226400	304895	78495	34,7

## Lista Duwem, r. 2

Parvekirina Xelkê di Parêzgeha Sulamanyê de li gora topraxê û tîrbûnê ji bona her Km çargoî

Jimar	Navê Melbendê	Jimara Xelkê	Toprax bi Km çargoî	Tîrbûna Km çargoî
1	Melbenda Sulêmanyê	110171	2937	37,511
2	Melbenda Helebçe	81749	3294	24,117
3	Melbenda Şehrezor	42333	2263	18,706
4	Melbenda Pişder	34545	1194	28,932
5	Melbenda Ranyê	36097	2594	13,915
	Tevaya Parêzgeha Sulêmanyê	304895	12282	24,824

## Lista azdeh di rûpelê 243 de

Parvekirina Xelkê di Parêzgeha Sulamanyê de li gora Nêr, Mê û Tuxum de  
Bajarê Sulêmanyê      Mayîna Parêzgehê      Tevaya Xelkê  
Parêzgeha

Zimanê Dê	Nêr	Mê	Tevde	Nêr	Mê	Tevde	Nêr	Mê	Tevde
Erebî	641	406	1047	2000	238	2238	2641	644	3285
Kurdî	24637	22435	47072	130194	122670	252864	154831	145105	299936
Iranî	15	10	25	15	4	19	30	14	44
Turkî	59	92	151	153	62	215	212	154	366
Ingilîzî	21	7	28	97	54	151	118	61	179
Firensî	3	1	4	180	44	224	183	45	228
Hindî	-	-	-	11	4	15	11	4	15
Kildanî û Sîryanî	116	98	214	110	14	124	226	112	238
Zimanên din	50	37	87	44	1	45	94	38	132
Nediyar	106	87	184	172	16	188	278	94	272
Tevde	25648	23164	48812	132976	123107	256083	158624	146271	304895

Li ser amara serjimara sala 1965 de serjimara Kurd li Parêzgeha Kerkukê de bi 170 905 kes ve dihate biderkevtin, ku serjimra hemû Neşîvanên Parêzgeha Kerkukê bi 473 626 Kes ve dihatin biderkevtin. Weha endazîya serjimara Kurd di tevaya Parêzgeha Kerkukê de bi 36,08 % der sedî ve dihate biderkevtin. Di amara serjimara sala 1977 de serjimara Ereb li Parêzgeha Kerkukê de bi 218 755 Kes ve dihate biderkevtin û serjimara Kurd bi 184 875 Kes ve dihate biderkevtin. Weha endazîya serjimara Ereb di tevaya Parêzgeha kerkukê de bi 44, 4 % desî ve dihate biderkevtin û Endazîya serjimara Kurd jî bi 37, 5 % der sedî ve dihate biderkevtin. Serjimara Turkumenan jî bi 80 347 Kes ve dihate biderkevtin û endazîya serjimara wan bi 16, 3 % der sedî ve dihate biderkevtin. Di vê ser jimara hanê jî de bes û bi tenha ve bi 33 880 Kes ve Ereb ji Kurd bêtir dihatin biderkevtin.

Tevaya siyaseta erebkirina Kerkukê bi carekê ve û hêj bêtir bi eşkere û diyar ve di nava amarên sala 1965 de û amarên sala 1977 de tete biderkevtin<sup>66</sup>.

Feysel Debax ji Qamusê El-ilamê Şemsi-Din Samî de dide biwergirtin, yê ku ew di sala 1889 de li Istenbolê de hatîye biderkevtin û yê ku wetov li ser Kerkukê de tede hatîye binivîsandin: “Jimara Daniştvanên wê bi 30 hezar Kes ve têtin biderkevtin. Heger ku Merov wan ji bona ser çar beşan de bide biparvekirin, dê sê beş bi Kurd ve bêtin biderkevtin û beşê tir jî dê ew li ser Turkumanan, Ereban û Kildanan de bête bibeşkirin<sup>67</sup>.”

Herwehaji hewildana kuştina Idrîs Barzanî li bajarê Bedgadê de di 7. 12. 1970 de, ya ku tede ji dêlva wî de Erif Hemîd Berwarî yekek ji Qehremanên Pêşmergeên Kurdistanê bi sengîn ve hate bibirîndarîkirin û bitawîkirin<sup>68</sup>.

<sup>66</sup> Fesal Debax, kaniya Pêşî, r. 14

<sup>67</sup> Feysel Debax. Kaniya Pêşî, r. 14

<sup>68</sup> Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve li ser vê rûdana hanê de nivîsta Circis Fethulah: serdanek ji bona mêja nêzik de, r. 64-65, Sutokholm sala 1998 de bidin bixwendin.

Herwehaji hewildana kuştina Barzanî li Hacî Omran de di 29. 9. 1971 de tete biderkevtin<sup>69</sup>. Wetov Basîya bi dijî vê peymanê 11 avdara sala 1970 mêtûyî ve ji bona nemankirina wêna didatin bikarkirin û bixebatkin. Bi hewildana kuştina Idrîs û Barzanî ve û bi danîna bernameyeke xwendekarî ve wan ji xwe re didatin bixwestin, ku ew şûrê bi yekcarî ve bidin biwêrankirin û binabûdkirin. Vê rêjima faşî şev û roj xwe ji bona ceng û şer li ser Kurdistanê de didate bilikarxistin û biamadekirin.

Piştî derbasbûna çar salan li ser peymanê 11 avdarê de bi alîkarîya karnasîya Ingilîz ve di pîrsa Kurd de serdarîya Iraqê pilana Ewtonomîyekê date bidanîn, ya ku ew jê re li ser destên Karnasên Ingilîz de hatibû bidanîn, ya ku wê bi carekê ve bingeh û navrokên peymanê 11 avdara mêtûyî pîroz didate bipeqandin û biherifandin.

Miletê Kurd bi carekê ve bi dil û can ve û bi rast û durustî ve didate bixwestin, ku Peymana 11 avdara mêtûyî bête bicihanîn; jiber ku ew bi rastî û durustî ve hem li berjerwendîya milletê Kurd de û himjî li ser berjewendîya milletê Ereb de ji bona çarekirina pîrsa Kurd de di Kurdistanê Iraqê de dihate biderkevtin.

Milête Kurd mîna hemû milletên vê dunyayê dildarê aşîtiyê bû. Wi rojekê ji rojan di tevaya xwebata xweyî rizgarîkirinê de dest bi şer û cengê ve nedabû bikirin, lêbelê wî her û her li ber man û nema xwe de bi neçarî ve didate bidan. Xebata meletê Kurd di Kurdistana Iraqê de bi xebateke dadwerî ve dihate biderkevtin û daxwazên wî jî him bi

---

<sup>69</sup> Li ser vê rûdana hanê de Cercis Fethulah di nivîsta xwe de: Serdanek ji bona mêja nêzik de, di dergehê heftehemîn de, r.195 - 206 de pir bi dûr û dirêjî ve û herwehaji ji hemû layekî rûnahî û lêvenerandinên pir bi nêr û hêja vedane binivîsandin, ji yên ku ew ji bona Xwendevanan pir bi hêja ve têtin biderkevtin. Hêjibêtir ew di vê rûdana hanê de tevaya siyaseta Partî û Serdarîya Basî beramberî çarekirina pîrsa Kurd di Kurdistana Iraqê de dide biderxistin. Hiç gûman tede nayête biderkevtin, ku Xwendevan di xwendin û xwedekarîya vî dergehê hanê de di bedbextîya kurtbûna liberkevtina Basîya di êveyê çarekirina pîrsa Kurd de di Kurdistana Iraqê de têtin biliberkevtin. Nivîskar Siyaseta Basîyan ji rê û regez de biramberî çarekirina pîrsa Kurd dide bixuyanîkirin. Belê ev siyaseta hanê di encamê dawî de bi nemankirina Dewleta Iraqê de tete bidawîkirin û ew bi serxwebûna Kurdistanê ve tete bitac û bixelatkin.

rewa ve û him jî pir bi nerm ve û li ser xwe de û li gora karîna wîna de ji bona bicîanîna wan de dihatin biderkevtin. Ji dêlva ku serdarîya Iraqê guhên xwe ji bona qazanc û berjewendîya tevaya milletê Iraqê bi giştî ve bide bidan û pîrsa Kurd di rêya peymanê 11 avdarê de bide biçarekirin, ya ku wê ew jî ber xwe ve û bi xwe ve ligel Rêberîya Kurd de di bin rêberîya Barzanî de dabû bimorkirin, bi servajîvêjî ve wê xwe jî roja morkirina peymanê 11 avdrê de der sala 1970 de her û her jî bona amadekirina şer û cengê li ser milletê Kurd de didate biamadekirin, û wê şerekî man û nemanê di avadar sala 1974 de li ser Kurd û Kurdistanê de date bidadan.

Barzanî jî serpêhatîya milletê xwe û herwehaji jî serpêhatîya xweyî dirêj û tal de di xebata xweyî xwînavîyî dirêj de pir bi başî ve didate bizanîn, ku şer û ceng rojekê jî rojan jî ve ne li qazanc û berjewendîya milletê Kurd de dihatin biderkevtin. Herwehaji ew di tevaya dema piştî morkirina peymanê 11 avadar sala 1970 de li ser pîlan, vîlik û dek û dolabên û her wehaji li ser sitratîcîya serdarîya Iraqê de ji bona nemankirina şuresê de bi başî ve bi agehdar ve dihat biderkevtin. Wî der kongirê heştêmî Partî de di yekê tîrmeha sala 1970 de di Nav Pirdan de di vekirina kongirê de ji bona Beşdarên Kongirê de date bigotin, ku di dema cengê de metirsî li ser linavbirdina me de 30% der sed de dihat biderkevtin, belam neha di dema aşîtiyê de 70% der sedî de tete biderkevtin.

Weha Barzanî di kûrbûn û dûrbûna dîtina xwe de hemû dek û dolabên serdarîya Iraqê li ber çavên xwe de didate bidîtin û wî bi metirsîya wan dek û dolaban ve pê hoşdarî jî bona milletê xwe didate bidan.

Di vî Kongirê hanê de Şandeke Komelê jî dihat bidîtin, ku di nava wê Şanda hanê jî de Nizamedin Qeya, Hesên Şetewî, Cewher Şawis û ez jî dihatim bidîtin. Wênerên her çar perçên Kurdistanê di vî Şanda me de dihatin biwenerîkirin. Ji bal Xelk û Zanevanên Kurd de li Kurdistanê Iraqê de pir bi germî ve ji bona me dihat bipêşewazîkirin û herwehaji me jî xwe di nava buhuştê welatê xwe de didate bidîtin. Bes û bi tenha ve ji bona nimûne ez navê Ismail Heqî Şawis li vir de didim bianîn, ku hergav vî pîrê hanê, vî Welatperwerê hanê, pir Agehdarvanê Şûreşa Şêx Seid û bi Serhatîvanê dewlemend ve ligel me de ji bona serdana

hemû dam û destgehên şûreşê dihate bihatin û wî him em bi kesên Weltperên Kurd ve didatin binaskirin û himjî wî ew bi me ve didatin binaskirin. Çi tiştê ku me jê didate bixwestin, wî li gora karin û pêwendîyên xwe de ji me re bi dil û can ve didate bicîanin. Wî pir jî Nûhatîyên Kurd didate bihezîkirin û her û her wî didate bigotin, di dilsozî, têgihîştin, zanebûn û zanistîya van Keç û Xortên Kurdî Nuhatî de hêvîya mîletê me di serxwebûna Kurdistanê de tete biderkevtin.

Gotinên wî pir bi dilên me bûn. Di nava wan de destanên mezinî giran û hejibêtir serpehatîyên pir tîrş û tal dihatin biderkevtin. Wî pir bi başî ve dizanîbû, bê ka ew çî ji me re dixwaze bide bigotin, herwehaji me jî tede him Rewşenbîrekî mezin û himjî Welatperwerekî mezin didate bidîtin. Wî jî mîna hemû Rewşenbîr û Welatperwerên Kurdên rasteqîne û nemîna Rehberên Qelp û Nezan, Hestîkoj û Xwefiroş pir bi çavekî bilid û perest ve him li Barzanî de û himjî li siyaseta wîyî rast û durust de jî bona Kurd û Kurdistanê didate bitemaşekirin.

Belê wî Ciwanmêrê Welatperwerê Kurd jî mêj ve ji nava vê dunya gewrika me jî bona nava nemanê dayite bibarkirin, lêbelê hêjî him evandariya wî û himjî kêra gotinên wî di nava bextê min de jî bona serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna dewletekî milî li ser bingehê dadwerîya civakî de têtin biderkevtin û tede jî didin bikêrkirin.

Vî Ciwanmêrê hanê li ser daxwaza me de didarek ligel Barzanî de liHacî Omran de di piştî bi dawîhatina Kongirê Heştêmî Partî ve date bilidarxistin, herwehaji wetov jî dihate bidiyarkirin, ku wî gelekî temîniya me dabû bikirin.

Wek neha bi bîra min ve tete biderkevtin, tevî ku ew di dawîya tîrmeha sala 1970 de hatîye bikirin. Min di vekirina Kongire de di cara pêşî de him Barzanî date bidîtin û himjî min lê date biguhdarîkirin.

Belê Ez Barzanî bûm û li ser evindariya wîna de hatibûn bişervekirin û biperwerdekirin. Ew jî bona min bi nimûneya Rêber ve dihate biderkevtin. Min di reftar û rabûn û rûniştinên wî de, belê di tevaya siyaseta wî de tevaya felsefa Kurd di jînê de, di nava dirêjbûn û kurbûna bextê mêjûwa Kurd û Kurdistanê de didate bidîtin. Ew ne kêr û ne jî bêtir bes û bi tenha ve bi Kurd ve, bi Merov ve dihate biderkevtin. Wî mîna hemû Kurdekî yek hêviya wîna di jînê de dihate bidîtin, ku ew jî mîletê Kurd bi aşitî ve, bi azadî ve û bextiyarî ve di



nava Kurdistanana xweyî serbixwe ve bête bijîyandin. Hîç di navê dilê Barzanî û siyaseta wîna de ne cihê kînê û ne jî cihê dilbijandinê dihate bidîtin. Wî her û her bi nala Rêberê miletekî xwedan serwerî didate bireftarîkirin. Ew bi dadwer ve nebes tenê ligel Dostên xwe de, lêbelê hêjbê ew bi dadwer ve bi beramberî Dujminên xwe ve dihate biderkevtin.

Siyaseta wî li ser yekitîya milletê Kurd de û di lêbuhradinê de dihate bivakirin; jiber vêjî ve wî di sala 1970 de di deme xurtbûna xwe de li Caên Şêts û Şeş de hate bilêbuhurandin, da ku ew belkî careke din wê Caşîtyê ji xwe re nedin bikirin û desthilatîya Iraqî mîna her car ji wan nede bikarkirin. Hêjbêtir wî di vê lêbuhrandîna xwe de ji bona wan Caşên Şêst û Şeşan û herwehaji ji bona hemû Caşên din jî de bi eşkere ve date bixuyanîkirin, ku serdarîya Iraqê bes û bi tenha ve ji xwe re ji wan sîd dide biwergirtin.

Em li odake pir biçûk de li kêleka dîwanxana wî de hatin birûniştin. Wî bi xêrhatineke pir germ ve li me de date bikirin û dest bi çûna xwe ve ji bona Sovyêtê date bidestpêkirin û çilo û çawan wan xwe di dûrbûnê de ji bona şûreşekê didatin biamadekirin. Herwehaji wî bi dûr û dirêjî ve li ser siyaseta serdarîya Iraqê de date biaxivtin, ku ev serdarîya hanê hîç tu bawerîyê bi vê peymanan hanê ve ji bona bicînaina wêna ve nade bianîn. Herwehaji wî pir bi dirêjî ve ji me re li ser hemû Pirsê Kerkukê, Xaneqîn û Eynzala de date biaxivtin û bê kanî wî çî di Wênerên serdarîya Iraqî re dayite bigotin û çawan jî ew pirsên hanê dikarin bêtin biçarekirin.

Wek neha bi bîra min ve tete bikevtin, gava wî date bigotin: Min ji Ebdul Xaliq Samurayî re date bigotin: Heger ku Kurd jî hemû li ser rûwê zemînê de nema bêtin bidîtin, tevlivêjî ve Kerkuk bi xakê Kurdistanê ve dê tete biderkevtin.

Wetov Mesud Barzanî li ser vê pirsê hanê jî de dide binivîsandin:

„Herwehaji Kerkuk bi xaleke cudabûnêyî bingehî ve di giftûgoyên sala 1970 de ligel Basîyan de dihate biderkevtin. Di dawîya dawî de di navbera Rêberîya Şûreşê û Serdarîya Basî de li ser de hate bilihevhatin, ku pişt bi amara sala 1957 ve bi nala bingeh ve ji bona

çarekirina cudabûnê bête bidan; belam Basiyan destên xwe ji bona xapandinê û sextekariya tomarên amariyê dane biavêtin û di civîneke Gifûgoyê de di berî morkirinê de li ser peymana 11 avdarê de Ebdullah Samurayî gotina xwe bi rengê pirsê ve date bigotin. “Ez dibêjim, ku Kerkuk ne bi Kurd ve tete biderkevtin, ma kî dikare bi servajî vêjî ve bide biderxistin?”.

Di piştî vê gotina hanê de bayê civînê hate binokirin û Barzanî bi bîntengî ve lê date bivegerandin: „Kerkuk ji mayînê de bi bajarekî Kurd ve tete biderkevtin û gotina te bi bê hîç bingehê yanî rastîyeke mêjûyî ve tete biderkevtin. Dê Kerkuk bi Kurd ve bête bimayîn, heger ku we xwest yanî we nexwest. Belê hûn dikarin wê ji bona demekî bidin bitalanîkirin; belam dê hûn nikaribin pêrûniştineke rewayî ji me li ser wê pêrabûna talanîya xwe de bidin bisitandin<sup>70</sup>. Li ser Pirsê Kerkukê de hîç dakevtinek nikare bête bidîtin û ez careke din nawxazim gotinên bi vî rengî ve bidim bibihîstin. Emê dê her hêjabûnekê ji bona Kerkukê bidin bigorîkirin<sup>71</sup>.

Barzanî bi dûr û dirêjî ve li ser nefta Kurdistanê û hoyê wê de ji bona pêkhatîna dewleta Iraqê li ser kîsê milê Kurd de date biaxivtin û wî ji me re date bigotin: ku ev şerê li Kurdistanê tete bikirin, hemû ji bona talankirina nefta Kurdistanê tete bikirin. Heger nefta me neba, dê ev şer jî nehate bikirin. Sê carî Idris derîyê odê date bivekirin û serê xwe hercar di derî re didate bidirêjkirin û wî digot: Babo Mêvan çavdirêya te didin bikirin. Hercar jî wî lêdidate bivegerandin. Başê. Me jî mîna her mêvanekî jê re didate bigotin, ku em dixwazin herin, jiber em naxwazin dema Mêvandarîya te bidin bidirêjkirin. Hercar jî wî ji me re didate bigotin, hûn narin, danîşin. Belê wetov dihate bidiyarkirin, ku pir kêfa wî ji me re dihate biderkevtin.

Me pir pirs jê her yekî ji aliyê xwe de dane bikirin û wî pir bi dilxweşî ve û bi dûr dirêj ve bersîva pirsên me didate bikirin. Wek

<sup>70</sup> Nefta dozandî li Kerkukê de bi nivê dozandina nefta Iraqê ve tete biderkevtin.

<sup>71</sup> Mesud Barzanî, Barzanî û Tevgera Azadixwaziya Kurd, Kurd û Şûreşa 14 Tîrmeha Sala 1958, Kurdistan, di 15 befirbara Sala 1991 de

neha bi bîra min ve tête biderkevtin, ku min jê ev pirsra hanê date bikirin: çî amojgarîya te ji me re ji bona başkirina Kar û barên Komela me li derve de tête biderkevtin. Barzanî ev bersîva hanê date bidan. Dostên me pîrbikin û dujminên me kêmbikin; jiber ku Dujminên me pîr bi zor ve têtin biderkevtin.

Bi vê pirsra hanê û piştî derbasbûna sê demjimarane me pîr sipasîya wî ji bona vê dîtina hanê, ji bona wan bîr û bawerîyên wî û guhdarîya wîna ji bona pîr pîrs û pevyên me date bisipasîkirin û me date bigotin, heger ku tu destûra me bide bidan, em dixwazin herin. Lê me jê date bixwestin, ku em li ligel wî de ji xwe re çend wêneyan bidin bigirtin. Ew di wê rojê de pîr bi kêf ve dihate biderkevtin. Wî pîr kêfa xwe ji bona wergirtina wêneyan ligel me de date bianîn. Ez li kêleka wîyî rastê de hatibûn birûniştin. Ez di wê demê pîr bi zeif ve dihatin biderkevtin, tê bigota ez ji welatekî birçî hatibûm bihatin. Ew ji bona ser xwe hatim birabûn. Wî milê xwe bi bin milên min ve date bixistin û ez piçekî bilindkirim û wî berê xwe ji bona min date bivekirin: Tu distrê, min jê re date bigotin. Na. Tu dilanê û govendê dizane bide bikirin, careke din min jê re date bigotin. Na. Wî bidengekî piçekî xurtir ve date bigotinn. Ma tu çi Kurd de. Bi lez û bez ve bi vê gotina Barzanî ve xwêdaneke xurt ez dame bigirtin û hêjbêtir bir sor bûm. Min pîr ji ber xwe ji bona peyva tu çi Kurd de didate bişermezarîkirin.

Bi wê lez û bezbûna hanê ve û hêjî di nava xewna wê nexweşîya hanê de Barzanî ez ji nava wê şermezarîya hanê dame birizgarîkirin û wî date bigotin: Rojekê Qenate Kurdo ji bona nik min hate bihatin û wî ji min re date bipirskirin: Tu distrê, Min got. Na. Tu dilan û govendê dizane bide bikirin. Min jê re got. Na. Di pişt re wî ji min re date bigitin: Ma tu çi Kurd de.

Bi van gotinên Barzanî ve xwîna min hate bivegerandin û cila şermezarîyê bi lez û bez ve ji ser min hate birakirin û bêhna min hate biderkevtin. Lêbelê hêjî ew bêhna hanê him bi bîra min ve û himjî li ber çavên min de tête biderkevtin. Di pişt re me jê xatirê xwe date bixwestin û em wê evê li Hacî Omran de di oda Mêvanan de hatin bixewkirin. Di sibeha rojan din de min Faris Bawa date binaskirin; jiber ku ew jî li wê oda Mêvanan de hatibû bixewkirin.

Di roja din de me çiroka dîtina xwe ligel Barzanî de bi carekê ve bi dûr û dirêjî ve ji bona Ismail Heqî Şawîs date bigotin. Pir bi wê dîtina Barzanî ve û bi dirêjbûna dema wî ve ligel me de kêfa wî pê hate biderkevtin.

Ji bextê minî reş hemû wêneyên girtî di Nav Pirdan û Hacı Omeran de di mekina min de hatin bisutandin. Wêneyek ji wan wêneyan li nik Hesên Şetewî de tête bidîtin, ku wî ji min re date bigotin, dê ezê ji te re daneyekî ji wan bidim birêkirin. Lêbelê hêjî ew ji bona min nehatiye bigihandin, dibe ku wî ew sozê xwe dabe bijîbîrakirin. Careke din heger ku min ew date biditim dê ezê wê daxwaza xwe ji bona wî wêneyê hanê jêre bidim binuhkirin.

Barzanî ji herkesekî bêtir bi dil û can ve bi dijî şer û cengê ve dihate biderkevtin. Bi herawayekî ve wî ji bona rêjîma Iraqê didate bibangkirin, ku ew pîrsa Kurd bi şêveyekî aşîfî ve bide biçarekirin û peymanan 11 avdara sala 1970 bide bicihanîn.

Lêbelê di rastîya rastî de ji bêhna morkirina peymanan 11 avdarê de rêjîma Basî bi herawayekî ve biryara xweyî dawî ji bona herifandina peymanan 11 avdarê û pêrejî biryara nemankirina şûreşê ji xwe re dabû bidan. Wê li her alîyekî de ji bona vê sitrafîcîya xwe de bi xurtî ve çî bi dizî ve û çî jî bi ekere ve didate bikarin. Taktîka wêna di vê dema hanê de bi carekê ve di wir de dihate biderkevtin:

Di warê hundur de:

Rêberên şûreşên yekî li dû yê din de bide bikuştin,  
 Erebkirina Kurdistanê bide bilezkin,  
 Hêzên dijî şûreşê di nava Kurdistanê de bide bipiştgirtin û biharkirin,  
 Çapemenîyên Partî rê li ber wan de bide bigirtin û biqedexekin  
 Agir di nav partîya Demokratî Kurdistanê û partîya Komonista Iraqê de bide bivêxistin.

B. Di derve de:

Di derve de tevaya sitrafîcîya rêjîma Iraqê bi carekê ve di dûrkiirinan Barzanî de ji Yekîtiya Sovyêtê, Dewletên Sosyalistî û hemû Hêzên Pêşverû û Demokrasên Cihanê de dihate biderkevtin. Wê

baş didate bizanîn, ku pêwendîyên Barzanî ligel Sovyêtê de pir bi xurtî ve dihatin biderkevtin û Sovyêtê bi dil û can ve, bi dirav û çek ve piştî wî ji roja hatina wî ji bona Iraqê tanî wê çaxê bi bê birîn ve û li dû hev de bi pêwendîyên xweser ve û bes û bi tenha ve ligel wênerên Barzanîyî pir bi taybetî û nehênî vî ve didate bikirin, ku li ser qolbûn û kûrbûna vê pêwendîya hanê de di navbera Barzanî û Sovyêtê de pir kêr kesên bi taybetî ve bi agehdar ve dihatin biderkevtin. Vê dostanîya pir xurtî Barzanîyan li gel Sovyêtê de rehên xwe ji pêla Şêx Ebdul-Selam de di sala 1913 de didatin biderxistin, gava ku ew ligel Ismail Axayê Simkoyê Şikanan de ligel Şehbenderê Rusî ve li bajarê Tevlîsê de hatin birûnstin<sup>72</sup>.

Şêx Abdul-Selam di vegera xwe de piştî, ku wî li Selmasê de xatirê xwe ji Ismail Simko date bixwestin, ew li gundê Gegencîn de hate bigirtin û ew ji bona desthilatîyên Osmanî hate bisipartin û wan ew ji bona bajarê Musliê de dane biveguhêstin. Ew li wêderê de di 14. 12. 1914 de hate bidakirin. Mîna ku tête bigotin, ku ew li bajarê Musilê de di meha rêbenda sala 1915 de hatîye bidarvekirin.

Hêjîbêtir ev Pêwendîyên xurtî Kurd ligel Rusan de ji bona pêla Berdirxanîyan û bi taybetî ve bi xurtî ve di dema cenga Kerim de der sala 1853-1856 de di hate bivegerandin û ev pêwendîyên hanê ji wê çaxê de her û her dihatin bixurtkirin.

Her û her Ingilîzan ev pêwendîyên Kurd ligel Rusan de û di pişt re ligel Sovyête de bi metirsîyeke mezin û giran ve li ser berjewendîyên xwe de di Rojhilata Navî de didate bidin; jiber ku wê didate bibawerîkirin, ku bes û bi tenha ve Rus di rêya Kurdan re dikarin deşta Furatê ji xwe re bidin bigirtin û bivegirtin û ew xwe bi ser tuxûbên ava germ ve, bi ser kendava Farsî ve bidin bigihandin<sup>73</sup>.

<sup>72</sup> Li vêderê de di vî babetê hanê de Hesên Şiyar di „Dîtin û Birhatinên min 1914 - 1983“, r. 134 de, çapxana Emîral, Libnan. Beyrût, 1993 de wetov dide binivîsandin: „Di 1913 de (mele Ebdulselam û Ebdurezaq beg Bedirxanî) çûne (Teflis) qeyser destê alî kariyê neda wan. (Ebdulselam) vegeriya (Ebdurezaq beg) li wir ma“.

<sup>73</sup> Ji xwe re li vê derê de li nivîsta pir hêjayî de ji bal Celilê Celilî de bi zimanê Rusî ve û wergerandî ji bal Siyamendê Sêrtî de ji bona zimanê. „Intifadet El-Ekrad - Serhildana kurdan- der sala 1880 de“, Dar El-Katib, Berûd sala 1979 de lêbidin

Herwehajî Barzanîyan di xebata xweyî milî de ji dil can didatin bibawerîkirin, ku dê kurd di rêya Uris re bêtin birizgarîkirin. Di seranserî xebata Barzanîyan de ji pêla Şêx Ebdul-Selam û pê ve him ligel Rusan de di pêla Qeyserî de û himjî di pêla Sovyête de pir bixurtî ve dihate biderkevtin<sup>74</sup>.

Herwehajî divê li vê derê de kêra pêwendîyên Ermenîyan ligel Kurdan de ji bona xurtbûna pêwendîyên Kurd ligel Ermenîyan de neyête bijibîrakirin; jiber ku piranîya wan pêwendîyên Kurdan ligel Rusan de di rêya Ermenîyan re dihate biderkevtin û vê pêwendîya Ermenîyan roleke giringî giran di yarmetîkirina vêxistinên şûreşên Kurdistanê de û di liberxwedana Kurdan de didate bikirin<sup>75</sup>.

Rêjîma Iraqê bi herawayekî ve dixwest vê girêka veşartîya hêz û hinera Barzanî bide bişikenandin, da ku ew wî di şer de bide bitenhakirin û di encamê dawî de bide bixistin.

Jibervêjî ve gava ku rêjama Iraqê date bidîtin, bi tep û pîlanan ve, bi kuştin û erebkirina Kurdisanê ve, bi durustkirina serêşî û sergêjîyê ve ji bona Barzanî ve di nava Kurdistanê de nikare bête biserkevtin û ew di rêya xapandinê û aşîtiyê re nikare şûreşê bide binemankirin, wê

---

bitemaşekirin. Ev nivîsta pir bi nexr û hêja ve bi zimanê Rusî ve li Mosko de der sala 1966 de hatîye bilevakirin; jiber ku di vê nivîsta hanê li ser gewretirîn û giringtirîn serhildana Kurd de bi sêweyêkî zanistîyî mêjûyîyî pir bilind ve û hemû bi belge ve ji bona serxwebûnê di mêjûa xebata milî de di piştî morkirina peymanê Çêldêran de ligel Seltena Osmanî de di sala 1515 de tete bixivtin.

<sup>74</sup>Ji xwe re li ser hinekî ji pêwendîyên Kurd de ligel Rusan de li nivîsta Xalêt Muradyovêc Pêtyova de: "Ji Mêjûwa pêwendîyên Rus û Kurdan de", wergerandina rusî ji bona zimanê Erebi ji bla Dr. Ismail Hesaf de, -bi bê sal û cihê derkevtinê ve- bidin bitemaşekirin.

<sup>75</sup>Ji xwe re hinekî li ser pêwendîyên Ermenîyan de ligel Kurdan de di nivîsta Mihemed Mele Ehmed de bi zimanê Kurdî ve: "Peywendîyên Kurd û Ermenîyan" de, Wergerandina Keça Kurd, di 1. 9. 1994 de, Sûriya - Qamişlo bidin bitemaşekirin

berê xwe ji bona taktîkeke nuh ji bona bicîanîna sitartîciya xwe di nemana şureşê de di rêya ceng û şer de date bivedan.

Başitirîn nimunê jê re di vî warê hanê de ji bona bi gihandina vê armnaca hanê ve di siyaseta Enwer Sadat de li Misrê de hate biderkevtin. Gava ku Enwer Sadat di piştî mirina Ebdul-Nasir di 28. 9. 1970 de ji xwe re date bixwestin, ku ew ji alîyekê de tevaya Hevalbendên Ebdul-Nasir ji ber xwe ve bide biderxistin û ji alîyên din jî de ew kêra Sovyêtê di nava Siyaseta Misrê de bide bihilanîn. Ji 28. 8. 1970 tanî 15. 5. 1971 de şerê li ser desthilatîyê de di navbera Sadat û Hevalên Ebdul-Nasir de date bidirêjkin. Wî duxwest, ku ew du çûkan bi kevirêkî ve bide bikuştin. Ev vekirina vê veşartoka hanê pir bi dijwar ve li ber Sadat li Misrê de di bin zînet û mercên wê demê de dihate biderkevtin. Lêbelê Sadat pir bi jîrbûneke mezin ve ji bona gihandina vê armanca xwe yek ji rêzanên siyaseta zanistîyî bingehî ve di diyalîtîka wê de ji xwe re date bikaranîn, ew jî ku Dujmin di rêya Dujmin re bide biavêtin. Wî ligel Sovyêtê de pir bi sadebûn ve û hêjîbêtir bi lez û bez ve Peymana Dostaniyê û Hevkarîyê di navbera Misrê û Sovyête de date bipişneyarkirin û herwehaji wî ew ligel wê de di 28. 5. 1971 de date bigirêdan û bimorkirin<sup>76</sup>.

Ebdul-Nasir him pir bi dostê Sovyêtê ve û himjî yekek ji dilsoztirînên wê ve dihate biderkevtin, rojekê ji rojan jî wî nikarîbû remaneke wetov jiber zînet û mercên heremê bidate biremankirin. Sadat bi vê taktîka xwe ve bi beramberî Sovyêtê ve bi vê gepa mezin ve hîş û sewda ji sêrê wê date birin. Wê dev ji Hevalên xwe date biberdan. Sadat tevde ji ber xwe datin bihalîn û biavêtin. Sovyêt li Misrê de bi bê Haval û Dost ve hate bimayîn.

Hêjîbêtir dûr yanjî nêzîk di piştî rûdanên Çiksilovakya de û bi taybetî ve piştî vegirtina wêna di 21. 8. 1968 de tevaya siyaseta Sovyêtî him bi beramberî Cuhana ve di seranserî dunyayê de û himjî di Rojhilata Navî de hate biveguhertin. Ev siyaseta hanê di bin nav û nîşana Dijî Samitîyê -Dijî Cuhûtî- de li Sovyêtê de û herwehaji li

<sup>76</sup> Ji xwe re di vî warê hanê de bi dûr û dirêj ve li: "Gesichte der Araber" -Mêjûwa Ereban-, bi zimanê Elmanî ve, Band 6, r. 82 - 139, Akademie Verlag, Berlin 1983 de bidin bitemaşekirin

tevaya dewletên Sosyaliştîyî hevalbendên wê de date bidestpêkirin, ku Sovyêt bi vê siyaseta hanê ve ji pir Zanistvan û Hozanên xweyî gewre di hemû warekî de hate bibêpîşkirin. Wetov bi sadetir ve taktîka Sadat di bin merc û zînetên weha de di ser serê Sovyêt de hate biderbaskirin. Sadat xweser ligel lêdana Hevalbendên Ebdu-Nasir û Sovyêt de bi xwe jî ve Peymana Dostanîyê û Hevkarîyê ligel Sovyêtê de date bigirêdan û ew ket û bir bi Beramberên xwe ve û bi lez bez ve hate bikevtin û wî ew bi carekê ve ji ber xwe date biavêtin û bihîç û bipûçkirin.

Piştî ku serdarîya Basîyî Iraqê bi kuştîna Barzanî ve nehate biserkevtin û bes û bi tenha ve wê di şer de bi serkevtina xwe ve didate bidîtin, wê jî bi lez û bez ve ji xwe re taktîka Sadat derbarê Barazî û hilanîna kêra Sovyêtê de di Iraqê de date bicîanîn. Iraqê di 9. 4. 1972 de Paymana Dostanîyê û Hevkarîyê ligel Sovyêtê de li Begdadê de bi Morkirina Kosigîn Serokê Wezîrên Sovyêtê û Serokê Komara Iraqê Ehmed Hesên El-Bekr ve date bigirêdan. Ev Sovyêt di xewna xwe jî de ji xwe re nikarîbû bidata bidîtin, ku ew di mējûwê de weha bi hêsanî ve ji bona ser kendava Farisî dê bête bigihandin.

Piştî morikirina Iraqê peymanê Dostanê û Hevkarîyê ligel Sovyêta de wê Partîya Komonista Iraqê bi cihê du Wezîran ve di Wezaretê xweyî Basî de date bixelatkirin. Yek ji van Mukerem Talebanî bû, yê ku jêre Wizaretê avdarîyê pê hate bidan û yê din Amir Abdul-Lah bû, yê ku ew bi Wezîrê Dewletê ve hate bidanîn.

Her Merovekî, yê ku jîyannama van herdu Merovan dide binaskirinn, dikare bide bigotin, ku ew ji wî perê Partîya Komonist têtin biderkevtin, ji yên ku ew bi bêtir ve bi Basî ve ji Komonist ve têtin biderkevtin.

Min weha her û her navê Amir Abdul-Lah nala Erebekî şovîni bi dijî miletê Kurd ve didate bibihîstin û tevaya reftara wîna nala Wezîrekî Basî ne kêr û ne jî bêtir dihate biderkevtin û heger ku reftara wîna yê rehperestî der barê miletê Kurd ji Basîyên Efleqî ne bi pîstir ve bihata biderkevtin, ew bi baştir ve nedihate biderkevtin.

Belam Mukerem Talebanî Kurd bû û min ew di cara pêşî de di meha axlêva sala 1969 de li bajarê Berlin de di kongerê Aştîyî Cihanî de date bidîtin; jibervêjî ve ez pir bigiring ve didim bidîtin, ku vî Merovê hanê piçekî bêtir bi Miletê Kurd ve li seranserê Kurdistanê de



bidim binaskirin, da ku ew bêtir li ber siyaseta serdarîyê û herwehaji hêjbêtir li ber destana siyaseta Partîya Komonist de bêtin biliberkevtin.

Jiber giringbûna van rûdanên hanê di wê demê de rep û rast ligel Mukerem Talebanî de ez pir bi başî ve didim bidîtin wan li vêderê de bidim bitomarkirin û wan li ber destên xwedevanên xwyî hêja de bidim bidanîn, da ku bi xwe ve dadkirina xwe li ser vî Merovê Komonistî Basîyi hanê de bidin bidan.

Di vê Kongirê Aştîyî Cihanî de em sê Kes bi navê Komela Xwedekarên Kurd ve li Eropa de têde hatin bibeşdarîkirin. Ji van jî Dr. Hadî Malik, Dr. Mohamed Salih Dehokî û ez dihatin biderkevtin.

Mukerem Talebanî jî ligel Wênerên Iraqê de di vî Kongirê hanê de dihatê bibedarîkin. Herwehaji Hemze Ebdullah, Ezîz Şerî, Serokê Sundikata Advokatên Iraqî û hin ji Merovên Basî û kesên din dihatin biderkevtin.

Bi navê Komelê ve me daxuyanîyek zor nerm û pir li ser xwe de bi zimanê Elmanî ve ji bona Beşdarên Kongirê dabû binivîsandin û têde bi givaştî ve, bi gihaştî ve û bi kurtî ve li ser wî şerê dadayî di Kurdistana Iraqê de dihatin biaxivtin û me têde zîyana wî him ji bona miletê Kurd di Kurdistana Iraqê de û him jî ji bona miletê Ereb de di Iraqê de bi jimar û amaran ve çî di warê diravî de û çî jî di warê Merovanî de didate biderxistin. Me têda ji bona tevaya Beşdarên Kongirê didate bibangkirin, ku ew dengê xwe ji bona pitgirina miletê Kurd li seranserî Kurdistanê de bidin bibilindkirin û ew ji serdarîya Iraqê bidin bixwestin, ku ew wî şerê nerewa bi dijî miletê Kurd ve di Kurdistana Iraqê de bidin birawestandin û pirsra Kurd bi şevyekî aşîfî li ser berjewendîya miletê Iraqê de bi Ereb û Kurd ve bide biçarekirin.

Kongirê di nava gelek Encumenan de dihatê biparvekirin û jiber ku em bi kêm ve dihatin biderkevtin, me xwe hersêyan ji bona nava Encumenan dabû biparvekirin, da ku em him bêtir pêwendiyên xwe ligel Wêneran de bidin bikirin û him jî da ku em bêtir di nava wan civînên encumenan de li ser pirsra Miletê Kurd di seranserî Kurdistanê de bidin biaxivtin.

Wetov hate biderkevtin û ku karê Mukerem Talebanî dihatê biderkevtin, ku ew her û her bi dû me ve bête bikevtin û her û her bi

dijî me jî ve bide biaxivtin. Wetov dihate bidiyarkirin, ku wî ev karê hanê ji bona ser hustê xwe dabû bihildan û hêjbêtir ew karê hanê pê hatibû bisipartin.

Cara pêşî em ligel piraniya Beşdaran de di nava encumena miletên cîhana sêyem hatin bibeşdarîkin û me jî xwest ku em jî ji xwe re li ser welat û miletê xwe de bidin biaxivtin û himji wê daxuyaniya xwe ji bona wan Beşdarên bi rêz û hêja ve bidin bixwendin. Belê daxwaza me li nik encumena serpereştîyê de hate biwergirtin.

Dr. Hadî Malik ji bona ser depê beyvdariyê hate biçûyîn û wî pir li ser xwe de li ser Kurd û Kurdistan de bi zimanê Elmanî ve date biaxivtin û wî ew daxuyaniya me date bixwendin û ew tevde bi zimanê Ingilîzî, Firensî, Sîpanî û Erebbî jî ve hate biwergerrandin.

Gotina Dr. Hadî Malik û daxuyaniya Komela Xwendevanên Kurd li Ewroda de pir bi dilên Beşdarvanan ve hate biderkevtin û wan pir bi germî ve pêşewazî li pêyvên Wênerê Kurd de datin bikirin. Di nava van çepkan û vê pêşewazîya germ de ji bona Dr. Hadî Malik Serokê Encûmenê bi navê xwe jîve pir sipasiya xwe ji bona Wênerê Kurd li ser wan peyvên hêja û bi nerx ve ji bona xurtkirina aştiya û dostaniyê di nava miletên Rojhilat de date biderxistin. Hêjî çepik û peyva Serokê Encûmenê nehatîbûn bidawîkirin, Endamên Şanda Iraqê ji yên Basî ligel Mukerem Talebanî bi qîjeqîj û qireqir ve dane bikirin û xweser ber bi depê peyve ve didatin birakişandin. Him Mukerem Talebanî û him jî Basîyek pir bi qelafet ve bi ser depa peyvê ve hatin bikevtin. Ezîz Şerîf di nava encumana serpereştîyê de dihate biderkevtin. Ew jî ber bi pêşiya wan ve li ser dep de hate biçûyîn, da ku xwe piçekî bidin bigirtin û destûra rêdana axvîtinê ji xwe re bidin bixwestin û dura ew dikarin ji xwe re bidin biaxivtin. Basî milên xwe bi singa Ezîz Şerîf ve date bilêdan û wî ew ji ber xwe date biderxistin û bi zorê ve mikrofona bi destên xwe ve date bixistin û pir gotinên xerabî siyasî bi zimanê Erebbî ve ji me re dane bidan.

Belam bextê wî pir bi baş ve hate biderkevtin; jiber ku ew gotinên wîyî hanê nehatin bi wergerandin; jiber ku ew bez û rezma hanê û reftara Basîyî naşîrîn bi dijî peyrewa civînê ve dihate biderkevtin.

Ezîz Şerîf pir li ber xwe de bi wî porê xweyî sipî ve û bi wê nermbûna xwe ve û hêjbêtir bi wê nasîna xwe ve hate biliberkevtin;

jiber ku hindik mabû, ku ew bi wê palpêdana Qeraseyê Basî hanê ve bi ser piştta xwe ve bihata bikevtin.. Piştî Ku Basî peyva xwe bi dawî ve date bianîn, Mukerem Talebanî xwe bi navê Endamê Civata Aştîyê ve li Iraqê de û him jî xwe bi nala Kurdekî ve date binaskirin. Gotinên wî dihatin biwergerandin. Wî pir bi arzanî ve li ser Komela me de date biaxivtin û pir navên xerab bi dû wê ve datin bivekirin û date bi gotin, ku ev Wênerê vê Komela hanê Wênerîya Kurdan nade bikirin, ew bes û bi tenha ve wênerîya Kevneperastan, Serokên Eşîran, Cihêvanan û Nokerên Impiryalizmê dide bikirin.

Mukerem Talebanî bi van gotinên xwe ve di vê civîna hanêyê pir hêja de bi erşkere ve xwe firoşîya xwe ji bona Basên faşî bi diyar ve date biderxistin; jiber ku piranîya pir ji Wênerên vê civîna hanê li ser tawankariyên Hovberên Basîyên faşî de der sala 1963 de beramber bi Demokratên Iraqî ve bi giştî ve û beramber bi milletê Kurd ve bi taybetî ve bi agehdar ve dihatin biderkevtin. Piranîya pir ji Demokrat û Komonistên Welatên Erebb û herwehaji Tude ev gotinên Mukerem Talebanî beramber bi Wênerên Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de, ya ku ew ji sala 1964 de bi Endamê Yekîtiya Xwendevanên Cîhanê ve dihate biderkevtin, pir bi erzanî û tûrebûn ve hatin bigirtin. Wan ew gotinên wî beramber bi xebata milletê Kurd ve di Kurdistana Iraqê de rast û durust bi gotinên Nokerekî Basî ve didatin bidanîn. Herwehaji hin Endamên Şanda Iraqê mîna Hemze Ebdula û Serokê Advokatê Sidîkata Iraqî ji bona nik me hatin bihatin û wan ji me re tevaya tûrebûna xwe li ser wan gotinên Mukerem Talebanî dane biderxistin û wan piştgirtina xwe ji bona doza Kurdî rewa datin biderxistin. Wan ji me re rast û durust datin bigotin: Hûn Mukerem Talebanî nadin binaskirin. Ew rast û durust bi Murtezeqekî - Kurtêlxwerekî- Basî ve tête biderkevtin. Rast bû, me ew nedidate binaskirin; belam pir me navê wî hestîkojê xwefiroşî Kurdê Komunistê Basî ji xwe re dabû bibihistin. Hemze Ebdula hemû piştgirtina xwe ji me re date biderxistin û hêjîbêtir wî ji me re date bigotin, heger ku hûn bi başî ve didin bidîtin, ez dê ji bona ser textê her civînekê bêtin biderkevtin û ji Beşdaran re bidin bixuyanîkirin, ku Mukerem Talebanî bi van gotinên xwe ve wênerîya Aştixwazên Iraqî nade bikirin; lêbelê bes û bi tenha ve wênerîya serdarîya Basî li Iraqê de dide bikirin. Me pir sipasîya wî date bikirin û me jê date

bihêvîkirin, ku ew hîç bi karekî wetov ve neyête birabûn, jiber ku dê metirsîyeke mezin him li ser wî de û himjî dê li ser Zarok û mala wî de ji bal Basîyên faşî de bête bikirin. Şev û roj her û her Kak Hemze Ebdula li nik me de dihate birabûn û rûniştin û wî nav di me de didate bidan û digot: Hûn rohnîya çavên minin, destê we xweş, we dilê min date bihênikkirin. Me jî pir jê didate bihezkin û rêz û hêjabûneke mezin li vî Welatperwerê pîrê Kurd de didate bigirtin.

Herwehajî Serokê Avokatê Sindikata Iraqî, navê wî Ciwanmêrî nema bi bîra min ve tete biderkevtin, lêbelê ew bi çavekî bû û ji Hevalên Çadirçî bû, pir caran ji bona nik me dihate bihatin û wî pir li ber dilê me didate bidan, ku em dilê xwe ji gotinên Mukerem Talabanî ve nedin bigirtin; jiber ku ew wênerîya Demokrat, Pêşverû û Aştîxwazên Iraqê beramber bi xebata rewayî milletê Kurd ve nade bikirin, ew bes û bi tenha ve bi hestîkojekî Kurd ve mîna bi sedan ve ji Çaşên Kurdî kevin û nuh ve tete biderkevtin.

Wî ji me re date bigotin, ku ez dixwazim ji we çîroka xwe ligel Hesên El-Bekir bidim bigotin: Piştî hatina Basîyan ji bona ser serdarîyê di 17 tîrmeha sala 1968 de Basîyan ji min datin bixwestin, ku ez daxuyanîyekî bi navê Sindakata Advokatên Iraqî ve bi dijî Barzanî û tevgera wî ve bidim biderxistin. Min ev daxwaza wan nedidate bicîanîn. Wan pir ev daxwaza hanê ji min didatin bikirin û min jî ev daxwaza hanê bi nayînê ve didate bibersivkirin. Pir pê neçû, Serokê Komarê Hesên El-Bekir bi xwe ve ji bona dû min date birêkirin. Ez ji bona nik wî hatin bjçûyîn. Me hevdû nasdikir. Wî pir rêz li min de date bigirtin û ji min careke din date bixwestin, ku ez daxuyanîyekê bi nava Snidikata me ve bi dijî Barzanî ve bidim biderxistin. Piştî peyveke dûr û dirêj di vî babetê hanê de em bi tu encaman ve nehatin bigihandin û di dawî dawî de min ev jêre date bigotin: Ez tu daxuyanîyan bi dijî Barzanî ve bi navê xwe ve nadim biderxistin, hegerjî tu min bide bidarvekirin; jiber ku Barzanî ji bona dozeke rewayî milletê xwe dide bixebatkirin. Lêbelê çî gava ku te doza milletê Kurd li Kurdîstana Iraqê de li ser bingehê pêrûniştî mafeyê wanî milî de di Ewtonomîyek rast û durust de pê bête birûniştin, wê gavê kî bi dijî vî siyaseta hanê ve bide bikarkirin, dê ezê bi dijî wî ve daxuyanîyan bidim biderxistin.

Bi van gotinên min ve Hesên El-Bekir pir pê hate bitûrekirin. Destên min tanî nehajî hêjî li ser dilê min de têtin biderkevtin, ma dê kengî Basî min ji bona binê zindanan bidin biavêtin û biazardarîkirin. Tevlivêjî de min nikarîbû bi dijî bextê xwe ve bida bikarkirin. Min ev ji bona Kurdan date bikirin, lêbelê min ev jiber hezkirina xwe ji bona miletê xweyî Ereba dayite bikirin, da ku em tûşî wan destanan neyêtin bikirin, ji yê ku Turk bi siyaseta xweyî turkkirinê ve bi beramberî miletê Ereba ve ji sala 1908 li ser destên Gencên Turkî de hatin bikirin û di encamê da de bi rûxandina Selteneta Osmanî de di sala 1918 de hate bidawîkirin.

Herwehaji wî ji me re didate bigotin, ku di seranserî mêjûwa Ereba de hêjî kesekî mîna milyên Basiyên şoviyên Ereba weto zîyan bi xebata miletê Ereba ve nedane bigihandin û di zîyana wan ji bona miletê Ereba deha bêtir bi ziyantir ve ji zîyana Gencên Turkan ve beramber bi miletê Turk ve dê bêtin biderkevtin.

Me pir bi çavekî rêz û hêja ve li vî Serbazê Demokratvanê windayî Ereba de didate bitemaşekirin, ku çend vî Demokratê Ereba ji welat û miletê xwe bi rast û durust ve didate bihezkin û hêjbêtir bê kanî çî qasî ev Merovê hanê di cewhera pirsê milî de ji bona çarekirina wêna de li ser bingehê çarenûsa miletan de di mêjûwê de dihate biliberkevtin.

Di civîna Encumena Rojhilata Navîn de careke din ji nû ve bez û rezmeke mizintir di navbera min û Mukerem Talebanî de û herwehaji ligel Wênerî Surî de date bidestpêkin; belam vê carê deha bi notir û xurttir ve date bidestpêkin.

Serokê vê Encumena hanê Xalid Muhyedîn bû, yê ku ew bi Serokê Civata Aştîxwazên Mîsrê ve dihate biderkevtin û ew pir di nava hêzên Demokrasî û Aştîxwaz de bi nav û bang bû.

Ez jî ji bona wê civînê hatin biçûyîn, da ku ez li wêderê de pir bi nermî ve û li ser xwe de li ser doza Kurd û Kurdistanê de bidim biaxivtin û wê ji bona wan Endamên bedarî bi rêz û hêja ve bidin bixuyanîkirin. Ev jî bi tiştê rewê ve dihate biderkevtin û himjî bi mafeyê me ve bi mîna Endamê Kongire ve dihate biderkevtin, ku em di vî kongirê aşîtyê de li ser çarekirina pirsê Kurd û Kurdistanê de bi azadî ve ji xwe re bidin biaxivtin.

Bêtir ji 30 Wênerên Welatan di wir de dihatin bibeşdarîkirin. Hemû Wênerên Welatên mezin û kêrdar têde dihatin bibeşdarîkirin.

Min jî mîna her endamekî civînê navê xwe ji bona peyvê date binivîsandin. Gava deme peyva min hate bihatin, min jî dest bi peyva xwe ve pir bi givaştî û hejîbêtir bi gihastî ved ate bikirin, da ku ez him Endamên civînê li ser pirsra Kurd de bidim biagehdarîkirin û himjî dilên wan bi ser pirsra Kurd ve bidim birakişandin. Weke ku neha bi bîra min ve tête biderkevtin, ez li ser navroka van xalên hanê hatî de hatim biaxivtin.

Li ser kevinbûna miletê Kurd de di Rojhilata Navînî de û tomarîkirina navê wîna ji berî sê hezar sal ve di berî zayîna Isa de di tomarên Somerî de ango ji berî pênc hezar sal ve li dû hevdû de ev miletê hanê di nava welatê xweyî Kurdistanê de tête bîjyandin û wî her û her mîna hemû miletên vê dunyayê hebûna xwe û serwerîya milet û welatê xwe beramberî bi her Dagîrkerekî ve dayite biparstin û bi merdayîti jî ve ji bona vî mafeyê perest di seranserî mêjûwê de ji baştirîn Keç û Lawên xwe dane bigorîkirin.

Kurdistan di sala 1514 di navbera Seltena Osmanî û Sefewî de hate biparvekirin û li ser Peymana ligel Sultan Selîm de der sala 1515 de Kurd bi baştirîn Ewtonomî ve di wê demê de ji bona serpereştiya Welate xwe hatin bigihandin. Kurdistan jî mîna hemû perçên dinî dewleta Osmanî hate bipêşkevtin. Di de jihevkevtina Selteneta Osmanî de miletê Kurd jî nala miletên din li jêr wê serdarîya hanê de hatin bipaşvekevtin<sup>77</sup>.

Li ser bingehê peyama Sayks-Pîko de der sala 1916 Kurdistan jî bi nala perçeyên dinî Seleteneta Osmanî ve di nava Ingliştan, Firensa û Rusya de hate biparverkirin.

---

<sup>77</sup> Ji xwe re di vî warê hanê bi dîr û dirêjî ve li nivîsta Olya Çelebî bi zimanê Farisî ve „Kurd der tarîx Hemsayegan“ de „Siyahetnane Olya Çelebî, Wergerandina Faruq Kîxosrewî, Intişarat Selah El Dînê, çapxana Sepher, Tehran 1364. Herwehaji ji xwe re li nê nivîstanahê de bi zimanê Kurdî ve bi zaravayê soranî ve bidin bitemaşekirin, ya ku ew ji bal Seîd Nakam de li jêr navnîşana „Kurd le Mêjûwî Dirawsekan de, Siyahetnamey Olya Çelebî“ de hatîye biwergerandin û ew li çapxana Korî Zanyariyî Kurd de li Begdadê de 1979 de hatîye bibelavkirin.

Ev nivîsta hanê bi belgeyekî mêjûyîyî pir bi nerx û hêja ve li ser mêjûwa Kurd û Kurdistanê ve tête biderkevtin.

Di herifandina Seltena Osmani de der sala 1918 de û di kongirê Sever de der sala 1920 de di bendên taybetîyî girêdayî bi Kurdistanê ve benda 62, 63 û 64 pir bi başî ve li mafeyê Kurd de di Kurdistanê de hate bitemaşekirin û ew li ser 14 bendên Wilson Serokê Yekgirtina Dewletên Emerîkî de di çarekirina çarenûsa netewan de hate biçarekirin.

Pirsa Musilê di sala 1925 û herwehaji pêrejî pirsra neftê li Kerkûkê de hate biderkevtin, ku Ingilistanê bi her awyekî ve bi destxistina Nefta Kurdistanê ve bi girîngtirîn berjewendîya xwe ve date bixwestin. Kurd di lêpirskirina milî de ji bala Girêdana Netewan de bi Eşkere ve datin bixwestin, ku ew dixwazin bi dewlet bin û heger ku ev neyête bikin, ew dixwazin ligel dewleta Turkîyê de bêtin biderkevtin û ew naxwazin, ku ew bi tev li dewleta Iraqê de bêtin bikin.

Dewleta Ingilîzî û herwehaji dewleta Iraqî sozên Ewtonomî ji bona Kurdistanê di salên 1922 û 1924 de beramberî bi tevaya dunyayê ve dane bidan. Belam dewleta Iraqê ew sozên hanê bi carekê ve dane bijibîrakin.

Kurdan ji wê rûjê de ji bona mafeyên xwe li Kurdistana Iraqê serhildanek li dû yan din de dane bikin, belam ew di tevaya wan serhildanên xwe de nehatin biserkevtin, ne ku dewleta Iraqê xurt bû, lêbelê her û her ew ji bal Impiryalîya Ingilîzî de bi dijî Kurd ve di hate bipîştgirtin.

Hêvîyeke mezin ji bona Kurd li Kurdistana Iraqê de hate biderkevtin, gava ku şûreşa demokrasîyî 14 tîrmeha sala 1958 hate bivêkevtin. Tevaya milletê Iraqê û herwehaji tevaya bîr û bawerîya cihanê bi vê şûreşa pîroz ve hatin bidilşadkirin, ku têde Erebi û Kurd bi Beşdar ve di nava welêt de bi mîrî ve dihatin biderkevtin. Barzanî piştî mayîna sêzdeh salan ji Sovyêtê ji bona Iraqê hate bivegerandin û xwe bi nala Serbazekî ve him ji bona Abdul-Kerîm Qasîm û himjî ji bona liberxwedana vê şûreşa demokrasîyî pîroz date bidanin.

Belam pir pê neçû, Ebdulkerîm Qasim ji rêya şûreşê hate biderkevtin û wî xwe bi diktatorekî bê hempa ve li ser milletê Iraqê de dixwest bide bidanîn. Wî dest bi şerê milletê Kurd ve di 11. 9. 1961 date bikin. Dî encamê vî şerê hanê de pir kes hatin bikuştin û di dawî dawî de di 8. 2 1963 de Abdul-Kerîm Qasim jî hate birûxandin û ji wê

rojê de û tanî neha de milîyên Erebî faşî bi hemû karînên xwe ve ji bona erebîkirina Kurdistanê û qirkirina milletê me bi hemû çekên xweyî dujehî ve bi napalm û Fosfor ve didin bişerkirin, ku tanî neha bêtir ji 70 000 Kes ji Zarok, Pîrek, Kal û Rebenên Kurdên bi bê çek ve li ser destên Şovîniyên Ereb de di Kurdistanê de hatine bikuştin û bêtir ji 2000 gund ji 5000 gundên Kurdan hatine bikavil û biwêrankirin. Herwehaji bêtir ji Milyardeke Dolar di vî şer û vê cenga qirkirina milletê Kurd de wêrankirina kurdistana Iraqê de li ser serdarîyên kevneperestîyên û şovîniyên Ereb de hatîye birawestandin.

Bes û bi tenha ve ev şer û cengên hanê ji bona erebîkirina Kurdistanê, talankirina 90 Melyon neft ve ji Kerkûkê de ji 15. 10. 1927 de û qirkirina milête Kurd tête biderkevtin. Weha bi hovberî ve sipahê Rehperestên Erebîyî Efleqî bi mîna Spanya û Pirtula ve li Emerîka de beramberî Hinodên Sor de ligel Kurd de di nava welatê wîyî Kurdistanê de ji bona qirkirina milletê Kurd de didin bişerkirin; jiber ku Kurd daxwaza Demokrasîyê ji bona Iraqê û Ewtonomîyê ji bona Kurdistanê didin bikirin

Hêvîya milletê me û daxwaza wî ji we Endamên hêjayî bi rêz ve tête biderkevtin, ku hûn dengê xwe ji bona rawestandina vî şerê qirkirinê beramber bi milletê Kurd ve li Kurdistana Iraqê de bidin biberzkerin û ji serdarîya Iraqê bidin-bixwestin, ku ew vê pîrsa rewayî hanê li ser bingehê demokrasîyê û ewtonomî de ji bona Kurd di Kurdistana Iraqê de bide biçarekirin; jiber ku neçarekirina vê pîrsa hanê metirsîyeke mezin li ser asayîşê, aramîyê û aştîyê de di Rojhilata Navînî de dide bidurustkerinê herwehaji hêjbêtir çarekirina pîrsa Kurd bi şêveyekî demokrasî ve li ser bingehê Demokratî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê bi carekê ve tête berjewendîya milletê Iraqê bi Ereb û Kurd ve tête biderkevtin û ew bingehê dostanîyî ji dêlva dujminatîyê ve di navbera milletên Kurd û Ereb de dide bidurustkerin.

Bi van navrokên hanê ve û di çarçopê van remanên hanê de ez li ser pîrsa Kurd û çarekirina wêna de di Kurdistana Iraqê de dihatim biaxivtin. Diyar bû, ku ev şêveyê lênerîna min ji bona çarekirina pîrsa Kurd bi dilên Beşdaran ve dihate biderkevtin. Hêjî min gotina sipasîya xwe ji bona guhdarîkirina Beşdaran ve nedabû bidawîkirin, Mukerem



Talebanî û Wênerî Surî vitevit bi wan ve hate bikevtin û wan herduwan bi hev re destên xwe ber bi tepê Serpereştiyê ve didatin bidirêjkirin û bi şipyayî ve dihatin birawestandin û wan herduwan bi her ver didatin biqîjkirin, ku ew dixwazin bidin biaxivtin. Ew pir bi lez û bez ve dihatin biderkevtin, da ku ew li ser gotinên min de bidin biaxivtin.

Belê ev jî bi mafeyên wan ve dihate biderkevtin, lê divabû ku ew çavdêriya hatîna dema navê xwe û peyva xwe bidin bikirin. Belam diyar bû, ku sewda û hiş ji serên wan de hatibû bihilanîn. Ew herdu pir bi naşîrîn ve bi qîreqîra xwe ve ji bona bi lezbûna peyvê ve di wê civatê de dihatin biderkevtin. Belê bîr û bawerî nayête biveşartin û bêhnêkê piçekî kêr yanî zû tu tiştê li gorê de û li rastê de nade biveguhertin.

Xalid Muhyedin bi ser xwe ve hate birabûn wî pir bi nermî ve ji wan re date bixwestin, ku ew ji fermûwa xwe bêtin birûniştin. Ew herdu hatin birûniştin. Xalid date bigotrin, belê hûn dikarin bi dûr û dirêjî ve li ser peyva Wênerê Kurd û bîr û baweriyên wî de bidin biaxivtin, dema me heye û wî rêya peyvê di pêşî de ji bona Mukerem Talebanî date bidan.

Mukerem Talebanî di pêşî de date bigotin, ku ez li vê derê de dixwazim vê rastiyê bidim bigotin, ku ev Merovê hanê ne bi Wênerê Kurd ve tete biderkevtin, ew bes û bi tenha ve bi Wênerê Serokên Eşîran ve, bi Wênerê Kevneperestan û Cihêvanan ve tete biderkevtin, Kurt ew bi Wênerê Partîya Demokratî Kurdistan ve tete biderkevtin, ya ku ew tevaya kevneperestiyê û Derebegiyê li Şemalî Iraqê de dide biwênerkirin. Pir ji Kurdên Pêşverû û Welatperwer û herwehaji ji Damizirvanên Partîya Demokratî Kurdistan neha ew ligel serdarîya miliyî pêşverû de mil bi mil ve bi diji Serokên Eşîrên Kevneperest û Cihêvanên Kurd ve Nokerên Impiryaliyê û Kevneperestî di Rojhilata Navînî de didin bixebatkirin û bişerkirin. Serdarîya Iraqiyî Miliyî Pêşverû rojekê bi diji birayên Kurd ve di Şemalî Iraqê de nedaye bişerkirin. Gotinên vî Merovê hanê bes û bi tenha ve li qazanca Kevneperestiyê û Impiryalizmê têtin biderkevtin.

Herwehaji ew bi dûr û dirêj ve li ser wan pêrabûnên avanîyê û bidestkevtinên Kurd de ji bal serdarîya miliyî pêşverû de hate biaxivtin.

Vî hestîkôjê Basîyî hanê xwe didate bijibîrakirin, ku Partîya Komonistî Iraqê û herwehaji Demokratên Erebi ligel Kurdan de di Kurdistana Iraqê de ji man û nemanê dihatin biparastin û wan bi dijî vê serdariya rehperest ve ji bona demokratîyê ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê didatin bixebatkin û bişerkirin. Bi kurtî ve û hêjibêtir bi kurmancî ve wî wetov didate bigotin: Hemed û sena bo Xwedayî Alemîn ev Xwedayê daye me ev Basên Mobîn<sup>78</sup>

Piştî bi dawîhatina gotina Mukerem Talebanî ve Wênerê Surîyî Basî bi can û dilê xwe ve çavên xwe date bigirtin û wî devê xwe date bivekirin: Mîna ku bi bîra min ve tete biderkevtin ev Basîyê Surîyî Manalê bê derpî li ser van xalên hatî de date biaxivtin: Kurd bi Miletêkî ve ne li Surî û ne jî li Iraqê de nayêtin biderkevtin. Ew bi kemîyeke milîyî barkirî ve ji bona nava xakê welatê Erebi hatine bibarkirin.

Kurdistan bi Welatê Kurd ve ne li Surî û ne jî li Iaqrê de tete biderkevtin.

Pirseki ku jêre dibêjin pirsê kurd niye<sup>79</sup>, ev pirsê hanê bes û bi tenha ve jî bal Sehyonizmê, Ipiryalizmê û kevneperestîyê de hatiye bidursutkirin, da ku ew gewdakî bêgane di nava welatê Erebi de ji Zerî tanî Kendava Erebi bidin bidurustkirin. Evê neha li Şemalî Iraqê de şerdikin, ew bi Nokerên Sehyonizmê, Impiryalizmê û Kevneperestîyê ve têtin biderkevtin, mîna ku birayê Mukerem Talebanî ev bi eşkere û

<sup>78</sup> Ev Malika hanê ji destpêka Nivîsta Zayîna Pêxember ve tete biderkevtin, mîna ku bi bîra min ve tete biderkevtin, ku ew nivîsta hanê ji bal Melayê Botî de hatiye binivîsandin û wetov ew malika hate tete bidestpêkirin:

Hemd û sena bo Xwedayê Alemîn ev Xwedayê daye me ev dînê Mobîn

<sup>79</sup> Ji xwe re li ser pirsê Kurd de li namilka wergerandî de ji bona Kurdî zaravayê soranî de ji bal Seed Ebdulah de bidin bitemaşekirin, ya ku bi derikî ve ji nivîsta Lazerêv tete biderkevtin. Ew nivîsta hanê, ya ku ew li jêr navnîşana: "Pirsê Miletan di nava Welatên rizgarîkirî de di Rihîlat de" tete bidîtin, bi zimanê rusî ve li Moskê de di sala 1986 de hatiye bibelavkirin. Ev namilka wergerandîyî hanê di bin vê nav û nîşanê de "Ew hokaraney meseley Kurd pêkdênin" -Hokariyên pirsê Kurd didin bipêkanîn- bi Kurdî ve bi zaravayê soranî ve hatiye biçapkirin. Li ser vê namilka hanê de ne dem û ne jî cihê çapê hatiye binivîsandin.

diyar ve date bixuyanîkirin. Sipahê Iraqêyî Erebî bes û bi tenha ve dide bixwestin, ku ew wan bîrîkên Sehyonizmê, Impiryalizmê û Kevneprestîyê bidin binabudkirin.

Miletê Erebîyî mezin ji Zerî tanî kendava Erebî dê vî xakê Erebî perest ji her destdirêjîyekê bide biparastin û dê ew destên destdirêjan bide bijêkirin.

Pir gotinên din di ferhenga Basîyên Efleqîyî faşî de vî Sêwîyê bêderpê û pêxwas ji xwe re bi dijî Kurd ve didate bigotin.

Piştî van gotinên vî Basîyê Surî Xalid Muhyedîn dest bi peyvê ve date bikirin û wetov bi kurtî ve ez dikarim gotinên wî bidim biderxistin:

Ez pir sipasî Wenerê Kurd li ser wan gotinên wîyî bi nerx ve didim bikirin. Çend ez ji sipasîyan ji bona Wênerê Kurd didim bipêkekirin, weha deha ez turebûna xwe li ser peyvên Mukerem Talebanî û Wênerê Surî didim biderxistin, ku ew ne bes tenê bi şermezarî ve ji bona herdu wan têtê biderkevtin, lêbelê hêjbêtir ew pir bi şermezarî ve ji bona hemû milletê Ereb ve têtê biderkevtin, gava ku ew wisa ligel çarekirina pîrsa milletê Kurd de didin bireftarîkirin û ev jî divê li vêderê de bête bigotin:

Miletê Kurd ji milletên Kevnarî Rohhilata Navînî têtê biderkevtin û ew bi hezaran sal ve di nava Welatê xwe de di Kurdistanê de têtê bijîyandin û ew neha di nava Turkî, Iran, Iraq û Surî de têtê biparvekirin<sup>80</sup>.

<sup>80</sup> Ji xwe re li ser Mêjûwa Kurdistanê û rûdanên wê de di piştî cenga cîhanîyî yekem de bi dûr û dirêjî ve li nivîsta pîr hêja û bi nerx ve bi zimanê Kurdî ve ji bal Hesên Hîşyar de di bin navûnîşana „Dîtin û Bîrhatinên min 1907 - 1985“ de, çapxana Emîral, Beyrût, Libnan 1993 bidin bitemaşekirin.

Ev nivîsta hanê yekek ji nerxtirîn nivîstên zimanê Kurdî bi zaravayê kurmançî ve li ser rûdanên wê demê de têtê biderkevtin; jiber ku Hesên Hîşyar bi karnasekî mêjûwa milletê xwe ve dihate biderkevtin û ew di şûreşa Şêx Seidê Pîran de bi pîr jêhatîbûn û bi têtê bibeşdar ve dihate biderkevtin û ew bi Yawirê Şêx Seid ve di şûreşê de dihate biderkevtin. Wî di tevaya jîna xwe de ji bona welat û milletê xwe bi dilsozî ve her û her bi welatperwerî ve di bin pîr merc û zînetên dijwar de didate bixebatkirin. Herwehaji wî bi hemû tuwana xwe jî ve piştî şûreşa Kurdistanê Iraqê

Mafeyê miletê Kurd mîna mafeyê hemû miletên din di ve dunyayê de ji bona çarenûsa xwe de têtê biderkevtin û daxwaza miletê Kurd li Kurdistanê Iraqê de: Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê pir bi rewşa ve û di cihê xwe de têtê biderkevtin. Divê bi wan daxwazên hanê ve bête birûniştin. Sipahê Iraqî bi beramberî miletê kurd ve di Kurdistanê Iraqê de bi sipahêkî dir û hov ve têtê biderkevtin.

Hîç Ereb nikarin tu hêvîyê û tu dawxazîyê ji bona piştgirina miletê Felestîn û piştgirtina xwe ji hîç miletêkî bidin bikirin, tanî ku ew pîrsa miletê Kurd li ser bingehê çarûsa miletan de nedin biçarekîrin û bi mafeyê miletê Kurdî rewşa ve neyêtin birûniştin.

Gotinên Mukerem Talebanî û Wênerê Surî bi bîra min ve rewşa Gencên Turkî Nuhhatî ji bona turkkirina Ereban di piştî Şûreşa Medhet Paşa de der sala 1908 de didin bibîrxistin, yên ku wan di encamê dawî de bi lezkirina rûxandina Seltena Osmanî ve der sala 1918 de datin bilezkirin û wan ziyaneke mezintir ji herkesêkî bêtir bi Turkan û Seltena Osamnî ve datin bigihandin. Wetov jî ev gotin û reftarên Milîyên Erebîyî şovîni di encamê dawî de bi erebkirina Kurd û Kurdistanê ve dê ziyânên wan li ser Iraqê û Surî de ne bi kêmtir ve ji ziyânên Cengên Turkî de li ser Selteneta Osmanî de bêtin biderkevtin.

Ez ji dil û can hêvîdarim, ku dê miletê Ereb her û her bide bixebatîkin, da ku ew miletê Kurd di Kurdistanê de bi Dostên xwe ve, bi Birayên xwe ve bide bikirin û ne ku ew bi darê zorê ve li ser siyaseta milîyî şovîni de vî miletê mîrxas û gerans lawên Selah El Dinê Eyûbî bi dujminên xwe ve bidin bikirin; divê Ereb jiber qehremanî û Qencîya Selah El-Dinê Eyûbî de bidin bişermkirin, heger ku Selah El-Dinê Eyubî neba, dê şerên Xaçperestan di dusedsalên xwe de welatên Ereb bidana bizeftîkin û dê nala Hinodên Sor li Emerîka de der sala 1492 de bi ser serên Ereban ve bihata bikirin.

Piştî Ku Xalid Muhyedîn peyva xwe date bidawîkin. Pîra Irlendî destê xwe date bibilindîkin, ya me ew di civîna pêşî de di

---

didate bigirtin û ew bi dilsozê Barzanîyê mezinî ne mir ve dihate biderkevtin.

bezim û rezma Basî û Mukerem Talebanî de ligel Wênera Emerîkî de dabû binisakirin. Wê pir ji me didate bihezîkirin û ji dil û can pişta pirsra Kurd di Kurdistanê de didate bipitgirtin. Wê em bi gelek Wênerên welatan ve li Ewropa û Emerîka Lafînî û Keneda de bi nala Wênerên Kurd ve di Kurdistanê de didatin binaskirin û wê ji wan daxaza piştgirtina me didate bixwestin.

Gava ku em ji bona nava hola Encumena Rojhilata Navînî hatin biçûyîn, wê bi milên min ve date bigirtin û ez di nava xwe û Wênera Emerîkî de datim bidanîn. Gava ku min gotina xwe date bidawîkirin û ez hatim birûniştin, wê pîrê bi hêdî ve ji min re date bigotin: Şêrinê ber dilê min, te başkir, ya te bes û yê mayî tu ji Pîra xwe re bide bihiştin.

Bi rastî jî ve Pîra min ne pîr bû. Gava ku ew bi ser xwe ve hate birabûn, tê bigota ku evaya bi keçeke çardeh salî ve di vîna xwe de ji bona Kurd dihate biderkevtin û wê, mîna ku bi bîra min ve têtê biderkevtin, wetov wê date bigotin:

Ez di nava gelek kongiran de çî netewî û çî jî di navnetewî de hatime bibeşdarîkirin, belam wetov bi xavî ve mîna gotinên Wênerên Serdarîyên Basî li Iraqê û Surî de min hêjî beramber pirsra miletekî nedayite bibihîstin.

Wênerê milletê Kurd bi amar û belge ve li ser pirsra Kurdistanê de date baxivtin, min nedate bibihîstin, ku yekekî ji wênerên wan serdarîyan amar û belge bi nerastî ve dane biderxistin; lêbelê bes û bi tenha ve bi gotinên hîç û pûç ve wan bersîva Wênerê Milletê Kurd datin bidan.

Pirsra milletê Kurd ji bona mafeyê çarenûsa wîna bi hîç merceki ve, yanjî bi hîç desteyekî ve, bi guruhekî ve û yanjî bi hîç çînîyekê ve nayête bigirêdan. Ev mafeyê hanê bi mafeyekî seruşti ve ji bona hemû miletan di vê dunyayê de têtê biderkevtin.

Mukerem Talebanî dide bigotin; ku ev Wênerê hanê ne bi Wênerê Kurd ve têtê biderkevtin, lêbelê bi wênerê Kevneperestîyê, Serokên eşîran ve têtê biderkevtin. Vî Wênerê Milletê Kurd Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomî ji bona Kurdistanê date bidaxwazkirin. Wî çarekirina pirsra milletê kurd bi aşîti ve date bidaxwazkirin. Wî ji me re tevaya derdên milletê xwe date biderxistin û ji bona bextê me date bibangkirin, ku em pişta vî Milletê Kurd ji

qirkirinê û wêranîkirinê de bidin bigirtin. Ev bi daxwaza Wênerê Kurd ve dihate biderkevtin. Talanî û wêrankirina Kurdistanê û qirkirina Kurd ji bal serdarîya Iraqê de ji bal Wênerê serdarîya Basî Mukerem Talebanî de dihate biderkevtin. Cudabûn di nava van herduan de yek jê wênerîya Miletê xwe dide bikirin û yê din jî bi navê Pêşverûtîyê ve rast û durust wênerîya serdarîya Basîyî rehperest dide bikirin, ku hêjî di nava guhên min de nalîna serbirîna bi hezaran ve ji Demokratên Iraqê ve li ser destên faşîyên Basî de der sala 1963 de tête biderkevtin.

Wênerê Basîyê Surî Kurd bi miletekî ve nade bidanîn. Ez zarobûm di mêjûwê de her û her navê Selah El-Dinê Mezin (1134 - 1193) ji mere di şerê Xacperestan de di sedsalên duwazdehan de dihate bigotin, ku vî Gewreyê Kurd Patîşahê Ingilizî Richard (1157 - 1189) dayite bidîlîkirin û wî ew di dawî de date biberdan. Herwehaji vî gewreyê Kurd der sala 1197 bi girtina Qudsê ve şerê Xaçperestan piştî dirêjbûna bi dusedsalî ve hate bidawîkirin. Herwehaji navê Kurd û welatê wîna ji bil belgeyên Somerî de herwehaji ew di Tewratê û Incilê jî de hatiye bitomrîkirin.

Der sala 1918 Wilson (1856 - 1924) Serokê Yekîtiya Dewletên Emerîkî 14 bendên bingehî di bernama xwe de ji bona çarekirina pîrsa Aştîyê di çarenûsa miletan de date binivîsandin. Wî ji bona çarekirin pîrsa miletên li jêr Selteneta Osmanî de di pêşî de ew li ser navê Ermenîya de, di pişt re ew li ser navê Kurdistanê de û di piştî re ew li ser navê Arebistanê de dide biaxivtin. Di peymanê Sever der sala 1920 de di bendên 62, 63, 64 li ser pêkhatîna dewleteke Kurd de tête biaxivtin, berî ku him li ser pêkhatîna dewletekî Surî yanjî Iraqî de bête biaxivtin. Heger Merov neha ji xwe re li hemû neqşên berî cenga cîhanî yekem de bidin bitemaşekirin, dê em ji xwe re neqşa Kurdistanê li ser wan neqşan de bidin bidîtin. Gelo Sehyonizmê, Impiryalizmê û Kevneperestîyê pîrsa vî miletê kevnar di nava welatê wîyî Kurdistanê de ji berî bêtir ji pênc hezar sal ve dayite biafirandin?. Ez gûmandikim, dê Basîyê Wênerî Surî bi çend hezar sal ve bi qerzdar ve bête biderkevtin; jiber ku Herz Theodor, yê ku wî tevgera Sehyonizmê dayite bidanîn, ew der sala 1860 hatiye bizayîn û ew der sala 1904

hatîye bimirin û Impiryalizim di dawî sedsalê Nozdehan de hatîye bipêkhatin<sup>81</sup>.

Wetov tête biderkevtin, ku ne Wênerên serdarîyên Basîyên Surî û Iraqî bi rastî ve nizanîm bê ka ew çî dibêjin. Heger ku ew dixwazin me bi van gotinên xweyî şovînî û rehperestî ve bidin bixapandin, ez gûmandikim, kes bi van pêyvên ne rast ve nayêtin bixapandin, lêbelê ew dikarin bes û bi tenha ve xwe bidin bixapandin. Di siyasetê de kî vê bide bikirin, di encamê dawî de bi zîyana wan ve tête bidawîkirin. Heger ku Ereba wetov bi vî çavê şovînî ve li çarekirina pîrsa miletê Kurd de bide bitemaşekirin, hîç gûman têde nayête bidîtin, ku dê pîr derd û kul bi ser serên miletê Kurd de bêtin bibarandin, lêbelê di dawîya dawî de dê pîrsa Kurd û Kurdistanê pîr bi diwartir ve û bi girantir ve ji her pîrsekêtir ve li ser Ereban de bête birawestandin. Ez ji dil û can hêvîdarim, ku dê miletê Ereba ne ji bona Kurd, lêbelê ji bona xwe bi çavekî dadwerî ve li çarekirin pîrsa Kurdistanê de bide bitemaşekirin. Serphatîya Ereba ligel Israîl de pîr bi dewlemend û azar ve di vî warê hanê de tête biderkevtin, Ereba bi hemû xavbûna xwe ve dixwestin, ku ew Cuhan ji bona nava derya sipî bidin biavêtin û di pêşîya van Ereban hîç û pûç de Basîyên Surî û Iraqî dihatin biderkevtin. Wan bi van bîr û barîyên xwe ve bi vî karê xwe der 5 axlêva 1967 de Miletê Ereba tûşî gewretirîn şikestin di mêjûwa wî de dane bikirin û Dewleta Israîlî li ser kîsê welatê Ereba de xwe date biducarîkirin. Belê dibe ku Basî xwe iro li Surî û Iraqê de beramber bi miletê Kurd ve bi xurt ve bidin bidîtin, belam sibehê dê pîr bi pepûk û lawazî ve xwe bidin bidîtin, gava ku piştî vî miletê qehreman bête bigirtin û dê miletê Kurd di çarekirina mafeyê çarenûsa xwe de mîna hemû miletên vê dunyayê bête biserkevtin û bigihandin.

Hemû wênerên din ji bil yê Cezarî de daxwaza çarekirina pîrsa miletê Kurd li Kurdistanê Iraqê de bi şêveyekî aşîtî û demokrasî ve

<sup>81</sup> Ji xwe re li ser pêkhatina Sehyonizmê û dewleta Israîlî de bi dûr û dirêjî ve li nivîsta „Israel Intern“ de bi zimanê Elmanî ve, ji bal Arne Jörgensen de, Militärverlag VEB, Berlin 1984 de bidin bitemaşekirin. Di vê nivîsta hanê de di rupelê 391 de hatîye binivîsandin, ku di sala 1897 de li bajarê Basel de li Siwîsra de Kongirêyê yekemî Zehyonizmê ji bona damizirandina Rêxistina Sehyonizmî Cîhanê hatîye bigirêdan.

datin bixwestin û wan date bihêvîkirin, ku wetov mîna Mukerem Talebanî û Wênerê Surî li çarekirina pirsra Kurd de neyête bitemaşekirin,; jiber ku pê dê zêyaneke pir mezin bi miletê Ereb ve di encamê dawî de bête bikevtin.

Di dawî de ez careke din hatim biaxivtin. Min date bigotin: Ez we tevan li ser van gotinên we de derbarê miletê Kurd di Kurdistanê de û pêwistîya çarekirina pirsra wî bi şeveyekî aşîfî û demokrasî ve ji dil û can didim bisipasîkirin.

Pîştî vê em hatin biderkevtin, Careke din Xalid Muhyedin bi destên min ve, bi destên Mukerem Talebanî ve date bigirtin û wî em ligel xwe de ji holê datin biderxistin û pêrejî wî ji bona Wênerê Basî ji bona hatina nik me date bibangkirin. Pîştî ku em herçar ligel hev de hatin bicivandin, careke din; belam vê carê pir bi tundtir ve wî ji wan re date bigotin: Ev siyaseta we dê bi gewretirin ziyar ve li ser miletê Ereb de bête biderkevtin. Her ku hûn Kurd bi laşekî biyanî ve di nava Xakê Ereb de bidin bidîtin û wî bi mîna Israîla duwem ve bidin bidanîn, dê hûn bi gelekî ve ji Israîl bêtir ji bona kara Israîlê bidin bikarkirin. Heyf, ku hûn weha bi nezanî û xurayî ve miletekî wetov nala Kurd di Kurdistanê bi Dujminê xwe ve didin bikirin; jiber ku danîna miletê Kurd bi Israîla duwem ve bi gelekî ve metirsîyekê li ser miletê Ereb de ji Israîla yekem de dide bidurustkirin. Ez ji we hêvîdikim, ku hûn dev ji van hîç û pûçîyan bidin biberdan û her û her ji bona dostaniya miletê Ereb ligel Kurdan de bidin bikarkirin.

Herduwan dixwestin, ku ew xwe zû ji nav destên Xalid Muhyedin bidin birizgarîkirin; lêbelê min dixwest, ku ew bêtir ji bona van nezanên rebenên mêjûwê û Dujimên miletên xwe bide biaxivtin. Wan di bin çavan re li min de didatin bitemaşekirin. Çavên wan ne dibarî, ku ew li rûçikên min de bidin bitemaşekirin; belam ez rep û rast ne bi nala qilçixekî, ne bi nala dirêşekê, lêbelê bi nala gîsnekî ve di nivên çavên wan de dihatim biderkevtin.

Pîştî çuna herdu Basîyan min xatirê xwe ji Xalid Muhyedin date bixwestin û wî ez datim bihembêzîkirin û ji min re date bigotin: Ez te li ser wan peyvên te didim bisipaskirin. Te pir bi rêk û pêkî ve li ser pirsra welat û miltê de xwe date biaxivtin. Te dilê min pir date bixweşîkirin. Dêya min bi xwe jî ve ji Kurdên Kurdistana Turkî ji bajarê Diyarbekrê tete biderkevtin. Wê her û her bi Kurdî ve ligel me



de didate biaxivtin. Ez pir bi Xalên xweyî Kurd ve serbilindim. Hêviyeke min ji te heye, ew jî ku tu pir silavên min ji bona Qehremanê milletê Kurd Barzanî bide bigihandin. Hûn her biserkevtîbin.

Wetov nasîna min ligel Xalik Muheyedîn date bidetspêkirin û wehaji hate bidawîkirin. Min nema êtir ew Ciwanmêrê hanê Xwarzê Kurd date bidîtin.

Belam çiroka me ligel Mukerem Talebanî hêjî nehate bidawîkirin. Ez dixwazim dêrên dawî jî ji vê çiroka hanê li viderê de bidim bidawîkirin.

Di roja din de em hersê Wênerên Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de ji bona geştekê li ser avên Berlin de di rêya keştekê de hatin bimêvandarîkirin. Em jî ji xwe re ligel hemû mêvanên din de ji bona wê seyranê hatin biçûyîn. Me ji xwe re keştyek date bidîtin û em ji xwe re lê hatin bisuwarbûn û me cî ji xwe re têde date bigirtin. Me careke din date bidîtin, ku Mukerem Talebanî mîna punga mar li ber pozê me de hate birûniştin.

Keçeke Elmanîyî Rojnemevan, ya ku me ew didate binaskirin, ji bona nik Mukerem Talebanî hate bihatin û wê ji wî çend pirs li ser serdarîya Iraqê jê date bikirin. Wî jî mîna hercar çi pesnê hebûn ji bona wê serdarêyê date bikirin û çi bedbûna hebû der barê Kurd û şureşa wî de date bigotin. Piştî ku Keça Rojnemevana Elamanî hevpyvîna xwe li nik wî de date bidawîkirin, wê berê xwe bi min ve date bivekirin û ji min date bipirskirin: Tu çî li ser van gotinên Mîrza Mukerem Talebanî dide bigotin: Mi jê re bi lez û bez ve date bigotin: Ku gotinên wî bes û bi tenha ve bi gotinên Xwefiroşekî ve têtin biderkevtin. Keça Elmanî ji pozê şeytan hatibû bikevtin, bi zû ve hate pê biliberkevtin. Min jê re date bigotin: bersiva min ji bona te hate bitêrkirin. Wê ji min re pir bi ken ve date bigotin: Ez pir bi givaştî ve û hêjîbêtir pir bi givaştî ve li ber bersiva te hatim bikevtin. Mukerem Talebanî li van gotinên meyî Elmanî de ne dihate biliberkevtin, lê ez gûmandikim, ku wî ew ji xwe re ji bal Wergerê pêre date biwergerandin.

Wetov bi vî rengê hanê ve çiroka me û Mukerem Talebanî di vî Kongirê hanê de pir kes li ser de hatin biagehdarîkirin. Piraînya Kurdên Komonist di Komelê de pir turebûna xwe li ser wan gotin û

reftarên Murekerem Talabenî de dadtin biderxistin û wan jî ji dil û can pişta helwesta me didatin bigirtin.

Raste duruste, ku helwesta Mukerem Talebanî ligel Basîyên Surî û Iraqî de weha pir bi naşîrîn ve beramber bi miletê me ve dihatin biderkevtin, lêbelê di rastîya rastî de wan bi wan reftarên xweyî hîç û pûç ve pir kareke mezin di nava hemû wênerên Kongirê de ji bona miletê Kurd dane bikin. Me zor sûd ji wê hîç û pûçbûna hanê ji xwe re ji bona ragiyandina doza miletê xweyî rewa bi tevaya Wenerên Kongirê ve date bigihandin. Wan pir baş li herdu alîyan de didatin biguhdarîkirin. Me dixwest, ku em pirsra Kurdistanê bi şêveyekî aşîfî, demokrasî li ser bîr û bawerîya cîhanê de bidin biraxistin û tevaya dadwerîya wê ji bona her Merovekî di vê dunyayê de bidin biderxistin. Ji aliyê din şovînzîma Erebi dixwest, ku ew her û her vê rastîyê li ser pirsra Kurd de bide bipoşandin û nehêle ku dengê vî miletê hanê ji bona mafeyên wî di çarenûsa wî de ji bona bîr û bawerîya cîhanê bête bigihandin. Em ji vî kongirê hanê bi serfirazî ve û bi serkevtî ve ji bona miletê xwe hatin biderkevtin.

Dara Tewfîq di wê gavê de li Mosko de dihate bidîtin û wî jî dixwest, ku ew ji bona wî kongirê hanê bête bihatin; belam piştî vê rezm û bezma me ligel Mukerem Talebanî de nema vîza pêhate bidan. Piştî bi dawî hatina vî kongirê hanê ve bi Dara Tewfîq ve vîza pêhate bidan û ew ji bona nik me li Berlin de hate bihatin. Me jê re ji nû ve çîroka xwe ligel Mukerem Talebanî de di kongirê de date bigotin. Pir turebûna xwe li ser Mukerem Talebanî de date biderxistin û herwehaji pir kêfa wî bi wan jêhatîbûnên me ve hate biderkevtin. Belam wî ji me re date bigotin: neha ez hatim biliberkevtin, bê çîma ji bona min vîza nedidane bidan.

Hêjîbêtir di 1. 6. 1972 de serdariya Iraqê Nefta xwe date bimilîkirin, ya ku Sovyêtê hêvîyên mezin li ser de didatin biavakirin, ku dê ew wê bi Karnas û teknîkên xwe ve bidin biderxistin û dê ew wê ji bona cîhana bazara neftê bidin bigihandin<sup>82</sup>.

<sup>82</sup> Ji xwe re li kaniya Pêşî de r. 193 - 227 bidin bitemaşekirin.

Sovyêt pir ji Barzanî didatin bihezkerin û rêz û pişt pir bi xurtî ve di seranserî mêjûwa xebata wî de lêdatin bigirtin. Lêbelê diyariya Basîyan ji wan re bi girêdana vê peymana hanê bigir bi bînimû ve dihate biderkevtin û ew bi gelekî ve bi giringtir ve ji girêdana payman Sadat ve ji ber cihê siyasîyî Iraqîyî Sitraticî ve dihate biderkevtin. Belê bi saya kêra Sovyêtê ve peymana 11 avdara sala 1970 mêjûyî di nava Barzanî û serdariya Iraqî de hate bigirêdan. Barzanî rast û durust ji Sovyêtê date bixwestin, ku ew wî ji nava devê gur bidin birizgarîkirin. Mebest jî ji vê li vêderê de di rizgarîkirina wîna de ji nava devê gurê Iranî dihate biderkevtin.

Sovyêtê di piştî girêdana vê peymana hanê de pir di navbera Barzanî û serdariya Iraqî de ji bona bicianîna peymana 11 avdara sala 1970 de datin bikarkirin. Wan baştirin û bi nav û bangtirin kesên xwe û gewretirîn Berpirsiyarên xwe ji bona çarekirina vê pirsê ji bona Iraqê didatin birêkirin. Bes û bi tenha ji bona nimû ne wan Girêcko Wezîrê Luberxwedana Sovyêtê, Kopsigîn Serokê Wezîrê Sovyêtê, Pîramakov jî û herwehaji pir kesên din ji bona çarekirin pîrsa Kurd li ser bingehê peymana 11 avdara sala 1970 de didatin birêkirin. Herwehaji Birêjnêv bi xwe jî ve di sala 1974 de nameyeke bi taybetî ve ji bona Barzanî bi xwe ve date birêkirin, ku ew têde tevaya dildariya xwe li ser pîrsa Kurd de dide biderxistin û herwehaji ew têde pirojeyê serdariya Iraqî ji bona çarekirina pîrsa Kurd di avdara sala 1974 de pir bi kêm ve dide biditin, tevliwêjî de ew jê dide bixwestin, ku ew pê bête birûniştin.

Barzanî bi Merovekî pir gewre û mezin ve di mêjûwa Kurd de dihate biderkevtin. Him ew bi hozanekî pir mezin ve di warê sipahî de û bi taybetî ve bi Mamostayê şerê partîzanî ve dihate biderkevtin û himjî ew bi hozanekî dûrbîn ve di siyaseta jî de û bi taybetî ve di siyaseta çarekirina pîrsa Kurd de û di pêkananîna Dewleteke serbixwe ve di seranserî Kurdistanê de dihate biderkevtin. Wî bi vê hozanî û dilsoziya xwe ve ji bona milletê xwe û himjî ji bona dostaniyê ligel milletên Erebb, Ecem û Turk de ji bona bi aşîti û demokrasî ve çarekirina pîrsa Kurd didate bixebatkin, wî pêtir ji nîvsedsalî ve Rêberîya milletê xwe ji bona serxwebûna wîyî siyasî û di encamê dawî jî de ji bona pêkanîna dewleteke milî de di seranserî Kurdistanê de didate bixebatkin û her û her milletê wî di seranserî Kurdistanê û Cîhanê de bi wê siyaseta demokrasî û merovanî ve di xebata xwe de

dihate biserbilindkirin û dostên wî dihatin bipirkirin û dujminên wî him dihatin bilawazkirin û himjî dihatin bikêmkirin. Jêre di vî warê hanê de tevaya siyasetê di armancê de di sitratîcîyê de û di taktîkî de nebes tenê di rawestandîna wê de hêjbêtir di veguhertina wê de dihatê bidiyarkirin. Barzanî di vî warê hanê bi nîşekî û bêtir durbûna siyaseta Kurd di Kurdistanê de didate bidîtin û mîna Rêberêkî jî wetov ligel de didate bireftarîkirin. Di tevaya rabûn û rûniştina Barzanî de çî di warê siyasî de û çî jî di warê sipahî de her û her Selah-El-Dînê Eyubî jêre bi nimûve dihatê biderkevtin<sup>83</sup>. Tevaya siyaseta wîna û têgihîştina wîna di jînê de li ser felsefa Xanî de dihatê bibingehkirin.

Merovekî hozan û zanayî wisa di nav tîrş û talîyên ceng û şer de hatîye bitirşkirin, li ber çavên wî de tevaya taktîk û sitratîcîya Basîyên Faşîyên Zarokên Eflaqîyî Iraqî dihatê bidiyarkirin. Wî mebesta wan pir bi başî ve didate binaskirin. Herwehajî hêjbêtir wî tevaya bingehê daxwaza Sovyêtî pir bi başî ve didate binaskirin. Jibervêjî ve wî her û her daxwaza çarekirina aşîyî pîrsa Kurd li ser bingehê rast û durst de dûr ji xapandîna û yarîkirina siyasî de didate bikirin. Wî yek daxwaza rewayî rast û durst û hêjbêtir bi pêwîst ve ji Sovyêtê didate bikirin, belê ezê bi daxwazên we ve bêtim birûniştin, gava hûn ji mer bidin bigirawkirin, heger ku serdarîya Basîyî Iraqê şerek li ser me de date bidadan, ku hûnê dê pişta me bidin bigirtin. Di vê daxwaza Barzanîyî rewayî durst de tevaya durbûna têgihîştina serûştîya siyaseta Basî tede dihatê biderkevtin. Lêbelê Sovyêtê jê re datin bigotin, ku ev bi me ve nayête bikirin.

Ji alîyê din de paşverû û kevneperestîya Kurd jî her û her wê jî ji alîyê xwe jî de agirê şer û cengê didata bidadan. Wê li dahol û zurna cengê de li Kurdistanê de didate bilêdan û wê fermanên kevneperestîya Rojhilata Navînî bi giştî ve û nemaze fermanên Şahê Iranê bi teyabetî ve didatin bicîanîn. Vê kevneperestîya hanê bi carekê ve xwe li ser kirinên xwînmişîya Şahînsahê Iranê de bi beramberî Kurd û hêzên pêşverû ve li seranserî Rojhilata Navînî de didatin

<sup>83</sup> Ji xwe re bi dûr û dirêjî ve li ser jîyannama Selah-El-Dîn de di nivîsta „Sela El-Dîn de“ di wergerandina Erebi de ji zimanê Inglîzî de ji bal Dr. Alî Madî, El-Ehliye liîleşir, Bêrud 1986 de bidin bitemaşekirin.

bijîbîrakirin û wan jêre didatin bişabaşkirîn û li dahol û zurnê de didatin bilêdan.

Herwehajiî impiryaliya Emerîkî di rêya Wezîrê xweyî derve Kisincer de didate bixwestin, ku ew vê şûreşa hanê bi hêsanî ve ji bona berjewendiyên xwe û derxistina Sovyêtê ji tevaya Rojhilata Navîn de û pêrejî ji Iraqê de bide bigorîkirin. Wî ji xwe re li Pirsayrîya Kurd de bi nala kaxezeke yarî ve li ser mêza siyasetê de lê didate bitemaşekirin.

Di mêjûwa siyasetê de gelek carî ev hatîye bikirin û hêjî bi pir jî ve ev dê bête bikirin. Mîletekî zana û têgihiştî ne Dost dikarin wî bidin bixapandîn û ne jî Dujmin dikarin bi pê ve bidin biyarîkirin. Bedbextîya miletan û herwehajiî bedbextîya miletê Kurd jî di nezanîya wan de her û her hatîye biderkevtin û hêjîbêtir dê bête biderkevtin.

Kurd bi nezanî ve û himjî bi neçarî ve tuşî veguhertina Dostên xwe bi Dujminên xwe ve dihatin bikirin. Hêjîbêtir û bi metirstir ve wan taktikî xwe bi sitraficîya xwe ve datin biveguhertin. Borcuwazîya Kurdîyî nuhhatî bi lez û bez ve tevaya mêjûwa miletê xwe di xebata wîyî dirêjî tirş û talî xwînavî de didate bijîbîrakirin. Wî Dost û Dujmin bi hev ve didatin biguhertin, ku ev siyaseta hanê di tevaya xebata azadîxwazîya Kurdistanê de bi bînimû ve di hate biderkevtin.

Belê di zanistîya siyasetê de Dost û Dujminên rawestyayî sarkirî nayêtin bidîtin. Dost û Dujmin di siyasetê de her û her di guhertinê de têtin biderkevtin. Bes û bi tenha ve nîşankirina Dost û Dujmin di siyasetê de li ser gihandina armancê de têtin binîşankirin. Ji bona gihandina armanca giştî, belê aramaca dewletê her pêrabûnek ji bona gihandina wê armançê hanê bi kurtirîn dem û kêmtirîn gorî ve her û her bi perst ve têtin biderkevtin. Weha ev rêzana zanîstina siyasîyî hanê di nivîsta Mir de ji bal Mikavilî de hatîye bitomarkirin. Di guhertin û veguhertina Dost û Dujminan de ligel hevdu de divê bi kêmanî ve pêşbînîya bi serkevtinê ve yanjî bi taktîkekî ve ji bona pêşbînîya bi serkevtinê ve bête biderkevtin. Jibervêjî vê ve di siyasetê de divê Merov tucarî derîyê ve gerê li ber xwe de nede bidadan. Her û her divê Merov deryekî vekirinê di pêşîya xwe de bide bihiştin. Lêbelê Borcuwazîya Kurdî nûhatî weha bi bê serpêhatî ve û hêjîbêtir bi nezanî ve xwe di nava honandin û tevnên xweyî nigaşî de dihatin

bikevtin û ku ew xwe di nava dek û dolabên Basîyan de bidin bivezilandin.

Siyaseta Komela me, Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de di tevaya xebata xweyî siyasî de di seranserî mêjûwa xwe de ji bona gihandina rewş û zînetên di Kurdistanê de ji bona bîr û bawerîya cîhanî didate bikarkirin, herwehaji wê xwe her û her bi beşekî ve ji xebata rewayî azadîxwazî miletên cihanê û herwehaji wê xwe bi beşekî ve ji xebata azadîxwazî Kurdistanê ve didate biditin. Wê ji alîyekî de pir bi xurtî ve û bi dil û can ve piştî xebata miletê xwe û şûreşa wî didate bigirtin, jiber ku bes û bi tenha ve Basîyên Dagirkerên Kurdisanê bi tawankar ve di vê siyaseta hanê de dihatin biderkevtin. Ew siyaseta hanê bes û bi tenha ve ji bal Basîyên faşîyên Iraqî de li ser Kurd de hatibû bineçarîkirin û kevneperestîya Kurd xwe di nava wê de didate bidermalekirin. Ji alîyê din de Komela me, Komela Xwendevanên Kurd li Ewrop de ji bona miletê xwe didate biderxistin, ku Dujminê hemû milatan di seranserî cîhanê de di mêjûwa wanî dîr û di rêj de di xebata wanî azadîxwaz de her û her kevneperestî û hêzên impiryalistî dihatin biderkevtin. Hiç rojeke ji rojan tanî neha xebata miletekî ji bona azadîxwazîya wîna, serbestîya wîna û serxwebûna wîna di rêya impiryalistîyê û kevneperestîyê de nehatîye biserkevtin. Dujminên Kurdî mezin her û her di kevneperestîyê û impiryalizmê de û nemaze di kevneperestîya Şahînsahê Iranê û impiryalizma Emerîkî de dihatin biderkevtin, yên ku ew her û her bi xwînîjî û bi xwînrijên miletê Kurd û hêzên pêşverû ve di seranserî Rojhilata Navînî de dihatin biderkevtin, hêjîbiserdejî ve kevneperestîya Şahînsahîya Iranî bi Cendermê impiryalizma Emerîkî ve di Rojhilata Navînî de ji bona talankirina dewlemendbûn wê û kolekirina miletên wê di hate biderkevtin.

Kevneperestîya Kurd bi hemû rengên xwe ve li ser bîr û bawerîyên wetov de weha pê dihatin biharkirin, ku wê weha bi dijî wan ve bi şer û ceng ve di hate bidakevtin. Wê Merovên weha bi bîr û bawerîyên wetov ve bi xurufandî ve didatin bixuyanîkirin. Xebata Kurdî rewa, ya ku ew weha ji bal seranserî hêzên pêşverû û azadîxwaz di hate bipiştlêgirtin, ew bi bê pişt ve û bi tenha xwe ve hate bimayîn û bes û bi tenha ve piştî wê bi Dujminên wê ve hatibû bigirêdan.

Basîyan di vî warê hanê de li seranserî Ewropa û Emerîka de hêzên Komnistên Iraqî û Gumgumên wan ji xwe re didatin bikaranîn û bidagirtin, ji yên ku ew bi nav ve, mîna ku Lenin di kongirê Şitugart de der sala 1912 de dide bigotin, Sosyalist bûn, lêbelê bi kar ve ew Şovînist bûn. Belê Gumgumên Gewreyên Komonistên Iraqî jî bi nav ve ew Komonist bûn, lêbelê di rastîya rastî de û di cewhera xwe de bi rast û durust ve bi faşîyên basîyên Efleqî ve dihatin biderkevtin. Basîyên faşîyên Efleqî ew ligel xwe de li bajarên Ewroipî û Emerîkî de didatin bigerandin û civîn li dû cîvanan de û pêwendî li dû pêndîyan de bi wan ve ji bona xelkê didatin bikin. Wan tevaya xebata miletê Kurd û şûreşa wîyê dadwerî ji bona mafeyê miletê wêyî rewa û ji bona man û nema wî bi kevneperestî ve, bi Nokerên Xwefiroşên Impiryalizmê û kevneperestîyê ve bi dijî serdarîya Iraqêyê pêşverû ve, ya ku ew li ser rêya bicîanîna Sosyalistîyê de tete biçûyîn, didatin biderxistin. Ne bes tenê van Komonistên Iraqîyî xwefiroş û hestîkojên Basîyên faşî hirîşî bi şas ve mîna Gewendan ji bona Basîyan li her der û cî ve dihatin biderkevtin, wan tucarî navê Kurdistanê bi ser zimanên xwe ve nedidatin bianîn, her û her wan navê Şemal-El-Hebîb didadatin bigotin. Partîya Komonist ligel Hevalbendên xweyî faîyî Basî de di Berê Milîyî Pêşverû de dihatin bibeşdarîkirin û herwehaji ew nala Partîyekê bi careke ve beramberî wê siyasta faşîyî Basî beramber Kurd û Kurdistanê ve xweser têtin biberpirsiyarîkirin û ew nebes bi tenê ve di wî karê xwe de bi rûreşî û tawankarî ve beramber bi miletê Kurd ve dihatin biderkevtin, herwehaji hêjbêtir ew bi rûreşî û tawankarî ve biramber bi Miletê Ereb ve li Iraqê ve dihatin biderkevtin. Hêjbêtir wan bi vê siyaseta xwe ve di encamê dawî de bi neçarî ve li ser belgeyê nemankirina xwe de li Kurdistana Iraqê de dane bimorkirin.

Dewletên mezin û giran di mêjûwê de bi siyaseteke wetov ve bi beramberî miletên jêrdest ve bi neçarî ve ji ser ruwê zemînê de hatine bimalandin.

Marx û Engels pir di warê pîrsa milî de û çarekirina wêna dane binivîsandin. Bi taybetî ve wan pir bi dûr û dirêjî ve li ser çarekirina pîrsa Irlendî û şêveyê çarekirina wêna dane binivîsandin. Hêjbêtir wan her û her didatin bigotin, ku pîvana wan ji bona sosyalistîya Merovekî her û her wan ew di helwesta wîna de ji bona çarekirina

pirsa milî de didatin bidîtin; jibervêjî ve li nik wan de û li gora pîvana wan de dê pir pir ji Komonistên Iraqê û yên Ereben din de rojekê ji rojan ne bi sosyalistî û neji bi Komonostî ve bihatana biderkevtin.

Herwehaji di vî warê hanê de pir bi dûr û dirêjî ve Lenin di nivîsta xwe de: Derbarê Çarekirina Mafê Netewan di Çarenûsa xwe de dayite binivîsandin. Wî Roza Luxemburga Sosyalistîya Elmanî bi Puşt ve didate binavkirin; jiber ku ew bi mafeyê çarenûsa Polonî ve nedihate birûniştin. Li nik Lenin de Mafeyê çarenûs bi nala mafeyekî serûştîyê Netewan ve tête biderkevtin û ew her kat û zemanekî û di bin her merc û zînetekê de divê pê bête birûniştin. Mafeyê çarenûs di pêkanîna dewleteke milî de bi serwerîya miletan ve tête biderkevtin, ew mafeyê hanê ne tête bidan û neji ew dikare ji miletan bête bisitandin. Ew mafeyê hanê ne ji bona Xanedanên miletêkî, neji ji bona Burcuwazîya wîna û herwehaji neji ji bona Karkerên wî miletî pê tête birûniştin, lêbelê ew bes û bi tehma ve her û her bi mafeyê milet ve tête biderkevtin û li ser hemû Sosyalistan, Komonistan û hêjîbêtir ew li ser Demokratên jî tête bidivakirin, ku ew bi wî mafeyê hanê ve bi bê merc û bend ve pê bêtin birûniştin; jiber ku Mafeyê Netewan di Çarenûsa wan de bi mafeyê serûştîyî miletan ve tête biderkevtin.

Weha Lenin li ser Mafeyê Çarenûs de û pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve dide biaxivtin. Hêjîbêtir di tevaya Mêjûwa Ewropa de di piştî hatina Borcuwazîyê de ji bona serdarîya welêt şer û cengên mezin di nava welatên Ewropî de li ser azadî, serxwebûn û pêkanîna dewletên milî de hate bivêkevtin. Bi Melyonan Merov di vî warê hanê de û di wan şer û cengên harî tenûrî de hatin bikuştin bisûtandin<sup>84</sup>. Imperatoriyên gewre û mezin li ser neçarekirina wê pirsê milî de di mafê çarenûsê de him hatinê bipaşketin û him jî ji ser rûwê zemîne de

<sup>84</sup> Ji xwe re li ser van cengên giran û mezin di Ewropa de di nivîsta Kant de „Zum ewigen Frieden“ -Jî bona Aştîya hergavî- bidin bitemaşkirin, ya ku ew ji 1796 - 17800 hatîye binivîsandin, Verlag Philipp Reclam jun. Leipzig 1984 de bidin bitemaşkirin.

Ev nivîsta hanê ji bal Seid Nakam bi zimanê Kurdî ve bi zaravayê soranî ve li jêr Navnîşana „Kurd li Mêjûwa Dirawesekanida“, „Siyahetnamey Olya Çelebî“ de hatîye biwergelandin û ewdi çapxana korî Zanyarî Kurd de, Begdad 1979 de hatîye biçapkirin.



hatine bimalandin. Ji bona nimû Lischtenstein -Lîtinitayin- bi biçûktirîn dewleta mîlî ve li Ewropa de tête biderkevtin, ku serjimara amara xelkên wê bi 25000 Kes ve tête biderkevtin.

Di piştî bi dawîhatina cenga cîhanîyî duwem ve di 26. 6.1946 de Sazmendîya Yekîtiya Netewan li San Francisco de di Yekgirtina Dewletên Emerîkî de hate bidurustkirin. Yekek ji girîngtirîn bendên bingehîyî vê sazmendîya hanêyê Navnetewî benda pêrûniştina bi Mafeyê Çarenûsê Netewan ve tête biderkevtin, ya ku têde tete bigotin, da ku nifşên tên ji cengê bêtin biparastin. Jibervêjî ve divê li vê derê de bête bidubarekirin, ku pêrûniştina bi mafeyê çarenûsa Netewan ve ji bona pêkanîna dewleteke milîyî ser bi xwe ve ne ji alîyekî demokrasî ve, neji ji alîyekî pêşverû ve û neji ji alîyekî merovanî ve tête biderkevtin, na. Ew bes û bi tenha bi neçarîyeke mêjûyî ve tête biderkevtin, ew bi mîna qanûneke serûştî ve tête biderkevtin. Her Merovekî ji miletekî zalkirî li ser miletekî din de bi vî mafeyê hanê ve bes û bi tenha ve di têgihîştina wîyî dûr de ji bona qazanc û berjewendîya miletê wî ve tête biderkevtin, yanjî bi neçarî ve tête biderkevtin, jiber ku welatê miletê jêrdest bi goristana miletê zalkirî ve di encamê dawî de bi rep û rast ve tête biderkevtin û tevaya hatin û dewlemendbûna miletê zaldar bi bê sûd ve ji bona nava tenûra şer û cengê ve bi dijî miletê jêrdest ve tête biavêtin.

Wetov heger ku Rom, Erebb û Ecem bi vî mafeyê miletê kurd ve di mafeyê çarenûsa wî de ji bona pêkanîna dewleteke milîyî serbixwe ve pê neyêtin birûniştin, di encamê dawî de her û her dê ew bi zîyana wan ve bête biderkevtin û Kurdistan dê bi goristana wan ve mîna Vîyetnamê bête biderkevtin.

Di cara pêşî de di mêjûwa Merovanîyê de Hegel di Felsefa Mêjûwê de der sala 1828 de di peyvdarîyên xwe de di zanistgeha Berlin dide bigotin: „Civateke Azad Civateke din nade bijêrdestkirin“. Di pişt re Marx di nava lênerîna tevaya jîna Mirovan de û di hemû qonaxên mêjûwê de û li ser bingehê wê remana bilindî Hegel de dide bigotin: „Miletekî Azad miletekî din nade bijêrdestkirin“. Magelo tanî kengî dê Rom, Erebb û Ecem li ber vê rastîya tîrşîya mêjûwê û serpêhatîya Merovan de nêyetin biliberkevtin. Rom, Erebb û Ecem xwe ji bona nava sedsalê bîstûyekem bi kole û bendekirina Kurd û Kurdistanê ve didin biavêtin, yê ku ew têde hêjbêtir ji miletê Kurd di

